Cahit TURĞUT

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

NÎSAN - 2019

K.T.
ZANÎNGEHA WAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE MELA MUHEMMED NÛRÎ Û BERHEMÊN WÎ

**Cahit TURĞUT**

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

NÎSAN - 2019

**K.T.**

**ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

# DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE MELA MUHEMMED NÛRÎ Û BERHEMÊN WÎ

**TEZA LÎSANSA BILIND**


**AMADEKAR**

**Cahit TURĞUT**

**ŞÊWIRMEND**

**Dr. Nesim SÖNMEZ**


**WAN-2019**

**T.C.**

**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI**

# KLASİK KÜRT EDEBİYATINDA MOLLA MUHEMMED NURİ VE ESERLERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**


**HAZIRLAYAN**

**Cahit TURĞUT**

**TEZ DANIŞMANI**

**Dr. Nesim SÖNMEZ**


**VAN-2019**


Bu tez Yüzüncü Yıl Üniveristesi Bilimsel Araştırma Projeleri Başkanlığı tarafından SYL-2017-6047 numarasıyla desteklenmiştir. Bilimsel Araştırma Projeleri Başkanlığına bu desteğinden dolayı teşekkür ederiz.

**T.C.**
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**TEZ KABUL TUTANAĞI**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Cahit TURĞUT tarafından hazırlanan **"Di Edbîyata Kurdî A Klasîk De Mela Muhemmed Nûrî û Berhemên Wî"** adlı bu çalışma, **29/04/2019** tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan(Danışman)** | : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ | İmza:………………… |
| **ÜYE** | : Dr. Öğr. Üyesi Mahmut DÜNDAR | İmza:………………….. |
| **ÜYE** | : Dr. Öğr. Üyesi Ahmet Bardak | İmza:………………….. |
| **ÜYE** | : ……………………..…… | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : ………………………..…… | İmza: ………………….. |

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

…/05/2019
Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü

**ETİK BEYAN**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Yüzüncü yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yzım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

Tez içerisinde sunduğum bilgi, belge ve dökümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,

Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,

Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,

Kullandığım bilgi ve dökümanlarda herhangi bir değişiklik yapmadığımı,

Bu tezde sunduğum çalışmanın ilk ve özgün olduğunu bildiririm. Aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

06/04/2019

Cahit TURĞUT

## NAVEROK


**NAVEROK** ........ i

**KURTE** ........ iii

**ÖZET** ........ v

**ABSTRACT** ........ vii

**PÊŞGOTIN** ........ ix

**KURTEBÊJE** ........ xii

**DESTPÊK** ........ 1

**BEŞA YEKEMÎN** ........ 4

**1.1. MELA MUHEMMED NÛRÎ Û JIYANA WÎ** ........ 4

**1.1.1. Jidayîkbûna Wî û Nesebê Wî** ........ 4

**1.1.2. Zaroktî û Perwerdeya Wî** ........ 4

**1.1.3. Zewaca Wî û Ehlê Mala Wî** ........ 5

**1.1.4. Dersdarî û Melatiya Wî** ........ 5

**1.1.5. Wefata Wî** ........ 6

**1.1.6. Çend Kurtenîşeyek ji Jiyana Wî** ........ 6

**1.2.1.Kitabu'l-Isra we'l-Mi'rac (Mi'raciye)** ........ 7

**1.2.1.1. Naveroka Berhemê** ........ 8

**1.2.2. Kitabu Nuzhetun-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî)** ........ 13

**1.2.2.1. Naveroka Berhemê** ........ 13

**1.2.3. Me'temname (Mersiyename)** ........ 18

**1.2.3.1. Naveroka Berhemê** ........ 18

**1.2.4. Mesnewiya Şemsedînê Tacir** ........ 22

**1.2.4.1. Naveroka Berhemê** ........ 23

**1.2.5. Dîwan** ........ 25

**1.3. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ** ........ 26

**1.3.1. Ziman û Vegotina Wî** ........ 26

**1.3.2. Di Berhemên Wî de Bandora Kevneşopa Medreseyan** ........ 29

**1.3.3. Di Helbestên Wî de Bikaranîna Serwayê (Qafiye)** ........ 30

**1.3.3.1. Serwaya Mucerred** ........ 31

**1.3.3.2. Serwaya Murdef** ........ 32

**1.3.3.4. Serwaya Muesses** ........ 33

1.3.3.5. Iltizam ........ 33
1.3.4. Paşserwa........ 34
1.3.5. Di Berhemên Wî de Hunerên Edebî........ 35
1.3.5.1. Tenasub ( Guncanîtî) ........ 35
1.3.5.2. Tezad (Dijberî) ........ 36
1.3.5.3. Teşbîh (Şibandin/Manendin)) ........ 36
1.3.5.4. Teşxîs ( Kesandin) ........ 37
1.3.5.6. Teraduf (Hemwateyî)........ 38
1.3.5.7. Tekrîr ( Dubare) ........ 39
1.3.5.8. Mubalexe (Pirole)........ 40
1.3.5.10. Telmîh (Bîranîn)........ 42
1.3.5.11. Nîda (Bang/Gazî) ........ 43
1.3.5.12. Îsti‘are (Sparde) ........ 44
1.3.6. Mexlesên Wî ........ 44
BEŞA DUYEMÎN........46
2. LATÎNÎZEKIRINA BERHEMAN........ 46
2.1. KITABU’L-ISRA WE’L-MI‘RAC (MI‘RACIYE) ........46
4.3. MERSIYENAME........ 193
4.4. MESNEWIYA ŞEMSEDÎNÊ TACIR........ 224
5.ENCAM........ 247
6.ÇAVKANÎ........ 250
7. PÊVEK........ 251

**KURTE**

Edebiyat û helbest jî nirxên jiyana mirovahiyê yên herî ciwan û rengîn in. Lewre ku çi tiştê bi jiyana merivan re têkildar hemû jî bi edebiyat û helbestan têne ziman. Bi vî awayî huner û edebiyat û helbest çawa jiyanê dihundirîne, her wisa xweşikahî û wateyê jî têxe nava jiyanê. Hîs û peroşên merivan, hest û ramanên wan, bîrî û bîreweriyên wan, çavdêrî û jiyarên wan bi saya edebiyatê û helbestan hebûna xwe dane der. Hafizeya/vebîra miletekê nîspetî ziman û edebiyata wî ye. Miletê bê wêje, bi kesê lal re hatiye şibandin. Lewre ew milet çanda xwe, rabirdûya xwe, xeyal û bîriyên xwe, kêfxweşî û êş û xemên xwe, bawerî û nirxên xwe, jiyar û serboriyên xwe bêedebiyat negengaze bîne ziman. Ji gelên misilman ên Rojhilata Navîn Kurdan jî ji demên berê heta niha gelek zana, hunermend û helbestvan xwedî kirine. Meriv dibîne ku deverên Kurd lê jiyane di dîrokê de her tim xwediyê şert û mercên zor ênîqlîmî û xwezayî bû. Her wisa deverên Kurdan bi bandora êrişên Xaçperestan, dagirkirina Moxolan û şer û pevçûnên navnetewî gelek bedelên giran daye. Ji ber jiyana qels a civakî û aborî, vê erdnigariyê gelek deman derfetên pêşveçûna edebiyat û hunerê nedîtiye. Lê dîsa jî mirov dikare qala bihereketbûna edebiyat û hunerê yatevî hemû şert û mercên neyînî bi taybetî li medreseyan û li derdora kesen xwenda yên ehlê medreseyan sazbûyî bike. Dema mirov bi vî çavî lê binêre wê bê dîtin ku edebiyata Kurdî jî li gor şert û mercên xwe yên taybet nirxên ku biçûk neên dîtin afirandiye. Mirov dibîne ku kevneşopa ku jê re edebiyata Kurdîya klasîk tê gotin ji aliyê bi dehan helbestvanan ve bi berhemên serkeftî û bedew ve bi sedan salan hatiye domandin. Bêguman ev kesayet û ev berhem hemû jî nirxên malbata mirovahiyê yên hevpar in û mîrata hevbeş a hafizeya mirovahiyê ne. Ez pêbawer im ku piştî berdewamkirina lêgerîn û lêkolînan emê rastî hebûna gelek zana û hunermendan, rastî hebûna gelek berheman bên. Lê belê kifşe ku lêkolîn û lêgerînên sîstematîk ên di vî warî de kêm in. Bi taybetî bi xebatên zanistî yên zanîngeh û akademiyan û bi xebatên zanistî yên kesayet û saziyên di vî warî de dişuxulin, wê berhemên edebiyata Kurdî û her wisa mîratên wêjeyî û çandî yên vê erdnigariyê ji mirovahiyê re hiştî derbikevin holê. Helbet bi vê minasebetê wê mereqdarên wan û hemû aliyên zanistî û hunerî, her wisatevahiya civakê hemû jî wê jê sûdwerbigirin. Me jî kesayetekî di derbarê wî de agahî tuneyî lê berhemên wî di destê malbata wî de heyî,di vê çarçoveya ku tevkariyeke mutewazi bê hesibandin dekir mijara xebata xwe ûbi

malbata wî re rû bi rû hevdîtin kir, gundê wî jî ziyaret kir. Dûre em çûn serdana gora wî û bi destûra malbata wî me berhemên seydayî kopî kir û bi vî awayî ev xebat hate wicûdê. Me di vê xebata xwe de cî daye hêmanên edebiyata klasîk û jiyana seydayê Mela Muhemmed Nûrî. Her wisa me cî daye berhemên wîyên bi tîpên Erebî lê bi zimanê Kurmancî hatine nivîsandin. Me berhemên wî Kitabu’l- Isra we’l-Mirac (Mi‘raciye), Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), Mersiyename, Mesnewiya Şemsedînê Tacir latînîze kir, anku tîpguhêziya wan kir. Bi vî awayî me nehişt nirxekî vî welatî winda bibe. Me bi vê xebatê derfetek çêkir ku berhemên Seydayî yên ku nifşê nû ji ber tîpên Erebî nizane bixwîne, ji hêla wan ve jî bête xwendin. Ev agahiyên rast ên ku me di xebata xwe de cî dayê, bi taybet me ji devê malbata Mela Muhemmed Nûrî guhdarî kiriye,em bawerdikin ku ev yek jî vê xebata me qîmetdartir dike.

**Peyvên Sereke:** Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Pîvana ‘Erûzê, Mela Muhemmed Nûrî, Mi‘raciye, Mersiyename.

## ÖZET

Edebiyat ve şiir, insan ve toplum yaşamının en güzel ve en renkli değerlerindendir. Zira yaşama dair her ne varsa edebiyat ve şiirle dile getirilir. Böylelikle sanat, edebiyat ve şiir hayatı konu alırken aynı zamanda hayata güzellik ve anlam da katar. İnsanoğlunun his ve heyecanları, duygu ve düşünceleri, özlem ve hatıraları, gözlem ve yaşantıları edebiyat ve şiir sayesinde bir hüner olarak varlığını dışa vurur. Bir toplumun hafızası, dili ve edebiyatı nisbetincedir. Edebiyatsız millet, lâl olan insanlara benzetilmiştir. Zira o milletin kendi kültürünü, geçmişini, hayal ve özlemlerini, sevinç ve acılarını, inanç ve değerlerini, yaşantı ve maceralarını edebiyat olmaksızın dile getirmesi pek de olanaklı değildir. Orta Doğu'daki müslüman kavimlerden biri olan Kürtler de geçmişten bugüne birçok alim, sanatkar ve şair yetiştirmişlerdir. Kürtlerin tarih boyunca yaşadığı coğrafyaların zorlu iklim ve doğa şartlarına sahip yerler olduğu görülür. Hakeza bu yöreler Haçlı saldırıları ve Moğol istilalarından, birçok beynelmilel savaşlardan etkilenerek ağır bedeller ödemiştir. Sosyal ve ekonomik yaşamın da zayıf olduğu bu coğrafyalar çoğu zaman edebiyat ve sanatın gelişebileceği elverişli bir ortam bulamamıştır. Fakat yine de bütün olumsuz koşullara rağmen bilhassa medreseler ve medrese ehli okumuşlar etrafında şekillenen bir ilim ve edebiyat hareketliliğinden söz edilebilir. Bu nazarla bakıldığında Kürt edebiyatının da kendi özel şartlarına rağmen küçümsenmeyecek değerler yarattığı görülür. Klasik Kürt edebiyatı denen edebiyat geleneğinin onlarca sanatçı ve şair tarafından güzel ve olgun eserlerle yüzyıllar boyunca devam ettirildiğini müşahede etmekteyiz. Kuşkusuz tüm bu şahsiyetler ve tüm bu eserler insanlık ailesinin de ortak birer değeri ve insanlık hafızasının müşterek mirasıdır. Eminim ki yapılacak araştırmalar ve incelemelerle zaman içinde daha pekçok bilgin ve sanatçının, daha birçok eserin varlığına tanıklık edebileceğiz. Ancak bu sahadaki bilimsel ve sistematik çalışmaların yeterli olmadığı da aşikârdır. Özellikle üniversiteler ve akademiler ile bu alanlarda bilimsel çalışmalar yapan kişi ve kurumların çalışmalarıyla Kürt edebiyatına ait olan ve aynı zamanda bu coğrafyanın insanlığa bıraktığı edebî ve kültürel miras yüzüne çıkacak; meraklılarının, bilim ve sanat çevrelerinin ve toplumun istifadesine sunulabilecektir. Biz de bu meyanda mütevazı bir katkı babında, kendisi hakkında malumat bulunmayan ancak eserleri ailesinin yanında mahfuz olan bir din adamı ve şairin yaşamı ve şahsiyeti hakkında bizzat

ailesinden yüzyüze görüşüp bilgiler alarak, yaşadığı köyü ziyaret edip medfun olduğu kabristana uğrayarak, eserlerinin de birer kopyasını ailesinden temin ederek bu çalışmamızı vücuda getirdik. Çalışmamızda klasik Kürt edebiyatı ve mefhumlarına, Mela Muhemmed Nûri'nin yaşamı ve eserleri hakkında bilgilere yer verdikten sonra Arap alfabesiyle fakat Kürtçe yazılmış Kitabu'l- Isra we'l-Mi'rac (Mi'raciye), Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), Mersiyename, Mesnewiya Şemsedînê Tacir adlı dört eserinin latinizesine de yer verdik. Bu suretle bir değerin tarihin sayfaları arasında kaybolmamasını sağladığımız gibi, Seyda'nın eserlerinin Arap alfabesiyle okuyamayan okuyucuların da istifadesine sunulmasına çalıştık. Çalışmamızda ulaştığımız bilgilerin birinci ağızdan ailesi ve tanıyanlar tarafından bizlerle paylaşılmış sıhhatli bilgiler olması kanaatimizce bu mutevazı çalışmayı kıymetlendirmiş olacaktır.

**Anahtar Kelimeler:** Klasik Kürt edebiyatı, aruz ölçüsü, Mela Muhemmed Nûrî, Mi'raciye, Mersiyename.

**ABSTRACT**

Literature and poetry are among the most beautiful and colorful values of human and society life. Because everything from life is expressed by poetry and literature. Thus while art, literature and poetry makes subjects from life, they also give meaning and beauty for life. Emotions and exites senses and thoughts longing and memories, searches and experiences of human beings are revealed as an ability through literature and poetry. Memory of a community is as much as its language and literature. A community without literature looks like people without tongues. Because it is impossible for this society to express their experience and adventure beliefs and values joys and sadness dreams and longings, its post lives culture. Kurdish people who are among one of muslim tribes in Middle East have brought up many scholors artists and poets. Kurdish have lived in harsh climate and hard surroundigs throughout history in addition these places have been harshly affected by Mongul invades, Crusader attacks and international wars. In theseregions where economical and social life are poor literature and art couldnt find a suitable place to develop. But, despite all of these unfavourable conditions, we can talk about a literature formed around especially Madrassa and those who studied there. When we look at from this respect, we can see that Kurdish literature hos created priceless values despite its special conditions. We see that literature tradition called classical Kurdish literature have been continued by tens of artists and poets with beautiful and mature works throughout centuries. Undoubtly all these personilities and works are common values of human beings family and common heritage of humanity memory. I am sure we will witness the existence of more scholar artists and many more works by studies and searches that will be carried out over time. But it is obvious that works in this field aren’t enough scientific and systematic.Especially via universities and academies, literary and cultural heritage belonging to Kurdish literature and this region left for humanity will be unveiled by the works  fof people and foundation that study in this field.Those who have wonder for this field those who are in art and science field and society will benefit from it. And we have formed our study by getting information having face to face contact with family of a clergyman and poet about whom there is not much information but whose works have existed in his family house, by going to his village and visiting his grave and by ibtainig a copy of

his works from his family. After we have informed aboutMella Muhemmed Nûrî and his works, we presented the Latîn version of his four works Kitabu'l-Isra we'l-Mi'rac (Mi'raciyye), Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), Mersiyename, Mesnewiya Şemsedînê Tacir which have been written in Kurdish with Arabic alphabeth. And thus in addition to we have prevent a scholar works from beng lost in history pages also tried to present them to thise who cant read them by Arabic alphabeth. That our information are from first person and from those who knows him will make our study more valuable.

**Keywords:** Classical Kurdish literature, aruz measure, Mella Muhemmed Nûrî, Mi'raciye, Mersiyename.

**PÊŞGOTIN**

Wek tê zanîn edebiyat peyvekî erebî ye. Gotin, nivîs û helbestên ku hunerê, ciwankarî û hêjahiyê dihundirîne wek "edebiyat" hatiye binavkirin. Kurdan wek hemwateya peyva edebiyatê, peyva "wêje" bikaranîne. Dîroka edebiyata/wêjeya Kurdan meriv dikare bigihîne serdemên beriya Îslamê. Lê ya rast, di nav gelê Kurd de edebiyat piştî serdema Îslamê pêşketîtir bûye. Taybetî jî di medreseyan de, li nav kesên zana û pêşeng de, li nav ehlê tesewifê û seydayan de edebiyata klasîk derketiye holê. Piraniya wan kesayetan taybetmendiyên 'erûzê û taybetmendiyên helbesta klasîk baş dizanîn. Gelek ji wan, berhemên Erebî û Farisî xwendine yan jî haya wan ji taybetmendiyên edebiyata'Ereb û Farisan hebûye. Hêmanên hevbeş ên di van edebiyatan de bûye para wêjeya Kurdî ya klasîk jî. Anku edebiyata miletên misilman ên Rojhilata Navîn, li ser heman zanist û hêmanan hatiye avakirin. Dema mirov van edebiyatan vebikole, wê derbikeve holê ku ruh û giyanê wan ji gelek aliyan ve wekî hev e.

Gelo edebiyata klasîk a bi zaravayê Kurmancî bi çi awayî tê pêşberî me? Bêguman ji serdemên hikûmet û mîrektiyên Kurdan heta serdema desthilatdariya Osmaniyan, li deverên Kurdan gelek medreseyên bi nav û deng, gelek 'alim û seydayên hêja hîme edebiyata Kurdan danîne û wêjeyekî jêhatî avakirine. Berhemên gelek helbestvan û berhemdaran gihîştine serdema me. Lê berhemên hinek ji wan jî hêj nehatine dîtin û destxistin. Hinek helbestvanên edebiyata klasîk a zaravayê Kurmancî ev in: Şukriyê Bedlîsî, 'Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, 'Eliyê Teremaxî, Bekir Begê Erizî, Îmaduddînê Hekkarî, Xalid Axayê Zêbarî, Ehmedê Xanî, Axayokê Bêdarî, Mela Huseynê Bateyî, Harisê Bedlîsî, Selîmiyê Hîzanî (Selîmê Silêman), Miradxanê Bazidî, Mela Mensûrê Girgaşî, Seyfiyê Şûşî, Perto Begê Hekkarî, Feqe Reşîdê Hekkarî, Şêx Nûreddînê Birîfkanî, Mihemed Teyar Paşayê Amêdiyê, Mela Xelîlê Sêrtî, Mela Mehmûdê Bazidî, Mela Yûnisê Herqetînî, Şêx Evdirehmanê Axtepî, Şêx Mihemed Can, Şêx Mihemed Kerbelayî, Şêx Mihemed 'Eskerî[1] û hwd. Heke seranserî herêma Kurdan bi awayekî micid bête lêkolîn û lêgerîn, mimkûne ku hêj gelek helbestvan, berhemdar û zanayên pir biqîmet bêne dîtin û berhemên wan bikevin destê me. Bi vê boneyê emê niha bikaribin qala

[1] Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, Çapa Duyem, Stembol 2014, r. 118.

mijara vê xebata xwe, anku qala Mela Muhemmed Nûrî bi kurtasî bikin.

Seydayê Mela Muhemmed Nûrî di sala 1894an de li gundê Sinanê hatiye dinyayê. Gundê Sinanê gundekî navçeya Bismilê ye, Bismil jî wek tê zanîn navçeya Diyarbekirê ye. Seydayî li gelek deveran xwendina xwe domandiye, piştî xwendina xwe xelas dike li gelek ciyan dersdarî û melatiyê dike. Dawiyê jî nêzî pêncî salan li gundê Diyarbekirê yê bi navê Hecî Îsê melatî û dersdariyê dike û li wir dizewice. Seyda jiyana xwe piranî li wir dijiye û li gundê Hecî Îsê diçe ber rehma Xwedê û li wê derê jî medfûne.

Me di vê xebata xwe de ewil wek destpêk di derbarê edebiyata klasîk de û bi taybetî di derbarê teşeya mesnewiyê de hinek agahî parvekirin. Paşî di derbarê jiyana Mela Muhemmed Nûrî û di derbarê kesayatiya wî de hinek agahî parvekirin. Me berhemên wî ji hêla ziman, ciwankarî û taybetmendiyan ve bi awayekî serveyî nirxand û dahûrînen xwe parve kirin û di derbarê berhemên wî de bi kurtasî hinek zanyarî dan. Dema me mînak ji malîkên seydayî jêgirtî û dahûrîn û nirxandinên xwe parvekirî me navê berheman bi kurtasî li kêleka malikê nivîsandiye. Jimareya ewil a li kêleka malikê hatiye nivîsandin jimara malikê ye, jimareya din jimara rûpela ve xebata me ye. Me berhema Mi’raciyye bi “MC”yê, Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs bi “KNN”yê, Mersiyename bi “MR”yê, Mesnewiya Şemsedînê Tacir jî bi “MŞT”yê daye nîşandan. Agahiyên ku me di derbarê jiyana Mela Muhemmed Nûrî de nivîsandî, hemû jî ji malbata seydayî û ji gundiyên seydayî me bi xwe tomarkirine. Çimkî di derbarê Seydayî de hetanî niha çi lêkolîn û xebatên nivîskî û akademîk tune bûn. Cara yekem e ku me di derbarê Seydayî de danasîneke wiha pêkanî û çar berhemên wî bi temamî latînîze kir. Di latînizeya berheman de me ji xwe re metna resen anku destxeta Mela Muhemmed Nûri esas wergirt. Me di vegotin û nivîsîna peyv û hevokan de çi guherîn çênekir. Ji ber vê yekê eger ku xwendekar di vegotina peyv û hevokan de li gor vegotina gelemperî yan jî li gor vegotina herêma xwe cudahiyekê yan jî çewtiyekê bibînin pêwist e vê bibîrxistina me bînin bîra xwe. Çimkî me di latînîzeya berheman de li gor xwe çi midaxele nekir. Metna resen çawa be me wisa guherandiye tîpên Latînî.

Melayî berhemên hêja li paş xwe hiştine:Kitabul-Isra we’l-Mi‘rac (Mi‘raciye), Kitabu Nuzhetun-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), Me’temname

(Mersiyename) û Mesnewiya Şemsedînê Tacir.. Me jî bi destûra malbata Seydayî kopiya destxeta van berheman xist ber destê xwe û latînîzeya wan çêkir û xiste nava vê xebatê.Piştî latînîzeya her çar berheman jî me hinek wêneyên seydayî û goristana seydayî xiste dawiya vê xebatê. Her wisa kopiya rûpelên van destxetan ên ewil û dawî jî me xiste dawiya vê xebatê. Ji bilî van berheman li gor gotina malbatê berhemeke din a Seydayî ya bi navê Dîwan jî hebûye û qasî 120 rûpelan bûye. Lê mixabin nusxeyên vê berhemê di destê malbata Seydayî de jî tune bûn û me jî nusxeya vê berhemê li tu deran destnexist. Ji ber vê yekê me bi tenê latînîzeya her çar berhemên li jorî hatiye qalkirin çêkiriye.

Em hêvîdar in ku ev lêkolîn û xebata me ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk wek xebatekî mutewazî bê hesibandin û helbestvan û seydayekî din ê Kurdan bi vê boneyê bête naskirin. Her wisa ev xebata me bibe destpêk ku piştî vê lêkolîn û xebata me, di derbarê Seydayî û berhemên wî de hê zêdetir agahî bêne dîtin û nivîsandin. Her wisa em hêvîdarin ku nirxekî din ê Kurdan bi minasebeta vê xebata me li nav pelên dîrokê de winda nebe û neyê ji bîr kirin.

Di lêkolîn û amadekirina vê xebata me de malbata Seydayî, bi taybetî jî kurê Seydayî birêz Ehmed TANYERİ gelek alikariya mekir û kopiya berhemên bavê xwe seydayê Mela Muhemmed Nûrî bi me re parve kir. Em rêz û minêkarî û spasiya xwe pêşkêşî birêz Ehmed Tanyerî û malbata Seydayî dikin. Her wisa şêwirmendê teza min mamosteyê rêzdar Erkdarê Hîndekariyê Dr. Nesim SÖNMEZ jî bi nirxandinên xwe gelek alikariya min kir û rêya min ronî kir.Ez rêz û spasiya xwe ji mamosteyê xwe yê qedirbilind re jî pêşkêş dikim. Wekî din Erkdarê Hîndekariyê rêzdarDr. Ahmet Bardak jî bi peşniyazên xwe yên ji hêla teknîkî ve teza me serûbertir kir.Bi vî awayî yên ku alîkariya wan gihiştî min ji hemû yan re spasdar im.

**Cahit TURĞUT**
**Wan - 2019**

**KURTEBÊJE**

**b.n.** :berhema navborî

**c.** : cild

**Er.** :Erebî

**Fr.** :Farisî

**hwd.** :hewûdin

**KNN** :Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs.

**m.** :malik

**MC** : Mi‘raciye

**MR** :Mersiyename

**MŞT** :Mesnewiya Şemsedînê Tacir.

**r**. : rupel

**wer.** :wergêr

**weş.** :weşanxane

## DESTPÊK

Edebiyat jiyan e, jiyan jî edebiyat e. Jiyan bi hemû reng û dengên xwe di edebiyatê de cî digire. Jiyan û mirin, evîn û veqetandin, kêf û xemgînî, hêvî û hilweşîn, serkeftin û têkçûn, xweşî û nexweşî, ciwanî û kirêtî tev di naveroka cûre nivîsên edebiyatê de ciyê xwe digirin. Her wisa di edebiyatê de kevneşopî û nêrîtên civakê, karesatên bi serê kesan û civakê hatî, pirsgirêkên jiyanê, serborî û dîrok û hwd. di berhemên edebiyatê de hem bi pexşanî hem jî bi helbestkî tên nivîsandin. Cureyên edebî, mijara xwe û tewereya xwe ji van babetan û têgehan werdigire. Ev taybetî edebiyatê gelekî qîmetdar û pêwist dike. Ji ber van taybetiyan edebiyat di nava hemû gelên cîhanê de sazbûye. Heke edebiyata miletekê pêşketî be, meriv dikare bibêje hem serpêhatiyên wan pir in, hem jî di nava wan de jiyaneke pirreng hebûye.

Di dîrokê de di nava Kurdan de jîli hemberî hemû şert û mercên nebaş ên siyasî, civakî û aborî edebiyateke serkeftî pêşketiye. Xasma edebiyata klasîk, ji çaxên dêrîn heta demên nêzîk di nav Kurdan de gelekî berbelav û pêşketî bû. Bi taybetî di medreseyan de û di nava ehlê tesewifê de edebiyata klasîk gelek îtibar dîtiye. Bi awayekî şênber xuya ye ku bandora ola Îslamê li ser edebiyata klasîk gelek zêde çêbûye. Ji ber vê rewşê bi sedan salan di nava Kurdan de jî çand, wêje, muzîk û her cureyên jiyanê mane dibin bandora hişmendiya olî û tesewifî de. Gelek helbestvan û zanyarên Kurd di dîrokê de bi helbestên xwe, bi dîwanên xwe û berhemên xwe yên cûr bi cûr ciyê xwe girtine.

Edebiyata Kurdan eger ku bê dabeşandin edebiyata gelêrî, edebiyata klasîk û edebiyata nûjen tê pêşberî me. Ji ber ku mijara vê xebata me bi edebiyata klasîk re têkildar e, emê di derbarê edebiyata Kurdî ya klasîk de hinek agahiyên serveyî bidin. Edebiyata ku piştî pejirandina ola Îslamê, dibin bandora Îslam û tesewifê de û her wisa dibin bandora çanda gelên Ereb û Farisan de pêkhatî wek “edebiyata klasîk” hatiye binavkirin.[2] Helbet ev nayê wê wateyê ku taybetiyên çanda Kurdan, jiyana Kurdan û serboriyên Kurdan tê de cî negirtiye. Lê belê di edebiyata klasîk de hinek hêmanên hevbeş hene ku di edebiyata Ereban, Farisan, Kurdan û Tirkan de jî hatine bikaranîn. Ev hêman kîjan in? Baweriya Îslamê û ramana tesewifê hêmana herî

[2] b.n, r. 17.

sereke ye. Kêşa (pîvan) erûzê jî hêmanekî bingehîn ê edebiyata klasîk e. Her wisa bikaranîna malikan (beyt), ciwankarî (hunerên edebî), bêjeyên qalibgirtî (mezmûn), ravek (terkîb), teşeyên nezmê, serwa (qafiye), paşserwa (redîf), rewanbêjî (belaxet), şîrove (şerha metnan) û gelek hêmanên din jî bi hev re edebiyata klasîk pêktîne.[3] Bi van hêmanan edebiyateke serkeftî û dewlemend, pirreng û pirwate hatiye damezirandin.

Di edebiyata klasîk de gelek cûreyên helbestan (teşeyên nezman) hene. Ji hêla teşeyê ve her yek ji wan naşibe yeke din û her cûre helbest jî bi mijara xwe ve serbixwe ye. Xezel, qesîde, mesnewî, mustezad, ruba'î, murebbe'e, muxemmes, museddes, musemmen, mu'eşşer û hwd. hinek cureyên helbestên edebiyata klasîk in.

Ji ber mijara vê xebatê, em li ser teşeya mesnewiyê hinek agahiyên zêdetir bidin wê baştir be. Gelo mesnewî di nav helbestên klasîk de taybetiyen çawa dihundirîne? Wek tê zanîn mesnewî peyvekî Erebî ye û tê wateya helbesten ku "didu didu" tên nivîsandin. Anku her beyteke mesnewiyan ji du risteyan pêk tê û her malik di nav xwe de hemserwa ne. Di edebiyata klasîk de helbestên herî dirêj jî mesnewî ne. Hinek mesnewî qasî xezelan dirêj in, hinek jî ji sedan, heta ji hezaran malikan pêkhatine. Helbestvanan çîrokên evînî, mijarên tesewifî, rûdanên lehengkî bi teşeya mesnewiyê anîne ziman. Bûyerên di nava gel de berbelav bûne, mijarên ku di qisseyên Qur'ana Pîroz de hatine qalkirin, her wisa serboriyên di diroka Îslamê de binavûdeng bûne her tim wek mijar di mesnewiyan de hatine vegotin û ristin. Carna jî helbestvanan çîrokên xwemalî yên ku di nav civaka xwe de jî kirine mijara mesnewiyên xwe. Bi naverok û şêwaza xwe ve meriv dikare mesnewiyan wek "çîrokên helbestkî" bi nav bike. Di nav gelên misilman de mesnewî pir zêde hatiye ecibandin. Her wiha di edebiyata Kurdan de jî mesnewiyan ciyekî taybet heye.

Teşeya mesnewîyê bi qalibên kêşa erûzê hatine nivîsandin. Di mesnewiyan de qalibên kinik hatine bikaranîn. Çimkî mesnewî ji xwe helbestên dirêj in. Eger ku hevok û risteyên wan jî dirêj bin wê demê çêja wan wê kêm bibe, xwendina wan jî hêsan nabe. Her wisa vehûnandin û ristina wan jî dê zortir be. Ji ber vê yekê qalibên kurt hatine tercîhkirin[4].

[3] b.n, r. 31.
[4]b. n, r. 418.

Di wêjeya klasîk a Kurdan de jî mesnewî hatine nivîsandin. Mesnewiya Kurdan a ewilîn hatiye nivîsîn “Mem û Zîn”a Ehmedê Xanî ye. Ji bilî wê “Leyla û Mecnûn”a Siwadî,“Yusif û Zelîxa”ya Selîmê Silêman (Selîmiyê Hîzanî), “Mewlûd”a Mela Huseynê Bateyî, “Nehcu’l-Enam”a Mela Xelîlê Sêrtî, “Rewdetu’n-Ne‘îm”a Şêx Ebdurrehmanê Axtepî, “Siyera Cenabê Pêxember” a Mela Nurullahê Kodişkî, Leyla û Mecnûn” a Şêx Mihemed Can û hwd. meriv dikare wek mînakên mesnewiyên Kurmancî rêzbike.[5]

Me jî di vê xebata xwe de xelqeyekî ku ji edebiyata kurdî ya klasîk bê hesibandin kir mijara lêkolîn û lêgerîna xwe. Ev kesayete bi navê Mela Muhemmed Nurî li gundên Diyarbekirê melatî û dersdarî kiriye. Li gor encama lêgerîn û lêkolînên me, çar berhemên Mela Muhemmed Nûrî bi dest me ketin. Dema meriv van berheman dixûne û dadihûrîne xuya dibe ku çar berhemên Seydayî jî wek mesnewî hatine nivîsandin. Kitabu’l-Isra we’l-Mi‘rac (Mi‘raciye), Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), Me’temname (Mersiyename) û Mesnewiya Şemsedînê Tacir çar berhemên Mela Muhemmed Nûrî ne û destxetên wan li nik malbata wî û kurê wî birêz Ehmet TANYERİ ne. Me jî bi malbata Mela Muhemmed Nurî re têkilî çêkir û em ketin pey şopa Mela Muhemmed Nurî. Me di derbarê jiyana wî û kesayetiya wî de, ji malbata wî û gundiyên wî rû bi rû agahiyên rast tomarkirin. Paşê di derbarê berhemên wî û kesayetiya wî ya edebî de hinek zanyarî û nirxandin hatine parvekirin. Her wisa me kopiya her çar berhemên wî jî ji malbata wî wergirtin û xwendin. Me berhemên seydayî latînîzekirin û xistin nava vê xebata xwe. Bi vî awayî ev xebata mutewazî derket holê.

---

[5] b.n, r. 420.

# BEŞA YEKEMÎN

## 1.1. MELA MUHEMMED NÛRÎ Û JIYANA WÎ

### 1.1.1. Jidayîkbûna Wî û Nesebê Wî

Mela Muhemmed Nûrî li gor salnameya (teqwîm) mîladî li dîroka 01.07.1894an de li gundê Sinanê hatiye cîhanê. Gundê Sinanê girêdayî navçeya Bismilêye. Bismil jî a niha girêdayî Diyarbekirê ye.

Li gor helbestên Mela û li gor gotina malbata wî,ew ji silaleya Ehli Beyt in anku Seyîd in. Navê diya Mela Muhemmed Nûrî, Fatima ye. Navê bavê wî jî Mela Ebdullah e. Mela Ebdullah kurê Mela Elî, Mela Elî kurê Mela Ebdullah, Mela Ebdullah kurê Mela Xalid, Mela Xalid kurê Mela Simayîl, Mela Simayîl kurê Mela Muhemmed, Mela Muhemmed kurê Mela Ehmed, Mela Ehmed kurê Mela Receb, Mela Receb kurê Mela Elî ye. Li gor gotina malbata seydayî, secereya wan bi vî rengî ye.

Bav û bapîrên Seydayî jî mela bûn. Xasma dayîka Melayî Fatima Xanim di nav malbata xwe û di nav gelê wê deverê de wek "Şêx Fatima" hatiye binavkirin. Piştî ku dayîka Mela Muhemmed Nûrî, Fatima Xanim wefat kiriye gora wê wek ziyaretgeh hatiye ziyaretkirin.

Li gor gotina ku Seydayî ji malbata xwe re qalkiriye secereya wan li bal birayê Seydayî Mela Mi'az bûye. Kalkê wan ê herî pêşî ji Kûfeyê hatine Mûsilê û ji wir jî hatine Cizîra Botan, Zaxo, Şîrwan û dawiyê jî hatine gundê Qadiya (Yeşilkonak) yê.Ev gund girêdayî Beşîrîyê ye. Beşîrîjî a niha navçeya Batmanê ye. Piştî van koçan malbata kalkên Seydayî hatine gundên Silîvan, Bismil û Diyarbekirê niştecih bûne. Ew malbat wê demê li wan deran jiyana xwe didomîne û zilamên wan li wan deveran melatiyê û muderrisiyê dikin.

### 1.1.2. Zaroktî û Perwerdeya Wî

Melayî perwerdeya xwe ya ewilîn li bal bavê xwe Mela Ebdullah li gundê Sinanê dîtiye. Hê temenê wî biçûk, bavê wî Mela Ebdullah diçe ber dilovaniya Xwedê. Seydayî li Elmedîne, Kardilek, Cizîr,Avîna, Derîk, Altunakar, Güzelşeyh, Alipınar, Maden û Licê perwerdeya xwe domandiye. Li Batmanê û li mizgefta Husrev Paşa ya li Diyarbekrê jî ji 'alim û seydayên mezin ders dîtiye.

### 1.1.3. Zewaca Wî û Ehlê Mala Wî

Mela Muhemmed Nûrî di jiyana xwe de sê caran zewicî ye. Navê jinên wî Medîne, Zemzema û Nafiye bû. Dema ku jina wî Medîne diçe ber rehma Xwedê bi Zemzemayê re, dema jina wî Zemzema diçe ber rehma Xwedê bi jina xwe Nafiyeyê re dizewice. Her sê jinên Seydayî jî çûne ber dilovaniya Xwedê. Ji van zewacan heft kurên wî û heft keçên wî tên dinyayê. Ji xanima Seydayî ya mezin Medîneyê Mehemed Mehdî, Menûre, Asiye û Mehemed Hadî hatine dinyayê. Ji xanima Seydayî Zemzemayê keçên wî Lamîa û Meryem hatine dinyayê. Ji xanima Seydayî Nafiyeyê jî Munewwer, Rabîa, Mehemed, Ehmed, Cemîle, Ebdurrehîm, Ebdulmelîk û Ebdulal hatine dinyayê. Navê keçên seydayî li gor rêza jidayîkbûna wan wiha ye**:** Menûre, Asiye, Lamîa, Meryem, Munewwer, Rabîa, Cemîle. Her wisa navê kurên Seydayî jî li gor rêza jidayîkbûna wan wiha ye**:** Mehemed Mehdî, Mehemed Hadî, Mehemed, Ehmed, Ebdurrehîm, Ebdulmelîk, Ebdulal.Di dema amadekirina vê xebata me de ji kurên seydayî Ehmed û Ebdurrehîm, ji keçên wî jî Asiye, Lamîa, Munewwer û Cemîle li heyatê bûn (2018).

Kurê Mela Muhemmed Nûrî yê mezîn ê bi navê Mela Muhemmed Mehdî, piştî ku Seyda melatiyê diqedîne, 39 salan li ciyê bavê xwe li gundê Hecî Îsê melatiyê dike û piştî teqawidbûna xwe jî li heman gundî diçe ber rehma Xwedê.

Ji kurên Seydayî yên li heyatê Ehmed TANYERÎ di jiyana xwe de li gelek saziyên fermî de wek karmend û wek rêveber kar kiriye. A niha jî li Amedê wek karmendê fermî jiyana xwe berdewam dike. Kurê Seydayî Ebdurrehîm TANYERÎ jî a niha li Amedê ye û ji saziyekî fermî teqawid bûye.

### 1.1.4. Dersdarî û Melatiya Wî

Seyda Muhemmed Nûrî piştî ku perwerdeya xwe li ber destê ‘alimû seydayên herêmê diqedîne û îcazeta xwe distîne, dû re li gundên Amed, Silîvan û Êlihê (Batman) dest bi melatiyê dike. Li gundên wê deverê yên bi navê Aşağı Veysikan, Aynşa, Alişim, Kurdika, Serkalî, Derwîşî û Hecî Îs melatî û dersdariyê dike. Melayî li gundên melatî û dersdarî kirî gelek xwendekar perwerde kirine û gelek kesên xwedî ‘ilm û edeb li ber destê Seydayî derçûyî bûne. Nemaze pêncî salan li gundê Hecî Îsê melatî û dersdarî kiriye, bi sedan keç û kur, xort û ciwan li ber destê wî hînî xwendina Qur’ana Pîroz bûne û her wisa bûne xwediyên ‘ilmên dînî. Bi taybetî jinên

wî jî dersa Qur’anê dane keçên gundê Hecî Îsê.

Mela Muhemmed Nûrî girêdayî Mezhebê Şafi‘î bû. Î‘tiqada xwe li gor Mezhebê Eş‘arî ava kiriye û tabi‘ê çi terîqeta nebûye. Lê têkiliya wî bi ehlê terîqetê re jî xweş bû. Rêz û hurmeta Şêx Evdilqadirê Geylanî û Şêx Ehmed Rufa‘î li bal wî zêde bû.

### 1.1.5. Wefata Wî

Mela Muhemmed Nûrî çend roj beriya wefata xwe kesên malbata xwe vexwendine û li dora xwe civandine, piştî hev helalkirinê destnimêja xwe bi zar û zêçên xwe dide wergirtin, nivînên wî ji ber daxwaza wî ber bi qibleyê ve tên zivirandin. Çend saetekan bêdeng dimîne, paşî çavên xwe vedike û ber bi deriyê odeyê ve dinêre. Hinekî dipeyive, dema malbata wî peyivîna wî pirs dike, seyda dibê ku: “ Ez bi rebbê xwe re dipeyivim” û ji demekî kin û şûn de ruha xwe teslîmî Rebbê xwe dike (27.05.1977).

Gora Mela Muhemmed Nûrî li gundê Hecî Îs e û li kêleka ziyaretgeha bi navê “Seyfulmulûk” e. Li wê derê, di “Goristana Ehli Beyt”a xwe de medfûn e. Gundê Hecî Îsê (Karpuzlu) 10 km’yan nêzî Diyarbekirê ye û li başûrê vî bajêrî ye.

### 1.1.6. Çend Kurtenîşeyek ji Jiyana Wî

Mela Muhemmed Nûrî kesayetekî mêvandar û comerd bû. Mêvanên ku kesekî wan li wî gundî tune, dema ku dihatin gundê seydayî, wî teqez ew mêvan dibirin mala xwe û bi mêvandariyeke baş li wan xwedî derdiket. Li gor danasîna xelkê gundê Hecî Îsê û malbata wî, Seyda di xitabetê (gotinbêjî) û belaxetê (rewanbêjî) de jî serkeftî bû. Seyda di temenê xwe de du caran çûye hecê. Di sala 1953an ûdi sala 1976an de Seydayî ziyareta hecê kiriye.

Dema ku li welêt bang bi Tirkî dihat xwendin, wî her tim bang bi Erebî xwendiye. Du caran cendirmeyan bi emrê qumandarê qereqola gundê Çarikliyê heskirine ku wî bibin qereqolê, lê piştî ku bi wî re peyivîne ew berdane û bi xwe re nebirine.Li gor agahiyên malbata wî, seydayî gelek caran gotiye ku wî du caran bertîl daye karmendên dewletê. Di salên 1930-1940an de bertîl daye cendirmeyan da ku karmendên dewletê yên wê demê berhemên olî ne şewitînin û zererekî negihînin wî. Seydayîji ber vê yekê bertîl daye wan û ew bela ji xwe û ji wir dûrxistiye.

## 1.2. BERHEMÊN WÎ

Berhemên Mela Muhemmed Nûrî yên bi zimanê Kurdî û ‘Erebî hene. Çar berhemên Seydayî yên bi Kurdî ku me destxeta wan peyda kirî bi tevahî helbestkî neanku menzûm in. Destxetên van her çar berheman li nik kurê Seydayî birêz Ehmed TANYERİ ne û wek defter hatine nivîsandin. Berhemên Seydayî yên bi Kurdî ev in:

### 1.2.1.Kitabu’l-Isra we’l-Mi‘rac (Mi‘raciye)

Ev berhem ji **2439 malik**an (beyt) pêk tê. Di vê berhemê de meşa Resûlê Xwedê Hz. Muhemmed a ber bi Qudsê ve û bilindbûna (mi‘rac) wî a ber bi asimana ve bi zimanekî hêsan û bi nezmekî fesîh hatiye nivîsandin. Ev berhem bi vê naveroka xwe ve di edebiyata Kurdî ya klasîk de taybet e. Ev berhem bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de ji behrên ‘erûzê **“behra muteqarib”** hatiye bikaranîn. Wek tê zanîn gelek beşên ‘erûzê hene û ji wan beşan re “behr” tê gotin. Her behrek jî ji qalibên cûr bi cûr çêdibe. Seydayê Mela Muhemmed Nûrî di vê mesnewiya xwe de ji behra muteqarib qalibê **“Feûlun/Feûlun/Feûlun/Feûl”** bikaraniye. Ev qalib di mesnewiyên gelên Rojhilata Navîn de gelek hatiye bikaranîn.[6] Çimkî qalibekî kin û herikbar e. Ev qalib ji çar tef‘îleyan û ji yazdeh kiteyan pêk tê. Helbestên ku bi vî qalibî hatine nivîsandin bara bêtir mesnewiyên dirêj in. Risteyên bi vî qalibî hatine nivîsîn merivan aciz nake û xwendina wan helbestan jî gelek rehet e. Şehnameya Firdewsî bi vî qalibî hatiye nivîsandin. Lewre ji vî qalibî re “kêşeya Şehnameyê” jî hatiye gotin. Em dikarin ji vê berhema Mela Muhemmed Nûrî du malikan wek mînak wiha bidin nîşandan**:**

Hezaran /selat û /hezaran /selam
Li ser Eh/med û şa/hi ‘alî /meqam

Digel a/l û sehbi /di wî cum/le şan
Çi an û/ çi hîn û/ çi sal û /zeman (MC:3,4 / 46)
**. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _**
Feûlun/ Feûlun / Feûlun /Feûl

[6] Haluk İpekten, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, Weş. Dergâh, Çapa Nozdehem. Stembol 2015, r. 287.

### 1.2.1.1. Naveroka Berhemê

Naveroka berhema Kitabu'l-Isra we'l-Mi'rac (Mi'raciye) bi kurtasi û bi vegotina pexşanî wiha ye:

Mesnewiya Mela Muhemmed Nûrî bi hemd û senaya Xwedê û bi selat û selamên li ser pêxember û al û eshabê wî destpê dike. Di malikên ewil de sedema nivîsandina berhemê tîne ziman. Di malikên dû re de dibêje ku guh nedin feylesofên înkara mi'racê dikin, çimkî bilindbûna pêxember a ber bi asîmanan ve ji bona Xwedê tiştekî hêsan e. Paşê vegotinê tîne ser mijara berhemê û qala mi'raca resûlê Xwedê dike.[7]

Xwedayê mezin qasidê xwe Hz. Muhemmed di şeva 27an a meha recebê ji Mekkehê dibe Qudsê. Ji Qudsê dibe heft tebeqeyên 'esmanan û ji wir jî dibe Sidretu'l- Muntehayê û herî dawî jî dibe 'erşê 'ezîm. Bi vî awayî Xwedayê 'ezîm gelek xelat û hedye dane pêxemberî û gelek ayetên mezinahiya xwe nîşanî pêxemberî dane.[8]

Li gor rîwayeta Ebdullah ibni 'Ebbas, 27ê meha recebê û şeva ku roja duşemê girêdide sêşemê, pêxember li mala jina xwe Ummi Haniyê bû. Keça wî Fatima jî li wir bû û hê temenê wê neh sal bû. Fatima dibihîse ku yek li deriyî dide. Ew kes îşaret dide ku keçik pêxemberî daxwaz bike ber deriyî. Dema pêxember diçe ber deriyî melekê Cebrail û melekên din selam û selata didin pêxemberî. Pêxember cil û bergen xwe berdike û bi wan re diçe sehrayê. Giyanewerekî hefsarê wî di destê Cebraîl de hatibû amadekirin ku resûlê Xwedê lê siwar bibe. Ew giyanewerê bi navê Buraq, dihat bal bi resûlê Xwedê ve. Li pişt Cebraîl jî gelek ferîşteyên Xwedê hebûn. Pêxember li Buraqî siwar dibe û bi lez bi rê dikevin. Dema digihin derekê Cebrail dibêje pêxemberî kerem ke ji Buraqî were xwarê û du rek'et nimêj bike. Pêxember sebebê vê yekê jê dipirse, Cebraîl jê re dibêje ku ev der Wadî'l-'Eqîq e. Ev der ciyekî pîroz e. Pêxember û melaîket bi hev re du rek'et nimêj dikin. Pêxember li wî ciyî dengê du mêran û dû re jî dengê jinekê dibihîse. Lêbelê pêxember bi wan re 'eleqedar nabe. Ta digihin Qudsê û li wir jî ciwanekî bedew selamê dide resûlê Xwedê. Pêxember pirsa van kesên razdar ji Cebraîl dike. Cebraîl dibê ku kesê ewil

---

[7] Mi'raciye, malik: 1-35, r. 46-47.
[8] b.n. malik: 36-50, r. 47-48.

vexwînerê Xiristiyanan bû. Ger ku pêxemberî bersiva wî bidaya wê ummeta wî tev bibûya Xiristiyan. Ê piştî wî jî vexwînerê Cihûyan bû. Ger resûlê Xwedê bersiva wî bidaya wê ummeta wî tev bibûya Cihû anku Yahûdî. Jinika gazî resûlê xwedê kirî jî zewk û lezetên dinyayê bûn. Ger pêxemberî bersiva wê bidaya wê ummeta wî tev bibana ketî û koleyên dinyayê. Di rêya Qudsê de dengekî herî bilind bihîstibûn. Cebraîl dibê ev deng ê kevirekê bû û piştî rêya pênsed salan gihîşte cehnema bi navê Seqerê. Ew ciwanê li Qudsê silav daye pêxemberî jî dînê Îslamê bû. Cebraîl dibêje pêxemberî ku divê ew tu car xemgîn nebe, çimkî ew û ummeta wî wê tev biçin cennetê. Dû re Cebraîl sê qedehên di destê xwe de dirêjî pêxemberî dike û dibêje yekê hilbijêre û vexwe. Di qedeha ewil de vexwarinek, di ya din de araq û di yadin de ava zelal hebû. Pêxember qedeha bi tehma hingivînî ya bi lezet wergirt û vexwar. Cebraîl wê demê gote pêxemberî ger wî qedeha araqê vexwariba wê ummeta wî tev gunehkar bibûya. Eger ku pêxemberî qedeha ava zelal vexwariba wê ummeta wî bi avê fetisîbana. Lê pêxemberî nîvek ji qedeha ewil vexwaribû. Ger ku hemû vexwariba, wê ummeta wî tev biçûya cennetê. Bi vê agahiyê pêxember xemgîn dibe. Paşê Cebraîl dibêje ku xemgîn nebe, tu wê bibî şefa‘etkerê ummeta xwe û wan ji ‘ezabê xelas bikî. Paşê pêxember û Cebraîl diçin Mescîd-i ‘Eqsayê.[9]

Pêxember û Cibraîl ji wir bi hev re diçin ‘esmanê yekem. Li wir çavkaniya her du çemên Nîl û Firatê dibîne, ava Kewserê jî dibîne. Paşê ferişteyekî ji nûrê dibîne û li pişt wê ferişteyê jî heftê hezar melek hebûn. Îsma‘îl pêxemberî dibîne û li wî semayî li pêşiya melaîketan du rek‘et nimêjê dike. Ev beşa berhemê bi du‘ayê diqede.[10]

Pêxember paşê diçe ‘esmanê duyem. Melaîket bi selam û selatan wî pêşwazî dikin. Bi daxwaza Cebraîl, ferîşteyê dergevan deriyê ‘esmanî vedike. Pêxember gelek ferişteyên bi şûr û tîran li hespên xwe siwar û amade dibîne. Cebraîl dibê ku ev melaîket ji bona alîkariya mu’minan her tim wiha di amade ne. Paşê du ciwanên rûyê wan sipehî dibîne. Cebraîl dibê ku yek Yehya pêxember e, yê din jî ‘Îsa pêxemberê kurê Meryemê ye. Hz. Muhemmed wan silav dike û bi wan re diaxive. ‘Îsa pêxember çîroka hebûna xwe û kiryarên qewmê xwe ji pêxember re dibêje. Yehya pêxember jî

[9] b.n. malik:51-246, r.48-56.
[10] b.n. malik:247-339, r.56-60.

bi resûlê Xwedê re dipeyive. Bi hev re nimej jî dikin. Ev beş jî bi du'ayê diqede.[11]

Pêxember û Cebraîl ji wî 'esmanî diçin semayê sêyem. Li wir jî bi daxwaza Cebraîl deriyê 'esmanî tê vekirin. Ferîşteyên wî semayî pêxember pêşwazî dikin û selama didin wî. Ferîşteyên li wir, li mu'minên şeva Leyletul Qedrê ihya dikin re silava dişînin û wan li deftera zakiran dinivîsin. Paşê hinek kal û ciwanan dibînin. Ew kesên kal Dawût û Silêman pêxember bûn. Ciwanê rû bedew û rû xweşik jî Yûsif pêxember bû. Pêxember bi wan re dipeyive. Yûsif pêxember qisseya xwe ji Hz. Muhemmed re dibêje. Bi hev re nimêjê dikin, pêxember ji wan re îmamiyê dike. Vegotina vê beşê jî wekî yên din bi du'ayê diqede.[12]

Dema pêxember ji semayê sêyem bilind dibe hinek ferîşte ah û fîxanan dikin. Ew ferîşte ji bo dîtina pêxember wiha dikirin û ji wî dixwestin ku pêxember ji bona wan ji Xwedê hêviyê bike. Paşê pêxember diçe 'esmanê çaran. Dema derî tê vekirin gelek ferîşte bi selam û selatan pêxemberî pêşwazî dikin. Pêxember li wir merivekî dilbikul dibîne. Cebraîl dibê ku ev kes Idrîs pêxember e. Resûlê Xwedê bi Idrîs pêxember re jî dipeyive. Paşê 'Ezraîl dibîne, 'Ezraîl wezîfeya xwe ji pêxember re kûr û dûr behs dike. Pêxember li wir jî îmamiyê dike û bi hev re nimêjê dikin. Bi du'ayê vegotina vê beşê xelas dibe.[13]

Cebraîl û pêxember bi hev re bal bi semayê pêncem ve bilind dibin. Dîsa bi gazîkirina Cebraîl dergevan tê deriyî vedike. Ferîşteyên wî 'esmanî, selam û selata didin pêxemberî. Pêxember li wir jî ferişteyekî pir biheybet dibîne.[14]

Di qalkirina bûyerên vî 'esmanî de Mela Muhemmed Nûrî navberê dide mijara xwe û beşekî du'ayê vedike.[15] Paşê dîsa berdewam dike mijara xwe.

Pêxember li 'esmanê pêncemîn de ferîşteyekî biheybet dibîne. Ev melek berpirsê dojehê ferîşteyê bi navê Malik bû. Ev melek deriyê cehnema bi navê Cehîm vedike û wan deran nîşanî pêxemberî dide. Pêxember li wê dojehê (cehnem) gelek 'ezabên cûr bi cûr dibîne. Pêxemberî li 'esmanê pêncem, ji hemû qatên 'esmanên din gelektir tiştên sosret dîtine. Paşê Cebraîl melaîketan hemûyan de'wet dike û li dû

[11] b.n. malik:340-531,r. 60-69.
[12] b.n. malik: 532-684, r.70-77.
[13] b.n. malik: 685-960, r. 78-90.
[14] b.n. malik: 961-1031, r. 91-94.
[15] b.n. malik:1032-1082, r. 95-97.

pêxember du rek‘et nimêjê dikin. Ev beş jî bi malika du‘ayê xelas dibe.[16]

Pêxember û Cebraîl diçin ‘esmanê şeşemîn. Deriyê ‘esman tê vekirin û ferîşte sef bi sef tên selam û selata didin pêxemberî. Pêxember li wir ferîşteyekê dibîne ku li ser kursiyekî ji nûrê rûniştiye. Ji Cebraîl dizane ku ew melek du‘ayan dikin ku qelb û dilê mu’minan bi ta‘et û îbadetî re qayîm be. Ferîşteyên li heft asîmanan jî bi hev re “amîn” dibêjin. Pêxember silav dike wê ferişteyê. Paşê kalekî rûyê wî binûr, cubbeyek li xwe kirî û di destê wî de asayek heyî dibîne. Cebraîl dibê ku ev kesê hanê Musa pêxember e û Xwedê Tewrat daye wî. Musa bi Fir‘ewn û alîgirên wî re gelek têkoşîn kiriye. Paşê Cebraîl qisseya Musa ji serî hetanî binî ji pêxember re dibêje. Pêxember diçe selamê dide Musa û ew jî radibe ser piya û bi edeb selama pêxemberi werdigire û bi hev re dipeyivin. Muellif piştî van behsan medha pêxemberî tîne ziman. Melaîket bi pêxemberî re xeber didin û vegotina beşê bi du‘ayê diqede.[17]

Hz. Muhemmed ji wir diçe ‘esmanê heftemîn. Melaîke hemû tên silavê didin pêxemberî. Pêxember li wir beşekî ferîşteyan dibîne ku ji wan re “Rûhaniyyûn” tê gotin. Pêxember li wir pergî Adem pêxember tê. Adem pêxember pişta xwe daye Beyt-i Me‘mûrê. Pêxember selamê dide wî. Wê demê melek hemû tewafa Beyt-i Me‘mûrê dikin. Paşê pêxember li Refref siwar dibe û diçe digihe behrekê. Li wir ditirse, wê demê melekê bi navê Mikaîl tê û dilê wî rehet dike. Melekê Mikaîl behsa Cebraîl, ‘Ezraîl û Îsrafîl dike. Mikaîl wezifeya wan melekan ji pêxember re dibêje. Paşê ferîşteyên ku jê re Kerrûbiyyûn û Ruhaniyyûn tê gotin li wir dibîne. Paşê bi hev re bilind dibin û ji heftê hezar perdeyan derbas dibin. Piştî Xweda gazî dike pêxemberî ew bi Refrefî baş nêz dibe. Xwedê bi dengê Ebubekrê Siddîq bangî pêxember dike. Çimkî pêxember ji Ebubekrî pir heskiriye. Êdî di navbera Xwedê û pêxemberê wî de çi tercuman tune ne. Xwedê dibê solên xe derîne û baş nêzî min be. Lêbelê pêxember Xwedê nabîne. Xwedê sifetên xwe ji pêxember re dibêje. Dibê ku çi daxwazên pêxemberî hebin ew dikare bibêje Xwedê. Çimkî Xwedê Qur’ana pîroz daye wî û qedrê wî bilind kiriye. Heqê şefa‘etê daye wî û Kewser jî kiriye nesîbê wî. Pêxember ‘efûkirina ummeta xwe ji Xwedê dixwaze û gelek mizgîniyan ji Xwedê

[16] b.n. malik: 1083-1254, r. 98-105.
[17] b.n. malik: 1255-1489, r. 106-116.

werdigire. Mela vê beşê jî bi du‘ayê diqedîne[18]

Piştî vê beşê Mela Muhemmed Nûrî dîsa dest bi beşekî din dike û li vê beşê hêvî û du‘ayan ji Xwedê dixwaze.[19]

Dawîyê pêxember ji ‘esmanan nazil dibe. Dema vedigere Xwedê pêncî rek‘et nimêjan wek diyarî dide ummeta wî. Di rê de rastî Musa pêxember tê. Tiştên dîtî û bihîstî ji wî re dibêje. Musa dibê ku ummeta te ze‘îf û neçar in. Nikarin pêncî rek‘et nimêjan bikin. Hêviyê ji Xwedê bike ku hejmara wan ji ummeta te re daxîne. Bi vî awayî pêxember tê û diçe hizûra Xwedê, hetanî hejmara nimêjan dibe pênc wextên nimêjan. Lê wek diyarî wê xêra wan qasî pêncî nimêjan be. Pêxember ji wir tê û bi Cebraîl re li heşt cennetan digere. Nî‘metên cennetan tev dibîne. Dawiyê bi Refref tê ‘erdî. Li wir jî dîsa li Buraqî siwar dibe û tê Mekkehê. Xatira xwe ji Cebraîl dixwaze û tê mala xwe. Hê jî şeve û nebûye sibeh. Pêxember hemû serboriyên xwe dibêje Ummi Haniya jina xwe. Ew dibê ku ehlê Mekkehê ji van gotinên te bawer nakin, lê tu dîsa jî xemgîn nebe. Roja din sibehê pêxember diçe Ke‘beyê. Ebu Cehil û gelek kes jî tên wê derê. Pêxemberî tiştên bi şev dîtinî hemû bi wan re parvekir. Wan jî henekên xwe bi pêxember re kirin û înkara wî û gotinên wî kirin. Xwedê Cebraîlî dişîne ku pêxember bersiva pirsên muşrika bikare bide. Bersivên wî yên di derbarê Mescîd-i ‘Eqsayê de tev rast û durist bûn. Lê wan dîsa jî bawerî bi wî neanîn. Paşê Ebubekir wî û gotinên wî tesdîq dike. Dawiyê pêxember qala qefîleyek Mekkehê dike û di derbarê wan de hinek agahiyan dide. Çimkî di dema vê meşê de pêxember di rêyê de pergî wî karwanê Mekkehê hatibû. Li gor wê dîtinê pêxemberî texmîn kiriye ku wê ew karwan kengî bigihin Mekkehê û ev agahî jî tev rast derdikevin. Muşrik hemû jî matmayî dimînin, lê dîsa jî bawerî bi wî neanîne. Pêxember van serboriyên xwe hemûyan dibêje sehabiyên xwe jî.

Mela Muhemmed Nûrî di dawiya Mi‘raciyeya xwe de dîroka qedandina vê berhemê jî tîne ziman. Wî ev behrem, li gor salnameya hicrî di sala 1389an de xelas kiriye. Di meha muherremê de, di şeva pêncan û saet heftan de ev mesnewî qediyaye.[20]

[18] b.n. malik: 1490-2013, r. 117-138.
[19] b.n. malik: 2014-2088, r. 139-142.
[20] b.n. malik: 2089-2439, r. 143-157.

### 1.2.2. Kitabu Nuzhetun-Nufûs[21] (Mesnewiya Hesen Cewherî)

Ev berhema Mela Muhemmed Nûrî ji **838 malik**an pêkhatiye. Mela Muhemmed Nûrî bi wesîleya çîroka Hesen Cewherî û kurê wî ‘Elî pend û şîretan li xwîneran dike. Berhem wek mesnewî û wek nesîhetname hatiye nivîsandin. Çimkî helbestvan bi wesîleya çîroka vê mesnewiyê xwîneran şîret dike û dibêje ku pêwist e merivê qenc şîret û wesiyetên qenc ên bavê xwe bigire û malê helal û rêya qenc bernede.

**“Behra muteqarib”** û qalibê **“Feûlun/Feûlun/Feûlun/Feûl”** di vê mesnewiyê de jî hatiye bikaranîn. Em ji vê berhemê jî du mînakên bikaranîna vî qalibî nîşanî bidin**:**

Bi zat û /sifati /Xudayî/ ‘ezîm
Me pî ib/tida kir /bi qelbi/selîm

Çi hemdi /ku bîtin/ ji her ha/mida
Muheqqeq /hemî ha/sil in bû/Xuda KNN:1,2/158)
. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _
Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl

#### 1.2.2.1. Naveroka Berhemê

Mela Muhemmed Nûrî di mesnewiya xwe ya bi navê Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî) de mijara xwe bi helbestkî aniye ziman. Me jî li jêrî mijara vê mesnewiyê bi kurtasî û bi terzekî pexşanî wiha vegotiye**:**

Berhem bi hemd û senayan û bi selat û selaman destpê dike. Mela Muhemmed Nûrî paşê gotinê tîne ser mijara mesnewiyê. Çaxên berê li welatê Misrê tacirekî xwedî ‘ilm û feraset û edeb hebû. Navê wî bazirganî Hesen Cewherî bû. Xwedê kurekê dide wî û navê kurê xwe ‘Elî didane. Demek tê ku Hesen Cewherî nexweş dikeve. Hîs dike ku wê bimire. Dibêje kesên li derûdora xwe ku kurê wî ‘Eli de‘wet bikin cem wî. Dema ‘Elî hat cem bavê xwe, Hesen Cewherî ji wî re qala fanîtiya dinyayê û mezinahiya Xwedê dike. Dibêje ku wî gelek serwetekî mezin ji

[21] “Kitaba Geryana Nefsan”

kurê xwe re hiştiye. Lêbelê dibêje ku bi malê dinyayê pêbawer nebe, ji rêya helal û qenc dernekeve û nekeve xefletê. Her wisa malê xwe di rêya qenciyê de xerc bike û ji kesên nebaş re hevaltiyê neke. Hesen Cewherî wesiyet dike kurê xwe ‘Elî ku li ehlê mala xwe û malê xwe xwedî derbikeve. Ji bona muemeleyekî baş şîretan li ‘Elî dike ku buka wî jineke ‘eslî û bi namûs e û divê ‘Elî her tim li wê jina xwe jî xwedî derbikeve. Rojek tê Hesen Cewherî wefat dike. ‘Elî demekî dirêj li gor şîretên bavê xwe jiyana xwe didomîne, her tim diçe ziyareta gora bavê xwe. Bi vî awayî xema wan bi mehan dom dike. [22]Werhasil piştî çend mehan hinek kes tên cem ‘Elî û dibên hewceye ew êdî dest ji vê me’temê berde û vegere jiyaneke asayî. Axir bi gelek gotin û hewlan, dawiyê ‘Elî dixapînin.’Eli didin ligel xwe û diçin bax û bexçeyan, dikevin nava kêf û lezetan. Dawiyê ‘Elî di‘elimînin şerabê jî. Jina ‘Elî bi vê rewşa mêrê xwe gelek xemgîn dibe û her car wesiyeta bavê wî tîne bîrê. Lê êdî feyde nake, ‘Elî xwe berze kiriye û dîsa diçe cem hevalên xwe yên nebaş. Sê salan ev rewş dewam dike û hevalên ‘Elî, wî bi temamî ji rê derdixînin heta ku ‘Elî malê xwe hemûyê di rêya neqenciyê de xelas dike. Heta ‘Elî avahiyê ku tê de rudinin jî difiroşe. Piştî van tiştên bi serî hatî poşman dibe. Lê êdî girî û gazindên wî feyde nake. Jina wî jî li hemberî vê rewşa ‘Elî nerazîbûna xwe nîşanî wî dide. Ji wî dixwaze ku tobe bike û dîsa xwe bispêre Xwedê. Dibe ku Xwedê li wan bê rehmê û deriyekê li wan veke. Jina ‘Elî rojekî diçe mala jineke dewlemend. Neçarî û feqiriya xwe ji wê re dibêje û çîroka xwe bi wê re parve dike. Ew jinik hinek mal û pereyî dide jina ‘Elî û dibê ku kengî mihtac bibin bila were nik wê. Jina ‘Elî bi van mal û pereyan vedigere mala xwe. ‘Elî bi vî halî gelek xemdar dibe û ji bo çareseriya vê rewşa xirab ji mala xwe diçe û welatê Misrê jî terk dike.[23]‘Elî ji wirjî diçe Dimyatê. Li wir dibe mêvanê dostekî bavê xwe. Demekê li wir bi mêvanî dimîne. Dostê bavê wî hinek pere, zêr û tiştan dide ‘Elî.  Demekî dirêj ‘Elî li wir dimîne û paşê jî biryar dide ku ji Dimyatê here. Sibehê xwe amade dike ku here Şamê. Dostê bavê wî heqê rêya wî dide ‘Elî û bi wî re heta peravê diçe. Di derheqê ‘Elî de kaptanê keştiyê hişyar dike. Dema ‘Elî digihe Şamê, diçe cem nasekî xwe. Heftiyekî dibe mêvanê wî. Rojekê li wir pergî qefîleyekê tê. Ji wan pirs dike ku wê herin ku derê. Ji wan dizane ku ew wê herin Bexdayê. ‘Elî xatira xwe ji dostê xwe yê ticar dixwaze û digihe qefîleyê. Piştî çûneke

[22] Kitabu Nuzhetu’n- Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî), malik: 1-93, r. 158-161.
[23] b.n. malik: 94-224,  r. 161-167.

domdirêj digihin nêzî Bexdayê. Li ser rêyê hinek rêbir wan dorpêç dikin û gelek ji wan dikujin, malê wan talan dikin. Hinek kesên di qefileyê de ber bi Bexdayê ve direvin û xwe ji destê rêbiran xelas dikin. ‘Elî jî direve û digihe dergehê bajêrî. Ji mihafizên bajêrî rica dike ku wî wergirin bajêrî. Mihafiz pirsê ji wî dike ka gelo ew kî ye û meqseda hatina wî ya Bexdayê çi ye. Wê demê ‘Elî dibêje mihafizan ku ew xelkê Misrê ye, bazirganekî mezin e, karwanê wî ji hêla rêbiran ve hatiye talankirin û xizmetkarên wî hemû hatine kuştin. Ew bi xwe reviyaye û xwe ji destê rêbiran xelas kiriye, ta ku gihiştiye Bexdayê.  Piştî van bersivan mihafiz dibêjin ‘Elî hetanî sibehê li vira be, emê ji te re çareseriyekê bibînin. Paşê ‘Elî zêrekê dide dergevanî da ku ji wî re hinek tiştên xwarinê bistîne. Wê şevê li wir dimîne, di xwe û vedixwe, li wir radizê. Sibehê mihafiz behsa ‘Elî ji bazirganên mezin ên bajêr re dikin. Bazirganekî dewlemend ‘Elî dibe hemamê. ‘Elî li wir serê xwe dişû, xwe paqij dike û ligel bazirganî diçin mala wî. Bazirgan gelek xatira ‘Elî digire û bi mêvandariyeke baş wî mêvan dike, xizmetkarên xwe dixe xizmeta wî û dixe bin emrê wî. Dibêje xizmetkarên xwe ku mêvanê wî merivekî hêja ye û ew çi hesbike, pêwist e xizmetkar bi wî bikin. Xizmetkarên bazirganî ‘Elî dibin serayê bi cî dikin. Wê demê ‘Elî dibîne ku serayeke xweşiktirîn li hemberî wê serayê ye. Pirsê ji xizmetkaran dike ku ev seraya xweşik ya kê ye. Xizmetkar dibên ku ev seray a efrîtekê ye û çi kesê bikeve hundirê serayê mirî derdikeve.[24] Ji ber vê yekê bazirganê xwediyê wan ev seraya hanê kilîd kiriye. Lêbelê ‘Eli dîsa jî kilîdê serayê ji wan dixwaze. Wê demê xizmetkar diçin bal bazirganî û xwesteka mevanê wî Êlî jê re dibêjin. Bazirgan tê bal ‘Elî û dibêje wî ku ew mêvanekî ‘eziz e, kilîdê serayê bila nexwaze, çimkî mumkin e ku zererek bête serê wî. Encax ‘Elî israr dike. Wê demê bazirgan dibê ku pêwist e ku ‘Elî senedekî nivîskî bide wî ku eger zererek bête serê wî, bazirganê xwediyê serayê perpirs neyê girtin. ‘Elî kaxezekê dinivîse, imze dike û dide wî. Paşê kilîdê serayê werdigire û dikeve hundirê wê seraya razdar. Li hundir destnimêja xwe digire, nimêj dike û diçe qata jorî. Li wir dengek tê guhê ‘Elî. Xwedanê dengî dibêje wî “ Ey ‘Eliyê kurê Hesen, tu hesdikî ez gelek zêr û zîv û zînetan bidim te?” ‘Elî şaş dimîne û dibêje “Wê ev yek çawa çêbibe?” Paşê dibîne ku ode tev bi zêr û zînetan re tijî dibe. ‘Elî ji xwedanê dengî dipirse ku evya çawa û çima çêdibe. Efritî gotiye wî ku yên beriya wî keftine hundirê serayê tev tirsiyabûn, wî jî ew kuştibûn. Lê ‘Elî ne tirsiyaye

[24] b.n. malik: 225-314, r. 167-171.

û xwestekên xwe bi wêrekî gotine wî, ji ber vê yekê jî efrîtî ev serwet daye wî. Efrît dibêje ‘Elî ku biçe Yemenê û wê li wir jî bigihe sermiyanekî mezintirîn. Lê beriya hingê ji ‘Elî dixwaze ku wî (efrîtî) azad bike.

Elî jî dibêje wî tu here Yemenê û ji min re wî sermiyanî bîne, paşê ezê te bi xelasî azad bikim. Efrît sozeke bi essehî ji ‘Elî dixwaze. ‘Elî temînatê dide efrîtî û ji efrîtî dixwaze ku jina wî û kurê wî jî ji Misrê bîne Bexdayê. Efrît dibêje ku wê di nava sê rojan de vegere ve serayê.[25] Piştî ku efrît diçe, ‘Elî nava serayê kontrol dike. Dema destê xwe dide deriyekî, derî vedibe û ‘Elî dikeve hundirê odeyekî tijî kîsik tê de. ‘Elî wan kîsan tijî zêr û zînet dike. Paşê merivekî abid li deriyê serayê dide. Dema ku ew meriv ‘Eli di nav wan zêr û zînetan de dibîne, paşve vedigere û diçe xeberî dide bazirganê xwediyê serayê. Bazirgan tê slav dide ‘Elî û pirsa vê rewşê jêdike. ‘Elî dibê ku wî destnimêj girtiye û nimêj kiriye, raketiye û qet ji xwe re tirs çênekiriye. Ew pêbawer e ku Xwedê çi hesbike wê bê cî. Piştî van gotinan bazirgan bêtir rêza ‘Elî digire. Hemû suxrevanên xwe dixe xizmeta ‘Elî. Bazirganên bajêr jî van bûyeran dibihîsin û ji ‘Elî re diyariya tînin. Piştî sê rojan efrît jina ‘Elî û zarên wî tîne serayê. ‘Elî bazirganên bajêr hemûyan de’wet dike. Ew hemû dibin şahidên van sosretiyan û bi mêvandariyeke baş tên mêvankirin. Paşê destûrê ji ‘Elî dixwazin û diçin. ‘Elî rêz û minetdariyeke zêde nîşanî bazirganê xwediyê serayê dide. ‘Elî dû re diçe bal jina xwe û rewşa wan a piştî wî ji wê dipirse. Ew jî rewşa xwe ya piştî wî û hatina wan a Bexdayê ji ‘Elî re dibêje. Jina wî dibê ku ew kesê ew anîne kilîdek daye wan û qala sindoqekê kiriye. ‘Elî û jina wî diçin sindoqa efrîtî pênasekirî ji nav gelek sindoqan peyda dikin û deriyê wê vedikin. Dibînin ku kilîdên hemû sindoqan di wê de ye. Bi vî awayî sindoqan hemûyan vedikin. Dibin xwediyê gelektirîn zêr û elmas û libasan. ‘Elî bi jina xwe re diçin odeya qata jorî û micewherên li wir nîşanî jina xwe dide. Jina wî heyirî maye û pirsê jê dike ku evya çawa çêbûye. ‘Elî dibê ku evya ji qencî û alîkariya Xwedê çêbûye. Jina wî dibêje ‘Elî ku pêwist e ew şukirdar be û wesiyeta bavê xwe ji bîr neke. ‘Elî şukirdariya xwe ji Xwedê re tîne ziman û dibê ku ew tu car din xeletiyên berê nake û hevaltiya nebaşan nake. Dawiyê ‘Elî dibe xwediye gelek dikan û serwetan. Li Bexdayê bi nav û deng dibe. Gelek xizmetkar û suxrevanan ji xwe re digire û dibe serekê bazirganan.[26] Melîkê Bexdayê van tiştan

[25] b.n. malik: 315- 392, r. 171-174.
[26] b.n. malik: 393-573, r. 174- 181.

dibihîse û ‘Elî de‘wet dike meqamê xwe. ‘Elî bi gelek diyariyên seyr û giranbiha ve û bi rêz û edeb diçe meqamê melîkî. Melîk kesên di maiyeta xwe de gazî dike û van diyariyên bêhempa nîşanî wan jî dide. Melîk biryar dide ku qîza xwe ya bedew bi ‘Elî re zewicîne. Wezîrên wî vê biryara melîkî tesdîq dikin. Melîk van diyariyan nişanî jina xwe jî dide û behsa tekûziya ‘Elî dike û biryara xwe ji wê re jî dibêje. Ew jî tesdîq dike. Melîk qaziyê bajêr û ‘Elî de‘wet dike hizûra xwe. Xwesteka xwe dibêje ‘Elî. Lêbelê ‘Elî dibê ku jina wî û kurekî wî yê ciwan bi navê Hesen heye. Melîk difikire ku kurê vî merivê berketî jî niha wekî bavê xwe berketî û hêja ye. Melîk emir dike xizmetkarên xwe, da ku Hesenê kurê ‘Elî bînin hizûra wî. Dema Hesen tê hizûra melîkî, bi tevahî li me‘rîfet û zanebûna wî û li bedewiya wî heyran dimînin. Melîk qiza xwe li vî ciwanî mehr dike. Jina ‘Elî bi van tiştan heyirî dimîne, ‘Elî jê re dibê ku ev hemû jî litf û ikrama Xwedê ne. Melîk dîlaneke bêhempa ji qîza xwe û zavê xwe re dike û qesrekê ji wan re çêdike. Çend sal bi vî awayî şad û bextewar diborin. Rojek tê Melîk nexweş dikeve. Dema hîs dike ku wê bimire, wezîr û mişawirên xwe daxwaz dike cem xwe û ji bo melîkiya bajêr zavê xwe Hesen pêşniyaz dike. Hemû bi hev re Hesenî wek melîk qebûl dikin.  Roja din vê biryara xwe bi qaziyan û xelkê re jî parve dike. Hemû jî biryara melîkî di cî de dibînin. Ji xwe ‘Eliyê bavê Hesen jî bûbû wezîrê melîkî. Hesen bi lez û edeb tê hizûra xezûrê xwe. Melîk rewşa tenduristiya xwe ji Hesen re dibêje û dibê ku piştî wî melîkê Bexdayê wê ew be. Ew jî bi terzekî edeb radibe ser piyan û dibê ku gelek kesên ji wî layiqtir di vê meclisê de hene ku meliktiyê bikin. Feqet wezîr û meclisa hazir tev dibên ku wan Hesen ji bona melîkiya bajêr guncan dîtine. Hesen şerm dike û serê xwe diçemîne. Melîk ji herkesî dixwaze ku fatîheyê bixwînin û Hesen wek melîk îlan dike. Dibêje qaziyê bajêr jî vê biryara me binivîse û qeyd bike. Dawiya dawî Hesen rûdine li ser textê melikiyê. Êvarê diçe mala xezûrê xwe, rêz û spasiya xwe li wir jî ‘erz dike wî. Hesen bi qencî û ‘edalet welatî birêve dibe. Caran jî diçe serdana xezûrê xwe. Xezûrê Hesen her tim şîretan li wî dike, tecrûbeyên xwe bi wî re parve dike. Jina Hesen û xesûya wî,  diya wî û bavê wî û her wisa hemwelatî tev de rêza Hesen digirin. Rojekê rewşa tenduristiya xezûrê wî xerab dibe. Hesen bilez diçe serdana wî. Xezûrê wî şîretên dawiyê lê dike û diçe ber rehma Xwedê. Taziye mehekê dewam dike. Gelek xêr û dua jê re tên kirin. Werhasil taziye xelas dibe. Hesen bi ‘edalet

demekî dirêj welatî birêve dibe. Piştî mirina wî kurên wî dibin melîkên Bexdayê.[27]

### 1.2.3.Me'temname (Mersiyename)

Ev berhem ji **679malik**an pêk tê. Di derbarê karesata Hz. Huseyn de hatiye nivîsandin. Ev bobelata xemgîn di dîroka misilmanan de gelekî muhîm e û di derbarê wê de di nav gelên misilman de gelek berhemên pexşanî û helbestkî hatine nivîsandin. Di nav Kurdan de jî ev berhema Seydayî bi vî awayî û bi vê babeta xwe şayanî xwendinê û lêkolînê ye. Ev berhem bi şêwaza xwe ne qesîde ye, bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Ev mesnewî jî bi **"behra muteqarib"** û bi qalibê **"Feûlun/Feûlun/Feûlun/Feûl"** hatiye nivîsandin. Ji vê berhemê du mînakên bikaranîna vî qalibî wiha ne**:**

Werin hey/ werin hey/ werin guh/bidin
Ku bîjim/ ji bû we/ çi derdek /mezin

Çi hate /serî eh/li beyta/ nebî
Ji bû wan /fida bin /ummî we/ ebî (MR:1,2/193)

. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _
Feûlun/Feûlun/Feûlun /Feûl

#### 1.2.3.1. Naveroka Berhemê

Mela Muhemmed Nûrî di vê mesnewiya xwe de qala bobelata Kerbelayê û şehîdkirina neviyê pêxember Hz. Huseyn û ehli beyta wî û dostên wî dike. Di vê berhemê de vegotina bûyerê wiha ye**:**

Neviyê pexember Hz. Huseyn ê ku pexemberî jê re "roniya çavê min" gotiye, amadehiyê dike ku biçe Kufeyê. Çikû ehlê bajarê Kûfeyê gelek name ji Îmam Huseyn re şandine da ku bê wê derê û serweriya wan bike, wan ji zilma Yezîd û merivên wî xelas bike. Hz. Huseyn ehli beyta xwe yanê bira û xwuşkên xwe, keç û kurên xwe û kurapên xwe dide ligel xwe û bi dost û alîgirên xwe ve dest bi meşekî zor û zehmet dikin da ku bigihin Kûfeyê. Meşa wan, di roja heştan a meha zilhicceyê

[27] b.n. malik: 574-838, r. 181-192.

û roja sêşemê destpê dike. Li gorî salnameya hicrî sala şêstan bû. Piştî amade dibin ji Mekkehê derdikevin û ber bi ‘Iraqê ve diçin. Wê demê helbestvanê ehli beyta resûlê Xwedê yê navdar Firizdeq rastî wan tê. Ew hê jî ‘Iraqê vegeriyabû. Îmam Huseyn pirsa wan deran ji wî dike. Ew jî dibêje Hz. Huseyn “Ya Îmam, ji vê meşê vegere û neçe ‘Iraqê. Çikû dilê ehlê Kûfeyê ligel te ye, lê sefên wan ligel Yezîdî ye.” Piştî vî xeberî jî Îmam Huseyn ji biryara xwe venagere û meşa xwe dewam dike.[28]

Piştî demekê Hz. Huseyn û ehlibeyta wî û hevalbendên wî digihin çemê Hicazê û li wir rastî ‘Ebdullah b. Muti‘ tên. Meqseda çûna xwe ji wî re jî dibêje. Ebdullah dibê ku “ehlê Kûfeyê xelkekî bêwefa ne û kesek ji wan bi te re nabin, hê zû ji vê rêyê vegere.” Lêbelê Hz. Huseyn dîsa ji biryara xwe venagere û meşa wan berdewam dike. Di rê de rastî qefîleyekê jî tên. Kesên di wê qefîleyê de behs û xeberên baş di derheqê Kûfeyê de nadin Hz. Huseyn. Li gor gotina wan, bi fermana ‘Ubeydullah b. Ziyad bi awayekî hovane serê Muslim b. Akîl hatiye jêkirin û hatiye qetilkirin. Piştî bihîstina vî xeberê reştarî, kurên Akîl anku birayên Muslim biryarekî teqez didin ku venegerin Mekkehê ta ku heyfa biraye xwe hildin. Hz. Huseyn beriya hingê kurapê xwe Muslim şandibû Kûfeyê, da ku behs û xeberan ji wir bigihîne wî û her wisa di navbera Hz. Huseyn û ehlê Kûfeyê de jî qasidiyê bike. Hê jî xeberên nebaş tên guhê Hz. Huseyn. Bi gotinan biraşîrê Hz. Huseyn ê bi navê ‘Ebdullah b. Buktur jî wekî Muslim bi terzekî hovane hatiye qetilkirin. Hz. Huseyn ew ji bona alîkariya Muslim dû re şandibû Kûfeyê. Hz. Huseyn piştî bihîstina van xeberan teklîf dike kesên ligel xwe ku yên hesbikin dikarin vegerin Mekkehê, yên hesbikin jî bila ligel wî dewam bikin çûna bi bal Kûfeyê ve. Piştî vê bangewaziya Hz. Huseyn, piraniya kesên di qefîleya wî de vedigerin Mekkehê. Kêm kes dimînin ligel wî û bi Îmam re meşa xwe didomînin. [29]

Wexta ku meşa wan dewam dike di rê de rastî kesekî din jî tên. Ew kes jî dibêje Îmamî ji vê rêyê vegerin paşve. Lê Îmam Huseyn bi wî jî nake û dîsa meşa xwe ya ber bi Kûfeyê ve didomîne. Qefîleya Hz. Huseyn digihe devereke ‘Iraqê û li wir bi hezar leşkeran ve artêşa Hurr b. Yezîd tê bal wan. Hurr b. Yezîd ji Huseyn dixwaze ku meşa xwe biqedînin û li wir bisekinin. Her çi qas Hurr b. Yezîd ji bona ragirtina Hz. Huseyn hatibe jî bi Îmam re xeber didin û paşî destûrê dide wan ku di

[28] Mersiyename (Me’temnâme), malik: 1-36, r. 193-194.
[29] b.n. malik:37-106, r. 194- 197.

bin çavnêriya artêşa wî de bimeşin. Meşa wan bi vî awayî heta Kerbelayê dewam dike. Li wir Hurr b. Yezîd ferman dide ku li wir rawestin. Îmam li wir dikeve fikaran û hîs dike ku wê li wir bê şehîdkirin. Hz Huseyn hinek şertên lihevhatinê ji Hurr b. Yezîd re dibêje. Ew jî van şertan dişîne bal ‘Ubeydullah b. Zîyad. Encax ew van şertan teqez qebûl nake û artêşekê di bin fermandariya ‘Umer b. Sad de dişîne ser qefîleya Hz. Huseyn. Artêşa ‘Umer digihe Kerbelayê û li wir dikeve di navbera çemê Firatê û qefîleya Hz. Huseyn de. Hz. Huseyn û qefîleya wî ji tîbûnê neçar dibin. Kesekî bi navê Yezîd b. Huseyn di qefîleya Îmamî de bû. Ew kes destûrê ji Hz. Huseyn dixwaze ku ger qebûl bike ewê here bal ‘Umer b. Sad û izna vexwarina ava Firatê ji wî bixwaze. Îmam destûrê dide wî û ew diçe bal ‘Umer b. Sad. Lê belê ‘Umerê zalim vê daxwaza wî qebûl nake. Heta dû re emir dide leşkerên xwe û êriş dikin ser qefîleya Hz. Huseynî. Bi vê êrişa ji nişkê ve pêncî hevalbendên Hz. Huseyn tên şehîdkirin. Wexta ku şer dewam dike wijdana Hurr b. Yezîd vê zilmê qebûl nake û tevlî qefîleya Hz. Huseyn dibe û dibe hevalbendê wan. Hurr b. Yezîd bi mêrxasî li hemberî artêşa ‘Umer b. Sad şer dike û bi derbeyên wan şehîd dibe. Dawîyê hevalbendên Hz. Huseyn hemû jî tên şehîdkirin. Dawiya dawî jî bi fermandana Şimr b. Zilcewşen, leşkerên ‘Umer êriş dikin Hz Huseyn û ji ser hespê wî têxin erdî, bi dehan derbeyan Hz. Huseyn tê qetilkirin. Paşê Sinan b. Enes jî tê serê Îmam Huseyn jêdike.[30]

Piştî vê behsa dilşewat û şehîdkirina Hz. Huseyn, berhema Mela Muhemmed Nûrî bi beşa “Mel‘ene” dewam dike û di wê beşê de le‘netan li ‘Ubeydullah b. Ziyad û Şimr b. Zilcewşen dike û nefreta xwe ji wan zaliman re tîne zimên. Mela dibê ku di destê me de tu delîlên tawanbarkirina Yezîdî tune ne û ji ber vê yekê jî le‘netan li wî nake, bi tenê ji bo wî ‘ezabeke mezin ji Xwedê dixwaze. Ji ber ku serê Hz. Huseyn jêkiriye gelek le‘netan li Sinan b. Enes jî dike. Sinan b. Enes serê Hz. Huseyn tîne bal ‘Ubeydullah b. Ziyad. Wî jî çovê di destê xwe daniye ser diranên Hz Huseyn. Wê gavê ji sehabiyên pêxemberî Zeyd b. Erkam li wir bû. ‘Ubeydullah îqaz dike ku van bêxatiriyan neke û heddê xwe bizane. Zeyd dibê ku min bi çavê serê xwe dîtibû ku pêxemberî ew dev û diran maç kirine. Dû re heqaretan li ‘Ubeydullahê zalim dike û ehlê Kûfeyê yên li wir hemûyan hişyar dike ku xetereyeke mezin li pêşiya wan e. Paşê jî Zeyd ji wî mekanî derdikeve. Zalimên bêedeb wan kêsên ji ehli beyta

[30] b.n. malik: 107-282, r. 197- 204.

Huseyn hatine dîlkirin tevan û serê Hz. Huseyn bi xwe re dibin Şamê. Ibni Qays qasidê ‘Ubeydullah b. Zîyad bû. Wî ehli beyta Huseyn bi Yezîdî re daye nasîn û paşê jî serê Îmam Huseyn daniye pêşiya Yezîdê xebîs. Mela Muhemmed Nûrî di malikên dû re dibêje ku Yezîd bi ditîna vê rewşa Huseyn û ehli beyta wî xemgîn bûye û giriye. Li gor malikên di rêzê de Yezîd gotiye ku eger ew pêhesiyaba nedihişt ev kiryarên hanê bi serê Huseyn û ehli beyta wî hatibana. Yezîd dû re hêrs dibe û Ibni Qeys ji hizûra xwe derkiriye. Lê belê dema Ibni Qeys çûye seraya Yezîdî li hêviyê bû ku Yezîd wî xelat bike. Dîsa li gor malikên di rêzê de Yezîd çoganê di destê xwe de daniye ser diranên Huseyn û bi vî awayî ew piçukxistiye. Wê demê sehabiyê pêxember Ebu Burdeti Eslemî dibe şahidê van bêrêziyên Yezîdî û wî hişyar dike û dibêje ku pêxemberî ji Hz. Huseyn re “efendiyê heşt cennetan” gotiye. [31] Pişti van malikan Mela Muhemmed Nûrî beşekî bi navê “beşa hêvî û gaziyan” vedike. [32]

Piştî vê beşê muellif beşeke din a bi navê “sewqi pîşî” vedike. Di vê beşê de vegotina bûyerê berdewam dike. Dema Ibni Qeys serê Huseyn daniye ber Yezîdê zalim wê demê ehli beyt hêj dizanin ku serê Huseyn hatiye jêkirin. Keçên Hz. Huseyn Sekîne û Fatima girîn û fîxanên bêhempa dikin. Kurê Îmam Huseyn ê navdar ‘Elî Zeynelabidîn jî berteka xwe nîşanî Yezîd dide û zilma wan dide rûyê wan. Yezîd dibêje wan ku haya wî ji vî şerî û ji van kuştinan nebûye. Van curm û kiryaran tev dike sûçê ‘Ubeydullah b. Zîyadî. Dibê ku ger Huseyn bibûya tabi‘ê min û serî li hemberî min ranekiriba ev kuştin çênedibûn. Lê dîsa jî wî nexwestibû ku rewş wiha encam bide. Yezîd piştî van axiftinan ferman dide ku rêza kesên ehli beytê yên li wir bê girtin. Rojekê Yezîd ji ‘Umer b. Huseyn dixwaze ku bi kurê wî Xalid re pêşbirkê bikin. ‘Umer şûrekê ji Yezîd dixwaze û bi Xalid re mêrxaskî pevdiçe. Di navbera Yezîd û ‘Umer de axiftinek çêdibe.[33]

Rojekê Yezîd teklîf dike ‘Elî Zeynelabidîn b. Huseyn eger ew hesbikin dikarin herin Medîneyê, ger hesbikin jî dikarin li Şamê jî bimînin. Lê belê ‘Elî Zeynelabidîn dibê ku ew ê vegerin Medîneyê. Yezîd jî hinek mihafizan dide ligel wan û wek qefîle wan dişîne Medîneyê. Ferman dide parêzvanan ku qefîleya ehli beytê bi ewlehî bigihînin Medîneyê. Serleşkerê mihafizan di rêyê de gelek hurmeta

[31] b.n. malik: 283-406, r. 205- 210.
[32] b. n. malik: 407-442, r. 211-212.
[33] b.n. malik: 443-510, r. 213-216.

ehli beytê digire û li wan xwedî derdikeve. Dawiyê ehli beyt digihin Medîneyê û li wir keça Hz. Huseyn diyariyekê dide Dimlec û ji bona serleşkerê mihafizan bi wî re dişîne. Encax ew kes diyariyê qebûl nake û rêzdariya xwe ji ehli beytê re tîne ziman. Paşî ew fermandar û mihafizên din tev vedigerin Şamê û encama peywira xwe bi Yezîd re parvedikin. Yezîd ji ber rewşa ehli beytê xemdar dibe û xew nakeve çavê wî. Lê dîsa jî Yezîdê xayîn li hemberî resûlê Xwedê rûreş e.[34]

Mela Muhemmed Nûrî piştî van behsan beşeke dirêj vedike û berhema xwe bi du‘ayan diqedîne. Dawîyê jî hêvî û du‘ayan ji Xwedê dike ku wî, dê û bavê wî, çar birayên wî û merivên wî ‘efû bike. Bi vî awayî Mersiyenameya Mela Muhemmed Nûrî xelas dibe.[35]

### 1.2.4.Mesnewiya Şemsedînê Tacir

Ev berhema Seydayê Mela Muhemmed Nûrî, **492 malik**an dihewîne. Di destxetên her sê berhemên din ên Melayî de li serê rûpelê ewil navê berhemê hatiye nivîsîn. Lê di serê rûpela ewil a destxeta vê berhemê de wekî her sê berhemên din çi sernav nehatiye nivîsandin. Berhem wisa dixuye ku dewama vê berhemê heye. Çimkî di dawiya rûpelan de peyva serê rûpela din her tim hatiye nivîsandin. Di binê rûpelê dawiyê yê di destê me de peyva “hasil” hatiye nivîsandin. Ji vê yekê jî diyar e ku dewama mesnewiyê heye. Delîleke din a vê yekê jî ev e ku bûyer û mijar jî nîvco ye û neqediyaye. Her wisa di dawiya mesnewiyên Mela Muhemmed de her tim malikên du‘a hene, lê di rûpela dawiyê ya destxeta vê berhemê de tiştek wisa nîne. Me jî ev perçeyê berhemê yê ku bi me nîvco dixuye xist ber destê xwe û latînîze kir. Lê em nizanin gelo Mela Muhemmed Nûrî dewama wê nenivîsandiye yan dewama wê winda bûye. Ev yek ji me re raz e û me tu agahî jî destnexistine. Ev berhem jî wek her sê berhemên din bi pîvana erûzê û bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Lê behr û qaliba vê mesnewiyê, ji mesnewiyên din ên Seydayî cudatir e. Di vê mesnewiyê de **“behra hezec”** hatiye bikaranîn. Ji qalibên mesnewiyê **“Mef’ûlu/Mefailun/Feûlun”**hatiye bikaranîn. Behra hecez û qalibên wê di helbestan de gelek hatiye bikaranîn.[36]Seydayî jî di vê berhema xwe de ev qalib bi kar aniye**:**

---

[34] b.n. malik: 511-569,  r. 216-218.
[35] b.n. malik: 570-679,  r. 219-223.
[36] Haluk İpekten, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, Weş. Dergâh, Çapa Nozdehem. Stembol 2015, r. 200.

Da hemd û /senai gir/digarî
Bînin ji / xu ra çû wur/di carî

Hemdi te /bikîn ji bû /xu ‘adet
Bilcumle/bikîn ji bû /te ta‘et (MŞT:1,2/224)
_ _ . / . _ . _ / . _ _
Mef’ûlu /Mefailun /Feûlun

#### 1.2.4.1. Naveroka Berhemê

Mela Muhemmed Nûrî di malikên ewil ên di vê mesnewiya xwe de hemda Xwedê û metha Xwêdê dike, hêvî û du‘ayan ji Xwedê dike.[37] Piştî vê beşê helbestvan beşeke din vedike û selat û selaman li pêxemberî dike, dîsa hêviyan ji Xwedê dike.[38] .

Mela Muhemmed Nûrî di beşa vegotina “çîroka ‘Elauddîn ebi’ş-Şammati” de gilî û gazindên xwe tîne ziman ku di vê dema me de şayîşdariya helalî û heramiyê nemaye. Behsa bûyera di mesnewiyê de bi van gazindan destpêdike. Di malikên dû re de dibêje ku demên borî de di qada bazirganiyê de hîle û derew tune bûn. Têkiliyên kesan jî wekî birayan bûn. Ji ber vê duristiyê bazirganên wî demî hemû jî dewlemend bûn karûbarên wan bixêr û bereket bûn. Her wisa bazirganên wî demî rizq û malê xwe bi rêya helal qezenc dikirin. Di nimêjkirin û rojîgirtinê de jî domdar bûn. Va ji ber van xesasiyetan sermiyanekî baş dihat destê wan.[39] Piştî behsa van mijaran Mela Muhemmed Nûrî derbasî çîroka mesnewiyê dibe. Çaxên berê li welatê Misrê bazirganekî bi navê Şemsedîn hebû. Ev bazirgan merivekî xwedî milk û mal bû, xwedî ‘eql û feraset bû. Jina wî jî jineke nazik û ‘eslî bû. Lê belê tu zarên wan tune bûn. Temenê Şemsedîn gihîştibû çil saliyê. Dema hevalên wî yên bazirgan diçûn dikanên xwe her tim kurên xwe ligel xwe dibirin dikanên xwe. Şemsedîn bi vê rewşê xemgîn dibû û dilê wî bi wî dişewitî. Rojeke înê diçe hemamê, laşê xwe dişû û paşê jî diçe hêvî û du’ayan ji Xwedê dike ku kurekê bike nesîbê wî. Dû re êvarê bi vê rewşa xwe ya kambax vedigere mala xwe. Jina wî ji ber vê rewşa wî dikeve mereqê û

[37] Mesnewiya Şemsedînê Tacir, malik:1-29, r. 224-225.
[38] Malik:30-53, r. 226-227.
[39] Malik:54-73, r. 228.

sebebê vê rewşa xerab ji wî dike. Şemsedîn sebebê rewşa xwe hemûyê dibêje jina xwe. Lê jina wî dibêje wî ku pirsgirêka zarok nebûna wan ji Şemsedîn bi xwe ye. Ger hesbike li bal ticarên dermanan bi navê “me‘keram” dermanek bihîstiye. Şemsedîn bi vê mizginiya dermanî kêfxweş dibe. Sibehê diçe çarşiyan li wî dermanî digere. Lêbelê xemdar û bêhevî tê dikana xwe. Çimkî derman destnexistiye. Alîkarê wî yê li dikana wî, bi vê rewşa Şemsedîn mereqdar dibe. Şemsedîn rewşa xwe û daxwaza xwe ji wî re dibêje. Alîkarê wî dibê ku ew dê bikare dermanî jê re bîne. Şemsedîn dibê ku ew dermanî peyda bike wê sermiyanekî mezin bide wî. Feqet alîkarê wî bi tenê zêrekê ji Şemsedîn dixwaze. Ew jî du zêran dide alîkarê xwe. Alîkarê wî zêrê xwe wergirt û kete dû destxistina dermanî. Hevalê Şemsedîn dermanî li nik ticarekê peyda dike. Lê buhayê dermanî sed zêr bû. Hevalê Şemsedîn tê zêran ji nik Şemsedîn werdigire û diçe dermanî distîne. Şemsedîn dermanî dibe mala xwe û şevê dermanî vedixwe. Jina Şemsedîn bardar dikeve û dawiyê kurekî wan tê dinyayê. Bi pêşniyara mirovekê navê kurê xwe dikin ‘Elaeddîn. Şemsedîn muderrisekê ji bona perwerdeya wî wezîfedar dike. Dersa Qur’anê û xweşnivîsê, her wisa dersa gotinbêjî û rewanbêjiyê dide ‘Elaeddîn. Şemsedîn û jina wî hetanî heft saliyê kurê xwe nişanî kesê nadin û dernaxin tu deran. Bi vî awayî kurê xwe ji nezera xelkê diparêzin ji xwe re bi terzekî taybet mezin dikin.[40] Rojekê navmaliya malê wekî her car xwarina ‘Elaeddîn dibe odeya wî. Lê dema derdikeve ji bîr dike û deriyî vekirî dihêle.’Elaeddîn wê demê bêdestûr ji odeya xwe derdikeve li nava malê digere. Li hêwana malê rastî diya xwe û hinek mêvanên jin tê. Dema jinik vî kurê cuwan û delal dibînin behitîn û ketin gumanan. Di navbera xwe de pisepis dikirin. Jina Şemsedîn bi vê rewşê gelek kêfnexweş bû. Mecbûr ma û çîroka xwe û kurê xwe ji serî heta binî ji wan re got. Wê gavê koma jinikan gelek şerm kirin û ji bona ‘Elaedîn pir du‘a kirin. ‘Elaeddîn derdikeve nava malê û hewşa malê. Pirsa karûbarên bavê xwe ji xizmetkarên malê dike. Suxrevan û navmaliyên malê dibêje wî ku bavê wî Şemsedîn gelek dewlemend e û serekê bazirganan e. ‘Elaeddîn heman pirsê ji diya xwe jî dike. Diya wî jî wekî xizmetkaran bersiva wî dide. Wê demê ‘Elaeddîn gelek gazinan dike û dibêje diya xwe madem ku bavê min ev qas dewlemende, we çima ez li malê hebs kirime? Dîya wî çîroka wan hemûyê ji ‘Elaeddîn re dibêje. Dibêje kurê xwe ku wan ji bo parastina wî ev biryar daye. ‘Elaeddîn dibêje diya xwe ku dema

[40] b.n. malik: 74-307, r.228-238.

bavê wî hat malê destûra wî jê bixwaze ku ligel bavê xwe here dikanê. Êvarê dayîka ‘Elaeddîn van bûyer û axiftinan hemûyan ji mêrê xwe re dibêje. Şemsedîn jî razî dibe û sibehê ‘Elaeddîn dibin hemama bajêr û serê wî dişûn. Cilên xweşik lêdikin. Paşê bavê wî ‘Elaeddîn bi xwe re dibe dikanê. Lê belê çi kesê ev kurikê ciwan bi ‘Elaeddîn re canecan dîtin ketin gumanan û di nava sûkê de gotegotên nebaş hatin gotin. Heta hevalê wî yê ji wî re derman peyda kirî jî bû şirîkê van bêbextiyan. Şemsedîn bi van pisepis û gotegotan, bi van bêbextî û nefretan gelek xemdar dibe. Paşê biryar dide û çîroka bûyîna ‘Elaeddîn hemûyê ji serî hetanî binî bi wan re parve dike. Rastiya vê rewşê derdikeve holê. Wê demê ewil hevalê wî, paşê jî bazirganên çarşiyê hemû ji Şemsedîn şerm dikin û lêborina xwe ji wî dixwazin. Piştî ku ew qani‘ dibin bazirganên çarşiyê teklîf dikin ku Şemsedîn ziyafetekê û mewlûdekê bide her kesî. Şemsedîn jî emir dide suxrevan û navmaliyên xwe ku amadekariyeke berfireh û baş bikin. Dema ew roj hat Şemsedîn her kesî de‘wet dike mewlûdê û ziyafetê. Berhem bi vî awayî diqede. [41]

### 1.2.5.Dîwan

Me nusxeyên vê berhemê destnexistiye. Bi tenê malbata Seydayî qala vê berhemê kiriye, lê di destê wan de jî ev berhem tune bû. Li gor gotina kurê Seydayî birêz Ehmed TANYERİ ev berhem 120 rûpel e û helbestên tê de bi Kurdî hatine nivîsandin.

### 1.2.6. Berhemên ‘Erebî

Ji bilî berhemên jorî yên bi Kurdî, du destnivîsen Seydayî yên bi zimanê ‘Erebî jî hene. Yek ji wan destnivîsan wek îqtibas hatiye tomarkirin û nivîsîn. Heta meriv dikare vê berhemê wek “nîşe” jî bi nav bike. Di wê de selewat û du‘a hene. Berhema din fiqhî ye. Li gor mezhebê Şafi‘î agahiyên ‘ilmihalê dide. Ev her du destnivîsen bi ‘Erebî hatine nivîsandin jî di destê malbata Seydayî de ne. Ji ber ku ew berhem bi ‘Erebî hatine nivîsandin me wergera wan û latînîzeya wan çênekiriye û nexistiye nava vê xebata xwe.

[41] b.n. malik:308-492, r. 238-246.

## 1.3. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Mela Muhemmed Nûrî ji malbateke zana û mela bû. Wisa xuya ye ku vê atmosfera malbatê li ser fikr û ramana Seydayî, li ser jîn û jiyana Seydayî bandor kiriye. Her wisa Seydayî ji bavê xwe tedrîsa ‘ilmî dîtiye. Dû re li gelek gund û navçeyan, li Batmanê û li Diyarbekirê ji gelek seydayan ders dîtiye. Ji her çar berhemên wî yên bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsandin xuya ye ku Seyda ji edebiyata klasîk û hêmanên wê agahdar e. Her wisa di hevoksaziyê û vehûnandina helbestan de jî hosta ye. Çimkî eger kesayetek nêzî pênc hezar malikan vehûne û binivîse, ew kes helbet di gotinbêjî û rewanbêjiyê de serkeftî ye. Va Mela Muhemmed Nûrî jî bi helbestên xwe ev yek isbat kiriye. Ji xwe nivîsandina mesnewiyên ev qas dirêj û bi huner ne karekî hêsan e û karê her kesî jî nîne.

### 1.3.1. Ziman û Vegotina Wî

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe de isbat kiriye ku di pêkanîna malikan de serkeftî ye. Kesê ku hinekê agahiya wî ji edebiyata klasîk hebe wê çêj û tehmekî xweş ji malikên seydayî werbigire. Zimanê helbestên wî de helbet gelek peyvên Erebî û Farisî jî hene. Ev taybetî ji perwerdeya wî ya medreseyê tê û ya din ji taybetmendiya edebiyata klasîk tê. Çimkî berhemên li medreseyên Kurdan Erebî, Farisî û Kurdî bûn. Lê dersdarî û şîroveya berheman li medreseyên Kurdan her tim bi Kurdî dihat kirin. Zimanê helbestên Mela Muhemmed Nûrî jî xwerû nîne. Di helbestên Mela Muhemmed Nûrî de jî gelek peyv, bêje, mezmûn û ravekên Erebî û Farisî hatine bi kar anîn. Carna jî ji bo ku mijara xwe herikbartir bîne ziman û qalibên ‘erûzê jî bê kêmatîtir bi kar bîne, peyv û bêjeyên Erebî û Farisî bi kar aniye. Lê dîsa jî zimanê wî li gor gelek helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk zelal û hêsan e, her wisa risteyên helbestên wî di herikbar in. Di berhemên xwe de gelek caran malikên xurt û bibandornivîsandiye. Di helbestên xwe de bi gelemperî devoka herêma Botan bi kar aniye. Hinek caran jî peyvên herêma Behdînan û Colemêrgê bikaraniye. Ev jî dide xuya kirin ku dema Seyda perwerdeya xwe li deverên Botan û derudorên Botan dibîne, maye dibin bandora wan devokan de. Gelek peyvên xwe ji Kurmanciya wan deveran girtiye.

Di berhemên Seydayî de diyar e ku ji bo serwa û paşserwaya helbestan, ji bo lihevhatina risteyan ji gelek devokên herêma Kurdan peyv û bêje bi kar aniye. **Wek**

**mînak, ji devera Behdînan û Colemêrgê hinêk peyv û lêker di helbestên Melayî de wiha hatine bi kar anîn:**

Cewab da resûli şehi layenam
Çi **hîn**a Xuda min bibe der meqam (MC:508/68)

Barî tu Nuceyli bed ‘efû **key**
Der baxi ne‘îmi rû be rû **key** (MŞT:29/225)

Li **nik** Ummi Hanî di hicra delal
Xuda razi **bit** jî bi ‘izz û kemal (MC:55/48)

**Çukû** hûn dibîjin çi eşya hebin
Bi teb‘i xû peyda ne bîsahib in (MC:20/47)

‘Ecel kin ‘ecel em biçîn meqsedî
Ku da paşnekev emr û nehyî **Xudî** (MC:1229/104)

Leben bû bi te‘mi wekî **hingivîn**
Wekî wî mi nedye li rûyî zemîn (MC:224/55)

Me hîvî heye me şefa‘et **bikey**
Di rûjî qiyame me derbazi **key** (MC:389/63)

Evî dabbei kes bi zîv û bi zer
Nika**rit** ku **bigrit** eva mu‘teber (MC:101/50)

Xuda gû dema ez wehî kim li wî
Ku çil sali derbaz **bibit** ‘umri wî (MC:791/82)

Ji çil sali heşt sal **bibûrit** yeqîn
Xû hazir bike bû Muhemmed emîn (MC:792/82)

Hinek jî kirasi li wan **kurt** û teng
Diçin tîn di nîv çarşiyî rengereng (MC:1176/102)

Hîvî me heye feqîr û jara
Derbazî **bikey** gunahikara (MŞT:16/224)

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe de gelek peyv û biwêj, gelek mezmûn û ravekên Erebî û Farisî jî bi kar aniye. Çimkî edebiyata klasîk ji fikr û ramanên berfireh, ji hest û xeyalên kûr ava dibe. Ji ber vê yekê helbestvan gelek caran hêz û alîkariya zimanên din jî bi kar tîne. Bi vî awayî kûrahiyeke xurt têxe naveroka helbestên xwe. A din, ji ber ku mijarên berheman û helbestan gelek caran olî û tesewifî ne, ji mecbûrî helbestvanan têgehên olî û tesewifî bi zêdehî bi kar anîne. Bi vê şêwazê helbestên klasîk ne bi zimanekî xwemalî û xwerû ne, berevajî vê yekê bi peyvên Kurdî, Erebî û Farisî hatine nivîsandin. Lê belê dîsa jî hejmara peyvên Kurdî pir zêde ne.

**Hinek mînakên bi kar anîna peyvên Erebî û Farisî di helbestên Seydayî de wiha tên pêşberî xwîneran:**

Bi **tesdîq**i bawer bikin bîhenek Er.
Ku da we xelas ke **şeh**i çavbelek Fr. (MC:8/46)

Ne ‘**eql** û **feraset** ji bû we **ebed** Er.
Ji xeyri ‘**inad**i bi **kîn û hesed** Er. (MC:18/46)

Bibîje ji bû min bi **lutf** û **kerem** Er.
Were tu beyan ke **eya** muhterem Fr. (MC:937/89)

Xuda wî **sual**i ji wan ke **yeqîn** Er.
Di **rûz**i qiyamet hemî ecme‘în Fr. (KNN:12/158)

**Ne‘em** gûtî vî hurmeta **mu‘teber** Er.
Ji bû ra digûtî hemî **serteser** Fr. (KNN:539/180)

| | | |
|---|---|---|
| Li dû her kesek çû bi **hal**i xû bû | Er. | |
| Bi şîn û biîş in heta **mah**i nû | Fr. | (KNN:88/161) |
| | | |
| Bi lez çû heta hate Kûfe **yeqîn** | Er. | |
| **Yekayek** digû bû ‘Ubeydi le‘în | Fr. | (MR:390/209) |
| | | |
| “Lewlake” te kirye **yadigar**î | Fr. | |
| Lutf û **kerem**a te bûye **carî** | Er. | (MŞT:7/224) |
| | | |
| **Fikr**î bi dil xû nine derman | Er. | |
| **Çeşm** û beseri wî şubhi baran | Fr. | (MŞT:101/230) |
| | | |
| Pur lazim ev ‘ilac **emanet** | Er. | |
| **Peyda** bibitin neke xiyanet | Fr. | (MŞT:195/233) |

### 1.3.2. Di Berhemên Wî de Bandora Kevneşopa Medreseyan

Mela Muhemmed Nûrî perwerdeya xwe di medreseyên herêmê de dîtiye. Ji ber vê yekê li ser nivîskariya wî bandora kevneşopa medreseyan, terz û şêweya medreseyan çêbûye. Bikaranîna peyvên Erebî û Farisî ji bona vê taybetiyê mînakekî berbiçav e. Mijarên olî û şêweya helbestan jî mînaka bandora kevneşopa medreseyan e. Di destpêka berheman de bikaranîna besmeleyê, di helbestan de bikaranîna mexlesan jî her wisa mînakên bandora kevneşopa medreseyan e. Mela Muhemmed Nûrî di berhemên xwe de ev taybetmendiyên hanê hemû jî bi kar aniye.

Dema meriv destxetên van berhemên Mela Muhemmed Nûrî dixûne taybetiyekî kevneşopa medreseyan a din jî tê pêşberî me. Muellifî di destxetên berheman de li ser navê Hz. Muhemmed û Ehmed xêzek kişandiye û bi Erebî herfa ‘eyn û mîmê nivîsandiye.[42] Ev herfên hanê kurteya peyva “‘eleyhisselam” e û bi Kurdî wateya vê peyvê “Selama xwe de li ser be” ye. Ev peyv di berhemên olî de piştî navên pêxemberan hatiye nivîsandin û vegotin.

Mela Muhemmed Nûrî di berhemên xwe de li ser navên ehli beyta

[42] Mi’raciye: m. 3, 6 ,7 r. 46 / m. 24, 29 r. 47.

pexemberî anku li ser navê Hz.‘Elî, Fatima hwd. bi Erebî herfa re û ‘eynê nivîsandiye.[43] Ev herfên hanê kurteya peyva “rediyellahu ‘enh” e û ev komebêje bi Kurdî wek “Xwede jê razî be” hatiye watedarkirin.  Carna jî li ser navê ehli beyta pêxemberî bi Erebî herfa re û datê nivîsandiye.[44] Ev kurte jî tê wateya “rediyellahu ‘enhû” yê û ev komebêje jî her wisa bi Kûrdî wek “Xwedê jê razî be” hatiye wergerandin.

Mela Muhemmed Nûrî gelek caran jî di berhemên xwe de li ciyê navên lehengên berhemê cînav (zemîr) bi kar aniye.[45] Di kevneşopa medreseyan de li ciyê navên di malikan û di hevokan de cînav hatine bikaranîn û ev taybetî wek  “rid‘e” hatiye bi nav kirin. Meriv dikare vê peyvê bi Kurdî wek “veger, vegerîn” watedar bike û wergerîne. Di helbestan de ev taybetî çima hatiye bikaranîn? Da ku her car navê lehengî neyê dubarekirin. A din da ku qalibê ‘erûzê bêpirsgirêk were çêkirin cînav hatine bikaranîn.

Di destxetên Mela Muhemmed Nûrî de carna li ser jimareyên di malikan de xêz hatiye kişandin û li ser xêzê reqema wê ya ‘Erebî hatiye nivîsandin.[46] Muellifî xwestiye ku bi vê sedemê xwendekarên berhêmê wan jimareyan tevlihev neke.

Seydayî di destxetên xwe de dema ku mijar diguhere yan jî dema vegotineke cuda destpê dike xêzek kişandiye[47] Di kevneşopa medreseyan de ji vê taybetiyê re “serkêşe” hatiye gotin. Mela Muhemmed Nûrî li gor kevneşopa edebiyata klasîk di helbestên xwe de mexlesên xwe bi kar aniye. Melayî li ser mexlesên xwe xêz kişandiye û bi ‘Erebî “kunyetu’n-nazim”[48] nivîsandiye. Ev peyv li ser mexlesên xwe yên Necli Ewhed, Nuceyl û Necl nivîsandiye.[49]Di berhemên xwe de navê xwe Nûrî jî wek mexles bi kar aniye û li ser vî mexlesî jî xêz kişandiye. Li wan deran de bi ‘Erebî “ismi’n-nazim” [50]nivîsandiye.[51]

---

[43] MC: m. 56,64, r. 48.
[44] b.n.m. 2438, r. 153.
[45] KNN: m. 775, r. 190  KNN: m.  803,  r. 191.
[46] MC: m. 971,972, r. 91.
[47] KNN: m. 5,17, r. 158.
[48] “Mexlesê di helbestê de.”
[49] MC: m. 340,342,  r. 61 / MŞT: m. 29,  r.  225   m. 52,53, r. 227.
[50] “Navê/mexlesê di helbestê de.”
[51] MC: m. 2014, 2016, 2027,   r. 139.

### 1.3.3. Di Helbestên Wî de Bikaranîna Serwayê (Qafiye)

Di helbestan de bi gelek hêmanan aheng tê çêkirin. Ji bilî wezn (kêş), asonans, alîterasyon, hunerên ciwankariyê û hwd. serwa û paşserwa jî hêmanên ahengê yên sereke ne. Wek tê zanîn di helbestên klasîk de jî serwa û paşserwa hatiye bi kar anîn. Serwa (qafiye) di risteyên helbestan de di koka peyva dawiyê de tê dîtin. Her wisa di peyva dawiyê de heke qertafên hempeywir hebin an jî peyvên bi heman erk û wateyê hatine dubarekirin hebin ji wan re paşserwa (redîf) tê gotin. Di destnîşankirina serwayê de tîpa herî muhîm “rewî” ye. Herfa li dawiya risteyê tê dubarekirin herfa “rewî” ye. Herfên din bi têkildariya herfa rewiyê ve tên bi nav kirin û her wisa li gorî ve yekê jî cûreyên serwayan derdikevin holê. Destnîşankirina serwa û paşserwayan de pêwist e tîpên Erebî bên esasgirtin.

#### 1.3.3.1. Serwaya Mucerred

Tîpa li dawiya risteyê tête dubarekirin “rewî” ye û serwaya ji rewiyê çêdibe wek “serwaya mucerred” hatiye binavkirin.[52] Em hinek mînakên vê cûreya serwayê ji malikên seydayî bidin:

Ku da hûn bizanin hemî sertese**r**
Ji mi‘raca Ehmed şehi mu‘tebe**r** (MC:6/46)

Bi tesdîqi bawer bikin bîhene**k**
Ku da we xelas ke şehi çavbele**k** (MC:8/46)

Nizanin ku ev rebbi ‘erşi mezi**n**
‘Elîm e bi ehwali insan û ci**n** (MC:30/47)

Ehli wî zemani tev bihikme**t**
Navi xû bi fali kirne ‘ade**t** (MŞT:291/237)

[52] Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, Çapa Duyem. Stemboll 2014, r. 397.

Guhî xû mede wan û fehşi xebe**r**
Tu caran li xû negre qet yek ese**r**  (MC:2276/150)

#### 1.3.3.2. Serwaya Murdef

Serwaya murdef, serwaya muqeyyed û serwaya muesses cûreyên "serwaya murekkebe" ne. Serwaya murdef ji herfên "ridf" anku ji "elîf, waw, ye"yê û ji herfa rewiyê pêktên. Ji van her sê herfan re "ridf" tê gotin. Beriya herfa rewiyê herfa ridfê bête bikaranîn, ew dibe serwaya murdef.[53] Em mînakên vê qafiyeyê jî wiha nîşanî bidin:

Hinek jî 'emel kir bi qenc û del**al**
Hinek jî xerabî dikir bîmec**al**  (KNN:11/158)

Xuda wî suali ji wan ke yeq**în**
Di rûzi qiyamet hemî ecme**'în**  (KNN:12/158)

Ji bil vî serai e nakim qeb**ûl**
Zerer nabitin hûn nebin qet mel**ûl**  (KNN:319/171)

Nihayet ewî herbekî bî mes**îl**
Dikir axirî da kirin wî qet**îl**  (MR:223/202)

Du sed betl û sendîdi Ibni Ziy**ad**
Dikuştin ji wan her wekî qewmi **'Ad**  (MR:224/202)

#### 1.3.3.3. Serwaya Muqeyyed

Li dawiya risteyên helbestan de eger ku herfa "qeyd" ( herfa beriya rewiyê ya dengdar û sakin) û rewî bi hev re hatibe bi kar anîn serwaya muqeyyed çêdibe.[54] Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe de ev cûreya serwayan jî bi kar aniye. Hinek mînak:

---

[53] b.n, r. 397.
[54] b.n, r. 397.

Bi ‘umri xû neh sal e bî kîm û ka**st**
Ji nav rawiya ev rivayete ra**st** (MC:57/48)

Ji vî der melaik hene ta bi ‘e**rş**
Ji vî der bila‘edd hene ta bi fe**rş** (MC:852/85)

Ku illa diçûm ûdeya pur bili**nd**
Mi danî li ber xû gelek mûm û fi**nd** (KNN:416/175)

Dema tîte fikr û xiyala Nuce**yl**
Dibare ji çeşm û beser xûn çû se**yl** (MR:577/219)

### 1.3.3.4. Serwaya Muesses

Beriya herfa rewiyê herfeke dengdar a bihereke (daxil) bê, beriya wê herfê jî herfa te’sis (elîf) bê, wê demê serwaya muesses çêdibe. Anku “te’sis+daxil+rewî” bi hev re hatibe bi kar anîn serwaya muesses çêdibe.[55] Hinek mînakên vê serwayê di malikên Mela Muhemmed Nûrî de wiha hatiye sazkirin**:**

‘Uzrî xû kirîn bu wî şik**ayet**
Em dexli te ne bikî ‘in**ayet** (MŞT:455/244)

Bîsûnd û derew meqali f**asid**
Kesba xû dikin bila mu‘**anid** (MŞT:71/228)

Hem şîv û te‘ami xas û n**adir**
Bilcumle ji bû wî kirye h**azir** (MŞT:133/231)

[55]b. n, r. 398.

### 1.3.3.5. Iltizam

Di dawiya risteyan de ji yek rewiyan bêtir rewî hatibe bi kar anîn ew dibe iltizam. Li gelek malikan de iltizam hatiye pêkanîn. Hinek mînakan wiha bidin nîşandan:

Gelek tî de tabût hene bî ‘e**d**e**d**
Di wan de hene sindiqi bî me**d**e**d** (MC:1144/100)

Bira ev xeberdan ji we çîne**bin**
Ku da kes nebit tabi‘i wî ji **bin** (MC:2403/156)

Ehmed ji me ra bikîte reh**ber**
Ref ref bu wî ra bibîn bera**ber** (MŞT:27/225)

### 1.3.4. Paşserwa

Paşserwa ne cûreyekî serwayê ye. Wek tê zanîn serwa di koka peyvên li dawiya risteyên helbestan de derbas dibe. Qertafên hemdeng û hempeywir ên li dû koka wan peyvan tên dubarekirin wek “redîf” anku “paşserwa” hatine bi nav kirin.[56]

Çikû der ezel ev le‘în muşrik **e**
Di kufra le‘îni meke qet şik **e** (MC:1438/114)

Kerem ke were nasihi ummet**i**
Bi çavi serî xû bibîn cennet**i** (MC:2173/146)

Jini jî re gû ey ‘Elî ev çi **ye**
Ewî ev xelat da bibîje ki **ye** (KNN:675/186)

Li vî der me naxi rikab**i di me**
Li vî der me hetti rihal**i di me** (MR:153/199)

[56] b.n, r. 399.

Tu hîja dibîjî ku ez mu'min **im**
Bi we'da Xuda hem resûl mûqin **im** (MR:187/201)

Barî tu Nuceylibed 'efû **key**
Der baxi ne'îmi rû be rû **key** (MŞT:29/225)

Lazim ev kura bi ism û nav **be**
Ev nave bi desti da û bav **be** (MŞT:287/237)

### 1.3.5. Di Berhemên Wî de Hunerên Edebî

Helbestên klasîk ji hêla ciwankariyê ve anku ji aliyê hunerên edebî ve pir dewlemend in. Bi vê sedemê di helbestan de watedariyeke berfireh çêdibe. Hêz û tehma helbestan jî her wisa zêdetir dibe. Ciwankarî pisporiya helbestvanî nîşanî xwîneran dide. Her wisa helbestvan, hostatiya rewanbêjî û hevoksaziya xwe bi pêkanîna hunerên edebî şênber dike. Em bi kar anîna hinek sernavên hunerên edebî ji helbestên Mela Muhemmed Nûrî bidin nîşandan:

#### 1.3.5.1. Tenasub ( Guncanîtî)

Di malik û bendan de peyvên ku di navbera wan de ji aliyê wateyê û ji aliyê qadê ve têkîlî heyî bêne qalkirin, wê demê hunera tenasub pêk tê. [57]

Digel al û sehbi di wî cumle şan
Çi **an** û çi **hîn** û çi **sal** û **zeman** (MC: 4/46)

Ne **'eql** û **feraset** ji bû we ebed
Ji xeyri **'inadi** bi **kîn** û **hesed** (MC: 18/46)

Ku belkî rehet bî li wî der gelek
**Xuda xaliq**i **ins** û **cinn** û **melek** (KNN:351/172)

[57] Cem Dilçin. Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, weş. TDK, Çapa Yazdehem. Stembol 2016, r. 431.

#### 1.3.5.2. Tezad (Dijberî)

Peyvên ku di navbera wan de ji aliyê wateyî ve dijberîtî heyî[58] di helbestan de gelek caran tê bi kar anîn û bi vî awayî hunera tezad tê pêkanîn.

Li nik wî nema şey'ekî serteser
Bi desti xû bigre ne **hişk** û ne **ter** (KNN:168/165)

Ez im bid'ekî **tahir**e bîxilaf
Eya qewmi **pîs**i bi laf û guzaf (MR:256/203)

Bi hev ra duxarin bi keyf û **sefa**
Ne te'b û eziyyet ne vî ra **cefa** (KNN:495/178)

Çikû wan dişandî **şeb** û **rûz** û an
Ku bîm Kûfei ez di weqt û zeman (MR:44/195)

Mufessel bibîje bike **eşkera**
Li min tu **xefî** qet meke der sera **(**MR:368/208)

Hinek çû li cewwi **sema** û **zemîn**
Dihatî sedayek ji ali yemîn (MC:173/53)

#### 1.3.5.3. Teşbîh (Şibandin/Manendin))

Hunera ku di navbera du tiştan de ji hêla taybetiyekê ve manendin bête kirin, wek teşbîh hatiye bi nav kirin.[59] Di edebiyata klasîk de ev ciwankarî gelek zêde hatiye bi kar anîn.

Çukû pir ji wî hesdikim **ez** bi dil
**Wekî bulbuli 'aşiq**i zati gul (MC:140/52)

---
[58]b.n, r. 449.
[59] b.n, r. 419.

Eger çi **gunahi** wa **misli çiya**
Li ber cenbî ‘efwi qe nabin xuya MC:2003/138)

**Tacir Şemsedîn** dema diçû der
**Wek teyra diçû** bi çeng û hem per (MŞT:193/233)

Nizanin çewa kin Huseyn û sehab
Ji tihna **dil û cerg**i wan bû **kebab** (MR:176/200)

Werin hey werin **hûn wekî sa** bi xar
Li we Kerbelai bikim teng û tar (MR:255/203)

### 1.3.5.4. Teşxîs ( Kesandin)

Di helbestan de helbestvan taybetmendiyên mirovan dide tiştên candar û bêcan. Ji vê hunerê re teşxîs (kesandin) tê gotin.[60]Di edebiyata klasîk de ev ciwankarî pir zêde hatiye bi kar anîn. Em çend mînakan ji malikên Mela Muhemmed Nûrî wiha bidin nîşandan:

Metirse **eya dabbe**ya şubhi gul
**Ji qelbi xû derxe hemî derd û kul** (MC:154/52)

Îşev te li min hemî hebandin
**Kerb û kederîm** hemî **civandin** (MŞT:169/232)

Mi dîtin **melaiksuwar in** hema
Li hespi belek **tev bi şûr û rima** (MC:426/64)

### 1.3.5.5. Întaq (Axivandin)

Ev cûreya hunerê jî dişibe kesandinê. Çimkî tiştên ji bilî mirovan, di helbestan de wek mirovan hatine axivandin. Anku çi candar be çi bêcan be, tiştên li cîhanê di helbestan de têne axivandin. Bi vî şiklî li dera ku axivandin hatibe çêkirin li

[60]b. n, r. 405.

heman demê kesandin jî hatiye çêkirin. Wek mînak li jêrî di berhema Mi‘raciyye de Buraqê ku ji pêxember re hatiye şandin bi pêxember re tê axivandin**:**

(Buraq) :
Kerem ke were ey şehinşahi dîn
Suwar be li min ta biçîn ecme‘în (MC:144/52)

Eger çi bi zahir me kir ev qusûr
Li min negre ey şahi sade ji nûr (MC:145/52)

Çukû ‘aşiq im ‘aşiqan nîne qet
Ne ‘eql û xired zahiri wan xelet (MC:146/52)

#### 1.3.5.6. Teraduf (Hemwateyî)

Helbestvan di risteyên helbestên xwe de peyvên ku wateyên wan yek bi kar bîne ew dibe ciwankariya teraduf. Gelek caran ev peyv bi gihaneka “û”yê hatiye çêkirin.[61] Em hinek teradufên (hemwateyî) di helbestên Mela Muhemmed Nûrî de hatine çêkirin mînak bidin:

Ji lew hûn dibîjin **seqîl** û **giran**
Bi hevrazî naçin bi teb‘i zeman (MC:21/47)

Ji Cibrîlî gûtî şehi ins û can
Metirse ji vî heybeti **hîn** û **an** (MC:114/50)

Welî î ku **gazî** dikir der ‘eqeb
**Nida**a Yehûdi bi **kîn** û **xezeb** (MC:203/54)

Li dû ev melîki bi **şerm** û **heya**
Nexûş ket xû avîti nava ciya (KNN:698/187)

---

[61] Nezîr Ocek, Edebiyata Kurdî, Weş. Sîtav, Wan, r. 102.

Hinek rutbe da wan hinek bûn ‘ezil
Edalet dikir wî bi **qelb** û bi **dil** (KNN:805/191)

Qesem pur dixûm ez bi zati celal
Me agah nebû qet bi **herb** û **qital** (MR:473/214)

**‘Eqarîb** û **dûpişk** mi dîtin gelek
Wekî qatira dûv li ser wan xelek (MC:1147/100)

Nihayet kî Ridwan bi desti mi girt
Diçûm em di nîv **dar** û bexç û **duruxt** (MC:2194/147)

Çukû pur muhimm e **limîj** û **selat**
Sebeb wî di heşri dibin ew necat (MC:2257/150)

#### 1.3.5.7. Tekrîr ( Dubare)

Ji bo bihêzxistin û şidandina wateya peyvan dubarekirin gelek caran pêwist e.[62] Ev taybetî hem di axiftinê de hem jî dinivîsînê de hêmanekî girîng e. Di helbestan de jî ev taybetmendî gelek caran hatiye bi kar anîn. Hinek mînakên vê hunerê li malikên Seydayî wiha hatine ristin:

**Werin hey werin hey werin** guhbidin
Ku bîjim ji bû we çi derdek mezin (MR:1/193)

**Wekî wan** ji zumrûdi kesk û di sûr
**Wekî wan** ji istebreqi xal û mûr (MC:1777/129)

**Wekî wan** ji sundus **wekî wan** ji nûr
**Wekî wan** ji zulmet **wekî wan** belûr (MC:1778/129)

[62] Cem Dilçin, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, weş. TDK, Çapa Yazdehem. Stembol 2016, r. 452.

Gelek jî ditirsim **eman sed eman**
Mi nedye wekî wî di weqt û zeman (MC:68/49)

**Wereheywere** tu rucû‘ be ji wir
Ricai dikim min nekî munkedir (MR:59/195)

Dizanim ku rehma Xudayi qedîr
**Kesîr e kesîr e kesîr e kesîr** (MR:628/221)

**Emanet emanet emanet** limîj
Ew e î ku kes nabitin bî qirîj (MC:2259/150)

**1.3.5.8.Mubalexe (Pirole)**

Ji bo ku wateya peyvekê yan jî wateya risteyekê bihêztir bibe, tiştê ku behsa wî tê kirin gelekbipirole tê qalkirin. Vegotina bi vî awayî xeyalekî kûr û dewlemend nîşanî me dide. Mela Muhemmed Nûrî di malikên xwe de vê ciwankariyê wek mînak wiha bi kar tîne:

Dema tîte fikr û xiyala Nuceyl
Dibare **ji çeşm û beser xûn çû seyl** (MR:577/219)

Te **can û ciger li min helandî**
**Ser ta bi qedem** te min **kewandî** (MŞT:147/231)

Her sinfek ji wan kirî defîne
**Qet ‘edd û hisabi jî re nîne** (MŞT:351/240)

**Mali wî pur** e ku **bî hisab** e
**Katib nikarin bikin kitab e** (MŞT:352/240)

**Ne berf agirî** wî **tefîne** ji wî
**Ne agirhelîne** evî **berfi** wî (MC:319/59)

Bizane ji bû wî **hezar ser hene**

**Di her ser de milyûn wecih** tî hene (MC:320/59)

### 1.3.5.9. Îqtibas (Jêgir)

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe de gelek caran ji ayetan û ji zimanê Erebî hinek îqtibas (jêgir) jî wergirtine. Ev taybetî helbestan watedartir dike û kesên agahiya wan ji wan têgehan, ji wan ayetan û ji wan gotinan hebe, dê bi nêrîneke berfirehtir berê xwe bide helbestan û dê wateyên zêdetir jî ji helbestan derbixîne.[63] Hinêk mînakên îqtibasan/jêgiran ji malikên Seydayî meriv dikare wiha rêzbike:

**"Fesirna ileyhim"**[64]bi emrî emîr

Me gûtî ji bû wî eya dilxetîr (MR:372/208)

**"Fe bi'l-hemdi"**[65]gûtin gelû der cihan

Tu kafir hene wek Yezîd bî eman (MR:456/213)

Di **"ecra lehum kullema yunfiqûn"**[66]

Li ser ev musîbet dibûn sabirûn (MR:493/215)

Ki **"la xeyrelî be'dekum fî'l-heyat"**[67]

Ji bû wan digût **"'eccilu fî'l-memat"**[68] (MR:79/196)

Dikit **"ma yeşaû"**[69]Xudayi mezin

**"We fî kullî yewmin huwe fî şein"**[70] (MR:32/194)

---

63 b.n, r. 465.

64 "Em çûn ser wan" (Tê gotin ku ev hevok di nav 'Ereben de wek gotinên pêşiyan berbelav bûye. Ka'b b. Malik ev hevok di herba Uhudê de di helbestekî xwe de qalkiriye.)

65 "Bi hemda Xwedê"

66 " Ew her çi înfaq bikin dê ecra xwe wergirin."

67 "Piştî we ji min re xêr tune ye"

68 "Di mirinê de lez bikin."

69 "Tişta ku hesbiket"

70 "Ew her gav di karekî ji hev cuda de ye" (Sureya Rehman, ayet 29)

Eger çi mi xelq kirye ‘Îsa bi **“kun”**[71]
Dema **“kun”** bibîjim hema ew dibin (MC:1945/136)

Muhemmed di nav wan bi şubhi qemer
**“Wehum hewlehu ke’n-nucûmi’s-sixer”**[72] (MC:2416/156)

**“We emma bi ni‘meti rabbike”**[73] hat
Li pey wî **“feheddis”** dihat qat bi qat (MC:2315/152

**“Lewlake”**[74] te kirye yadigarî
Lutf û kerema te bûye carî” (MŞT:8/224)

### 1.3.5.10. Telmîh (Bîranîn)

Kesayet û bûyerên di dîrokê de binavûdeng bûyî di helbestan de bi peyv û biwêjan, bin av û têgehan têne qalkirin.[75] Bi vî awayî helbestvan bi sedema van kes û rûdanan mijara helbesta xwe bihêztir û xurttir, her wisa watedartir û berfirehtir dike. Xwîner jî hem ji helbestê çêj û tehmekî xweş werdigire, hem jî bi bi fikr û xeyala xwe ve li nav rûpelên dîrokê de digere û wan kesayet û rûdanan bi bîr tîne. Hinek mînakên vê hunerê di malikên Seydayî de wiha hatine ristin:

**Nekîr** û digel **Munker**î pur delal
Dema bîne ba min ji min kin sual (MC:1047/95)

Ji **Mûsa** re gûtî **‘esa** hilde zû
Li **behr**î xe da **şeq bibit** zû be zû (MC:1419/113)

Ev e î ku **‘Îsa diçû asiman**
Bi yumna şehinşahi axirzeman (MC:1459/115)

[71] “Bibe/çêbibe” (Sureya Yasîn, ayet 82)
[72] “Ew li dora wî wekî stêrên biçûk in”
[73] “Tu her behsa qencî û nî‘metên rebbê xwe bike.” (Sureya Dûha, ayet 11)
[74] “Ger tu nebûya...” (Hedîs) Aclunî, Keşfu’l- Xefa, c. II, r. 214.
[75] Cem Dilçin, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, weş. TDK, Çapa Yazdehem. Stembol 2016, r. 461.

Ji nûra Xuda kesk û sûre ‘eyan
Bi **Refref** duxûl bû şehi ins û can (MC:1627/126)

Ji bû wî re gûtin ev e **Kerbela**
Ela ey **Imam**i bi heyy û hela (MR:148/199)

Temamen vegerya bi ser şahizad
Li dûr wî digirtin wekî **qewmi ‘Ad** (MR:259/204)

Bi **Ilyas û Welyes**‘i paki delal
Bi **Yûsuf** xudawendî sahib cemal (MR:656/222)

### 1.3.5.11. Nîda (Bang/Gazî)

Helbestvan gelek caran di helbestên xwe de bang dike tişt û hêmanên ku di helbesta xwe de qala wan kirî, carna jî li gor mijara helbesta xwe bang dike Xwedê, kes û kesayetan û hwd. Ji bo pêkanîna vê hunêrê daçekên bangkirinê yên wekî “ya, ey, eya, hey” û hwd. bi kar tîne.[76] Carna jî navan bi xwe bi vegotineke bangkirî bi kar tîne. Hinek mînakên vê ciwankariyê di helbestên Seydayî de wiha ne:

Çukû hesdikim ez ji te **ey resûl**
Hemî gûtinî te li nik min qebûl (MC:1852/132)

Rica me heye **ey şehi bawefa**
Di rûzî qiyamet nebînin cefa (MC:986/92)

Emanet **eya Seyyidi mulk û mal**
Gelû wesyeta walidî bû zewal (KNN:137/163)

Bibîjin Huseyn**a** şehi dilbirîn
Ji bû te şeb û rûz em in dilhezîn (MR:5/193)

[76] b.n, r. 453.

Şehîd bû şehi Kerbelai wehîd
Were **hey** were **ey Resûli Mecîd** (MR:275/204)

**Ilahî** bikî rehberî min emîn
Mi dûr kî ji vî firqeya muznibîn (MR:407/211)

#### 1.3.5.12. Îsti‘are (Sparde)

Ev ciwankarî hin caran bi şibandinê (teşbîh) re tê tevlihevkirin. A rast di şibandinê de herî kêm du hêmanên şibandinê (manende-lêmanende) hene. Lê di îsti‘areyê de bi tenê yek hêman tê bi kar anîn. Heke "manende" bi tenê hebe dibe "îsti‘areya girtî". Heke "lêmanende" bi tenê hebe ew jî dibe "îsti‘areya vekirî"[77]Ev huner di axiftin û nivîsandinê de, di pexşan û helbestan de gelek caran tê çêkirin.

Emanet bike diqqeti ey **ciger**
Li nik xû bigîre gelek mu‘teber (KNN:48/160)

Xuda te duxwaze eya **şah**idîn
Xelatek mezin wî bide te yeqîn (MC:254/56)

### 1.3.6. Mexlesên Wî

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe de ji xwe re hinek mexles jî bikaranîne. Çimkî di kevneşopa edebiyata klasîk de helbestvan teqez ji xwe re mexlesekê (nasnav) bikartînin. Melayî jî di helbestên xwe de wek mexles **"Nûrî, Necl, Nuceyl, Necli Ewhed"** bikaraniye. **Necl** peyvekî Erebî ye bi Kurdî tê wateya**"kur"** î. **Nuceyl** jî peyvekî Erebî ye, di rêzimana Erebî de ji peyvên wiha re "ismi tesxîr" tê gotin. Bi Kurdî wateya peyva Nuceyl **"kurik"**e. Her wisa **Necli Ewhed** jî bi Kurdî wek **"Kurê êkane/yekane"** tê wergerandin. Li jêrî ji malikên Mela Muhemmed Nûrî hinek mînakên bikaranîna mexlesên wî hatine rêzkirin:

Şefa‘et bike **Nûri**yî bîmedar
Mehîle di werta gunah de tu car (MR:424/411)

---

[77] b.n, r. 412, 414.

Birîje heraret ji qelb û ciğer
Eya **Nûri**yî şafi‘î bîmefer (MR.:445/213)

Ilahî bi reyhanei cenneti
Tu **Nûrî** nehîlî di nîv zehmetî (MR:594/220)

Ev **Necl**a feqîr û pur hezîn e
Der xatimei meded bişîne (MŞT:52/195)

Ne bîhiş be ey **Necl**i jar û hezîn
Şiyar be li seyra şehinşahi dîn (MC:342/61)

Eger tu nebûrî ji wî ey nebî
Ki ye tî bibûre ji **Necl**i xebî (MR:426/211)

Ku illa şehinşahi beyt û hetîm
Şefa‘et bikit vî **Nuceyl**i seqîm (MR:600/220)

Barî tu **Nuceyl**i bed ‘efû key
Der baxi ne‘îmi rû be rû key (MŞT:29/94)

Were ey **Nuceyl**i bikerb û keder
Beyan ke ji seyra şehi mu‘teber (MC:340/61 )

Nizanî demek hewcei şahi dîn
Dibî **Necli Ewhed** eya dilbirîn (MR:435/212)

Were **Necli Ewhed** tu bes iztirab
Bike te dil û sîne kir wek kebab (MR:443/213)

Were **Necli Ewhed** were rûsiya
Ji heddi xû zîde meçe bîheya (KNN:645/184)

## BEŞA DUYEMÎN

## 2. LATÎNÎZEKIRINA BERHEMAN

### 2.1. KITABU’L-ISRA WE’L-MI‘RAC (MI‘RACIYE)

**BISMILLAHIRREHMANIRREHÎM**

**(Ev beş 339 malik e)**

1 Bede‘tu bi ismi’l-celali ela
Bu wî Xaliqi ferş û ‘erşi ‘ula

2 Bi hemd û senai ji bû zîlcelal
Me pî ibtida kir bi ‘izz û kemal

3 Hezaran selat û hezaran selam
Li ser Ehmed û şahi ‘alî meqam

4 Digel al û sehbi di wî cumle şan
Çi an û çi hîn û çi sal û zeman

5 Webe‘dû werin guh bidin hûn temam
Ji bû we beyan kim hemî xas û ‘am

6 Ku da hûn bizanin hemî serteser
Ji mi‘raca Ehmed şehi mu‘teber

7 Bi qelb û dili xû hemî guh bidin
Li mi‘raca Ehmed şehi ins û cin

8 Bi tesdîqi bawer bikin bîhenek
Ku da we xelas ke şehi çavbelek

9 Nebin tabi‘i felsefa ey bira
Bu wan re beraber nebin eşkera

10 Çukû ew bi ‘eqli xû yî bîguman
Dibîjin ku mi‘raca şahi cihan

11 Mehal e ‘eqil wî hemil naketin
Ji wî i’tiqadi re bîdewlet in

12 Evan feylesûfi xebîs û mirar
Bi ‘eqli xû yî qasir û bîmedar

13 Dibîjin çi tişti giran û seqîl
Bi hevrazî naçit bi teb‘ û delil

14 Çukû teb‘i siql û giranî ji dil
Hubûti dikîtin heta jîri gil

15 Mehal e ji bû şexsi rûyî zemîn
Bi hevrazî rabit semai metîn48

16 Cewab dane bilcumle ehli kelam
Li redda evan feylesûfi heram

17 Evan gûtini we hemî bîdelîl
Di nîv mehfela de dikin qal û qîl

18 Ne ‘eql û feraset ji bû we ebed
Ji xeyri ‘inadi bi kîn û hesed

19 Eger ne ‘inad û hesed bit li we
We nedkir di va meclisa lewlewe

20 Çukû hûn dibîjin çi eşya hebin
Bi teb‘i xû peyda ne bîsahib in

21 Ji lew hûn dibîjin seqîl û giran
Bi hevrazî naçin bi teb‘i zeman

22 ‘Eceb tişt hene bîxweyî bîmeded
Bi kufr û ‘inadi mebin dilcemed

23 Gelû hûn tedebbur di furqani dîn
Qe nakin Xuda da li rûyî zemîn

24 Xuda wehyî kir ev kelami qedîm
Ji bûna Muhemmed resûli ‘ezîm

25 Mebe dilgiran ey şehînşahi dîn
Ji van gûtini feylesûfa hemîn

26 Li wan iltifati meke ey resûl
Bi van gûtini wan meke dil melûl

27 Çukû ew bi kufr û ‘inadi heman
Dibin munkiri şahi axirzeman

28 Xuda hafizi te hetanî hebî
Ji bû min muheqqeq resûl û nebî

29 Çukû ew bi kufri dibîjin ‘eyan
Muhemmed nikare here asiman

30 Nizanin ku ev rebbi ‘erşi mezin
‘Elîm e bi ehwali insan û cin

31 Çi fikr û çi qewl û çi fi‘li di wan
Hemî eşkera ne li nik wî ‘eyan

32 Heye qudretek pur ji bû Zîlcelal
Ne jî ra hisab e ne jî ra zewal

33 Dema ew buxwaze ji ketma ‘edem
Muheyya bike şexsekî lacerem

34 Bi derhali tîtin wucûdi temîz
Ev e qudreta wî Xudayi ‘ezîz

35 Çewa ew nikarit hebîbi kerîm
Ji ‘erdi bibe ta bi ‘erşi ‘ezîm

36 Di zerfi şeqa bîst û hefti receb
Xuda wî bire ‘erşi bi keyf û tereb

37 Ji qelb û zebani xû derxin xema
Nebîjin Muhemmed bi xû çû sema

38 Ku belkî Xudayî ‘ezîz û letîf
Ji Mekkî bi şev birye Qudsa Şerîf

39 Ji Qudsi wî bir ta bi heft asiman
Li wî der xelati mezin jî re dan

40 Li ser asimana bi Sidre giha
Ji bû re dibîn Sidretu’l-Munteha

41 Ji Sidre birî ta bi ‘erşi ‘ezîm
Ev e hikmeti wî Xudayî kerîm

42 Li wî der gelek faxiri xil‘eti
Dikir hedye bû wî digel ummeti

43 Heta hate erdi bi emri Qedîr
Li me kir beyan wî beşîr û nezîr

44 Me jî jî qebûl kir bi qelb û zeban
Ev e i‘tiqada me Islamiyan

45 Çukû wî Xudayî Kerîm û ‘Elîm
Nuzûl kir ji bû me kelami qedîm

46 Kî subhan ji bû zati wacib wucûd
Qedîr û ‘Ezîz û Letîf û Wedûd

47 Muhemmed bi şev bir ji Mescidheram
Bi bal Mescidi’l- Eqsei wesselam

48 Evî sîrata pur mubarek kubar
Ji bûna Muhemmed kirî yadigar

49 Ku da ew bide dîtini ayeta
Ji bûna Muhemmed bibîn ‘ibreta

50 Çukû ew semî‘e li eqwali me
Xebîr û Besîr e li ef’ali me

51 Me anî beyan kir ji Ibn-i ‘Ebas
Ji wan razi bit xaliqi cinn û nas

52 Ewî jî riwayet ji fexri’r-rusul
Hilanî heta hatime şubhi gul

53 Ku ye‘nî hebîbi mu‘ezzem heman
Beyan kir ji çûna xû yî asiman

54 Duşenbe şeva bîst û hefti receb
Di nîv sali heşta bi keyf û tereb

55 Li nik Ummi Hanî di hicra delal
Xuda razi bit jî bi ‘izz û kemal

56 Di nîv hicrei Fatima enwerî
Xuda razi bit jî bi peyxemberî

57 Bi ‘umri xû neh sal e bî kîm û kast
Ji nav rawiya ev rivayete rast

58 Ji nagah de dî Fatime bî xeber
Yekî da işaret li fexri’l-beşer

59 Heman Fatime çû heta ber derî
Ku da ew bizan kî işaret kirî

60 Bi lez Fatime çû derî lî vekir
Heman dîti şexsek li wî muntezir

61 Ji bû ra du qanat hene bî meded
Bû wan meşriq û mexribi kirye sed

62 Li ser tacekî pur muresse‘ ji dur
Nefîstir ji her new‘ û ecnasi pur

63 Li ser aniyî La Ilahe Illallah
Nuwîsend Muhemmed resûli Ilah

64 Heman Fatime jî re gû hani han
Çi tiştî duxwazî bibîje ‘eyan

65 Digûtî eya bid‘eta tahir e
Duxwazim Muhemmed eya zahir e

66 Vegerya heta ba resûli Xuda
Li wî tev beyan kir ‘ela ma beda

67 Ku ye‘nî li ber dergehi mu‘teber
Mi dî şexsekî purr bi hewl û xeter

68 Gelek jî ditirsim eman sed eman
Mi nedye wekî wî di weqt û zeman

69 Dibîjî duxwazim Muhemmed emîn
Di vî sa‘etî da xeber pî bigîn

70 Heman zû bilez rabû fexri cihan
Heta çû giha qapiyî pur giran

71 Dema wî fetih kir deri namidar
Bi ‘izz û bi temkîn şehi namidar

72 Bi derhali Cibrîl selat û selam
Didan ser resûli şehi layenam

73 Subûhiyyû quddûsiya ba tereb
Selat û selam dan li fexri ‘Ereb

74 Dibû welwele der hetîm û meqam
Cemî’i melek dan selat û selam

75 Li ser fexri ‘alem şehi bawefa
Muhemmed resûli Xuda Mustefa

76 Bi tesbîh û tehlîl cemî‘i melek
Xû avîtine ber piya lek bi lek

77 Xuda me xelat kir bi fexri cihan
Bi teşrîfi Ehmed ku bî asiman

78 Were Ehmedi çavbelek bîriya
Temaşake der cenneti hûriya

79 Çi xulxul kete bax û qesr û sera
Ji ‘erşi ‘ezîm ta bi jîri sera

80 Wekî bulbuli ‘aşiqi zati gul
Li ser te selata didin tev ji dil

81 Kerem ke qedem deyne ser ‘erşi pak
Ji bû te cemî‘i melek derdinak

82 Diîm şeb sufûfi cemî‘i melek
Ji bû te muheyya ne ey çavbelek

83 Kerem ke were me ji qeyda derî
Tubayi‘ hemî em li te muşterî

84 Bi derhal şehi Turk û Rûm û ‘Ereb
Digû ey bira yî bişerm û edeb

85 Gelû te wehî aniye bîje min
Weya we‘d û emri Xudayî mezin

86 Kerem ke were bîje min hani han
Ku emri Xuda ez bizanim ‘eyan

87 Cewab daye Cibrîl digû ya hebîb
Ji bû derdemenda tu bûyî tebîb

88 Kerem ke tu rabe bi ‘izz û kerem
Libasi xû werke bi ser ta qedem

89 Metirse eya fexri axirzeman
Tu derxe ji qelb û dili xû xeman

90 Tu îşev dibî seyfi Rebbi Kerîm
Muheyya ji bû te çi ‘erşi ‘ezîm

91 Gelek xil‘eti faxire hazir in
Ji bû te muheyya ne tev zahir in

92 Muheqqeq di vî leyleya muhterem
Dibînî cemala Xuda lacerem

93 Dema wî bihîstî kelami melek
Ji hindav de rabû bi şahî gelek

94 Li xû werkirin wî libasi nezîf
Bi derket heta çû bi sehra şerîf

95 Heman dî Buraqek bi husn û cemal
Serefsar di dest Cibreîli delal

96 Dikîşe bi bal efxeri neh felek
Li pî wî sufûfi cemî‘i melek

97 Bi hay û bi hî ne bi tesbîh û deng
Bi ah û fîxan in luxet rengereng

98 Mi dî ev Buraq wek dewabbi cihan
Wuha pî xeber da şehi ins û can

99 Ji bexli biçûktir ji ker mestir e
Welî dabbekî pur bi keşf û sir e

100 Wekî wechi insan e ew bîhewes
Welîkîn cesed her wekî î feres

101 Evî dabbei kes bi zîv û bi zer
Nikarit ku bigrit eva mu‘teber

102 Ji yaqût û cewher bujû wî hene
Ji zimrûdi kesk her du guh zîde ne

103 Du çeşmi di şehla wekî kewkeba
Ji bû ra hene her wekî xebxeba

104 Belek pur sipî ew ji nûra zelal
Ev e sen‘eti Baqi yû Zulcelal

105 Ji her çar nigayek kumeyt e yeqîn
Evî dî sipî ne çû durri semîn

106 Li ser yek cilek pur muresse‘ ji dur
Ji yaqût û elmas û ecnasi pur

107 Kesek qet nikarit wesif ket ebed
Evî dabbei xeyri Zati Ehed

108 Bi husn û melahet bi wesfi kubar
Kesî qet nedîtî wekî wî tu car

109 Ji lew wî şehinşahi ‘erşi ‘ezîm
Muheyya kirî bû resûli kerîm

110 Heman Cibreîlî digû el-eman
Xû avîtî ser payî fexri cihan

111 Mi hîvî heye rûzi heşr û qiyam
Mi derxî ji wî wertei wesselam

112 Çukû ez ditirsim ji hewl û xeter
Xuda min duxûl ke di nari seqer

113 Ricai dikim her dem û sa‘eti
Mi ‘ed kî ji efradi vî ummeti

114 Ji Cibrîlî gûtî şehi ins û can
Metirse ji vî heybeti hîn û an

115 Eger ew Xuda yî bi ‘izz û kemal
Şefa‘et bide desti min ey delal

116 Ji nîv ehli heşri heçî mu’minîn
Şefa‘et bikim wan mebe dilhezîn

117 Xulase evî Cibreîli wefî
Digûte Muhemmed resûli sefî

118 Kerem ke were zû suwar be delal
Li ser vî Buraqi bi ‘izz û kemal

119 Xuda te duxwaze di ev nîmi şeb
Bi ‘izz û delalî bi keyf û tereb

120 Herî xelwexana şehi lamekan
Bi keyf û sefa ey şehi ins û can

121 Ne kesk û ne zerd e ne sûr û sipî
Ne şîn û ne reş lamekan ey nebî

122 Ne sal û ne mah e ne în û ne sebt
Ne lehd û duşenb e ne sebt û ne rebt

123 Ne sîşenbe û çarşeb e bîguman
Ne pîşembe ye lew dibîn lamekan

124 Me anî Buraqek eya şehriyar
Ji bû te muheyya ku lî bî suwar

125 Kerem ke Buraq hazir e bîhenek
Ji bû te bi sef sef cemî‘i melek

126 Bi ah û fixan seffi quddûsiyan
Bi tesbîh û tehlîli sibbûhiyan

127 Ji vir ta sema kursi yû ‘erş û ban
Sedai melek çû heta lamekân

128 Sufûfi cemî‘i melek hazir in
Li husn û cemala te tev nazir in

129 Kerem ke suwar be bi ‘izz û bi naz
Ku da em bi te pur bibin serfiraz

130 Resûli Xuda çû bi teşrîfi pak
Hilanî qedem wî ji ser rûyi xak

131 Ku deyne li ser dabbeya pur semîn
Xû dûr kir Buraqi ji şahi emîn

132 Diket re’şeti ev Buraq pur gelek
Wekî re’şeta masiyî der şebek

133 Nida daye Cibrîli gûtî heya
Bisekne eya dabbeya bîheya

134 Xû deyne ji bû seyyidi cumle xelq
Bizanî ev e ew hebîbi bi heq

135 Fewellahi wek wî li nik zîlcelal
Çû nîne bi qedr û bi ‘izz û kemal

136 Buraqi cewab da ji bû Cibreîl
Li min bû suwar Adem û hem Xelîl

137 Eger çi bi zahir dikim nefreti
Ku da ew ji bû min biket diqqeti

138 Di rûzi qiyamet suwar be li min
Şefa‘et biket mu’mini ins û cin

139 Wegerna çi hedd e ji bû min bedî
Ku nefret bikim ez ji bû Ehmedî

140 Çukû pir ji wî hesdikim ez bi dil
Wekî bulbuli ‘aşiqi zati gul

141 Dikim intizari bi keyf û tereb
Ji bû xatiri bîst û hefti receb

142 Eva sed hezar sal e bûrî li min
Mi ‘ehd e bibînim şehi ins û cin

143 Li min ew suwar be di rûzi qiyam
Şefa‘et biket mu’mina xas û ‘am

144 Kerem ke were ey şehinşahi dîn
Suwar be li min ta biçîn ecme‘în

145 Eger çi bi zahir me kir ev qusûr
Li min negre ey şahi sade ji nûr

146 Çukû ‘aşiq im ‘aşiqan nîne qet
Ne ‘eql û xired zahiri wan xelet

147 Li min negre ey rakibi heft tebeq
Hebîbi Xuda seyyidi cumle xelq

148 Eger çi mi ev qa dirîj kir meqal
Neî ber dili padişahî melal

149 Di rûzi qiyamet meqami kerîm
Mi daxil bikî defteri ey helîm

150 Ku da zîde bit hinde fexri li min
Di yewmi’l-qiyamet bibit zuxri min

151 Dema gûşi kir şahi Beytu’l-heram
Ji vî dabbeî ev hedîs û kelam

152 Qebûl kir ji wî ev meqali temîz
Bi şefqet bi rehmet nebiyyî ‘ezîz

153 Mi navi te daxil kirî nameî
Ezî te xelas kim ji wî werteî

154 Metirse eya dabbeya şubhi gul
Ji qelbi xû derxe hemî derd û kul

155 Eger ew Xudayî ‘Ezîm û Metîn
Şefa‘et bide min ji bû muznibîn

156 Mi ‘ehd e ezî te şefa‘et bikim
Ji hewla qiyami te derbazi kim

157 Kerem ke were em biçîn bî dereng
Eya dabbeya pur bihusn û bireng

158 Kerem ke were em biçîn zû bi şev
Ku da emr û nehyî Xuda paşnekev

159 Dema emri kir wî bi ‘izz û kemal
Li vî dabbeya pur bi husn û cemal

160 Ku da lî suwar bit bi ‘izz û kerem
Resûli Xuda şahi Beyt û Herem

161 Buraqi ‘ecel kir bi lutf û weqar
Ku da eşrefi ‘alemi bit suwar

162 Dema hate ber payî şahi Huda
Qedem da rikîbi hebîbi Xuda

163 Dema bû suwar ev şehi neh felek
Seda dan cemî‘i sufûfi melek

164 Sedayî evan cumle quddûsiyan
Bela bû di behr û di çûl û çiya(n)

165 Selat û selam dan li fexri cihan
Seda çû giha ta bi heft asiman

166 Bi teyran Buraq çû ji rûyî zemîn
Suwar e li ser seyyidi’l-murselîn

167 Hinek çûn heman Cibreîli kir nida
Kerem ke peya be li vir Ehmeda

168 Du rek‘et limîj ke li vir ey nebî
Bera rûhi Cibrîl fidai te bî

169 Heman ew resûli bi ‘izz û weqar
Peya bû ‘ecel kir bi lez hate xwar

170 Li wî der du rek‘et limîj kir hema
Bi teyran bi jûr ket li cewwi sema

171 Ji Cibrîl sual kir çira emri kir
Heta min du rek‘et limîj kir li vir

172 Cewab da ji bûna hebîbi heqîq
Ev e î musemma bi Wadi’l-‘Eqîq

173 Hinek çû li cewwi sema û zemîn
Dihatî sedayek ji ali yemîn

174 Kî qifya Muhemmed ji bû min hinek
Heta ez beyan kim li te yek bi yek

175 Ji bû te ji bû ummeta te yeqîn
Gelek ez nesîhetger im ey emîn

176 Ebed guh nekir min li wî iltifat
Bi fezla Xudayî cemîli’s-sifat

177 Hinek dî diçûn em li cewwi sema
Li ali şimali seda tî hema

178 Dibîjî bisekne eya şehriyar
Digel te xeber dim kelami kubar

179 Çukû ez nesîhet li tew ummeti
Dikim her mudamen dikim diqqeti

180 Tu hindek bisekne ji bû min emîn
Gelek menfi‘et tî bibînî hemîn

181 Gelek ez ji te hesdikim bîguman
Bisekne heta bîme ba te eman

182 Mi gûh lî nedî ra bi fezla Xuda
Bi yumna Xudî ez ji wî bûm cuda

183 Li dû em ji wî çûn gelek daire
Ji nagah mi dî yek jinek naşire

184 Muzeyyen mukellel bi durri semîn
Bi husni cemali wekî yasemîn

185 Nida kir li min ey şehi ins û can
Ji bû te li vir mame sal û zeman

186 Ricai dikim ez ji te bî qeder
Tu derxî ji qelb û dilî min keder

187 Biseknî heta ez beyan kim li te
Evan gûtini xû dişiwrim bi te

188 Ji tew ummeta te gelek hesdikim
Biseknî ricai gelek ez dikim

189 Mi guh lî nekir ez duçûm hani han
Bi fezla Xudî rebbi kewn û mekan

190 Bi pîşv ku çûn em ji wî bî qeder
Bihîstî mi dengek bi hewl û xeter

191 Gelek jî ditirsim bi tirsek mezin
Ne min jî sual kir ne kes gûte min

192 Ji wî em bilez çûn bi emri letîf
Ji nagah duxûl bûn bi Qudsa Şerîf

193 Mi dî hate pîş xurtekî pur delal
Wekî wî min nedye bi husn û cemal

194 Bi terz û edeb hem bi husni siyab
Bi misk û ‘ebîr e hemî ev şebab

195 Çi weqta mi dî hate ba min delal
Selam da li ser min bi ‘izz û kemal

196 Mi jî dest hilanî li wî dîlberî
Ji ber min xefî bû wekî xeyberî

197 Dema ew nihan bû mi gû Cibreîl
Gelû ew çi deng bûn bibî biddelil

198 Li min dan nidai hemî yek bi yek
Ji qelbi mi derxe hemî reyb û şek

199 Gelek mame heyrî nidai ewan
Ji bû min beyan ke yekayek ‘eyan

200 Cewab daye Cibrîl ji bû şehriyar
Nida a ewwel cumle da‘î’n- nesar

201 Eger te cewab da ji bû wî bizan
Li pey te heçî ummeta te heman

202 Dibûne Nesare hemî serteser
Tu hilde ji min qewlekî mu‘teber

203 Welî î ku gazî dikir der ‘eqeb
Nidaa Yehûdi bi kîn û xezeb

204 Eger te bisekna ji bûna Yehûd
Heçî ummeta te dibûne Cuhûd

205 Yeqîn ke ji min pend û we‘zi delal
Xû bispîre emri şehi layezal

206 Tu hemd û sena ke ji bû girdigar
Ku ew ummeta te xelas ke ji nar

207 Welî ew jina pur bi cil yû xişir
Te baş kir li wî iltifati nekir

208 Bizane ku dunya bû ew nazenîn
Heçî tabi‘i xû dike muznibîn

209 Eger te xeber da bi wî ra ‘eyan
Bizan ummeta te di axirzeman

210 Dibûn tabi‘i sahira pîr û kal
Di zenb û guna de dibûn kerr û lal

211 Gelek tu şukur ke bi şukri kubar
Xuda te xelas kir ji pîra xedar

212 Welî seyheta pur weqûr û giran
Dema te bihîstî li cewwi ‘eyan

213 Kevirki giran bû bi hewl û xeter
Di vî sa‘etî da gihîşte seqer

214 Ji pansed sene ev kevir tîte xwar
Nuha der cehîmi di girtî qerar

215 Li dû min digûte exi Cibreîl
Ji min re beyan ke tu şabi cemîl

216 Dema hate ba min selam kir li min
Mikir jî sual kim xefî bû li min

217 Cewab daye Cibrîl ‘eleyhisselam
Bi lutf û kemal û bi sed ihtiram

218 Ev e dîni Islami ey şahi dîn
Ji bû vî şebabî mebe dilhezîn

219 Beşaret li te her dem û sa‘eti
Ku wî ummeta te biçit cenneti

220 Çukû hate ba te bi sidq û sefa
Te hembîzî kir wî eya Mustefa

221 ‘Elamet di vir de heye ey emîn
Ku wî ummeta te bibin mu’minîn

222 Li dû Cibreîl çû heta mescidi
E jî bûme tabi‘ li vî meqsedi

223 Heman Cibreîl zû vegerya ‘ecel
Li ser desti wî sî qedehya ewel

224 Leben bû bi te‘mi wekî hingivîn
Wekî wî mi nedye li rûyî zemîn

225 Wekî ev leben kes nedîtî ebed
Bi te‘m û bi lezzet bi muhr û sened

226 Duwem xemre tî de siyem abi pak
Bi lutf û kerem anî ser rûyî xak

227 Heman Cibreîli dikir pur fereh
Hilîne ji van her siya yek qedeh

228 Bi fezla Xudî min hilanî ‘elen
Ji van her sî eqdahi safî leben

229 Mi hindek ji wî xwar û hindek dima
Mi da desti Cibrîl qedeh zû hema

230 Ji bû min re gû Cibreîli kubar
“Esebte esebte” eya şehriyar

231 Eger te bigirta xemir ey emîn
Di pey te ummet tev dibûn muznibîn

232 Eger te ku ev av bigirta temam
Evî ummeta te hemî xas û ‘am

233 Dibûn xerqi ma’ puştî te ew heman
Sebeb zenb û ‘isyan di axirzeman

234 Eger te buxwara temami leben
Dibin camei da nehîla ‘elen

235 Butûn ummeta te di rûzi qiyam
Xuda wî efû wan bikirna temam

236 Heman min digûtî bi cezl û fereh
‘Ecel ke tu bîne ji bû min qedeh

237 Ricai dikim ez ji te ey exî
Tu cami vegîrî ji bû min sexî

238 Ku da ez vexûm her çî der camei
Nehîlim di bin da yekî cur‘ei

239 Ku belkî Xuda wan ‘efû ke temam
Bibe cenneti wan hemî xas û ‘am

240 Cewab da ki gû ya Muhemmed emîn
Muheqqeq tu yî rehmeta ‘alemîn

241 Çi rehmet Xuda date ey şehsuwar
Bi vî rehmeti wan derînî ji nar

242 Welakinne heyhate ya Ehmeda
Wuha hate giran bi emri Xuda

243 Mi gûtî muheqqeq temami umûr
Di lewhi mezin da hemî bûn sutûr

244 Çi tişti hene wî Xudayî ‘Ezîz
Newîsende kirye di lewhi temîz

245 Kerem ke were em biçîn meqsedi
Heta em bigîn xelwexana Xudi

246 Heman Cibreîlî ‘eleyhisselam
Mi bir Mescidi’l-Eqsei bittemam

247 Ji wî der heta sexrei pur temîz
Nuzûl bûye mi‘rac bi emrî ‘ezîz

248 Ji wî sexreî ta ‘inani sema
Li wî hate danîn di lehzi hema

249 Ji mi‘raci ehsen mi nedye tu car
Çi tiştek muzeyyen wekî wî kubar

250 Ji zîv û ji zîr û ji mas û guher
Zuberced ji yaqûti ehmer li ser

251 Heman Cibreîlî mi himbîzi kir
Di nîv her du burhi mi teqbîli kir

252 Digûtî Muhemmed qedem deyne ser
Tu derxe ji qelb û dilî xû keder

253 Ez û tu bi hevra biçîne sema
Mekîşe ji vî meqsedi qet xema

254 Xuda te duxwaze eya şahi dîn
Xelatek mezin wî bide te yeqîn

255 Dema min li mi‘raci girtî nezer
Hema min hilanî qedem da li ser

256 Dibû welwele nîvi quddûsiya
Dihatin melek her wekî îlçiya

257 Sufûfi melaik hemî lek bi lek
Li dûr fexri ‘alem digirtin xelek

258 Ne hedd û hisab e ji bû wan ebed
Kesek qet nizane ji xeyrî ehed

259 Mi dîtî nucûmi semai zemîn
Mu‘elleq dibin da wekî dûrebîn

260 Biçûki ji wan wek çiyayi ‘ezîm
Hemî sen‘eti zati Rebbi Kerîm

261 Bi esre‘ ji yek turfe çûn asiman
Wekî berqi xatif heman pî gihan

262 Ji erdi hetanî sema bittemam
Mesafe bi pîsed sene ew meqam

263 Wekî wî bi qalindiyî ev sema
Resûli kerîm pî xeber da hema

264 Dihat ber derî Cibreîl hani han
Digûtî vekin qapiyî pur giran

265 Cewab da ki ye vî şeva pur surûr
Li me asiman kirye sade ji nûr

266 Cewab da ez im Cibreîli emîn
Fetih kin derî el-‘ecel hûn yeqîn

267 Bi min ra Muhemmed resûli ‘ezîz
‘Ecel kin fetih kin derî pur temîz

268 Hemî wan bi hevra digû merheba
Xuda me bide cahi ehli ‘eba

269 Selat û selaman dixwûndin gelek
Temamen li ser Ehmedi çavbelek

270 Dibû hay û hû ser semai zemîn
Seffi xû girîdan hemî ecme‘în

271 Hemî hatine ber piya yek bi yek
Bi rû mali xaki piya ew melek

272 Me hîvî heye ey hebîbi Xuda
Ji nîv ummeta xû nekî me cüda

273 Dema em bi hevra diçûn asiman
Mi dî ev sema cumlei wî duxan

274 Musemma bi ismi refî‘ e metîn
Ev e î dibîjin semai zemîn

275 Li ser vî semai mi dîtin gelek
Bi tesbîh û tehlîl sufûfi melek

276 Hinek jî rukû‘in hinek sacidîn
Bi tirs û bi heybet hemî ecme‘în

277 Mi dîtin du nehri mezin serteser
Bi hay û hû ne hemî bî mefer

278 Mi pirsî ji Cibrîl ey bawefa
Çi nehr in diçin tîn bi keyf û sefa

279 Cewab daye Cibrîl ‘eleyhisselam
Ev in î dibîn jî re Nîl û Ferat

280 Bizan me‘dena wan ji nîv cenneti
Bi te‘m û lezîz in wekî şerbeti

281 Mi dî nehrekî dî gelek mu‘teber
Li ser wî hebû qesrekî zîv û zer

282 Muzeyyen muneqqeş bi durri yetîm
Bi misk û ‘ebîr e çi sun‘i qedîm

283 Mi gûtî gelû ev çi qesrek temîz
Xuda çîkirî bû merivkî ‘ezîz

284 Beyan ke li min qasidî girdigar
Bibîje ji bû min çi qesr e kubar

285 Cewab daye Cibrîl cewabek hesen
Ev e nehri kewser ji bû te ‘elen

286 Ji bû te beşaret didim ey cemîl
Di rûzî qiyamet dibî tu delîl

287 Ji bû ummeta ‘asiyû bî medar
Heta bîn qe çûn ew ji hewzi kubar

288 Mi hemd û sena kir ji bû zîlcelal
Çi ni‘met bi min da bi ‘izz û kemal

289 Bi fezl û kerem xaliqi ins û can
Ji kenza ‘edem me deranî heman

290 Ku da em bizanin Xudayî metîn
Me anî wucûdi hemî ecme‘în

291 Li me lazim û wacib e bîhenek
Di xelqiyyetî da nakin reyb û şek

292 Mutî‘ bin ji wî ra çewa emrî kir
Ji heddi xû derva neçin em li vir

293 Ku belkî Xudayî kerîmû’l-fi‘al
Me ‘ef ke bu wî qudreta layezal

294 Çukû qudreta wî pir e bî‘eded
Ne jî ra hisab e ne jî ra meded

295 Nihayet resûli kerîm serfiraz
Li wî yek melek dî bi ‘izz û bi naz

296 Suwar e li hespek ji nûra zelal
Wekî wî mi nedye bi ‘izz û kemal

297 Libasi melek cumle nûr e yeqîn
Bi şu‘le diîse wekî xatifîn

298 Reîs e li hefti hezaran melek
Cemî‘en suwar in li hespi belek

299 Bi dest her yekî herbekî nûri saf
Cunûdi Xudî ne hemî bîxilaf

300 Eger yek bi ‘isyani taxî bibit
Li ser rûyi erzi ji hed derkevit

301 Nida tî ji nik Xaliqi girdigar
Ji bû van cunûdi li hespa suwar

302 Bizanin xezeb kir Xuda ser fulan
Hemî hûşiyar bin li wî hani han

303 Dema wî nidai hilînin melek
Li wî şexsi tîne xezeb yek bi yek

304 Welî ger rucû‘ be evî bîmefer
Xuda wî xelas ke ji hewl û xeter

305 Li dû tî nidaek ‘ezîz û delal
Ji wî şexsi razî bûye Zulcelal

306 Heman ew melaik bi hev ra temam
Ji wî şexsi razî dibin wesselam

307 Ji Cibrîl pursî resûli kerîm
Ki ye ev melek bîje min ey helîm

308 Çukû ev melek zîde pur heybet e
Bibîje ji bû min gelek hesret e

309 Cewab da ji bû wî ev e Isma‘îl
Ev e xazini vî semai esîl

310 Bi leq ve herre hem bike lî selam
Bi lutf û kerem hem bike ihtiram

311 Bi leq wî ve çûm hem selam lî dikir
Cewab da li min hem himbîzî kir

312 Digûtî beşaret li te ey nebî
Bira rûh û can im fidayî te bî

313 Di rûzi qiyamet tu yî serfiraz
Di nîv ‘alemî da wekî şahibaz

314 Çi xeyr û se‘adet heye der cihan
Hemî şamili şahi axirzeman

315 Bizan ummeta şah û fexri ‘Ereb
Di rûzi qiyamet bi keyf û tereb

316 Mi hemd û sena û şukur kir gelek
Ji bû xaliqi ins û cinn û melek

317 Hinek dî diçûm pîş de çendî qedem
Çi şexsek mi dî ew şubhi ‘elem

318 Hinek berf e hindek ji wî agir e
Welîkin eva şexsa pur zakir e

319 Ne berf agirî wî tefîne ji wî
Ne agir helîne evî berfî wî

320 Bizane ji bû wî hezar ser hene
Di her ser de milyûn wecih tî hene

321 Di her wechi milyûneke ez zeban
Bi tesbîhi wî xaliqi ins û can

322 Dibîjit kî Subhan ji bû wî gelek
Ku çîkir ji berf û ji agir melek

323 Du‘a wî ev e her dem û sa‘eti
Di nav ehli îman bikî ulfeti

324 Sufûfi melaik hemî bittemam
Kî “amîn” dibîjin hemî xas û ‘am

325 Hema min digûte exi Cibreîl
Bibîje çi şexs e eva biddelîl

326 Wekî wî mi nedye bi vî hey’eti
Ji bû wî gelek ez dikim hesreti

327 Ji bû min bibîje li min ke beyan
Ku da ez vî şexsi binasim ‘eyan

328 Cewab da ji bû min cewabek temîz
Digûtî eya ey resûli ‘ezîz

329 Ev e î ku her heft tebeq asiman
Di ber mehyeta wî di ev qa zeman

330 Wekî wî di nîv hinde quddûsiya
Çu nîne bi rehm û bi şefqet heya

331 Eva pur nesîhet çi ye der felek
Wekî wî çu nîne ji qismi melek

332 Nexasim ji bû ademîna temam
Ji rûja Xudî çîkirî wesselam

333 Mi pir hesdikir jî re gû merheba
Diîse ji wî nûr wekî kewkeba

334 Li dû qudsiya sef girîdan temam
Li dû ra Muhemmed ‘eleyhisselam

335 Fixan û sedai evan qudsiyan
Selat û selam in li fexri cihan

336 Resûli kerîm bû imami melek
Du rek‘et limîj kir li sethi felek

337 Limîj kir du rek‘et resûli celîl
Li ser milleti Ibrahîmi Xelîl

338 Bi terz û liyaqet bi husn û edeb
Du rek‘et limîj şah û fexri ‘Ereb

339 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

## Mebhesû irtiqai'n-nebiyyi (s.'e.w.) ile's-semai's-saniye[78]
## (Ev beş 192 malik e

340 Were ey Nuceyli bi kerb û keder
Beyan ke ji seyra şehi mu'teber

341 Ji ewwel ve lî ke selat û selam
Digel al û sehba bi sidqî temam

342 Ne bîhiş be ey Necli jar û hezîn
Şiyar be li seyra şehinşahi dîn

343 Nekû can giran bî di vî sîreti
Hilîne ji vî sîreti 'ibreti

344 Beyan ke ti vî sîreta Mustefa
Bi rûh û bi can û bi sidq û sefa

345 Ku belkî şehinşahi Beytilheram
Li ser wî hezaran selat û selam

346 Bibit rehberî te di yewmi'l-ceza
Nehîle li wî qet bibînî eza

347 Xû bavîje dergahi 'alî cenab
Ricai gelek jî bike subh û şam

348 Bibîje eya şah û fexra 'Ereb
Xuda emri kir bîst û hefti receb

349 Bi teşrîf ji Mekkî te bir asiman
Ji wî der heta xelweta lamekan

350 Xelati mezin hedye kir Zulcelal
Te dîsa vegîra bi 'izz û kemal

351 Mi hîvî rica ez şehi ummeti
Mi mehrûm nedî rî ji vî dewleti

352 Çukû kelbek im kelbekî pur neçar
Ji zenb û ji 'isyaniyî bîqerar

353 Nikarim xeber dim ji bîemriya
Ji qewl û ji fi'li xû yî bîheya

354 Mi defter tijî kir ji qîl û ji qal
Ji vî rûsiyahî zebani milal

355 Meded xwahi ber asitani resûl
Ez im min nehîlî di vir da melûl

356 Gelû wî çi ye ger tu vî mucrimi
Şefa'et bikî wî ji curman hemî

357 Wegerna li vir mam bi halek xerab
Di nari cehennem bibim teng û tar

358 Çukû rehmeta seyyidi'l-murselîn
Wekî xîme digre li ser muznibîn

359 E jî yek gunehkarî vî ummeti
Qe mehrûm nemînim ji vî dewleti

360 Were Necli Ewhed were bîedeb
Xû bavîje dergahi şahi 'Ereb

361 Gelû ev çi laf in dikin qal û qîl
Ji van qal û qîlan re nîne delîl

---

78 "Behsa bilindbûna Nebî (s.'e.w.) a ber bi 'esmanê duyemîn ve"

362 Were rû bimale li xaki qedem
Ji van laf û bîemriyan lacerem

363 Ku belkî bibûre ji te şahi dîn
Nizanî ew e şafi‘i muznibîn

364 Were sewqi ke sîreta Mustefa
Suwari li refref şehi bawefa

365 Dema çû semai yekî şahi dîn
Xû avîtine ber piya ecme‘în

366 Li wî dan selat û selami kubar
Bi naz û bi ‘izz û gelek iftixar

367 Li hev dane mizgîn bi keyf û tereb
Li me seyf û mihvan e şahi ‘Ereb

368 Dibû welwele dengi quddûsiyan
Bi sef sef xû avîtine ber piya(n)

369 Tijî bû semai yekem serteser
Ji behsa şehinşahi ins û beşer

370 Subûhiyyû quddûsiya sef bi sef
Xû avîtine ber piya her teref

371 Rica me heye her dem û sa‘eti
Bi lutfi me‘ed kî ji vî ummeti

372 Ricaxwaz û milxwari babi te ne
Me hilde mehîle ji me yek tene

373 Cewab da ji bû wan Muhemmed resûl
Muheqqeq rica we li nik min qebûl

374 Eger ew Xudayî ‘ezîm û metîn
Şefa‘et bide min ji bû muznibîn

375 Ezî we hisab kim ji vî ummeti
We mehrûm nakin ji vî dewleti

376 Heman Cibreîl gû eya şehriyar
Kerem ke were em biçîn zû bi xar

377 Me qesd e biçîn xelweta lamekan
Kerem ke dereng e eman sed eman

378 Nida hatî nik hezreta girdigar
‘Ecel kin hebîbi mi bînin bi xar

379 ‘Ecel kin bi ‘izz û kemal û edeb
Resûli mini şahi ‘alî’n-neseb

380 Bira bîte xelwe şehi layezal
Bi lutf û bi ikram û ‘izz û kemal

381 Nida daye Cibrîl li seffi melek
Xû hazir bikin bû şehi çavbelek

382 Hemî hûn bi hev ra selat û selam
Bixûnin li ser şahi Beytilheram

383 Çi qasî melaik hebûn an zeman
Selat û selam dan li şahi cihan

384 Selamlix vegirtin ji bû şahi dîn
Bi hev ra seda dan hemî ecme‘în

385 Xuda çi xelatek mezin daye me
Bi teşrîfi ta ha xelat bû li me

386 Bi keyf û bi şahî ji ser asiman
Berî xû didan xelweta lamekan

387 Li cewwi sema cumlei qudsiya
Bi sef sef xû avîtine ber piya

388 Hemî jî ricai dikin wî demi
Çukû tu şefî‘i li vî ‘alemi

389 Me hîvî heye me şefa‘et bikey
Di rûjî qiyame me derbazi key

390 Gelek em ditirsin bi tirsek mezin
Di nari cehennem de waqi‘ bibin

391 Eger ne ji yumna şehi ins û can
Dimînin di nari seqer sed zeman

392 Welî em ji te nabitin bîumîd
Nehîlî bibînin ‘ezabi şedîd

393 Hetanî nuha em ji qismi melek
Ditirsan ji nari cehîmi gelek

394 Dema ku bi teşrîf şehinşahi dîn
Qedem wî hilanî ji rûyî zemîn

395 Bi ‘izz û kemal hate ser asiman
Berî xû dide xelweta lamekan

396 Me zanî bi îman ku ceddi’l-Hesen
Ew î me xelas ke ji agir ‘elen

397 Gelek hîvî em dikin bîqerar
Di rûzî qiyame xelas kî ji nar

398 Me ‘ed kî li me pur bikî minneti
Me daxil bikî deftera ummeti

399 Nihayet resûli kiram ev xeber
Emir kir bi qewli xû yî mu‘teber

400 Dema em diçûn ber derî asiman
Bi zikr û bi tesbîhi quddûsiyan

401 Bi leztir ji çavgirtini bîhenek
Emanet di vir da nekin reyb û şek

402 Bilind û bi qalindiyî tev ji dil
Muheqqeq wekî asimani ewil

403 Dema hatine ber derî hani han
Heman Cibreîl gazî kir dergevan

404 Veke dergehi asiman ey melek
Seda Cibreîl çû heta neh felek

405 Heman wan bi hev ra dikir pur ‘eceb
Digûtin ki ye ev di ev nîm şeb

406 Dike gaziyî ew li ser dergevan
Dibîje veke qapiyî pur giran

407 Bi hev ra digûtin ji bû tariqi
Bibîje tu ki ye eger sadiqi

408 We illa di ev bîst û hefti receb
Qe nabe bi xeyr şahi Turk û ‘Ereb

409 Cewab daye Cibrîl ji bûna mucîb
Ez im Cibreîl û bi min ra Hebîb

410 Ku ye‘nî Muhemmed şehi ins û can
Duxwaze here xelweta lamekan

411 ‘Ecel ke veke dergehi nazenîn
Ji bû şafi‘i ummeta muznibîn

412 Seda dan bi hev ra bi keyf û tereb
Beşaret didan hev bi şahi ‘Ereb

413 Bi tesbîh û zemzem dihatin melek
Ji bû dîtina murşidi çavbelek

414 Dema wan fetih kir derî dûredûr
Xû avîtine ber piyî sade nûr

415 Gelek em ricai dikin ey resûl
Rica me li ba xû tu bigrî qebûl

416 Rica me ev e her dem û sa‘eti
Me‘ed kî li ba xû ji vî ummeti

417 Resûli Xuda ‘ehdi kir bû melek
Li vî ‘ehdi qet jî meke reyb û şek

418 Çukû der cihani Xuda emri kir
Te razî bikim dil meke munkedir

419 Muxeyyer qe nabit kelami Xuda
Ji vî gûtina xû qe nabit cuda

420 Mi jî ‘ehd e rûzî qiyam û heşir
We derbazî kim dil mekin munkedir

421 Izin ger bidit ew Xudayî metîn
Şefa‘et bikim bû kesî muznibîn

422 Metirsin ji vî ‘ehdî insan û cin
Çi qismi melek bit ji ‘ehda mezin

423 Nihayet dema çûn semai mecîd
Mi dîtî sema cumlei wî hedîd

424 Ne wesl e di vî da ne fesl e yeqîn
Wuhayî emir kir Xudayî metîn

425 Dibîn jî re ma‘ûn di sal û zeman
‘Inadi meke her wuha tu bizan

426 Mi dîtin melaik suwar in hema
Li hespi belek tev bi şûr û rima

427 Mi pirsî ji Cibrîl bi vî hîreti
Temamen wekî ‘eskerî nesreti

428 Bibîje ji bû min exi Cibreîl
Eger u dizanî bibî biddelîl

429 Cewab da digû ya Muhemmed emîn
Muheyya ne bû nesreta mu’minîn

430 Dema muşrik û kafiri dînbetal
Bi Islami ra pur bikin qîl û qal

431 Ze‘îf bin li ber wan heçî mu’minîn
Nikarin qitali bikin în çunîn

432 Xuda wî emir ke li van qudsiya
Herin hûn qetil kin ewan taxiya

433 Bi derhal ewî bîn li rûyî zemîn
Xusûsa ji bû nesreta mu’minîn

434 Ew î muşrikîna qetil kin temam
Yeqîn tu bizane ev e wesselam

435 Li dû min didîtî du xurti delal
Bi şikl û bi sîma wekî hev cemal

436 Gelek min ji wan hesdikir bîqeder
Wekî wan mi nedye ji qismi beşer

437 Bi husn û cemal in şebabi ‘ezîz
Li wan qat bi qat in libasi temîz

438 Mi pirsî ji Cibrîl bi ‘izz û kemal
Çi xurt in dibînin bi husn û cemal

439 Bibîje ji bû min exî hani han
Beyan ke li min van tu xurti cuwan

440 Cewab da ji bû min bi ‘izz û bi naz
Tu guh de li min ey şehi serfiraz

441 Yekî jî ye Yehya bizane hema
Yekî dî bizan ‘Îseyî Meryema

442 Li wan bin selami Xudayî celîl
Bi ‘izz û kemal û bi qedri cemîl

443 Here nîzî wan û selam ke li wan
Bi keyf û fereh wan bibîne heman

444 Çukû ew ji te hesdikin ey nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

445 Bi lez çûme nik wan bi ‘izz û kiram
Bi keyf û fereh min li wan kir selam

446 Vegirtin selami qewî mu‘teber
Li ser min bi şahî hemî serteser

447 Dema min ku ‘Îsa didî an zeman
Bi husn û cemal e gelek ew cuwan

448 Midîtî sipî sûrekî esmerî
Bi qedd û bi qamet ewî enwerî

449 Mi kîfa xû anî ji wî hesdikir
Mi nav her du burhi wî teqbîli kir

450 Mi jî re digû ‘Îseî Meryema
Tu yî î ji erdi diçûye sema

451 Ne‘em gûtî bû şahi ‘alî ‘elem
Ez im ‘Îseî Meryema lacerem

452 Zemani Xuda min dida der cihan
Bi kaf û bi nûni dibûm an zeman

453 Bi buhtan xeber dan ji bû min gelek
Di xelqiyyeti da kirin reyb û şek

454 Digûtin çewa çîdibit ev weled
Me nedye wekî vî bi muhr û sened

455 Di ‘urfa cemî‘i cihani temam
Me nedye wekî vî hemî wesselam

456 Gelû kes bi bî baviyî tî wucûd
Me nedye qe nabit bi keşf û şuhûd

457 Bi buhtaniyî gûtine Meryema
Te ev kur ji kû anî bîje hema

458 Ne bavî te pîs ne diya te xerab
Ji kî der te anî bide me cewab

459 Cewaba evî Meryema pur delal
Ji bû ehli kufr û fesad û delal

460 Işaret kirî wî li alî di min
Ku da ez cewabi bidim mîr û jin

461 Cewab dan ji bû Meryema pur feqîr
Çewa em xeber din bi tifli sexîr

462 Tu tişta dibîjî kesî ew nedî
Ji ber gûtini te dikin em fedî

463 Ji wan re mi gû gûtinek bîmisal
Ez im ‘ebdi wî Xaliqi layezal

464 Nebî me Xuda daye min yek kitab
Ji bû min li Meryem nekin hûn ‘itab

465 Ne tiştek ‘ecîb e ji bû Zîlcelal
Wekî min ku bîne wucûdi bi qal

466 Çukû mes’ela min wekî Adem e
Ji axi Xuda çîkirî în he me

467 Çewa jî re gûtî bibe an zeman
Bi derhal seffi Xuda bû heman

468 Welîkin ricai dikim bîqeder
Mi pir kir li ber te kelam û xeber

469 Mi hîvî heye ji Qasim û Ibrehîm
Ji ber van kelama nebî dilseqîm

470 Eger çi mi zîde xeber da yeqîn
Di vî mehzera şafi‘i muznibîn

471 Li min negrî ey seyyidi bawefa
Gelek min dirîj kir eya Mustefa

472 Ricai dikim ez resûli kerîm
Nebînim di heşri ‘ezabi elîm

473 Mi daxil bike deftera ummeti
Ku belkî bi hev ra biçîn cenneti

474 Dema dî resûli Xudayî metîn
Ji ‘Îsa evan gûtini pur şîrîn

475 Qebûl kir li ba xû hemî mu‘teber
Digûtî metirse ji hewl û xeter

476 Bi izna Xudî te şefa‘et bikim
Ezî te ji vî ummeti ‘ed bikim

477 Welîkin dema min ku Yehya didî
Xuya bû li wechi wi şerm û fedî

478 Bi husn û melahet bi çeşm û beser
Wekî wî qelîl in ji qismi beşer

479 Mi jî ra selam da selamek delal
Ji hindav de rabû bi ‘izz û kemal

480 Cewaba selami vegirtî li min
Digûtî eya şahi insan û cin

481 Eva çendi sed sal li vir huzne me
Hemî ‘aşiqi wî cemala te me

482 Li vir mame çend sal bi şîn û girîn
Ji hubba şehinşahi dîni mubîn

483 Hetanî nuha ez di vî me’temi
Ji bû xatirî rehmeta ‘alemi

484 Rica pur dikir min ji Rebbi Kerîm
Bibînim cemala resûli ‘ezîm

485 Nida hat ji nik Xaliqi girdigar
Dema bî wucûdi resûli kubar

486 Bi ‘umrî xû çil sal bibûre temam
Ji nik xû wehî kim li ser wî kelam

487 Di nîv sali heşt bîst û hefti receb
Muheyya be bû fexrî ‘alî’n-neseb

488 Li vir muntezir be heta wî demi
Li vir tî bibînî şehi ‘alemi

489 Ji weqta nidai hetanî nuha
Li vir muntezir bûm ku bîtî luha

490 Mi cur‘e vexwarin bi huzn û girîn
Ji bû dîtina seyyidi’l- murselîn

491 Mi derbaz kirin çendî sali ‘edîd
Bi şîn û girîn û bi huzna şedîd

492 Heta vî demi hatî şahi cihan
Bi teşrîf diçit xelweta lamekan

493 Mi dî asiman pur bi nûr bû gelek
Dibû welwele nîv cemî‘i melek

494 Bi tesbîh û tehlîli quddûsiya
Bi ah û bi nalîni subbûhiya

495 Bi mizgîn digûtin şehi ins û can
Bi teşrîf diçîtin sera lamekan

496 Werin em bi hev ra biçîn pî şikar
Suwarî li şehper resûli kubar

497 Selat û selama bidin em ‘elen
Bikin yadigar em li ceddi’l-hesen

498 Mi dîtin bi sef sef melek zîde bûn
Bi hay û bi hû ne hemî ew butûn

499 Gelek keyf û şahî diket nîv melek
Hemî muntezir bûn li çeşmi belek

500 Hinek ji hubûti dikin hin su‘ûd
Kesek qet nizane çi hatî wucûd

501 Hetanî nida hat edeb kin edeb
Bibin sef ji bû şahi Turk û ‘Ereb

502 Bi terz û liyaqet herin pîşi ber
Gelek jî rica kin hemî serteser

503 Eger ew rica we qebûl ke temam
Ezî we ‘efû kim di yewmi’l-qiyam

504 Bi sef sef dihatin qedem bûse dan
Ji bû te muheyya ne ev qa zeman

505 Ricai dikin em ji te ey resûl
Rica me li ba xû tu bigrî qebûl

506 Me hîvî heye ez şehi ins û can
Dema tu biçî xelweta lamekan

507 Sual kî ji rebbi xû yî muqtedir
Bira me ‘efû ke nebin munkedir

508 Cewab da resûli şehi layenam
Çi hîna Xuda min bibe der meqam

509 Izin ger bidit ew bi lutfa ‘emîm
Ji bû min şehinşahi ‘erşi ‘ezîm

510 Li min lazim e rûzi heşr û ceza
Nehîlim ebed yek bibînit eza

511 Çukû rehmet û şefqeta layezal
‘Emîm e ji bû ehli curm û webal

512 ‘Efuww û kerîm e gelek hesdike
Bi lutf û kerem wan hemî ‘ef dike

513 Resûli Xuda gûte Yehya heman
Metirse ji huzna xû ev qa zeman

514 Bi izna Xudayi kerîmi’s-sifat
Di rûzî qiyame dibî tu necat

515 Tu barrî ji bû da û babi delal
Bi rehm û bi şefqet bi ‘izz û kemal

516 Xuda te duxûl ke di nîv rehmeti
Bi wî rehmeti tî biçî cenneti

517 Metirse xû bispîre rehma Xuda
Xuda te ji rehma xû naket cuda

518 Çukû rehmeta wî pur e bîhisab
Bi rehmi diçin cennetî bî‘ezab

519 Ji rehma Xuda tu nebî bîumîd
Ku da tu nebînî ‘ezabi şedîd

520 Xulas e ku ‘Îsa û Yehya heman
Didîtin cemala şehi du cîhan

521 Selat û selam wan li wî hedye kir
Ji bû rehmeta wî kirin pur şukur

522 Mubarek be gûtin eya şehriyar
Se‘adet Xuda kir li te yadigar

523 Çi xeyr û keramet hebit der cihan
Xuda da te wû ummeti her zeman

524 Ji ewwel çi çîbû heta axirî
Ji bû xatirî te Xuda çîkirî

525 Tu serbestî der heft sema û zemîn
Xuda te kirî xatemu’l-murselîn

526 Xuda gûtî “lewlake” ey şahibaz
Mi nanîn wucûdi hemî serfiraz

527 Xuda te kirî rehmeta ‘alemi
Gerek wan xelas kî ji derd û xemi

528 Dema min bihîstî ji wan ev kelam
Mi hemdi Xuda kir li wan kir selam

529 Nihayet ewan sef girîdan temam
Du rek‘et limîj kir li wî bûm imam

530 Li ser milleti wî Xelîl Ibrehîm
Çewa ku Xuda emri kir festeqîm

531 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatiri şahi ‘alî cenab

## Mebhesû irtiqai'n-nebiyyi (s.'e. w.) ile's-semai's-salise[79]

## (Ev beş 153 malik e)

532 Bi ismi Xuda û bi hemdi kesîr
Me pî ibtida kir bi 'ewna qedîr

533 Selat û selam dan bi 'izz û kiram
Li ser Ehmedi şubhi gul wesselam

534 We be'dû werin guh bidin mebhesi
Beyan kim ji bû ehli vî meclisi

535 Bi tefsîl beyan kim yekayek temam
Ji mi'raca Ehmed 'eleyhisselam

536 Beyan kim resûli Xuda zîheya
Ji Mekkî çewa çû semai siya

537 Me gûtî resûli Xuda serfiraz
Dema ew ku derket ji erdi Hicaz

538 Suwari Buraqi şehinşahi dîn
Bi teyran diçû şehri Qudsî yeqîn

539 Ji wî der bi mi'raci çû asiman
Nihîrtî sema cumlei wî duxan

540 Ji wî çû semai duwem bîxeber
Heman dî hedîd e hemî serteser

541 Ji wî çû gihîşt ta semai siya
Bi tesbîh û tehlîli quddûsiya

542 Nida daye Cibrîl nidayek 'ecîb
Ku qapî vekin hûn ji bûna hebîb

543 Cewab dan ji bû Cibreîlî kubar
Ki ye î li qapî dixe çendî car

544 Zeman sed zeman bûrî sali 'edîd
Me dît û nedî qapî bîkilîd

545 Ku illa şehinşahi Beyt û meqam
Bi teşrîf kerem ke heta vir temam

546 Di nîv sali heşt bîst û hefti receb
Fetih wî bibit ev li şahi 'Ereb

547 Ji bû wan re gû Cibreîli emîn
Li we mujde bit hat resûli mubîn

548 Fetih kin derî el 'ecel hani han
Muhemmed diçit xelweta lamekan

549 Bilez wan fetih kir derî bîxeber
Ji bûna şehinşahi cinn û beşer

[79] "Behsa bilindbûna Nebî (s 'e.w) a ber bi 'esmanê sêyemîn ve"

550 Dema wî didîtin li ber sef vedan
Digûtin ev e şahi axirzeman

551 Xû avîtine ber piyî şahi dîn
Sufûfi melaik hemî ecme‘în

552 Sufûfi melaik hemî ecme‘în
Bi deng û bi tesbîh û pur zemzeme

553 Ku îşev li me zeyf e zati binûr
Hemî em ji wî ra bi keyf û surûr

554 Li me lazim e em bibin canfida
Resûli mu‘ezzem hebîbi Xuda

555 Ji weqta Xuda xelqi kirin em li vir
Hetanî nuha em li vir muntezir

556 Ku da em bibînin cemala hebîb
Ji bû xestexani divî yek tebîb

557 Hemî em birîndar in û bîmefer
Me derman bike şahi cinn û beşer

558 Ricai dikin em ji şahi Huda
Me ‘edd ke ji vî ummeti bu Xuda

559 Me daxil bike deftera salihîn
Şefa‘et bike me hemî ecme‘în

560 Resûli Xuda ehdekî pur mezin
Bi wan re dikir şahi insan û cin

561 Eger xaliqi erd û heft asiman
Bi yumna xu iznî bide min ‘eyan

562 Ezî we şefa‘et bikim bîhenek
Çi ins û çi cinn û çi qismi melek

563 Evî asimani sisî bîmecal
Seraser hemî sifreyî qîl û qal

564 Muzeyyen bûye ismi wî ey fulan
Wuha nav kirî xaliqi ins û can

565 Mi dîtin di wî asimani melek
Bi husn û cemal in hemî çavbelek

566 Bi wan re hene elwiyî kesk û sûr
Suwar in li hespi hemî sade nûr

567 Muzeyyen bi enwa‘i lebsi temîz
Evî qismi ha der sema‘i ‘ezîz

568 Nedî min wekî wan bi vî hey’eti
Bi şikl û bi sîma bi vî xel‘eti

569 Bi sewt û seda ne hemî ev suwar
Selata didin ser resûli kubar

570 Mi nedye wekî wan li ser asiman
Wuha pî xeber da şehi ins ‘u can

571 Mi pirsî ji Cibrîl beyan ke li min
Evan qudsiya hey’eta pur mezin

572 Bi xeml û bi rîşî bi husn û cemal
Mi nedye wekî wan bi ‘izz û kemal

573 Were tu ji min re bibî Cibreîl
Ku kî ne evan qudsiyan biddelîl

574 Heman Cibreîl gû di weqt û zeman
Dipursî beyan kim li te hali wan

575 Zemani qedir leyleya nazidar
Ku bîtin li ser ummeta şehriyar

576 Evan şehsuwari bi vî hey’etî
Diçin tîn temamen li ser ummetî

577 Li ser zakirîna diçin tîn mudam
Di nîv meclisa rûdinîn bittemam

578 Kesî zikri mewla biket în çunîn
Dixin deftera ismi zakir yeqîn

579 Eger şev limîj be selam lî dikin
Bi keyf û surûri hemî ew diçin

580 Emanet bike ummeta nazenîn
Dema ku tu çûyî li rûyî zemîn

581 Bira leyle qedri bikîtin dewam
Ku da ev melek bîn li nik wan temam

582 Ji cum‘e cema‘et xû pur dûr nekin
Bira ew limîji şeva pur bikin

583 Çukû ev melaik bi emri Xuda
Ji van meclisa ew qe nabin cuda

584 Bi zikr û bi tesbîh û xwundin yeqîn
Bira kin dewami hemî ecme‘în

585 Ku belkî Xuda wan ‘efû ke temam
Biçîn cenneti ew hemî xas û ‘am

586 Bi diqqet emir ke li wan serteser
‘Umûmen beyan ke çi cinn û beşer

587 Cewab da eger ew Xudayî metîn
Bi rehmet mi bîne li rûyî zemîn

588 Ezî dî emir kim li wan ev kelam
Ku ‘ibret hilînin ji vî wesselam

589 Bi pîşda ku çûm min dî yek şeyx û şab
Mi pirsî ji Cibrîli ‘alî cenab

590 Bibîje ji bû min çi şexs in li vir
Ji bû wan gelek ez dibim munkedir

591 Bi tertîb li ser kursî sade nûr
Culûs in hemî ew bi keyf û surûr

592 Wekî hev bi şikl û bi sîma gelek
Mi nedye wekî wan li rûyî felek

593 Gelû ev çi şeyx û şebab in li vir
Bi vî hey’eti ew dibin mustebir

594 Cewab daye Cibrîl bi nutqa fesîh
Dibînî evan merdumani melîh

595 Culûs in li vir ew bi heşm û edeb
Bi vî hey’eti ew bi keyf û tereb

596 Dibînî evî şeyxi pak û delal
Dibare ji wî nûr bi ‘izz û kemal

597 Xelîfî Xudî Dawûdi muhterem
Ev e ey şehinşahi ‘alî ‘elem

598 Evî dî Suleymani sahib-huner
Xuda kirye sultan li cinn û beşer

599 Gelek jî Xuda hesdike ey nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

600 Here nîzî wan û selam ke li wan
Bi teşrîf kerem ke şehi ins û can

601 Bi leq wan ve çûm ez bi lutf û edeb
Selam kir li wan min bi keyf û tereb

602 Heman radibûn ser piya şeyx û şab
Ji bû hurmeta şahi ‘alî cenab

603 Bi redda selami muşerref dibûn
Bi leq wî ve çûn şeyx û şab ew butûn

604 Gelek merheba jî re gûtin temam
Li ser wan hezaran selat û selam

605 Digûtin eya şahi ‘alî’n-neseb
Li te mujde bîtin bi keyf û tereb

606 Çi xeyr û çi ihsan heye ey delal
Di tew ummeta te bi lutf û kemal

607 Ricai dikin em ji te ey sefî
Me ‘edd kî ji vî ummeti ey wefî

608 Li vir muntezir mane ev qa zeman
Ji bû dîtina şahi her du cihan

609 Diçî xelweta zati wacib wucûd
Me mehrûm nedî rî ji keşf û şuhûd

610 Xuda ni‘metek pur mezin daye te
Nedaye çu kes wî ebed xeyri te

611 Me hîvî heye rûzi heşr û ceza
Nehîlî bibînin ebed yek eza

612 Çukû em ditirsin ji hewl û xeter
Eger ne tu bî em dibînin zerer

613 Rica wan qebûl kir li nik xû hema
Nekîşin ji vir pî ve derd û xema

614 Li dû dî li ber wan şebabek ‘ezîz
Mulebbes libasi nezîf û temîz

615 Li ser kursi ye ew ji nûra zelal
Bi şewq û şemal û bi husn û cemal

616 Diîse ji wechi wî nûr û ziya
Xuda hedye kir bû wî şerm û heya

617 Bi husn û bi sûret kebedri’d-duca
Bi rehma Xudî pur diket iltica

618 Ku ye‘nî bibînim şehi ins û can
Dema ew biçit xelweta lamekân

619 Gelek hîvî jî bikim wî demi
Çukû xas û mehbûb e der ‘alemi

620 Xû bavîme dergahi wî subh û şam
Mededxwahi min be di rûzi qiyam

621 Mi pirsî ji Cibrîl ki ye ev şebab
Bi tefsîl beyan ke bide min cewab

622 Çukû pur dikîşe evî hesreti
E jî mame heyrî ji vî dehşeti

623 Bibîje ji bû min êcel ke hema
Mi nedye wekî wî di erd û sema

624 Ne husn û melahet wekî wî heye
Ne kerb û ne hesret wekî wî heye

625 Ji lew ez dibînim di vir da ‘eceb
Bibîje ji bû min bi keyf û tereb

626 Cewab daye Cibrîl eya şahi dîn
Eger çi dibînî bi huzn û girîn

627 Temamen ji bû husn û dîdari te
Dikîşe evî hesreti ew li te

628 Ev e Yûsufi ku bi husn û cemal
Li ser wechi wî çîdibin xett û xal

629 Heta kes nikarit bi nîrî li wî
Ji ber nûra wechi Xuda daye wî

630 Xuda kir muşerref bi husn û cemal
Wekî rewneqa wî çu nîne misal

631 Xuda sûreti wî muzeyyen kirî
Bi husn û cemali muşerref kirî

632 Nedaye tu kes sûreti wî yeqîn
Bi xeyrî şehinşahi rûyî zemîn

633 Xelatek muebbed Xuda lî heband
Bi husn û melahet Xuda wî şihand

634 Bi xett û bi xal û bi sûr û sipî
Wekî wî nedaye çu kes ey nebî

635 Li wechi xû danî diwazde niqab
Ku da kes nizane çi ye der hicab

636 Dema ew bi teşrîf diçû nîv sera
Diîsa ji wî nûr dida pencera

637 Here nîzî wî ey şehi bawefa
Bi teşrîf selam lî ke ey Mustefa

638 Gelek laiq e Yûsufî pur delal
Selami ku lîkî bi ‘izz û kemal

639 Ku da ew nebî sahibi mu‘cizat
Ebed wî li min qet nekir iltifat

640 Kerem ke selami li wî ke ‘eyan
Bi keyf û xweşî ey şehi ins û can

641 Ku da keyf û şahî biket qelbi wî
Muhemmed bi teşrîf li min bû xweyî

642 Bi leq wî ve çûm ez bi keyf û kenîn
Ji bû me wuha gû şehinşahi dîn

643 Mi lî kir selamekgelek mu‘teber
Bi nutq û fesahet bi telqi beşer

644 Mi pirsî ji wî ey nebiyyi delal
Ji bû çi bi huznî li vir bî misal

645 Xuda te hebandî ji beyta mulel
Bi husn û melahet ji rûja ezel

646 Mekîşe evî hesretî serteser
Bi huzn û girînî li vir bî mefer

647 Cemalek mezin daye te girdigar
Nedaye çu kes pîşî te ey kubar

648 Qena‘et bike tuhfeya bî misal
Ji bû te ku hedye kirî zulcelal

649 Cewab daye Yûsuf ji bû şahi dîn
Eger çi dibînî tu şîn û girîn

650 Li min pur xuya ye li vir her mudam
Temamen ji ‘işqa te ye wesselam

651 Te haşa qena‘et nekim tuhfei
Bi rûh û bi cani xû ez hedyei

652 Dizanim Xuda hedyekî pur mezin
Li min ixtiyar kir neda xeyri min

653 Welîkin dema wî Xudayî Wedûd
Di der vî cihani mi anî wucûd

654 Bi vî husn û dîdariya bîmisal
Bi şekl û bi sîma bi qed i‘tidal

655 Mi rûjek li ‘eynî nihîrtî ‘eyan
Mi gûtî gelû kes heye der cihan

656 Wekî min bi vî hey’eta sade nûr
Bi husn û cemal û bi keyf û surûr

657 Wekî min qe nîne bi vî hey’eti
Bira kes nekîşe evî mihneti

658 Eger rûjekî ez bibim yek ‘ebîd
Bi vî rewneqa wî Xudayi mecîd

659 Ku wî ixtiyar kir li min ev cemal
Kesek qet nikare mi bistî bi mal

660 Çukû ev cemala Xudî daye min
Nedaye çu kes ev cemal xeyri min

661 Mezin kir mi nefsa xû ya qasire
Hesed min digirtî ji xeyrî xû re

662 Li min girt Xuda wî demi an zeman
Edeb ke li husna şehi ins û can

663 Eger ew nebûna ne ‘erş û felek
Ne ins û ne cinn û ne qismi melek

664 Min anîn wucûdi hemî serteser
Tu hilde ji min qewlekî mu‘teber

665 Xuda kir musellit li min deh bira
Hesed wan ji min kir hemî eşkera

666 Mi anîne sehra û çûla li dûr
Mi daxil kirin cubbeya kûrekûr

667 Heta min firûtin bi çend dirhema
Bi ‘ebd û bi kûletiyî wan hema

668 Eger min nekirna hesed wî demi
E nedbûme riswa di nîv ‘alemi

669 Welî ger mi nefsa xû nekra wehîd
Di nîv ‘alemi da e nedbûm ‘ebîd

670 Welî min rica ye ji payi resûl
Li nik xû tu tewba mi bigrî qebûl

671 Mi bîhedd xeber da li ber şahi dîn
‘Efû ke qusûr im hemî ecme‘în

672 Çukû tu reûf û rehîmi yeqîn
Şefa‘etgerî cumlei muznibîn

673 Mededxah im û bîneçar im heman
Li ber dergehî şahi axirzeman

674 Mi rûzî qiyamet şefa‘et bikî
Ji husn û cemala xû mehrûm nekî

675 Mi daxil bikî deftera ummetî
Ku da ez tevî te biçim cennetî

676 Resûli mu‘ezzem ‘eleyhisselam
Ji bû ra gelek wî dikir ihtiram

677 Ne‘em gû ji bû Yûsufi bacemal
Izin ger bidit Xaliqi zulcelal

678 Metirse ji hewli qiyami tu car
Bi izna Xudayi ‘ezîzi kubar

679 Li dû emri kir Cibreîl hani han
Li quddûsiya sef girîdin heman

680 Sefi xû girîdin hemî hûn temam
Ji bûna Muhemmed ‘eleyhisselam

681 Bi tertîb sufûfi xû girtin melek
Subbûhiyû quddûsiyî der felek

682 Li wî bû imami evî ‘alemi
Sela dan li ser wî di gav û demi

683 Du rek‘et limîj kir resûli celîl
Li ser milleti Ibrahîmi Xelîl

684 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

**Mebhesû irtiqai’n-nebiyyi (s.‘e.w.) ile’s-semai’r-rabi‘e[80]**

**(Ev beş 276 malik e)**

685 Bi hemd û senai Xudayî kerîm
Me pî ibtida kir bi qelbi selîm

686 Hezaran selat û hezaran selam
Bibarin li Ehmed şehi xas û ‘am

687 Li ser al û sehba hemî cumle şan
Çi an û çi hîn û çi sal û zeman

688 We be‘dû werin guh bidin aşîkar
Ku Ehmed çewa çû semai çihar

689 Bi sidq û bi niyyet hemî guh bidin
Ji isra û mi‘raca şahi mezin

690 Beyan kim li we tev hemî yek bi yek
Bi teşrîf kerem kir li sethi felek

691 Dema xwest biçit ez semai siya
Bi tesbîh û tehlîli quddûsiya

696 Werin hûn bibîjin çi huzn û girîn
Ji bû min beyan kin hemî ecme‘în

697 Mekîşin evan derd û ah û keser
Bi çi mubtela ne hemî serteser

698 Werin hûn bibîjin li min kin ‘eyan
Ku hî em neçûne li ser asiman

699 Cewab dan ji bû şehsuwari felek
Bi ah û bi nalîn hemî ev melek

700 Ricai dikin em ji şahi emîn
Şefa‘et bikî me hemî ecme‘în

701 Gelek em ditirsin ji nari Cehîm
Di wî da bibînin ‘ezabi elîm

702 Me ‘edd kî ji vî ummeta nazîdar
We ger na li vir mane çar û neçar

703 Hemî muntezir man li vir bîhenek
Ji bû dîtina şehsuwari felek

704 Ku pî em teberruk bibin el eman
Ricai dikin em ji fexri cihan

705 Di rûzî qiyame bibî destegîr
Me daxil bikî defterî ey beşîr

706 Şefa‘et bikî me di rûzî qiyam
Ji wî wertei me xelas kî temam

707 Ji rûja Xuda me wucûd kir li vir
Ji bû dîtina te hemî muntezir

708 Çukû rehmetî bû hemî ‘alemîn
Me daxil bike rehmeti ecme‘în

[80] “Behsa bilindbûna Nebî (s ‘e.w) a ber bi ‘esmanê çaremîn ve”

709 Xuda emrî kir ser cemî‘i melek
Dema me wucûd kir li sethi felek

710 Bikin intizari bi terz û edeb
Ji bû dîtina şah û fexrî ‘Ereb

711 Dema hate ba we rica kin ji wî
Ku da rûzî heşri xelas bin bi wî

712 Eger ew rica we qebûl ke temam
Ezî we ‘efû kim di yewmi’l-qiyam

713 Çi hîna me sehkir kelami metîn
Diçûn secdei em hemî ecme‘în

714 Me anî rica kir ji zati ‘elîm
Çi weqte ku bîtin resûli ‘ezîm

715 Dema em bizanin ku ew şehriyar
Resûli mu‘ezzem li şehper suwar

716 Bi teşrîfi bîtin li sethi felek
Emi jî rica kin hemî yek bi yek

717 Xû bavîne ber payî şahi Huda
Em in jî re bilcumle tev canfida

718 Ku belkî rica me qebûl ke temam
Li ser wî hezaran selat û selam

719 Nida hat ji nik Xaliqi neh felek
Edeb kin edeb kin edeb ey melek

720 Dema bî wucûdi di axirzeman
Resûli mu‘ezzem şehi ins û can

721 Bibûrit ji ‘umrî wî çil sal yeqîn
Ezî lî wehî kim kelami metîn

722 Di nîv sali heşt bîst û hefti receb
Xû hazir bikin bû resûli ‘Ereb

723 Rica xû ji wî kin hemî bittemam
Ku da we şefa‘et bikit der qiyam

724 Çi hîna rica we bike ev resûl
Muheqqeq li nik min rica wî qebûl

725 Ji weqta me sehkir kelami Xuda
Selata didin em li şahi Huda

726 Ev e zikr û ewradi me subh û şam
Li ser te didin em selat û selam

727 Me zanî ku îşev şehi ins û can
Bi teşrîf diçit xelweta lamekan

728 Beşaret giha me ku şahi herem
Li me zeyf û mihvan e ew lacerem

729 Me dî asiman pur bi nûr bû gelek
Dibû welwele nîv cemî‘i melek

730 Beşaret li hev dan ku şahi cihan
Di vî lehzei tîti ser asiman

731 Dema me beşaret bihîstî yeqîn
Me jî sef girîdan ji bû şahi dîn

732 Me hîvî rica ye ji payî resûl
Rica me li ba xû tu bigrî qebûl

733 Gelek hîvî em dikin bîqeder
Me daxil bikî deftera mu‘teber

734 Rica wan qebûl kir resûli kerîm
Li nik xû nehîla bibin dilseqîm

735 Hilînin evî xeşyeta xû temam
Bi izna Xudayî ezel layenam

736 Izin ger bidit ew Xudayî metîn
Şefa‘et dikim we hemî ecme‘în

737 Di rûzî qiyamet nebin cangiran
Bi fezla Xudî tev biçîn cinan

738 Wekî ber wî çû Cibreîli emîn
Heta çû gihîşt qapiyî enwerîn

739 Nida da veke qapî ey dergevan
Bi keyf û bi şahî derî asiman

740 Veke ey melek hani han zû bixar
‘Ecel ke derî asimani çihar

741 Heman dergevan gû ki ye bîje min
Li qapî dixe vî şevî bîizin

742 Heman Cibreîl gû ez im Cibreîl
Li qapî dixim ez bi izn û delîl

743 Veke zû ‘ecel ke bi ‘izz û bi naz
Ku da tu li vî der bibî serfiraz

744 Nida da melek gû bibîje bi xar
Ki ye î di gel te bibî aşîkar

745 Cewab da Muhemmed şehi ins û can
Di îşev diçe xelweta lamekan

746 Veke zû derî tu bi keyf û surûr
Xû bavîje ser payi şahi binûr

747 Gelek merheba jî re gûtin temam
Li ser wî dixwundin selat û selam

748 Sufûfi melek hatine ber derî
Fetih wan dikir qapiyî enwerî

749 Dema wan didî şahi Beytulheram
Xû avîtine ber piya xas û ‘am

750 Selam dan li ser wî bi ‘izz û edeb
Dihatin li dûr şah û fexri ‘Ereb

751 Rica me heye her dem û sa‘eti
Bi teşrîf me ‘edd kî ji vî ummeti

752 Ji weqta Xudî me ku anî wucûd
Ditirsin li vir em ji nari weqûd

753 Gelek hîvîyî em dikin ey resûl
Tu tewba me bigrî li ba xû qebûl

754 Eger tu me negrî di rûzî qiyam
Muheqqeq xelasî ji bû me heram

755 Ricai dikin em ji şahi emîn
Me ‘edd kî ji vî ummeti ecme‘în

756 Qebûl kir rica wan li ba xû temam
Li ser wî hezaran selat û selam

757 Resûli Xuda gû ji bûme hema
Dema ez bi teşrîf diçûme sema

758 Mi dî ev sema tev ji zîvî beyaz
Melaik di wî da hemî serfiraz

759 Ji bû ra dibîn zahira pur binûr
Wuha navi danî Xuda bîqusûr

760 Li vî asimani mi dîtin gelek
‘Ecaib wekî wan nedî der felek

761 Bi şikl û bi sîma hemî sade nûr
Xuda wan wucûd kir hemî bîqusûr

762 Hinek şîn û kesk in hinek sûr û zer
Hinek cûn û penbe wekî neyl û fer

763 ‘Eceb nîne ger vî Xudayî ‘ezîz
Ku bîne wucûdi bi rengi temîz

764 Çukû tev delîl in ezel ta ebed
Xuda her yek e yek bizane ehed

765 Ji ketma ‘edem wî Xudayî wedûd
Bûyi qudreta xû me anî wucûd

766 Nihayet li wî der mi dî yek recul
Bi husn û cemal e welî dilbikul

767 Mi pirsî ji Cibrîl ki ye ev delal
Beyan ke li min wî çi keyf û çi hal

768 Dibînim li wechi wî nûr sati‘ e
Welakinne qelbi wî pur xaşi‘ e

769 Gelek pî diîşim bibîje ki ye
Gelû ev çi hal e bibîje çi ye

770 Çukû min dema dî bi vî hey’eti
Bi ahan dikîşe evî hesreti

771 Mi hesret dikîşa ji bû wî gelek
Mi nedye wekî wî li sethi felek

772 Were tu beyan ke li min hani han
Çi şexs e dibînim li vir ez ‘eyan

773 Bi vî haletî ez dibînim hezîn
Dikîşe ji çeşm û beser av û xwîn

774 Cewab da ku Idrîs e ey Mustefa
Xuda wî bilind kir mekani sefa

775 Xudî te ji wî razi ye bîqeder
Tu derxe ji qelb û dilî xû keder

776 Eger hesnekirna ji wî ey resûl
Net anî li vir wî bi ‘izz û qebûl

777 Ji bû wî mekîşe xema serteser
Xuda daye wî cayekî mu‘teber

778 Her tu bi leq wî ve lî ke selam
Bi ‘izz û bi temkîn û lutf û kiram

779 Çukû pur ji te hesdike ev nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

780 Gelek ew li ser te selata dide
Ji lew ez dibîjim selam lî bide

781 Bi leq wî ve çûm û selam kir gelek
Li wî hedye kir min hemî yek bi yek

782 Ji hindav de rabû nebî an zeman
Selat û selam dan li şahi cihan

783 Digûtî eva çendî sed sal temam
Li ser te selata didim subh û şam

784 Dema ez ji qewmi xû bûm dilkesir
Xudayî Te‘ala mi danî li vir

785 Xuda emri kir pur selat û selam
Bide ser Muhemmed ‘eleyhisselam

786 Selat û selaman bi sidq û sefa
Temamen bikî hedye ser Mustefa

787 Zemani Muhemmed ku bî vî deri
Rica xû ji wî ke ji bû mehşeri

788 Ku da te şefa‘et biket an zeman
Di gel wî biçî nîv qusûri cinan

789 Migûtî eya ey Xudayî metîn
Zemani ku bîtin Muhemmed emîn

790 Çi weqt e ku da ez bizanim ‘eyan
Xû bavîme dergahi şahi zeman

791 Xuda gû dema ez wehî kim li wî
Ku çil sali derbaz bibit ‘umri wî

792 Ji çil sali heşt sal bibûrit yeqîn
Xû hazir bike bû Muhemmed emîn

793 Di nîv sali heşt bîst û hefti receb
Xû hazir bike bû resûli ‘Ereb

794 Çi weqta te dîtiyi li vir bittemam
Ji ber min ve lî ke selat û selam

795 Dema bû temam ev xitaba ‘ezîz
Bi van qewl û elfazi şîrîn temîz

796 Mi da ber xû rahi selat û selam
Li ser te eya şahi Beytulheram

797 Zeman ser zeman bûrî ev qa li min
Selat dan li ser şahi insan û cin

798 Suwarî li şehper sera lamekan
Bi ah im bi wah im di ev qa zeman

799 Mi hîvî heye rûzî heşr û ceza
Şefa‘et bikî ez nebînim eza

800 Bi kerb û bi hesret mi bûrîn zeman
Ji bû xatirî şahi axirzeman

801 Gelek min rica ye ji te ey resûl
Rica min li ba xû tu bigrî qebûl

802 Ricaxwaz û milxwari babi te me
Zeman ta zeman ez bi te hewce me

803 Çi hîna diçî xelweta lamekan
Bibîjî ku Idrîs dibîne xeman

804 Ku belkî bide xatirî Ehmedî
Ricai dikim tu li min bî xudî

805 We ger na li vir mame cumrek ji nar
Bi kerb û bi hesret dibim teng û tar

806 Mi hîvî rica ye ji payî resûl
Li sethi sema min nehîlî melûl

807 Resûli Xuda gûte Idrîs heman
Çi weqta biçim xelweta lamekan

808 Ezî jî rica kim ricayek mezin
Ku belkî Xuda te riha ke ji bin

809 Di rûzî qiyamet dibî şadiman
Bi hev ra biçîne qusûri cinan

810 Li dû min selam kir li wî yek selam
Bi keyf û bi şahî gelek ihtiram

811 Mi xatir dixustî ji Idrîs ji dil
Li pey min nekev hesreti dilbikul

812 Gelek wî du‘a kir ji bû ummeti
Ku mehrûm nemîne ji vî dewleti

813 Hinek çûm mi dî yek melek pur mezin
Di xelqiyyeti da wekî wî nehin

814 Nikarî kesek lî binîre ebed
Kesî lî binîre dibit wek cemed

815 Dibin erzi sabi‘ meqerri qedem
Serî wî li ‘erşi Xuda lacerem

816 Culûs e li ser kursiyî sade nûr
Cemî‘i melaik dikin jî nufûr

817 Li ber desti wî rast û çep pur melek
Diçin tîn ji bû xizmeta wî gelek

818 Ji bû emri mewla dikin intizar
Ku da pî teberruk bibin aşîkar

819 Mi dî lewhekî pur mezin der yemîn
Li çep darekî hail e pur semîn

820 Welîkin ne zihk û tebessum ebed
Ji bû wî heye ew bi muhr û sened

821 Ji Cibrîl mi pirsî ki ye hani han
Mi nedye wekî wî di dewra zeman

822 Çukû pur ‘ebûs û bi kîn û bexûd
Difûre ji wechi wî nari weqûd

823 Were tû bibîje ki ye ev melek
Ditirsim ji vî hey’eta wî gelek

824 Cewab da ji bû min exi Cibreîl
Ji bû te beyan kim melek biddelîl

825 Ev e î di hedmîne lezzet gelek
Ji insan û heywan û cinn û melek

826 Teferruq dike wan ji hev dûr e dûr
Ev e î di hedmîne beyt û qusûr

827 Ev e pur dike gûr û qebr û mezel
Yekayek bi îş û bi derd û zelel

828 Gelek ew yetîma dihîle zelîl
Ji bû wî çu nîne ne dûst û xelîl

829 Ev e î dihîle jina bî rical
Bi muflis dihîle ne mulk û ne mal

830 Derî ra dide wan dike pur feqîr
Ne qedr û ne rutbe dike wan esîr

831 Ev e ew melek mewti sahibxeter
Ji kes ra nehîla ebed yek mefer

832 Ev e qabizi rûhi sahibnufûs
Ev e î di xelqiyyeti da ‘ebûs

833 Ev û maliki nari her heft tebeq
Beşaşet ji bû wan çu nîne bi heq

834 Ev e ‘Izreîli bibuxz û bikîn
Musellet li ser kafir û muşrikîn

835 Here nîzî wî ey resûli delal
Selami tu lî ke bi ‘izz û kemal

836 Bi leq wî ve çûm û mi lî kir selam
Ne redda selami dikir ne kelam

837 Ne redda selami ne rabû piya
Li vir mame heyrî ji şerm û heya

838 Bi lez Cibreîl gû eya ‘Izreîl
Nizanî ev e ew resûli celîl

839 Ev e seyyidi xelqi cumle temam
Çira tu li wî nakî redda selam

840 Dema wî bihîstî ji Cibreîl eser
Heman radibû ser piya bîxeber

841 Li min wî vegîrandî redda selam
Li ser min duxwundî selat û selam

842 Gelek merheba gû ji bû min ji dil
Ricai dikim tu nebî dilbikul

843 Qusûr im ‘efû ke eya şehriyar
Bide cenbi wî rehmeta girdigar

844 Li te mujde bit ey resûli emîn
Şefî‘i ji bû cumlei muznibîn

845 Resûli mu‘ezzem di gel ummeti
Bi fezla Xudî dî biçîn cenneti

846 Çi xeyr û menafi‘ hene der cihan
Di tew ummeta te tu bîşek bizan

847 Mi jî ra digû ey exî ev meqal
Meqami te ye bîje min wesselam

848 Ne‘em gû ji bû min eya şehriyar
Ji rûja Xudî xelq kirî min bi xar

849 Li vir ixtiyar kir ji bû min yeqîn
Heta bî qiyamet çi an û çi hîn

850 Migûtî ku ev der mekan û meqam
Çewa qebz dikî rûhi cumle enam

851 Were tu beyan ke li min qisseti
Çukû pur dibînim li vir ‘ibreti

852 Ji vî der melaik hene ta bi ‘erş
Ji vî der bila ‘edd hene ta bi ferş

853 Çewa mumkin e ev qeder ey delal
Tu qebza nufûsa dikî bîmisal

854 Bibîje ji bû min ku da qelbi min
Di vî mes’eli da bibit mutmein

855 Cewab da ji bû şehsuwari felek
Di vî mes’eli da neke reyb û şek

856 Xuda quwwetek pur mezin daye min
Di qebza rûha de neda xeyrî min

857 Musexxer kirî pênc hezar ez melek
Di emr û di nehyî mi de yek bi yek

858 Zemani ecel bî di hîn û di gav
Ji bû wî nemîne ne nan û ne av

859 Zemani temam be heyta ‘ebîd
Zeban wî digirti bi qefl û kilîd

860 Dişînim li wî çil melek hani han
Ji bû ew bikîşin ji wî rûh û can

861 ‘Urûq û ‘eseb lehm û dem wî demi
Bi wî heybeti ew dikîşin xemi

862 Ji nik rûh dikîşin heta rukbeti
Ji lew ew dikîşit gelek hesreti

863 Li wî der hinek istirahi didin
Ku da ew rehet be ji kerba mezin

864 Ji rukbe dikîşin heta sureti
Bi muhlet dihîlin heta sa‘eti

865 Ji surre dikîşin heta henceri
Dinîre bi çeşm û beser penceri

866 Bi derhal dikev xerxeri ew feqîr
Kesî qet nenase ne can û ne pîr

867 Çukû ‘eql û daniş ji bû wî ni ye
Ku da ew bizane li nik wî ki ye

868 Bilez ez dikîşim ji wî rûh û can
Ne te‘b û eziyyet dibînim heman

869 Dema derkevit rûh ji can û cesed
Bi derhali çav lî dibin wek cemed

870 Dinîre li rûhi xû yi nazenîn
Çewa çû li vir mame zar û hezîn

871 Midîtî li nik wî di gurzî giran
Yekî nûr e yek zulmet e bîguman

872 Mi pirsî ji wî ev çi gurz in li vir
Bibîje ji bû min eya muqtedir

873 Ji van her du gurzi giran û mezin
Gelek tirs û heybet ji wan hate min

874 Yekî der yesar û yekî der yemîn
Ji van her du gurza dibim dilhezîn

875 Cewab da evî der yemîni bi nûr
Ji bû rûhi wî mu’mini dilsebûr

876 Çi weqta mirin bî yekî mu’minîn
Dikîşim rûhi wî bi gurzî şirîn

877 Diçit ‘Illîyyînî bi emri Xuda
Ebed ew ji wî der qe nabit cuda

878 Welî ger rûhî yek xebîsi mirar
Bi kev tengiyî ez dikîşim bi xar

879 Rûhî wî xebîsî bi gurzî giran
Dişînim Siccîni di weqt û zeman

880 Li wî der dimîne heta sa‘eti
Gelek ew dikîşe li wî hesreti

881 Çi ye ev Siccîna me gûtî ‘eyan
Kevir kî reş e pur mezin bîguman

882 Dibin heft tebeq erzi sufla yeqîn
Mekan û cihî kafir û muşrikîn

883 Mi gûtî çewa zanî ey muhteşem
Zemani huzûra ecel be li cem

884 Bike diqqeti tu ji bû min li vir
Ku da ez bizanim çewa tî emir

885 Muheqqeq sebebkî ji bû wî heye
Bibîje ji bû min gelek fayde ye

886 Digû ya Muhemmed çi ‘ebdi hebî
Ji bû du derîne bizan ey nebî

887 Du bab in ji bû wî di der asiman
Yekî rizqi wî tîte xwarî ‘eyan

888 Yekî dî muheyya ji bûna ‘emel
Wuha tu bizane ji min bîxelel

889 Mi dî darekî pur mezin hail e
Li alî çepî wî hinek mail e

890 Li ser yek wereq ismi şexsek ‘eyan
Ji ewladi adem ji mîr û jinan

891 Çi weqta mirin bî yekî ‘en qerîb
Wereq zer dibit wî demi ey hebîb

892 Ewî ser nivîsandiye navi wî
Bi emri Xudayî ‘ezîz û qewî

893 Heman tîte ser babi rizq ew wereq
Di lewhî de nav reş dibit heq bi heq

894 Di wî weqti zanim ecel bû temam
Bi emri Xudayî ebed layenam

895 Ezî lî binîrim bi yek nezreti
Cesed wî demi lî dikev hesreti

896 Dikev heybeti qelbi wî an zeman
Bi vî heybeti ew dikev nav ciyan

897 Ezî dî bişînim li ser çil melek
Li dûr wî diçin tîn hemî yek bi yek

898 Dema rûh dikev henceri bittemam
Ezî rûh hilînim ji wî wesselam

899 Li dû min digû ‘Izreîli mezin
Bide dîtini sûreti xû li min

900 Nîşande bi min sûreti xû yî ewul
Ku pî rûh dikîşî ji cismi recul

901 Cewab da digû ya hebîbi kubar
Ji bû dîtina min meke intizar

902 Çukû tu nikarî li min ki nezer
Bi wî sûretî min dibînî keder

903 Mi gûtî bi heqqi Xudayî mezin
Tu wî sûreti xû nîşandî li min

904 Çukû dîtina sûreti te yeqîn
Ji min ra meraq e wekî hingivîn

905 Nida hat ji nik Xaliqi girdigar
Muxalif neke gûtina wî tu car

906 Emanet bi diqqet edeb ke edeb
Li ber wî şehinşahi Turk û ‘Ereb

907 Xû zahir bike jî re bî qîl û qal
Meyîne ji bû xû tu hinde misal

908 Nizanî ev e ew hebîbi mezin
Mi ‘erş û mi ferş tev ji bû çîkirin

909 Hema sûretî xû berî da nişan
Bi xelqiyyeta xû berî kir ‘eyan

910 Dema min didî sureti hail e
Bi vî hey’et û heybeta kamil e

911 Diket qelbi min tirs û heybet gelek
Ji xelqiyyeta sûreti ev melek

912 Mi dîtî ku dunya li nik wî temam
Wekî dirhemek nik yekî wesselam

913 Gelek jî ditirsim di weqt û zeman
Ne ‘eql û fikir ma ji bû min ‘eyan

914 Heman Cibreîl hatî ba min bi xar
Mi himbîzî kir Cibreîli kubar

915 Vegerya li min ‘eql û fikrî di min
Ne tirs û ne heybet xuya bû li min

916 Heman Cibreîl gû eya şehsuwar
Dema tu biçî xelweta girdigar

917 Ji wî der vegeryayî hatî li mal
Bi izna Xudayî kerîm layezal

918 Bi diqqet beyan ke li vî ummeti
Bira hûşiyar bin ji bû cenneti

919 Ku ye‘nî xû dûrkin ji e‘mali pîs
Ji qetl û zinai ji fi‘li xebîs

920 Emanet li wan ke evî wesyeti
Li vî wesyeti ew bikin diqqeti

921 Nihayet hinek çûm bi çendi qedem
Mi dîtî zilamek bi şubhi ‘elem

922 Bi husn û cemal û bi ‘eqli giran
Wekî wî mi nedye di der asiman

923 Zemani mi dî pur tebessum dikir
Ji bû min gelek keyf û şahî dikir

924 Vegeryam bi ser Cibreîlî emîn
Ki ye ev meriv pur bi keyf û kenîn

925 Heman zû bîje ji bû min bi xar
Bi keyf û tereb ey refîqi kubar

926 Cewab da ku bavî te ye Ibrehîm
Here nîzî wî tu bi qelbi selîm

927 Bi leq wî ve çûm û selam lî dikir
Mi hemd û sena û şukur pur dikir

928 Selama mi da merheba gû gelek
Digûtî “henîen” eya çavbelek

929 Gelek ez bi te şa me ey nazenîn
Çukû tu şefî‘î ji bû muznibîn

930 Bi te fexrîdar im ela ey sebî
Bira rûh û can im fidai tebî

931 Li te mujde bîtin ji bû ummeti
Mekîşe ji bû ummeti hesreti

932 Di rûzî qiyamet dibî şadiman
Bi keyf û bi şahî dibî an zeman

933 Tu îşev bi Cibrîl diçî xelweti
Ji Xaliq dibînî gelek ni‘meti

934 Xuda pur ji te razi ye ey weled
‘Ezîz î li nik wî ezel ta ebed

935 Du‘a ke ji bû ummeti ey resûl
Çi mayî tu bîjî li nik wî qebûl

936 Mi gûtî eya ceddi sahibkemal
Ji bû çi li vir calisi çendi sal

937 Bibîje ji bû min bi lutf û kerem
Were tu beyan ke eya muhterem

938 Çukû ez ji nav bab û cedda temam
Bi te iftixari dikim wesselam

939 Cewab da ji bû min bi ‘izz û bi naz
Suwari li ‘erşa şehi serfiraz

940 Bizane ji min ez li vir çendi sal
Culûs im bi emri şehi layezal

941 Dinîrim li e‘mali vî ‘alemi
Ku qencya xera ye di gav û demi

942 Mi nedye wekî ummeta te yeqîn
Mukemmel munewwer muzehher hemîn

943 Mi nedye wekî wan di her sa‘eti
Muheqqeq ew in î herin cenneti

944 Çukû ew dibîn La Ilah Illallah
Li pey wî Muhemmed resûli Ilah

945 Bi vî zikri mewla dikin aşikar
Ji lew ew diçin cenneta nazîdar

946 Bi diqqet beyan ke li wan ev kelam
Li ser te hezaran selat û selam

947 Mi hemdî Xuda kir bi hemdi mezin
Xuda çi xelatek mezin daye min

948 Fereh hate qelbi mi wî sa‘eti
Çi ni‘met Xuda daye vî ummeti

949 Nida daye Cibrîl bi cumle melek
Bi sef sef werin ber şehi çavbelek

950 Bi sef sef dihatin geran ta geran
Seffi xû girîdan li şahi cihan

951 Li pîş wan limîj kir du rek‘et nemaz
Bi şert û bi erkan şehi serfiraz

952 Dema bû temam ev limîja temîz
Sela dan li ser wî resûli ‘ezîz

953 Bi tehlîl û tesbîhi subbûhiya
Bi tekbîr û teqdîsi quddûsiya

954 Bi sef sef dihatin cemî‘i melek
Xû avîtine ser piya yek bi yek

955 Hemî jî ricai dikin bittemam
Şefa‘et bikî me di rûzî qiyam

956 Resûlî Xuda gûte wan serteser
Di rûzî qiyamet nebin dilkeder

957 Eger ew Xudayi ‘ezîz û mezin
Di rûzî qiyamet bide min izin

958 Hemî we şefa‘et bikim an zeman
Bi wî Xaliqi erz û heft asiman

959 Dema wan bihîst ev beşaret yeqîn
Selat û selam dan li ser şahi dîn

960 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

**(Ev beş 71 malik e)**

961 Bi hemd û sena û bi qedri kesîr
Bi sidq û sefa û bi lutf û kebîr

962 Bi çend sed selat û bi çend sed selam
Li ser Ehmedi şubhi gul ixtitam

963 Li ser al û sehbi di wî cumle şan
Nebit munqeti‘ ta bi axirzeman

964 We be‘dû werin ehli Islam û dîn
Binîrin li mi‘raca şahi emîn

965 Muhemmed resûli Xuda ye bi heqq
Ji ser rûyî erdi biriye heft tebeq

966 Ji wî bir heta Sidreti’l- Munteha
Bi qasî du qewsa bi bal xû giha

967 Gelek ni‘meti faxire jî re dan
Nedaye çu kes xeyrî wî ins û can

968 Tekellum bi wî ra kirî not hezar
Kesek qet nizane çi bû sî hezar

969 Evan hezarî sî mi gûtî ‘eyan
Ne me‘lûm e xeyrî şehi ins û can

970 Ji van re dibîjin heqîqet yeqîn
Kesek pî nizane ji bil şahi dîn

971 Welî sî hezarî ji wî not hezar
Şerî‘et dibîjin ji lew aşikar

972 Evan sî hezarî dini ya zilam
Ji bû ra dibîjin terîq wesselam

973 Nihayet Xuda ni‘metek pur mezin
Didaye şehinşahi insan û cin

974 Gelek laiq e şahi beyt û hetîm
Bi vî ni‘meti ew ji Rebbi Kerîm

975 Li dû çûne cewwi semai çihar
Li wî dîn melaik bi seffi kubar

976 Temami melaik bi tesbîh û deng
Bi şekl û bi sîma hemî rengereng

977 Selat û selama didin bîqerar
Ji bûna Muhemmed dikin yadigar

978 Dema dîn resûli Xuda bû xuya
Bi hev ra xû avîtine ser piya

979 Selat û selam lî duxundin gelek
Subûhiyyû qudsî cemî‘i melek

980 Dibû welwele nîv melek an zeman
Di ev şev Xuda da me şahi cihan

981 Gelek ev çi şev bû Xuda kir wucûd
Li me nûr xuya bû bi keşf û şuhûd

982 Heman me bihîstî bi keyf û tereb
Ku îşev şeva bîst û hefti receb

983 Li cewwi sema nûr xuya bû gelek
Heta çû belabû li sethi felek

984 Gelek wan rica kir ji şahi cihan
Di rûzî qiyamet bibî puştiban

985 We ger na li vir mane jar û hezîn
Feqîr û sutûxar û ah û enîn

986 Rica me heye ey şehi bawefa
Di rûzî qiyamet nebînin cefa

987 Eva çendi sed sal li vir muntezir
Ku şahi ‘Ereb bîti îşev li vir

988 Emi jî rica kin ricayek kubar
Ku da me xelas ke ji nari kubar

989 Tu îşev dihatî li nik me resûl
Rica me li nik xû tu bigrî qebûl

990 Me hîvî ji payi resûli kerîm
Di rûzî qiyamet nebin dil seqîm

991 Cewab da ji bû wan resûli ‘Ereb
Bi ‘izz û kemal û bi fexr û edeb

992 Mebin cangiran hûn ji vî qisseti
Ezî we hisab kim ji vî ummeti

993 Bi izna Xudayî ‘ezîz û metîn
Ezî we şefa‘et bikim ecme‘în

994 Ji îşev heta rûzî heşr û ceza
Mekîşin ji vî qisseti yek eza

995 Mi navi we da deftera ummeti
Digel ummeti dî biçîn cenneti

996 Li dû em diçûn ber derî asiman
Heman Cibreîl gazî kir dergevan

997 Veke dergevan qapiyî sade nûr
Bi ‘izz û kemal û bi keyf û surûr

998 ‘Ecel ke veke qapî pur bû dereng
Nida kirye Cibrîl bi sewt û bi deng

999 Dema ku bihîst dergevan ev nida
Bibîje tu kî yî ji bûna Xuda

1000 Cewab da gû Cibrîl im ey muhteşem
Bi min re şehinşahi ‘alî ‘elem

1001 Vekin qapî zû hûn ‘ecel kin bi xar
Ku da bî duxûl ke hebîbi kubar

1002 Bi navî hebîb wan bihîstî cewab
Ji kerb û ji hesret dibûn wek kebab

1003 Derî wan vekirbû hebîbi bi nûr
Bi ‘işq û heraret bi keyf û surûr

1004 Dema çav ketin ser resûli ‘Ereb
Dihatin bi bal ve bi keyf û tereb

1005 Li ser wî selat û selam pur didan
Dihatin li nik wî geran ta geran

1006 Mi dî ev sema tev ji zîrî di sor
Mulewwen bi rengî sipî şîn û mor

1007 Musemma bi ismi munîr e sema
Wuha navi danî Xuda lî hema

1008 Mi dîtin li ser vî semai gelek
Ji esnafî quddûsiya ew melek

1009 Welîkin mi dî yek melek pur mezin
Bi sef sef melek tîn selam lî didin

1010 Eger lî emir ke Xuda hani han
Bi def‘ek bibel‘îne heft asiman

1011 Digel heft tebeq erzi safî turab
Li ber wî wekî yek tene ber xurab

1012 Digel ev xeber pur hezîn e delal
Bi ah e ji tirsa şehi layezal

1013 Sebûr û weqûr e helîm û şekûr
Du‘a û niyazî dike ez xefûr

1014 Fixani diket her dem û sa‘eti
Tu daxil bikî mu’mina cenneti

1015 Kesî namutî‘ e nezane ‘ezab
Ji bû wî yek in çi sewab û ‘iqab

1016 Helîmi li ser muznibi zenbidar
‘Efû ke kesî muznibi tewbedar

1017 Li wî der mi dî babekî pur binûr
Ji nav hindî vî babi nûr jî difûr

1018 Li ser wî nivîsandiye du setir
Diîsin ji wan nûr bi ‘izz û fexir

1019 Nivîsandî yek La Ilah Illallah
Yekî dî Muhemmed resûli Ilah

1020 Çi hîna mi xewn dî qefil hate xwar
Ji ser wî deri nûri pur nazîdar

1021 Mi dîtî ji wî nûr difûrit gelek
Ji ser sethi xamis heta neh felek

1022 Ji wî ta diçit erzi sabi‘ yeqîn
Ji wî ta diçit esfeli safilîn

1023 Mi dîtî cehennem gelek tari ye
Ji rehma Xudî ew hemî xali ye

1024 Welî dû diçit jî bi efrazi xeyb
Emanet di vir da nekî şekk û reyb

1025 Li vî der mi dî yek melek pur mezin
Bi kîn û bi buxz e li mîr û li jin

1026 Şedîdi’l- miras û ‘ezîmu’l-xeter
Ditirsin ji wî qismi cinn û beşer

1027 Di nîv hinde çeşmi wî ‘eqdek mezin
Nikarin binîrin ne insan û cin

1028 Eger ew nezer ke li erzi temam
Hemî can didin serteser bî kelam

1029 Ne berr û ne behr û çiya wî demi
Dimînin diçin tev di gel ‘alemi

1030 Ji ber heybeta maliki nari gur
Çi qismi melaik dikin jî nufûr

1031 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

**Mewzi‘u’t-tederru‘u we’l-ibtihal[81]**
**(Ev beş 51 malik e)**

1032 Ilahî bi zat û sifati qedîm
Bi yumna Muhemmed resûli kerîm

1033 Bi heqqi hemî enbiya û rusul
Bi cahi hemî mu’mini dilbikul

1034 Nedî dîtinî wechi Malik bi min
Bi hewl û bi wî qudreta xwey mezin

1035 Cibrîl û ‘Izrîli sahibhuner
Mi dûr kî ji Malik nebînim keder

1036 Bi Mîkal Serafîli ‘alî’r-ruteb
Mi dûr kî ji Malik bi keyf û tereb

1037 Bi Rizwan û Malik reqîb û ‘etîd
Mi nespîrî nefsa min a pur şedîd

1038 Çikû pur hezîn û neçar im gelek
Bide xatiri şehsuwari felek

1039 Bi wan hamili ‘erşi şahi ‘ezîm
Bi wî hurmeta wî kelami qedîm

1040 Bi hubba şehinşahi axirzeman
Nedî wechi Malik bi min tu ‘eyan

1041 Ji nefs û ji şeytani pîsi mirar
Mi dûr ke Ilahî nebim teng û tar

1042 Zemani mirin tî li ser min heman
Bişîne Muhemmed di weqt û zeman

1043 Ku da ez bidim rûh bi dil wî demi
Bi saya Muhemmed şehi ‘alemi

1044 Şehadet bidim rûh di dev de hema
Ku da ez nebînim çu derd û xema

1045 Dema min duxûl kin di nîv qebri kûr
Dimînim ez û rehma Rebbi Xefûr

1046 Bişîne Muhemmed resûli kubar
Mi himbîz bike deyne ser axi sar

1047 Nekîr û digel Munkerî pur delal
Dema bîne ba min ji min kin sual

1048 Bidî quwwetek pur mezin ey Xuda
Ji dîni Muhemmed nekî min cuda

1049 Ku da ez cewabi bidim wan temam
Bi yumna Muhemmed ‘eleyhisselam

1050 Beraber bi min ra kelami qedîm
Heta der cinani bi qelbi selîm

1051 Mededxahi min be di heşr û ceza
Nehîle bibînim ebed yek eza

[81] “Babeta hêvî û du‘ayan”

1052 Di zumra Muhemmed bikî min heşîr
Nehîlî di heşri bibim dilkesir

1053 Mi ‘ed kî Ilahî ji vî ummeti
Bi fezla xû daxil bikî cenneti

1054 Eger çi xerab im welî î te me
Di ewwel di axir bi te hewce me

1055 Gelek ez feqîr û neçar im eman
Bide xatirî şahi axirzeman

1056 Muhemmed bişîne ji bû min meded
Bi heqqi sifati xû kî ya Semed

1057 Ku şeytan nebîjit yekî ummeti
Sebeb zenb û ‘isyan kete zehmeti

1058 Çikû ew neyar e ji bû me temam
Duxaze me ixwa biket xas û ‘am

1059 Welî ger Xudayî ‘ezîm û metîn
Bişîne meded xatemu’l-murselîn

1060 Nikare zerer kî bide me tu car
Bi yumna Muhemmed resûli kubar

1061 Rica me ev e her dem û sa‘eti
Bi Ehmed me daxil bikî cenneti

1062 Bi hubba hebîbi xû kî ey Xuda
Ji zumra Muhemmed nekî min cuda

1063 Gelû wî çi ye ger Xudayî metîn
Bike şafi‘i min Muhemmed emîn

1064 Ji ‘efwa xû ya Reb nekî min cuda
Ji ‘efwî gelek hesdikî ey Xuda

1065 Çukû tu ‘efûww û kerîmi ebed
Mi ‘ef kî bi ‘efwa xû yî bî ‘eded

1066 Li ber dergehi rehmeti tûle me
Ezel ta ebed ez bi te hewce me

1067 E jî kelbek im ber deri rehmeti
Bi wî rehmeti min bixî cenneti

1068 Çukû bawerim pur bi te ey Ehed
Heye bî nezîr û mesîli ebed

1069 Ne hinkûf û hemta ne zidd û ‘enîd
Ji bû te eya rebbi ferd û wehîd

1070 Qedîr î li ser cumlei kainat
Eger tu nebî nîne bû wan necat

1071 Tu wî xaliqi cumle fi‘li ewan
Welî ixtiyarî bi desti ewan

1072 Eger tu nedî quwwetek pur mezin
Ji bû wan nikarin tehemmul bikin

1073 Çukû em ‘ebîd in tu rebbi qedîm
Me ‘ef ke Ilahî bi ‘efwa ‘emîm

1074 Bi fezla hebîbi xû yi ixtiyar
‘Efû kî gunahi sexîr û kubar

1075 Bi hubba şehînşahi axirzeman
Ji erdi te bir xelweta lamekan

1076 Bi qedri ewan xil‘eti bahir e
Te lî ixtiyar kir hemî zahir e

1077 Me daxil bikî cenbi ‘efwa ‘emîm
Me sabit bikî ser riya musteqîm

1078 Terîqa te da enbiya û rusul
Digel wan ‘ibadi te yî şubhi gul

1079 Sedîq û şehîd û digel salihîn
Me tîxî buhuşti hemî ecme‘în

1080 Selat û selami Xudayî kubar
Bibarin li ser wan hemî bîqerar

1081 Kesî ku li nefsa xû pur nasih e
Bira ew bixûne li me fatihe

1082 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

## Sewqi ma nehnu fîhi eyyuhe'l-wefî[82]

## (Ev beş 172 malik e)

1083 Were Necli Ewhed bi ah û fixan
Beyan ke li me meqseda lamekan

1084 Dema çû Muhemmed li xamis sema
Li wî dî 'ecaib gelek wî hema

1085 Li ser sethi dî qubbeyek faxir e
Şu'ai ji nûri ji wî zahir e

1086 Ji wî nûr difûre heta jîri gil
Mi dîtî cehennem bi zencîr û xul

1087 Zefîr û fixan jî diçit neh felek
Li wî dî li ser cehnemi yek melek

1088 Welîkin bi tirs û muhîb û murîb
Ji xelqiyyeta wî dimame 'ecîb

1089 Nihayet mi pirsî exî Cibreîl
Beyan ke çi şexs e evî biddelîl

1090 Çukû min nedî der sema û zemîn
Wekî vî bi vî heybeti ecme'în

1091 Were tu beyan ke li min ev ki ye
Ku da ez bizanim heqîqet çi ye

1092 Cewab da ji bû min exî Cibreîl
Ev e xazini cehnemi biddelîl

1093 Ev e malik û xazini nari kûr
Cemî'i xelaiq dikin jî nufûr

1094 Ji rûja Xuda xelq kirî wî li vir
Ji sext û xezeb xeyrî wî çînekir

1095 Zeman ta zeman ew bi buxz û bi kîn
Li ser wan neyarî Xudî ecme'în

1096 Ne ev ne melek mewti sahibxeter
Ne dihk û tebessum li wan bû eser

1097 Bi pîş de here lî selami bike
Ne tirs û ne heybet xitabi bike

1098 Kerem ke here ey şehi ins û can
Li wî de selami bi rûh û bi can

1099 Eger çi dibînî bi buxz û bi kîn
Neyar e li ser muşrik û kafirîn

1100 Bi serbest kerem ke bi keyf û surûr
Qeder zerreyek tu nekî jî nufûr

1101 Dema çûme ba wî mi lî kir selam
Bi 'izz û bi lutf û bi qedri temam

1102 Nedî min wekî wî bi vî heybeti
Cemî'i xelaiq dikin nefreti

---

82 "Sewqa ku em tê de"

1103 Ne redda selami ne redda cewab
Mi hin dî selam da bi wî kir xitab

1104 Hema jî re gû Cibreîli humam
Sebeb çi tu nadî li Ehmed selam

1105 Hebîbi Xuda seyyidi ‘alemi
E‘ezzi’l-xelîq e di gav û demi

1106 Nizanî ev e î Xudayî wedûd
Temami xelaiq ji bû kir wucûd

1107 Dema Maliki dî resûli bi heq
Suwarî li şehper bi heftim tebeq

1108 Li nik wî qiyam e bi ‘izz û kiram
Hema rabû ser xû bi redda selam

1109 Digûtî leke’l-‘uzr û ya Mustefa
Tu halim dibînî bi sidq û sefa

1110 Ji weqta Xuda xelq kirî neh felek
Me anî wucûdi çi qismi melek

1111 Bi her yek wezîfek di danî li ber
Emir kir ji heddi xû der nîne der

1112 Zeman ser zemani ku bûrîn li me
Çewa me dibîni ev e hali me

1113 Nikarin seri xû bi hevrazî xin
Ji ber heybeta wî Xudayi mezin

1114 Muheqqeq dizanî Xudayi ‘elîm
Dema wehyî kir wî kelami qedîm

1115 Çiqasî melaik di der asiman
Dibûrin li ser wan hezaran zeman

1116 Ne ‘isyani yû bîemir tîte der
Bi diqqet wezîfa xû digrin eser

1117 Ji lew min dibînî bi vî diqqeti
Nikarim bi paşxim ji vî heybeti

1118 Rica min heye pur ji pay û qedem
Li min negrî ey şahi Beytûherem

1119 Emir ke çi emrî dikî ey resûl
Muheqqeq li nik min ew e pur qebûl

1120 Dizanim çi ni‘met Xuda daye min
Li min zeyf û mihvan e şahi mezin

1121 Dizanim şeva bîst û hefti receb
Li min zeyf û mihvan e fexri ‘Ereb

1122 Welîkin nikarim ji tirsa Xuda
Ji vî xizmeta xû bibim ez cuda

1123 Ricai dikim bîhed û bîqeder
Bibûrî ji min ey şehi mu‘teber

1124 Dema ev rica dî Muhemmed resûl
Hisab kir li ba xû rica wî qebûl

1125 Welîkin resûl û şehi ins û can
Dema ev rica dî ji Malik ‘eyan

1126 Digûtî fetih ke derî cehnemi
Ku da ez bibînim cihî ‘alemi

1127 Gelû wî çewa kin di nari seqer
Nikarin hilînin ne cinn û beşer

1128 Were tu fetih ke derî hani han
Ku da ez bizanim çi ye hali wan

1129 Ji kerb û ji vî hesreta ummeti
Dikîşim eziyyet bi vî hesreti

1130 Cewab da ki ya eşrefî kainat
Nikarim vekim vî derî qat bi qat

1131 Mi nîne izin ez vekim vî derî
Ricai dikim ez ji peyxemberî

1132 Bi derhal nida hate Malik ‘eyan
‘Ecel ke veke qapiyî pur giran

1133 Emanet bi diqqet şiyar be melek
Veke qapî bû Ehmedi çavbelek

1134 Heman wî keşif kir ji nari hicab
Difûrî ji wî tîti bihna kebab

1135 Gelek tari ye muzlim e ev Cehîm
Bi sewt û seda û zefîr e muqîm

1136 Kesek qet nikare binîre li wî
Ji ber heybet û dehşeta ku li wî

1137 Heta hate gûtin ku nari cihan
Ji bû ra heye ruhnî ev qa zeman

1138 Çukû hate şûştin bi mai’l-bihar
Dişûştin li wî bû temam hefti car

1139 Heta jî re çîbû ziya wî demi
Ji lew bû menafi‘ ji bû ‘alemi

1140 Mi dîtin ji xislîni hefti hezar
Wekî wan ji xessaqi behri kubar

1141 Wekî wan ji qetrani pîs ey humam
Wekî wan risasi helandî temam

1142 Li ser her yekî van buhûri ‘izam
Hezar belde tî da ji nari hutam

1143 Di her beldekî ev qa qesri ji nar
Di her qesrekî tî de nari kubar

1144 Gelek tî de tabût hene bî‘eded
Di wan de hene sindiqi bîmeded

1145 Di her sindiqi nari Zati’l- Weqûd
Kî hefti hezar new‘ ‘ezab tî wucûd

1146 Mi dîtin heyat û ziya ey xelîl
Wekî dari xurma dirîj û tewîl

1147 ‘Eqarîb û dûpişk mi dîtin gelek
Wekî qatira dûv li ser wan xelek

1148 Mi hefti hezar bîr didîtin ji dûr
Hemî zemherîr in çû qe‘rî bihûr

1149 Mi dîtin gelek jin bi ah û enîn
Bi huzn û bi kerb û bi şîn û girîn

1150 Bi gazî hewar in cewab nîne qet
Bi derd û bi îş in rehim nîne qet

1151 Mi gûte exî Cibreîl ev çi kes
Ji bû min beyan ke çine bîhewes

1152 Digûtî ev in î xû tezyîn dikin
Ji bû xeyri zewci xû tedhîn dikin

1153 Mi dî hinde jin rût û tazî ji wan
Li ser wan e derpî hemî qetiran

1154 Şidandî bi zincîr û lellî kubar
Bi ah û fixan in ji nari xedar

1155 Mi gûte exî Cibreîli delal
Were tu beyan ke li min keşfi hal

1156 Beyan ke li min tu evan mer’eta
Ji bû çi dikîşin evan ezyeta

1157 Digûtî eya şahi dîni Huda
Eya rewneq û nûra zati Xuda

1158 Ev in î bi mîrî xû ra pevdiçin
Xeberdani fehşî ji bû wan didin

1159 Dibîjin çi wechek qebîh e li te
Çi wechek qebîh e Xuda daye te

1160 Ji bîna genî kes nikare ebed
Bibe nîzî te tev bi muhr û sened

1161 Nizanin Xudayi ku wan xelq kirî
Yek e yek Ilah e ji ‘eyba berî

1162 Mi dîtin hinek jin wekî wan xerab
Dev û pûzi wan tî gilîz û lu‘ab

1163 Diçin tîn di nîv agirî her zeman
Dişewtin dev û pûz û dest û ziman

1164 Mi pirsî ji Cibrîl mi jî kir sual
Were tu beyan ke li min keşfi hal

1165 Cewab da ev in î ji mîrî xû ra
Dibîjin mi berde kurî sed kera

1166 Ez û tu ne hinkûf in ev qa zeman
Dibînim ji te ez çi derd û xeman

1167 Tu pîr û cuwan im li min hey felek
Çewa min li ba te ‘umur kir gelek

1168 Eger min bigirta şebabek cuwan
Mi zanî mi lezzet didî her zeman

1169 Were tu mi berde eya bîedeb
Ku da ez bikim keyf û ferh û tereb

1170 Mi dîtî hinek jin mu‘elleq bi pûr
Dimaxi serî wan difûrit li jûr

1171 Di nîv agirî da ev e hali wan
Wuha hate gûtin ji şahi cihan

1172 Mi gûtî ku kî ne eya Cibreîl
Beyan ke ji bû min bi sidq û delîl

1173 Cewab da ev in î ku pûrî serî
Di qussîn û tîn çarşiyî serserî

1174 Dikîşin hinek mû di bin nasiyî
Ku her kes bibîne ji vî çarşiyî

1175 Xu lîvsûr dikin cumle pîr û cuwan
Bi vî hey'eti tev diçin çarşiyan

1176 Hinek jî kirasi li wan kurt û teng
Diçin tîn di nîv çarşiyî rengereng

1177 Hinek jî gelek rût û tazî ji bin
Ku her kes bibîne çi mîr û çi jin

1178 Hinek jî dili wan bi bal ve diçit
Hinek tif dikin le'netî lî dikit

1179 Ne namûs bi wan re ne ba mîrî wan
Ev e hal û ehwali axirzeman

1180 Ne şerm û heya ye ne ba wan edeb
Bi vî hey'eti tev bi keyf û tereb

1181 Nezanin mirin, ne 'ezabi Xuda
Ji vî hey'eti qet xû nakin cuda

1182 Ji lew ew diçin cehnemi serteser
Ji derka 'ezabi dibin bîmefer

1183 Xuda me ji wan dûr bike her mudam
Bi cahi Muhemmed 'eleyhisselam

1184 Hinek jin bi pûrî serî xû yeqîn
Mu'elleq dibin ew di nîv agirîn

1185 Bi şewk û kelalîbi sade ji nar
Mu'elleq di bin ew di nari kubar

1186 Mi pirsî ji Cibrîl evan hurmeta
Sebeb çi dikîşin evan ezyeta

1187 Cewab da ev in şîr didan bî riza
Ji lew ew dibînin di agir eza

1188 Mi dîtin hinek jin bi dest û ziman
Diçin tîn di nîv agirî hîn û an

1189 Mi gûte exi Cibreîl ey exî
Beyan ke li min hali wan ey sexî

1190 Çukû ez dibînim ji wan 'ibreti
Dikîşim ji wan ez gelek hesreti

1191 Were tu beyan ke li min hani han
Ku da ez bizanim hemî hali wan

1192 Cewab da ev in î ku bî dewlet in
Bi buxz û bi kîn in bi bî 'işret in

1193 Nizanin ku desmîjî bigrin tu car
Siya bû cesed tev qirîj û buxar

1194 Ji heyz û cenabet xusul naketin
Limîja xû sistî dikin ta diçin

1195 Mi dîtin hinek kerr û lal û 'ema
Cihî wan di tabûti agir hema

1196 Dimax û mejî wan çû duhni muzab
Genî ne ji wan tîtî bihna kebab

1197 Bi derd û bi îş in hemî bittemam
Genî ne wekî bihna behq û cuzam

1198 Mi pirsî ji Cibrîl ‘ecel ke ‘ecel
Beyan ke li min hali wan bî xelel

1199 Çukû ez di îş im bi wan bîhenek
Dizanî bibîje ji bû min melek

1200 Cewab daye Cibrîl ev in zaniyat
Dihetkin bi riswayî der kainat

1201 Çi hîna weled bî wucûdi ji wan
Dibîn ev weled î te ye ey fulan

1202 Mi dîtî hinek jin bi dest û piya
Di tendûri agir evî bî heya

1203 Digûtî ev in î musellit lisan
Li ser mîr û ezwaci xû her zeman

1204 Mi dîtî hinek jin bi wechi siya
Dixûn ruviyî xû hemî ser piya

1205 Bibîje ji bû min ‘ecel ke ‘eyan
Seraser bibîje li min ke beyan

1206 Digûtî ev in fahişati enam
Dikin cem‘i isneyn di fi‘la heram

1207 Mi dî yek jinik şubhi xenzîri har
Serî gel beden her wekî yek himar

1208 Li ser wî hezar new‘ ‘ezabi şedîd
Di dest û piyî wî de xilli hedîd

1209 Mi gûtî ki ye ev jina bîmedar
Dibîne di agir ‘ezabi kubar

1210 Were tu beyan ke li min ke ‘eyan
Dibînim di agir bi ah û fixan

1211 Cewab da kî ev jin xemam û du rû
‘Edawet dixit mu’mina rû bi rû

1212 Di nîv zewc û cîran ‘edawet dixet
Bi kizb û xilafi bi wan pur diket

1213 Mi dîtin hinek jin bi ah û fixan
Bi can û cesed her wekî qatiran

1214 Dihîşin wekî qatira bîedeb
Di nîv nar û agir bi kerb û te‘eb

1215 Ne ser şekli insan evan hurmeta
Şev û rûj dikîşin evan ezyeta

1216 Mi pirsî ji Cibrîl çi ye fi‘li wan
Kerem ke were bîje hal û beyan

1217 Cewab da ev in î diçin berbera
Li ser kursiya rûdinîn wek kera

1218 Bi keyf û bi şahî ne şerm û heya
Hemî rût û tazî li ser kursiya

1219 Serî wan diqussîn bi miqraz û şeh
Bi hev ra dileyzin wekî kelb û seh

1220 Dev û lîvî wan sûr dikin wî demi
Dibin wek sehi har di nîv ‘alemi

1221 Ne namûs bi wan re ne ba berbera
Bi hev ra dihîqin bi şubhi kera

1222 Mi dîtin gelek tirs û hewl û ‘ezab
Dilî min dişewtî bi şubhi kebab

1223 Mi dîtin di wî da ‘ezabi şedîd
Nikarin hilînin hicar û hedîdl

1224 Gelek mame heyrî ji vî mihneti
Ditirsam ji bû xatiri ummeti

1225 Mi dîtî cehennem çi jûr û çi bin
Mi dî ekseri ehli wî cumle jin

1226 Mi dî Malikî der li wî dadida
Dibû ew bi şubhi berî bîseda

1227 Li ser sethi xamis mi dîtin gelek
‘Ecaib ne wek sethi her neh felek

1228 Heman Cibreîl gazî kir an zeman
Sufûfi xû bigrin li şahi cihan

1229 ‘Ecel kin ‘ecel em biçîn meqsedî
Ku da paşnekev emr û nehyî Xudî

1230 Subûhiyyû qudsî li xamis sema
Sefi xû girîdan li wî der hema

1231 Bi tesbîh û bi tehlîl û sewt û seda
Selat û selam dan li şahi Huda

1232 Hemî hatine ber piyî çavbelek
Bi ah û fixan in cemi‘i melek

1233 Ricai dikin jî hemî serteser
Nehîlî di heşri bibînin keder

1234 Nihayet sefi xû girîdan temam
Li dû ra Muhemmed ‘eleyhisselam

1235 Du rek‘et limîj min dikir wî demi
Li pîş bûm imam ez li vî ‘alemi

1236 Dema bû temam ev limîja giran
Sela da melaik li heft asiman

1237 Ji îşev nuha em dizanin hene
Sema û zemîn bû li me rewşen e

1238 Li ser şehperî Cibreîli delîl
Dihatî li nav me resûli celîl

1239 Werin hey werin hey werin ey melek
Bi rûmali wî bin li sethi felek

1240 Rica xû ji wî kin dem û sa‘eti
Ku da ew me ‘ed ke ji vî ummeti

1241 Selat û selama bidin aşikar
Li ser Ehmedi şubhi gul bîqerar

1242 Li me bûye mihvan di vî sa‘eti
Nebiyyi Huda şahi vî ummeti

1243 Werin rû bimalin li şahi Hicaz
Li ser sethi xamis bibin serfiraz

1244 Werin tev bi hev ra selata bidin
Li ser Ehmedi şahi insan û cin

1245 Werin hî neçûyî sera lamekan
Selata bidin ser şehi ins û can

1246 Dihatin hemî serteser ew melek
Li ber payî Ehmed şehi çavbelek

1247 Bi ah û fixan in hemî serteser
Xû davîne ser payî şahi beşer

1248 Hemî em li ber te esîr û zelîl
Di rûzî qiyamet bibî tu delîl

1249 Bi te ilticai dikin em butûn
Di rûjî ceza deftera me bixûn

1250 Rica me heyej murşidi ‘alemi
Bibe rehberî me di gav û demi

1251 ‘Eded kulli zerrati kewn û mekan
Selat û selam ser şehi ins û can

1252 Ne‘em gûtî sultani cinn û beşer
Li ba min rica we gelek mu‘teber

1253 Bi izna Xudayî cemî‘i enam
Ezî we şefa‘et bikim der qiyam

1254 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

## Mebhesu irtiqai’n-nebiyyi (‘e.s.w.) ile’s-semai’s-sadise[83]

## (Ev beş 235 malik e)

1255 Bi hemd û sena û selat û selam
Me ev bendi anî wezin bittemam

1256 Ku da hûn nebin cangiran serteser
Li ber sîreta xeyri cinn û beşer

1257 Çukû bîwezin pur melamet dibit
Bi wezni helawet gelek çîdibit

1258 Me qesd e ku em sîreta Mustefa
Beyan kin bibîjin bi keyf û sefa

1259 Çi fezlek Xuda da şehi ins û can
Heta ku ji erzi birî lamekan

1260 Di zerfi şeva bîst û hefti receb
Li nik Ummi Hanî resûli ‘Ereb

1261 Xuda gûte Cibrîl û Mîkali pak
‘Ecel kin herin erzi ser rûyî xak

1262 Buraqek muzeyyen bibin bû hebîb
Ku da lî suwar bit hebîbi lebîb

1263 Di zerfi şevî da melek sef bi sef
Li Mekkî qerar dan hemî ref bi ref

1264 Dibû welwele nîv cemî‘i melek
Selata didin ser şehi çavbelek

1265 Bi derhal nida da Xudayi kerîm
‘Ecel kin ku bînin hebîbi ‘ezîm

1266 Welîkin bi diqqet eya Cibreîl
‘Ecel ke here zû digel Mîkeîl

1267 Welîkin ku hûn çûn sera Ummi Han
Edeb kin edeb kin dema pî gihan

1268 Ji ber min ve lîkin hezaran selam
Edeb kin bi ‘izz û bi lutf û kiram

1269 Bibîjin ku ev xaliqi ins û can
Dixwazit te bînit sera lamekan

1270 Ku da hinde ni‘met biket yadigar
Suwari li Refref hebîbi kubar

1271 Heman Cibreîl û digel Mîkeîl
Dihatin li ber payî şahi cemîl

1272 Digûtin ela ey şehi bawefa
Resûli mu‘ezzem bi sidq û sefa

[83] “Behsa bilindbûna Nebî (s.‘e.w.) a ber bi ‘esmanê şeşemîn ve”

1273 Xuda hedye kir pur selami temîz
Li ser te ela ey resûli ‘ezîz

1274 Dixwazit ku teşrîf bikî lamekan
Kerem ke tu rabe şehi ins û can

1275 Resûli mu‘ezzem ku dî Mîkeîl
Beraber bi wî ra exi Cibreîl

1276 Ji hindav de rabû selam kir li wan
Hebîbi mu‘ezzem şehi ins û can

1277 Digûtî ku xeyr e di ev nîvi şeb
Beyan ke li min zû bi keyf û tereb

1278 Gelû te wehî aniye ey melek
Beyan ke ji bû min neke reyb û şek

1279 Cewab daye Cibrîl eya şehriyar
Xuda te dixwaze li ba xû bi xar

1280 Kerem ke suwar be şehi neh felek
Ji bû te muheyya ne cumle melek

1281 Hemî sef girîdan ji bû şahi dîn
Kerem ke suwar be li rûyi zemîn

1282 Bi teşrîf kerem ke eya rûh û can
Ku da tu biçî xelweta lamekan

1283 Dişandî Xuda yek Buraqek temîz
Suwar bî li ser ey resûli ‘ezîz

1284 Digel hulle û taci nûri zelal
Ji bû te dişandî şehi layezal

1285 Evan tac û hullî ‘ecîb û bedî‘
Dişandî ji bû te Xuda ey şefî‘

1286 Kerem ke tu rabe li me bû dereng
Lebis ke tu van tac û hullî bireng

1287 Dema wî hebîbi ‘ezîm sehkirî
Ji hindav de rabû li xû werkirî

1288 Diçû ber Buraqi li wî bû suwar
Melek sef girîdan ji bû şehriyar

1289 Selat û selam dan li şahi cihan
Selamlix girîdan ji bû wî ‘eyan

1290 Bi hev ra diçûn ta bi Qudsi Şerîf
Bi sef sef ji wî çûn semai zerîf

1291 Ji ser asimani yekî çûn bi lez
Ji wî çûn semai duwa se‘y û bez

1292 Nida hati nik xaliqi ins û can
‘Ecel kin hebîbi mi bînin ‘eyan

1293 Heman Cibreîl kir seda û fixan
Li subbûhiya gû eman sed eman

1294 ‘Ecel kin bi sef sef biçîn meqsedi
Ku da paşnekev emr û nehyî Xudi

1295 Bi teyran bi hevrazî çûn el‘ecel
Heta çûn semai siya bî xelel

1296 Ji ser asimani siya ew hema
Bi teşrîf çûn ta bi rabi‘ sema

1297 Ji rabi‘ sema çûn bi ah û fixan
Heta çûn bi xamis sema ew gihan

1298 Bi lez çûn semai şeşa hani han
Wekî turfe ‘eyni heman pî gihan

1299 Heman Cibreîl çû heta ber derî
Li qapî dixistî ewî rehberî

1300 Digûtî vekin hûn derî bû dereng
Li me ey sukani semai bireng

1301 Digûtî ‘ecel kin li vî meqsedi
Ku da paşnekev emr û nehyî Xudi

1302 Werin hûn vekin qapî zû hani han
Ji bû na şehînşahi axirzeman

1303 Cewab dan ji bû tariqi serteser
Ki ye tî li qapî dixe bî xeber

1304 Bibîje ji bû me di ev nîvi şev
Li qapî dixî te sema kir telef

1305 Cewab daye Cibrîl ez im Cibreîl
Çewa ez li qapî dixim bî delîl

1306 Veke zû ‘ecel ke derî asiman
Dereng e ji çûna sera lamekan

1307 Bi tehqîq dema gûşi kir dergevan
Ki ye î digel te bibîje ‘eyan

1308 Di ev nîvi şev da sema bû binûr
Bibîje ji bû min bi keyf û surûr

1309 Ji bû dergevan gû exî Cibreîl
Ev e î digel min resûli celîl

1310 Muhemmed resûli Xudayi kerîm
Dixwaze biçit ser wî ‘erşi ‘ezîm

1311 Veke dergevan qapiyî sade nûr
Muhemmed diçit xelwa zati Xefûr

1312 Heman wî ‘ecel kir derî lî vekir
Gelek hemd û şukri Xudayi xû kir

1313 Dema wî vekir qapiyî pur kubar
Heman dî Muhemmed li şehper suwar

1314 Bi husn û cemal û bi ‘izz û kemal
Diçit xelweta wî şehi layezal

1315 Selat û selam dan li ser wî gelek
Cemî‘i melaik li sethi felek

1316 Dibû ah û efxan li sadis sema
Bi Refref dihatin qe yek jî nema

1317 Werin tev xû pî em ziyaret bikin
Ev e ew hebîbi Xudayi mezin

1318 Dihatin li ber wî hemî ref bi ref
Li pîş û li paş wî kirin sef bi sef

1319 Bi tehlîl û tesbîh pur zemzeme
Bi ah û fixan in hemî demdeme

1320 Selat û selam dan li şahi zeman
Ji bû wî kirin hedye û ermexan

1321 Dema zati enwer dihatî huzûr
Semai şeşa tev tijî bû ji nûr

1322 Dibû welwele nîv cemî‘i melek
Li dûr şahi enwer dibûn wek xelek

1323 Dihatin li ber wî bi keyf û tereb
Selat û selam dan li şahi ‘Ereb

1324 Gelek wan edeb kir li ber Mustefa
Bi lutf û kerem hem bi sidq û sefa

1325 Digûtin rica me ji payî resûl
Li ba xû tu bigrî rica me qebûl

1326 Di rûzî qiyamet bikî şadiman
Me daxil bikî defterî eleman

1327 Hetanî nuha em ditirsîn gelek
Cemî‘i melaik li sethi felek

1328 Ji vir pî ve tirsa me çû vî demi
Li me bû musafir şehi ‘alemi

1329 Şefa‘et bikî me di der sa‘eti
Me daxil bikî deftera ummeti

1330 Dixwazin beraber bi te bin heval
Di rûzî qiyamet nebînin sual

1331 Resûli mu‘ezzem ‘eleyhisselam
Rica wan li ba xû qebûl kir temam

1332 Eger hesbiket rebbi erz û sema
Mekîşin ji vir pî ve derd û xema

1333 Dema em duxûl bûn li ser sadis e
Ji yaqûti kesk e bi nav xalis e

1334 Mi dîtin ‘ecaib di wî de gelek
Welîkin di nav wan mi dî yek melek

1335 Celîs e li ser kursiyek sade nûr
Bi emri Xudayi ‘ezîzî xefûr

1336 Hinek berf e hindek ji nari zelal
Bi hukm û bi wî qudreta zulcelal

1337 Ne agir bi teb‘i xû berfî dibit
Ne berfî heraret ji wî hildikit

1338 Dike welwele ew bi qelbi hezîn
Bi ah û bi wah û bi şîn û girîn

1339 Dibîjit kî Subhan e zati kubar
Mehebbet duxûl kir di nîv selc û nar

1340 Tu qelbi ‘ibadi xû yi mu’minîn
Qewî kî li serr ta‘eti ecme‘în

1341 Temami melaik di der heft sema
Dibîjin kî “amîn” ji bû wî hema

1342 Mi gûtî exî Cibreîl ev ki ye
Dizanim ji wî re gelek qenci ye

1343 Mi nedye wekî wî bi qelbi hezîn
Du‘ai diket ew ji bû mu’minîn

1344 Bibîje ji bû min bi sidq û sefa
Ki ye ev meriv zû eya bawefa

1345 Digûtî ela ey resûli hebîb
Eva yek melek der sema pur ‘ecîb

1346 Xuda heft sema xistne ber hey’eti
Temamen ji bû xatiri ummeti

1347 Du‘ai diket ew ji bû wan temam
Wuha wî du‘a ke heta bî qiyam

1348 Li dû çûme nik wî selam lî dikir
Selama mi da min şukur pur dikir

1349 Gelek merheba gû bi husni edeb
Mi girtî ji me’rifeti pur ‘eceb

1350 Mi nedye wuha der sema û zemîn
Du‘ai biket ew ji bû mu’minîn

1351 Li dû min didî kehlekî enwerî
Di rîj û bi mû rengekî esmerî

1352 Li wî cubbekî pur sipî lî hebû
Xu da ser ‘esa jî re ew tekye bû

1353 Bi lehy û bi sûret sipî tî sedir
Bi lutf û bi ‘izz û kemal û fexir

1354 Mi pirsî ji Cibrîl ki ye ev delal
Emir ke bibîje ji bû min heval

1355 Cewab da ki Muse’bnu ‘Imran e ew
Xuda kir tecellî li wî tew bi tew

1356 Xuda fezlekî pur mezin jî re da
Di nîv ‘alemî da xû kir canfida

1357 Here nîzî wî hem li wî ke selam
Bi ‘izz û bi lutf û bi qedri temam

1358 Çukû pur ‘ezîz e li nik zîlcelal
Bi lutf û bi fezl e evî pur delal

1359 Xuda jî re Tewrat kelami qedîm
Wehî kir ji bû ew bibit musteqîm

1360 ‘Esayek Xudî dayî der kainat
Di der wî ‘esayi hezar mu‘cizat

1361 Xuda pur ji wî razi ye ey resûl
Çi fi‘l û çi eqwal li nik wî qebûl

1362 Zemani risalet ji bû hate xwar
Ewî gûte Fir‘ewn û ali xedar

1363 Werin hûn bi îman Xuda kin qebûl
Xuda min dişandî bi bal we resûl

1364 Werin hûn bikin terk evan heykela
Muheqqeq li ser we dibin ev bela

1365 Werin guh medin qewl û fi‘li derew
Di nari cehennem dibin kew bi kew

1366 Ebed guh nekin fi‘l û eqwali zûr
Bi van i‘tiqada dibin dûredûr

1367 Mexapin bi Fir‘ewn û kizbi di wî
Hemî iftira ne dibînin ji wî

1368 Nihayet hinek jî dibûn mu’minîn
Hinek mane der firqeya muznibîn

1369 Di der şehri Misri dibûn du ferîq
Ferîqek mecazî yekî jî heqîq

1370 Ferîqa mecazî bi Fir’ewni dûn
Hemî i’tiqadî dikin pî butûn

1371 Ferîqa heqîqî bi Mûsa resûl
Bi peyxemberîtî dikin wî qebûl

1372 Ferîqa heqîqî feqîr û neçar
Ji ber qewmi Fir‘ewn dibin teng û tar

1373 Gelek ew eziyyet dikîşin ji wî
Ji buhtaniyû iftirai li wî

1374 Hemî qewmi Mûsa digû ya resûl
Rica me li ba xû tu bigrî qebûl

1375 Nikarin tehemmul bikin ezyeti
Ji Fir‘ewn û Haman û vî muhneti

1376 Çukû em feqîr û ‘ebîd in temam
Ji bû qewmi Fir‘ewn û ehli heram

1377 Ji lew zulm û te‘da dikin her zeman
Muheqqeq nikarin hilînin ji wan

1378 Di wî weqti Cibrîl xû tebdîli kir
Bi lebsi ‘Ereb da nekin tu fikir

1379 Heta hate Fir‘ewn bi lebsi cedîd
Ji bû kes nenase evî tek wehîd

1380 Digûtî eya padişahi şehir
Bi ‘edl û belaxet bû pî muştehir

1381 Merivkî mi da mulk û mal û menal
Digel bax û bûstan qusûri ‘ewal

1382 Mi jin jî re anî weled çîdibûn
Heta bûn suwari li hespa butûn

1383 Nuha ew berî xû didin min bi kîn
Hisabi mi nakin li rûyi zemîn

1384 Gelû wî çi ye ev di şer‘a te da
Ji bû min bibîje di bexti te da

1385 Cewab daye Fir‘ewn ji bû î ‘Ereb
Ji min vî hilîne bi keyf û tereb

1386 Eger ev meriv î bi inkar û kîn
Di hukmi mi daye li rûyi zemîn

1387 Ezî wî qetil kim di der behri kûr
Ji ber kîn û buxza ji wî bû sudûr

1388 Ji bû wî re gû Cibreîl wî demi
Tu derxe ji qelb û dilî min xemi

1389 Bide min tu resmek bi muhr û sened
Ku da xel bizane ev e ta ebed

1390 Cewab daye Fir‘ewn ji bû Cibreîl
Tu rûnî bidim te sened biddelîl

1391 Tu derxe ji qelb û dili xû xeter
Çi bînim seri wan bi buxz û huner

1392 Li dû wî nivîsand senedkî mezin
Xû hişyar bikin tev binîrin li min

1393 Eger yek merivkî bide mulk û mal
Bide yek merivkî bi ‘izz û kemal

1394 Jinî jî re bîne weled çîbibin
Li dû jî re tev dujminî pî bikin

1395 Ji ferza ne xerqa wî der ev behir
Ku da kes li pî wî neket ev fexir

1396 Ev e cumle ‘alem bizane ji min
Di şer‘a mi de hûn hemî guhbidin

1397 Bi muhr û bi imza dida Cibreîl
Ji wî rabû çû der bi hukm û delîl

1398 Evî kelbi qet fihm nekir ev xitab
Heta ev sened kir bi resma cewab

1399 Bi xû wî li ser xû qerar kir temam
Le‘în û mirari xebîsi enam

1400 Nihayet ji nik wî diçû Cibreîl
Heta çû gihîşt ‘eskerî Isreîl

1401 Digûtî ji şehri bi derve herin
Ku nesret bibînin ji Rebbi mezin

1402 Dema ew bibîjin ku hûn derketin
Ji şehri bi bal çûl û sehra ketin

1403 Ewî bidne pey we bi keyf û surûr
Heta bîn hûn pur bibin dûredûr

1404 Metirsin Xuda pur ji we razi ye
bin tabi‘i Mûsa ‘Imraniye

1405 Dema wan bihîstî kelami metîn
Tedarek kirin xû hemî ecme‘în

1406 Xeber dane Mûsa bi ‘izz û kemal
Kerem ke bi derve here ey delal

1407 Ku da em xelas bin ji vî zalimî
Muheqqeq bi fi’li wî pur ‘alimî

1408 Cewab daye Mûsa Benî Isreîl
Nuha gûte min wî exî Cibreîl

1409 Zemani ji Misri herin hûn ‘eyan
Berî xû ji vir bidne behra giran

1410 Ezî wan di vî de hemî xerqi kim
Ji bû min Xuda emri kir ev hukum

1411 Werin em bi hev ra hemî em biçîn
Ji Fir‘ewn û Haman mebin dilhezîn

1412 Zemanî we hatî yeqîn bittemam
Ji vî gûtina min ku gû wesselam

1413 Dema wan bihîstî ji Mûsa xeber
Evî gûtina pur xweş û mu‘teber

1414 Hemî derketin qet nema yek li mal
Heta çûn gihan Mûsa pur delal

1415 Digûtin ‘ecel ke ‘ecel hani han
Ku da ew nebînin li vir me ‘eyan

1416 Diçûn ew bi tirs û bi hewl û xeter
Ne rah û ne cay û ne lî yek eser

1417 Heman dîn ku Fir‘ewn digel ‘eskerî
Li pey wan ‘ecel tîn wekî serserî

1418 Ditirsan heçî ‘eskerî Isreîl
Ji nagah de dîtin exî Cibreîl

1419 Ji Mûsa re gûtî ‘esa hilde zû
Li behrî xe da şeq bibit zû be zû

1420 ‘Esa wî hilanî li behrî dixist
Dibû dûzde perçe ne kîm û ne sist

1421 Heman ew bi pîşket li behra giran
Hemî ‘eskerî wî li pey bû rewan

1422 Dema ew duxûl bûn di behri siya
Serî hespi Fir‘ewn li wî bû xuya

1423 Heman hate wî Cibreîl el‘ecel
Li hespek mu‘înî suwar e bifehl

1424 ‘Ecel kirye Cibrîl bi hespa mu‘în
Dida ber dev û pûzî hespî le‘în

1425 Dema wî didî ev mu‘îna bifehl
Li hespa mu‘înî dikir wî ‘ecel

1426 Heman Cibreîl çû di behra rewan
Evî hespî lîkir seda û fixan

1427 Qe Fir‘ewn nikarî bigirta serî
Diçû pî mu‘înî wekî serserî

1428 Zemani ku Fir‘ewn duxûl bû temam
Bi ‘esker duxûl bû hemî xas û ‘am

1429 Di behrî diçin her wekî çarşiya
Hemî ew yekayek ji hevdû xuya

1430 Dema derketî ‘eskerî Isreîl
Li Fir‘ewn vegîra exî Cibreîl

1431 Dida dest sened ew bi imza û mûr
Ewa wî bi desti xû lî kir sutûr

1432 Digûtî eya kafiri dînbetal
Te rûjek nekir qet çû fikr û xiyal

1433 Bi zulm û ‘inadî bi kufra şedîd
Te ‘umrî xû derbazkirî ya ‘enîd

1434 Tu zanî ku îrû temam bû ecel
Nikarî tedaxul bikî yek xelel

1435 Dema vî le‘îni ku dî ev meqam
Xû avîte Cibrîl ‘eleyhisselam

1436 Digûtî mi îman bû wî aniye
Ewî ku Benî Isreîl aniye

1437 Heman Cibreîl hinde av û herî
Dixiste devî wî le‘îni ferî

1438 Çikû der ezel ev le‘în muşrik e
Di kufra le‘îni meke qet şik

1439 Nihayet dema vî resûli celîl
Bihîstî xitab ez exî Cibreîl

1440 Bi Mûsa giha hem selam lî dikir
Bi lutf û kemal û bi ‘izz û fexir

1441 Dema Mûsa dî hat hebîbi Xuda
Ji hindav de rabû selam lî veda

1442 Ji bû ra gelek merheba hedye kir
Li nav her du burhî wî teqbîli kir

1443 Bi ze’mi Benû Isreîla temam
Kî Mûsa bûye efzeli xas û ‘am

1444 Nizanin ev e efzeli kainat
Li ser wî hezaran selam û selat

1445 Nebiyyi Qureyşî ji nesla ‘Ereb
Bi lutf û kemal û bi fexr û ‘edeb

1446 Eve ew Hebîbi Xudayî kerîm
Eve î Xuda bir li ‘erşi ‘ezîm

1447 Eve î ku Bûraq Xuda jî re şand
Heta wî bibali du qewsa gihand

1448 Eve î li şehper suwari melek
Heta pî dida wî li sethi felek

1449 Ev e î ku ref ref ji bû ra dihat
Ev e î ji wî çîdibin mu'cizat

1450 Ev e î Xûda bir sera lamekan
Bi teşrîf ji wî meclisa Ummi Han

1451 Ev e î me derbaz diket her mudam
Li ser wî hezaran selat û selam

1452 Ev e î ku Adem xelas bû bu wî
Ji wî muhneta pur ku çîbû li wî

1453 Ev e î ku Idrîs bu wî çû sema
Xelas bû bu wî ew ji derd û xema

1454 Ev e î ku Nûhi nebî pî necat
Ji tûfani avî di der kainat

1455 Ev e î Berahîm ji nari kubar
Xelas bû bu wî ew ji desti kufar

1456 Ev e î Sima'îl ji zebha 'ezîm
Xelas bû bi cahi resûli kerîm

1457 Ev e î ku Yûsuf ji bîrî xelas
Dibû ew bi yumna şehi 'am û xas

1458 Ev e î ku Mûsa ji behra 'ezîm
Xelas bû bi yumna resûli kerîm

1459 Ev e î ku 'Îsa diçû asiman
Bi yumna şehinşahi axirzeman

1460 Ev e î ku beyta Xuda kir tehûr
Ji wan heykela Ehmedi sade nûr

1461 Ev e î ku dîni Xuda kir neşir
Bi 'izz û bi naz û kemal û fexir

1462 Ev e î Xuda ummeta wî heband
Kelami qedîm wî li ser wan dişand

1463 Ev e î şefa'et diket serteser
Çi cinn û melaik çi qismi beşer

1464 Ev e î ku fexra xû em pî dikin
Di der cenneti nik Xudayî mezin

1465 Ev e ew Muhemmed emîni bi heq
Xuda wî mezin kir li ser cumle xelq

1466 Digûtî eya Ehmedi ebtehî
Ji bû cumle 'alem gelek nasihî

1467 Xuda te mezin kir li me cumle şan
Ku em bûne ummet ji bû te 'eyan

1468 Rica me heye'j zati sahibcemal
Me 'ed kî ji vî ummeti bîsual

1469 Xuda rutbeyek pur mezin daye te
Berî te nedaye çu kes xeyri te

1470 Li wî da nida Cibreîl hani han
Sufûfi xû bigrin li şahi cihan

1471 Dihatin melek lî hemî çar teref
Sufûfi xû girtin ‘êyan û bi xef

1481 Melaik dihatin li dûr şahi dîn
Hemî ji ricai dikin ecme‘în

1482 Di rûzî qiyamet nekî me ji bîr
Ketin bext û damani şahi beşîr

1483 Me ‘ed kî ji vî ummetî ey resûl
Rica me tu bigrî li ba xû qebûl

1484 Ku belkî bi te em xelas bin temam
Li ser te hezaran selat û selam

1485 Resûli mu‘ezzem li wan da cewab
Dema wî bihîstî ji wan ev xitab

1486 Rica we qebûl e li nik min yeqîn
Nebin cangiran hûn bi qelbi hezîn

1487 Eger izn û ruxset bide min Xuda
Ebed hûn ji nik min qe nabin cuda

1488 Metirsin ji ehwali yewmi’l-qiyam
Ezî we xelas kim hemî bittemam

1489 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatirî şahi ‘alî cenab

## Mebhesû irtiqai’n-nebiyyi (s.‘e.w.) ile’s-semai’s-sabi‘e[84] (Ev beş 527 malik e)

1490 Çi hemd û senai ku hatin wucûd
Ji bûna Xudî zati wacib wucûd

1491 Selat û selami Xudayi kerîm
Li ser Ehmedi zati xulqi ‘ezîm

1492 Digel al û sehbi di wî ecme‘în
Digel wan hemî tabi‘ û mu’minîn

1493 We be‘du werin guhbidin hûn temam
Ku da ez beyan kim ji bû we meqam

1494 Muhemmed resûli Xuda çavbelek
Sufûfi xû girtin li dûr wî melek

1495 Niyet kir biçit xelweta lamekan
Muhemmed şehînşahi axirzeman

1496 Subûhiyyû qudsî hemî sef bi sef
Dihatin li nik wî hemî ref bi ref

1497 Selat û selam dikin yadigar
Li ser wî resûli li şehper suwar

1498 Bi hevrazî çûn ta bi sabi‘ sema
Li ser sethi sadis ebed yek nema

1499 Bi deng û seda û bi ah û fixan
Ji bû xatirî şahi insan û can

1500 Dema çûne ber babi sabi‘ sema
Li wî dîn melaik bi derd û xema

1501 Selata didin ew hemî ecme‘în
Bi ah û fixan û bi şîn û girîn

1502 Du‘ai dikin ew hemî serteser
Ji wî xaliqi cumle cinn û beşer

1503 Bişînî ji bû me şehi esfiya
Di ev nîvi şev be li sabi‘ xuya

1504 Ku da em ricai ji wî kin gelek
Cemî‘i melaik li sethi felek

1505 Çukû rehmet e bû hemî ‘alemîn
Şefa‘etgerî cumlei muznibîn

1506 Ji nagah de dîn hatî şahi cihan
Suwarî li şehper şehi ins û can

1507 Bi leq wî ve çûn ew hemî serteser
Sela dan li sultani cinn û beşer

1508 Xû avîtine ber piya wî demi
Rica me heye ez şehi ‘alemi

1509 Di rûzi qiyame me derbazi key
Ji wî rehmeta xû me mehrûm nekey

1510 Selat û selami Xuda bî‘eded
Bibarin li ser te ezel ta ebed

1511 Resûli kerîm da cewaba melek
Li ber dergehi sabi‘i neh felek

[84] “Behsa bilindbûna Nebî (s.‘e.w.) a ber bi ‘esmanê heftemîn ve”

1512 Eger ew Xudayî ‘ezîm û metîn
Bide ruxseti ew ji bû min yeqîn

1513 Ezî we şefa‘et bikim bittemam
Di rûzî qiyame hemî xas û ‘am

1514 Ezî we hisab kim ji vî ummeti
Ku da hûn bi hev ra biçîn cenneti

1515 Dema wan bihîstî beşaret ‘eyan
Ji peyxember û şahi axirzeman

1516 Selat û selam dan li şahi cihan
Li ber dergehi sethi heft asiman

1517 Sufûfî xû girtin hemî aşikar
Li dûr fexri ‘alem resûli kubar

1518 Bi lutf û kemal û bi fexr û edeb
Selat û selam dan li fexri ‘Ereb

1519 Hetanî nuha em bi derd û hezîn
Bi ah û fixan in hemî ecme‘în

1520 Nida hatî im şeb nidayek ‘ecîb
Hemî pî şiyar bûn be‘îd û qerîb

1521 Xû hişyar bikin tev bi keyf û tereb
Li we zeyf û mihvan e şahi ‘Ereb

1522 Rica xû ji wî kin bi keyf û sefa
Bi hurmet bibîjin eya Mustefa

1523 Were me xelas ke ji vî mihneti
Me daxil bike deftera ummeti

1524 Me rûzî qiyamet şefa‘et bikey
Rica me ji vî ummeti ‘ed bikey

1525 Zemani ku bîtin Muhemmed resûl
Rica we muheqqeq li nik wî qebûl

1526 Dema me bihîstî nidaa delal
Me zanî muheqqeq ji nik zîlcelal

1527 Me anî sefi xû girîdan temam
Ji bûna Muhemmed ‘eleyhisselam

1528 Ricai dikin her dem û sa‘eti
Me derxî bi yumna xû ez muhneti

1529 Bi ‘edda rimal û hubûb û nebat
Li ser te bibarin selam û selat

1530 Resûli Xuda gû metirsin tu car
Bi izna Xudayî kerîm û kubar

1531 Ezî we xelas kim ji derdî giran
Di rûzî qiyame dibin şadiman

1532 Hema wan sela dan li ser şahi dîn
Bi keyf û bi şahî hemî ecme‘în

1533 Bi lez çûn gihîştin bi sabi’ sema
Li ser sethi sadis ebed yek nema

1534 Hemî bûn beraber bi şahi zemîn
Bi lutf û kerem çûn hemî ecme‘în

1535 Bi sabi’ semaî gihîştin temam
Bi hev ra li wî dan selat û selam

1536 Dema çûne ber qapiyî mu‘teber
Cemî‘i melaik hemî serteser

1537 Li qapî dixist Cibreîl hani han
Dereng e veke qapî ey dergevan

1538 Were zû ke qapî veke bû dereng
Li me ey melek qapiyî rengereng

1539 Dema gûşi kir dergevan ev meqal
Cewab da bi ‘izz û bi lutf û kemal

1540 Ki ye vî şeva bîst û hefti receb
Li qapî dixe ew bi keyf û tereb

1541 Bibîje ji bû min ‘ecel ke ‘eyan
Ku da ez bizanim di weqt û zeman

1542 Cewab da ez im Cibreîli emîn
Bi min ra beraber Muhemmed emîn

1543 Xuda gû şeva bîst û hefti receb
Li ba xû dixwazim resûli ‘Ereb

1544 Ku da serfiraz bit şehi ins û can
Dema ew biçit xelweta lamekan

1545 Were zû ‘ecel ke were ey bira
Ku da em ‘ecel kin biçîn eşkera

1546 Heman dergevan hat û qapî vekir
Gelek hemd û şukri Xudayi xû kir

1547 Dema dî Muhemmed li şehper suwar
Selat û selam dan li wî bî qerar

1548 Bi sef sef dihatin cemî‘i melek
Li Ehmed girîdan hemî lek bi lek

1549 Bi ah û fixan û seda ne hemî
Xu dan ser pîyî Ehmedi Haşimî

1550 Dixûndin li ser wî selat û selam
Dikin yadîgar tev ji bû wî temam

1551 Mi dî ev sema tev ji durrî sipî
Wuha gû ji bû me resûli nebî

1552 Ji bû ra dibîjin ‘ecîb e yeqîn
Wuha gûte me seyyidu’l-murselîn

1553 Mi dîtin li sabi‘ semaî gelek
Subûhiyyû qudsî ji cinsi melek

1554 Dibîjin ji bû wan kî rûhaniyûn
Ji nûra Xuda ne hemî ew butûn

1555 Resûli Xuda sed selat û selam
Li ser bin digû min didî yek zilam

1556 Welî ixtiyar e bi wechi hesen
Libasi li ser wî diîsin ‘elen

1557 Culûs e li ser kursiyek sade nûr
Ji wî bihna misk û ‘ebîrî difûr

1558 Ku puşta xû da Beyti Me’mûri dur
Bi husn û cemal û bi keşf û bi sur

1559 Muqabil bi Beytilherami yeqîn
Xuda ke muşerref di her weqt û hîn

1560 Mi gûte exî Cibreîl an zeman
Ki ye ev bi vî hey’eti şadiman

1561 Bibîje ji bû min eya Cibreîl
Çi şexs e beyan ke bi keşf û delîl

1562 Were tu beyan ke li min hani han
Ku da ez binasim çi şexs e ‘eyan

1563 Cewab da ev e Ademi basefa
Ev e bav û ceddi te ey Mustefa

1564 Selat û selami Xudayi metîn
Li ser we bibarin di her weqt û hîn

1565 Here nîzî wî ey resûli delal
Li wî ke selami bi ‘izz û kemal

1566 Çukû lazim e ey şehi ins û can
Li wî kî selami bi qelb û ziman

1567 Diçûm wî demî min li wî kir selam
Bi lutf û kemal û şeref bittemam

1568 Mi jî re selat û selam da gelek
Li ser wî hemî yadîgar yek bi yek

1569 Selama mi da gûte min merheba
“We ehlen we sehlen” eya zîneba

1570 Digûtî ji min ra tu pur salihi
Ji bû cumle ‘alem gelek nasihi

1571 Beşaret li te ey şehi esfiya
Çi xeyr û sewab e ji te bû xuya

1572 Di nîv ummeta te hemî bû ‘eyan
Xuda te muşerref kirî her zeman

1573 Xuda te bilind kir ji rûyi zemîn
Ku da te bibit xelwexani yeqîn

1574 Gelek xel‘eti faxire bû te da
Ji bil te ewî bu kesî ew qet neda

1575 Tu îşev diçî xelweta lamekan
Çi xel‘et hene wî li wî bit ‘eyan

1576 Mubarek be ey şahi insan û cin
Li te xel‘eti wî Xudayî mezin

1577 Mi dî Beyti Me‘mûr qenadîli pur
Di wî de hene cewher û mas û dur

1578 Mi dîtin qenadîl ji nûra zelal
Muzeyyen muneqqeş bi lutf û kemal

1579 Welîkin mulewwen bi lewni xerîb
Mi nedye wekî wî bi sun‘i ‘ecîb

1580 Bi yaqût û almas û durri semîn
Bi şewq û şemal in ji nûra mubîn

1581 Mi dîtin melaik tewafî dikin
Li dûr Beyti Me‘mûri beyta mezin

1582 E jî bûm duxûl çûm bi qesda tewaf
Bi wan re heta bû temam bîxilaf

1583 Mi hef car tewaf kir bi wan re temam
Li ser wî hezaran selat û selam

1584 Mi pirsî ji rûhaniyî sade nûr
Werin hûn bibîjin bi keyf û surûr

1585 Eva çendi sal e ziyaret dikin
Bi beyta Xudî xû teberruk dikin

1586 Ku da ez bizanim eva çendî sal
Ziyaret dikin hûn bi ‘izz û kemal

1587 Cewab dan ji bû şahi rûyi zemîn
Muheqqeq li ba xû tu bigre yeqîn

1588 Berî Ademi hî ne hatî ‘eyan
Me ev beyt ziyaret dikir hîn û an

1589 Welîkin berî wî yeqîn du hezar
Sene çû me ev beyt li xû kir qerar

1590 Melek tîn bi sef sef ziyaret dikin
Gelek hemd û şukr û senai dikin

1591 Di her rûzî hefti hezar tî wucûd
Dewamî dikin ta bi yewmi’l-xulûd

1592 Bi newbet tewafi dikin her mudam
Rucû‘ nabe newbet li wan wesselam

1593 Resûli Xuda gû diçûm bî delîl
Li ber min xefî bû exî Cibreîl

1594 Mi lîkir nida ya exî aferîn
Çewa tu li vir min dihîlî hezîn

1595 Ez û tu bira ne bi sidq û sefa
Çira min dihîlî li vir bîwefa

1596 Were tu bi min ra eya Cibreîl
Nizanim tenî ez biçim bî delîl

1597 Cewab daye Cibrîl digû ya Nebî
Bira rûh û canim fedai te bî

1598 Tu rûh û rewanî ji bû Cibreîl
Çewa ez dixwazim herî bî delîl

1599 Welîkin bi heqqi Xudayî mezin
Bu wî xaliqi cumle insan û cin

1600 Nikarim bi pîşxim ebed yek qedem
Ji tirsa şehînşahi lewh û qelem

1601 Çukû her kesek me meqamek heye
Nikarit biçit ez meqami xu ye

1602 Eger yek ji me ew tecawuz biket
Wekî turfe ‘eyni Xuda wî dibet

1603 Dema min bihîstî ji wî ev kelam
Bi tirs û bi heybet li vir mam temam

1604 Gelek heybet û re‘şeti girte min
Ji xewf û ji tirsa Xudayî mezin

1605 E jî mame heyrî li ser asiman
Nizanim herim kî derî bîguman

1606 Hema Cibreîlî mi himbîzî kir
Di nav her du burhi mi teqbîlî kir

1607 Digûtî metirse eya şahi dîn
Ji vî meqseda xû nebe dilhezîn

1608 Xuda te dibe xelweta lamekan
Muheqqeq li wî te diket şadiman

1609 Metirse tu rûh û rewanî yeqîn
Tu yî şafi‘i cumlei muznibîn

1610 Xuda wî bide te xelatek mezin
Kesek pî nizane ne ins û ne cin

1611 Dema min bihîstî ji wî ev meqal
Bi ‘izz û bi lutf û bi fezl û kemal

1612 Ji min çû hemî xewf û tirsa mi dî
Li wî der teni mam wuha min xu dî

1613 Hema min bihîstî nida hate min
Teref zati ekber Xudayî mezin

1614 ‘Ecel kin hebîbî min î sade nûr
Bi cezl û fereh hem bi keyf û surûr

1615 Bi derhali hatin melaik çihar
Li nik min bi Refref li wî bûm suwar

1616 Wekî kursiyek Refrefa pur delal
Hemî kesk e safî ji nûra zelal

1617 Evî Refrefa pur delal û temîz
Ji bû xatirî wî hebîbi ‘ezîz

1618 Xuda kir muheyya ji behra ‘edem
Ji bûna hebîbî xû yi muhterem

1619 Dema ez li Refref dibûme suwar
Hema çû ‘ecel Refrefa nazîdar

1620 Wekî berqi lami‘ diçû bî dereng
Heta çû gihîşt behrekî rengereng

1621 Sipî safi yû tev ji nûra zelal
Wuha xelqi kir Xaliqi zulcelal

1622 Mi dî yek melek ser vî behra giran
Bi hewl û bi tirs û bi xewf e ‘eyan

1623 Eger teyrekî zû ‘ecel ke mudam
Bi sir‘et bi quwwet cenahi temam

1624 Bi teyran di pînsed sene ew biçit
Ji menkib heta menkibi nagihit

1625 Li dû çû heta behrekî pur mezin
Ne jî ra heye ser ne jî ra ne bin

1626 Ji nûra Xuda kesk û sûre ‘eyan
Bi Refref duxûl bû şehi ins û can

1627 Mi dî yek melek pur bi hewl û xeter
Kesek qet nikare bike lî nezer

1628 Ji ber heybeta cusseî pur giran
Wuha bû riwayet ji şahi cihan

1629 Eger ew Xudayî ‘ezîm û celal
Emir ke li wî ew bi lutf û kemal

1630 Bibel‘îne heft erz û heft asiman
Leha ne ‘eleyhi bi xelqi giran

1631 Li dû derketim ez ji behri serî‘
Bi bal behrekî dî ‘erîz û wesî‘

1632 Welîkin ji nûra zer e bîhenek
Li ser behri min dî hema yek melek

1633 Eger heft tebeq erz û heft asiman
Tu deynî li ser desti wî an zeman

1634 Wekî xerdelek deyni nîv Kerbela
Wuha bû riwayet ji fexrî ‘ula

1635 Li dû derketim çûme behra siya
Gelek tirs û heybet li min bû xuya

1636 Diçûm secdei bû Xudayî metîn
Mi pir iltica kir bi qelbi hezîn

1637 Mi gû ya xeyasi hemî ‘alemîn
We ya hami yû melcea muznibîn

1638 We ya mûnisa jar û qelbi seqîm
We ya sahib û rebbi ‘erşi ‘ezîm

1639 Tu sebra mi bînî di vî sa‘eti
Bidî ber mi ya Reb hinek raheti

1640 Tu ‘ebdek ji wan ‘abidi mutteqîn
Bi lutf û kerem tu ji bû min bişîn

1641 Ku da ez bi wî ra tekellum bikim
Ku da tirs û heybet li vir ez nekim

1642 Heman yek nida hat ji behra mezin
Were ya Muhemmed binîre li min

1643 Bi leq wî ve çûm û mi dî yek melek
Nigî wî li jîr e serî ser felek

1644 Mi pirsî ji wî ey melek hani han
Tu navî xû bîje ji bû min ‘eyan

1645 Ku ez bizanim ku namet çi ye
Çukû min wekî te kesek nediye

1646 Li vir tu dipîvî bi Mikyali av
Di weznî bi mîzani der hîn û gav

1647 Cewab daye Mîkal ez im Mîkeîl
Emir ke li min ey hebîbî celîl

1648 Çi emrî dikî ez li vir hazir im
Bi serbest kerem ke li vir nazir im

1649 Heman min li wî kir selamek celîl
Sebeb çi ji bû te dibîn Mîkeîl

1650 Ji bû min re gû ya hebîbi Xuda
Ji bû te dikim rûh û cani fida

1651 Ji bû çi dipursî ji min navi min
Eya ey hebîbi Xudayi mezin

1652 Çi tiştî wucûd bit di der hîn û gav
Muheqqeq ji bû wî heye ism û nav

1653 Welîkin ‘ecaib pir in her zeman
Te tiştek nedîtî li ser asiman

1654 Eger te bidîna te nedkir sual
Ne jî ra hudûd e ne jî ra misal

1655 Mi pî ra xeber da bi ‘eql û fikir
Ji bûna Xuda kir mi hemd û şukur

1656 Welîkin duxwazim di ev hîn û an
Dema ez vegîrim li erzi heman

1657 Ji min kin suali bidim wan cewab
Ku herkes bi navi xu ye bî xitab

1658 Ne‘em gûtî Mîkal bi ‘izz û weqar
Ji bûna Muhemmed li Refref suwar

1659 “Sedeqte” eya Ehmedi çavbelek
Dipursî ji min ism û navi melek

1660 Ezî kim beyani li te ey nebî
Bira rûh û can im fidaî te bî

1661 Ez im î muwekkil bi qetr û nebat
Dipîvim buhûra hemî qat bi qat

1662 Bi wezni diweznim buhûra temam
Wezîfam ev e ta bi rûjî qiyam

1663 Ezî sewqi kim a vi ali sehab
Bi keyl û bi wezn in hemî bîxitab

1664 Xuda kî derî emri kir dî biçit
‘Eceb tişt hene bî Xuda ew bibit

1665 Li dû min dipirsî çi re‘d û çi berq
Ji bû min bibîje kelami bi heq

1666 Ku da ez bizanim hemî cumle şan
Yekayek beyan ke ji bû min ‘eyan

1667 Ne‘em gûtî Mîkal bi sidq û sefa
Kerem ke were vir eya Mustefa

1668 Ji bû ez beyan kim li te yek bi yek
Nekev ber dilî te ne reyb û ne şek

1669 Zemani ku av çû bi ‘ewr û sehab
Xuda wî bişî yek melek bî xitab

1670 Ewî lî suwar be wekî yek feres
Xuda kî derî emri kir bî hewes

1671 Ewî sewqi ke wî bi sewqek şedîd
Ji wî tîtî deng û seda wek hedîd

1672 Zemani ku deng çû ji wî aşikar
Ji wî ra dibîn re‘d e re‘di kubar

1673 Welî ger bişiddet neçit ev sehab
Melek lî dixit ew bi sewti ‘ezab

1674 Ji wî nûr diçîtin bi şewqek şedîd
Ji wî tîtî bihna buhar û hedîd

1675 Ev e î dibîn berq eya şahi dîn
Ji bû vî cewabi nebe dilhezîn

1676 Welîkin bizane ji min ey nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

1677 Di desti melek re‘di sî dar hene
Welîkin ne wek î di desti me ne

1678 Yekî av û yek şîşe yek agir e
Li ser vî wezîfi gelek şakir e

1679 Didû jî sewab in dibin pî şehîd
Yekî dî ‘ezab e çû xulli hedîd

1680 Heçî av û agir şehîd in yeqîn
Evî dî ku şîşe ‘ezabi muhîn

1681 Eger tu dipirsî ji min Cibreîl
Beyan kim li te ez bi keşf û delîl

1682 Ew e sahibî xesf û mesx û qezif
Digel zelzel û sa‘iqi muxtelif

1683 Dipirsî ji min Isrefîl bîje min
Xuda da ji bû quwwetek pur mezin

1684 Di nava cemî‘i melaik hemîn
Wekî wî bi quwwet çûnînin yeqîn

1685 Wekî wî bi bask û bi rîşa temam
Çûnînin wekî wî ne xas û ne ‘am

1686 Ew e sahibi sûr ey Mustefa
Hemî pîdizanin qe nabit xefa

1687 Eger tu dipirsî ji ‘Izrîli pak
Dixwazim ji bû wî nebî derdînak

1688 Çukû ew muwekkil bi qebza rûha
Ne mexfî li nik te “Keşemsi’d-Duha”

1689 Hemî em ditirsin ji wî bîqeder
Kesek nîne jî dûr kevit bîmefer

1690 Nihayet selat û selami Xuda
Li ser te ebed yek nebit jî cuda

1691 Mi lî kir selam û ji wî çûm hinek
Li pey min selata dide yek bi yek

1692 Du‘ai dike bû min û ummeti
Ku da em bi hev ra biçîn cenneti

1693 Nihayet diçûm nîv cemî‘i sufûf
Hemî sef girîdan ji bû min wuqûf

1694 Ji wî çûm heta ba exî Isrefîl
Mi lî kir selamek bi keşf û delîl

1695 Mi dîtî neşir kir du baskî temîz
Bi zikr û bi tesbîh û nexma lezîz

1696 Cenahi wî milyûneke bîderew
Bi misli seri wî ne xurd û ne xew

1697 Wekî wî di her re’sekî wechi nûr
Wekî wî di her wechi dev bûn zuhûr

1698 Wekî wî di her femmekî bûn lisan
Dikir zikri Mewla bi qelb û ziman

1699 Luxet ba luxet zikri Mewla diket
Wekî hev qe nebînin ebed ev luxet

1700 Nigî wî li bin erdi sabi‘ yeqîn
Muheqqeq bizanin hemî ecme‘în

1701 Mi dî ‘erş li ser kahili wî temam
Welîkin heçî sûr di dev de mudam

1702 Bi qasî xelaiq di sûri suqûb
Hene ew li wî nabe te‘b û luxûb

1703 Mi dî sûr di femmi Serafîl temam
Bi lerz û bi re’ş e ji hewla qiyam

1704 Nigî rasti danî li ber xû yesar
Li pişt xû wuha ew diket intizar

1705 Ku kengî emir bî ji bû nefxi sûr
Wuha inhinai diket bîqusûr

1706 Di nav her du burhi wî lewhi ‘ezîm
Mu‘elleq bi emri Xudayî kerîm

1707 Bi ‘erz û bi pehniyyi lewhi delal
Wekî meşriq û mexribi bîmisal

1708 Mi car din li sûri nihîrtî yeqîn
Wekî wî mi nedye mezin în çûnîn

1709 Eger bî te danîn semawat û erz
Digel î di nav de tevî tûl û ‘erz

1710 Wekî yek heleq bîti der Kerbela
Wuha bû riwayet ji şahi ‘ula

1711 Dema min Serafîli dî bittemam
Bi ‘izz û bi hurmet mi lî kir selam

1712 Gelek nûr difûre ji wî serteser
Welîkin bi tirs û bi hewl û xeter

1713 Bi qedr û bi ‘izz û gelek ihtiram
Bi keyf û xweşî wî li min kir selam

1714 Digûtî selat û selami gelek
Li ser te eya şehsuwari felek

1715 Migûtî ji bû ya exî Isrefîl
Ji bû çi culûsî li vir ey xelîl

1716 Were zû ke bîje li min ke ‘eyan
Ku da ez bizanim bi te hîn û an

1717 Cewab da Serafîl ji bûna Nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

1718 Ji rûja Xudî xelq kirî min temam
Cih û meskenî min ev e wesselam

1719 Ezî her li vir bim heta sa‘eti
Bi saya serî te biçim cenneti

1720 Li vir ez dibîzim kelami Ilah
Wuha tu bizane eya padişah

1721 Ji bûna Serafîl mi kir ev eza
Çewa tu dibîjî kelami Xuda

1722 Bibîje bi diqqet beyan ke yeqîn
Ku da ez bizanim hemî an û hîn

1723 Cewab da hilîne kelami bi heq
Dibîjim şedîdtir ji re‘d û ji berq

1724 Migûtî dema ew Xudayi metîn
Bixwaze ku tişkî wucûd ke yeqîn

1725 Çi tiştî dibîje heta tî wucûd
Beyan ke ji bû min bi keşf û şuhûd

1726 Digûtî dema bîje “kun feyekûn”
Ebed lahiqi kafi nabîte nûn

1727 Heta “ma erade” yekûn û yeqîn
Wuha tu bizane eya şahi dîn

1728 Çukû qudreta wî Xudayi wedûd
Bi ‘eql û feraset qe na î wucûd

1729 Li dû min digû ya exî Isrefîl
“Fî eyyi mekanîn” ena ya Xelîl

1730 Çukû ez ditirsim bi tirsek mezin
Li vir bîdelîl im bi ah û hezîn

1731 Cewab da Serafîl ji bû şahi dîn
Metirse eya xateme’l-murselîn

1732 Xuda te dibit xelweta lamekan
Ku da te xelat ke muheqqeq bizan

1733 Xuda te mezin kir li ser kainat
Li ser te didit ew selam û selat

1734 Kerem ke li ser xû binîre resûl
Çi tiştî bibîjî li nik wî qebûl

1735 Li ser xû nihîrtî resûli kerîm
Ji nagah de dî xû li ‘erşi ‘ezîm

1736 Çi erd û semawat û her neh felek
Li ber ‘erşi e’la wekî yek xelek

1737 Tu bavîjî erdek dirîj û fire
Ku belkî ji wî helkei kemtir e

1738 Li dû min didî yek melek zî xeter
Li ser sûreti dîk e ey mu’teber

1739 Seri vî li ‘erş e nigî wî li jîr
Sipî sûr û kesk e hemî tev ji zîr

1740 Mi dî wî di secdi bi tesbîh û deng
Luxati muxalif hemî rengereng

1741 Kî subhan di bî bû Xudayî ‘ezîm
Evî dîki efreq ji zîr û ji sîm

1742 Dema ew bi tesbîh biket yek nida
Digih dîki erzi hemî ev seda

1743 “Temîlû bi e‘naqiha” ev diyûk
Guhî xû didin wî kebîr û puçûk

1744 Dibîjin ji wî dîkî tesbîh û zeng
Dikin qîreqîr ev duyûk rengereng

1745 Ku ye‘nî cewabi didin dîki ‘erş
Çukû dighi dengi wî ta jîrî ferş

1746 Bi tesbîh û teqdîsi zati kerîm
Dixûne evî dîki ‘erşi ‘ezîm

1747 Zemani bisekne hemî serteser
Diseknin hemî ev hedîs û eser

1748 Hinek çûm mi dîtin melaik gelek
Qiyam in hemî ser niga yek bi yek

1749 Mi pirsî mi gû ya exî Isrefîl
Beyan ke ji bû min evan biddelîl

1750 Bibîje ji bû min li min ke beyan
Ku da ez bizanim çi şexs in ‘eyan

1751 Cewab da digûtî eya rûh û can
Tu guh de li min da bikim ez beyan

1752 Ev in î dibîjin kî rûhaniyûn
Hinek jî dibîjin kî kerrûbiyyûn

1753 Ev in hamili ‘erşi rebbi ‘ezîm
Yeqîn ke ji min ey resûli kerîm

1754 Xuda quwwetek pur mezin daye wan
Nedaye çû kes ev quwwet xeyri wan

1755 Here nîzî wan û selam ke li wan
Gelek ew ji te hesdikin her zeman

1756 Diçûm nîzî wan ez bi lutf û kerem
Bi ‘izz û kemal û gelek muhteşem

1757 Hema min selam kir selamek kubar
Kesî ew selam qet nedîtî tu car

1758 Selama mi girtin bi fezl û edeb
“We ehlen we sehlen” bi şahi ‘Ereb

1759 Selat û selam dan selati kubar
Ji bûna Muhemmed kirin yadigar

1760 Xuda mujdeyek pur mezin bu me şand
Di ev şev Muhemmed bi ‘erşi gihand

1761 Bi husn û cemala wî em bûn surûr
Li nik ‘erşi e’la hemî bî qusûr

1762 Mi dî yek nida hat ji jûrî ‘eyan
Selamun ‘eleyke e şahi cihan

1763 Selat û selami Xudayi metîn
Li ser Ehmed û şafi‘i muznibîn

1764 Mi hingî serî xû bilind kir temam
Mi dî yek melek ew li jûrî qiyam

1765 Bi xelqiyyetek pur mezin ew melek
Eşeddu beyazen ji selci gelek

1766 Melaik li pîş wî kî hefti hezar
Li ser sûreti wî hemî aşikar

1767 Selata didin ew li şahi zemîn
Bi keyf û bi şahî hemî ecme‘în

1768 Hema ew melek hat mi himbîzî kir
Li nav her du burhi mi teqbîli kir

1769 Digûtî eya ey hebîbi Xuda
Di rûjî qiyamet nekî min cuda

1770 Mi daxil bikî deftera ummeti
Ku belkî bi te ez biçim cenneti

1771 Selat û selami Xuda her zeman
Bibarin li ser şahi insan û can

1772 Nihayet bi wan re diçûm ez gelek
Bi sef sef li dûr min digirtin xelek

1773 Bi te‘zîm û ikram diçûn em hemî
Beraber bi hev ra bi şubhi gemî

1774 Wuha em bi hevrazî çûn serteser
Me heftî hezar perde girtin eser

1775 Hemî ew ji durri sipîyyû semîn
Wuha emrî kir xatemu’l-murselîn

1776 Wekî wan ji zumrûdi kesk û di sûr
Wekî wan ji istebreqi xal û mûr

1777 Wekî wan ji sundus wekî wan ji nûr
Wekî wan ji zulmet wekî wan belûr

1778 Wekî wan ji ‘enber bi şubh û misal
Ji ber van hicaba zebani me lal

1779 Wekî wan melekût diger ceberût
Difûre ji wan misk wekî ‘enzerût

1780 Bi qalindiyî pênsed û sal yeqîn
Yeqîn kin ji min hûn hemî ecme‘în

1781 Ji wî em diçûn ta bi perda duxan
Ji wî perde ya nûri saf bû ‘eyan

1782 Ji wî em diçûn perda ‘izz û cemal
Heta em digîştin hicaba kemal

1783 Ji wî em diçûn perda qehra Xuda
Ji ser Refrefi ez qe nabim cuda

1784 Ji wî çûne em ‘ezmeti hani han
Ji wî çûne wehdanetî pî gihan

1785 Ji wî çûn semedaniyet bî dereng
Hetanî hicaba beqai bi reng

1786 Ji wî çûn hicaba ‘ula em yeqîn
Heta kibriyai bi ‘izz û mekîn

1787 Ji wî çûn hicaba huzûra Ilah
Bi diqqet yeqîn ke seraser tebah

1788 Dema em diçûn perda ferdaneti
Xuya bû li min perda wehdaneti

1789 Ku hefti hezar sef melek hazir in
Ji emri Xuda re hemî nazir in

1790 Wuha em hemî sernigan e temam
Ji ber heybeta Xaliqi la yenam

1791 Mi dî yek nida hat ji alî Xuda
Hilînin hicaba ji ber Ehmeda

1792 Hilînin hicaba hemî yek bi yek
Ji ber Ehmedi min şehi çavbelek

1793 Dihatin hilanîn hucub bî ‘eded
Ji xeyri Xuda kes nizanit ebed

1794 Mi dî sed hezar sef melek bittemam
Rukû‘ nîne bû wan ebed ew qiyam

1795 Mi dî sed hezar sef rukû‘ in yeqîn
Sucûd nîne bû wan hemî raki‘ în

1796 Mi dî sed hezar sef sucûd in ebed
Culûs nîne bû wan bi muhr û sened

1797 Serî xû bilind nakitin yek ji wan
Heta bî qiyamet ev e hali wan

1798 Gelek min tefekkur dikir wî demi
Ji tirs û ji hewla evî ‘alemi

1799 Gelek heybeti girte min bîqeder
Digel re‘şet û zelzeli serteser

1800 Ji ber heybeta wî Xudayî celal
Ne ‘eql û feraset dimane kemal

1801 Ji nagah nida hatî ya Ehmeda
Binîre li ber xû bihîst min seda

1802 Were nîzî min be eya çavbelek
Tu yî efzeli ins û cinn û melek

1803 Mi gavek dihavîtî pînsed sene
Li hevrazî çû Refrefa tentene

1804 Nida hate min “la texef ey hebîb”
Metirse ji tiştî dibînî ‘ecîb

1805 Çi tiştî dibînî hemî ayet in
Li nik ehli dil cumle tev ‘ibret in

1806 Ne xewf û ne tirs qet li nik min nema
Ji tiştî mi dîtî ji behra xema

1807 Nihayet evî Refrefa pur delal
Heta çû bi nîzî huzûra celal

1808 Nihayet mi dîtin çi emri mezin
Ku pî wehm û xatir xiyal tev herin

1809 Ne çava diye ne bihîstî guha
Muheqqeq yeqîn ke ji min tu wuha

1810 Bi nîzîkî Rebbi xû bûm bîqeder
Wekî qabi qewseyni ya kîmiter

1811 Muheqqeq bila şekk û reyb e hemîn
Muhemmed resûli Xuda ye yeqîn

1812 Hebîbi mu‘ezzem resûli kiram
‘Eleyhisselat û we elf û selam

1813 Hebîb û hebîb nîzî hev bûn gelek
Wekî reşsipî yû di çeşmi belek

1814 Hebîbi Xudî gû mi dî an zeman
Yedî qudreti hate puşt min ‘eyan

1815 Li nav her du ketfi min î zahire
Dihatî yedî qudreta tahire

1816 Ne wek desti mehsûs wekî î di me
Ku belkî yedî qudreta ‘alim e

1817 Mi dî ber du hînik dihatî ciger
Çi kerbi mi dîtin hemî çûne der

1818 Xuda ‘ilmi ewwel digel axirîn
Dixiste dilî min hemî ecme‘în

1819 Gelek keyf û şahî li min çîdibû
Wekî tirs û heybet li min çînebû

1820 Di zenna mi de xelqi der asiman
Digel xelqi erzi hemî çûn ‘eyan

1821 Çukû wur ne hiss û hesîs û herek
Heta ez bizanim hene yek bi yek

1822 Li du ‘eql û zihnî di min hate min
Mi fikrî di vî ‘alema pur mezin

1823 Xuda çi şerefkî ‘ezîm hedye kir
Ji bû min dema min dikir ev fikir

1824 Nida hatî ya Ehmedi nazîdar
Were nîzî min ey hebîbi kubar

1825 Mi gûtî Ilahî çi bîjim muram
Çukû tu selami ji te tî selam

1826 Nizanim çi bîjim li ber te yeqîn
Çukû tu ‘elîmi ez im cahilîn

1827 Di ger kir nida wî nidaek mezin
Kerem ke ‘ecel ke were nîzî min

1828 Bi nîz ve diçûm wî li min kir selam
Bi dengî Ebûbekri Siddîq kelam

1829 Mi gûtî Ilahî we ya Zelqehar
Bi min ra heval e Ebûbekri yar

1830 Çukû ez dibîjim bi dengi Sedîq
Selami li ser xû bi heqq û heqîq

1831 Beyan ke li min ey Xuda ev kelam
Ku da ez bizanim ki ye kir selam

1832 Cewab da Xudayi ‘ezîm û kerîm
Kî gû ya Muhemmed ez im festeqîm

1833 Tu hatî mekanek ne cay û mekan
Heta tu Ebûbekrî bibînî ‘eyan

1834 Welîkin mi zanî di der ‘alemi
Ji wî hesdikî tu di gav û demi

1835 Mi anî selam kir bi dengî Sedîq
Ku da mutmeîn bî bi heqq û heqîq

1836 Mekîşe ji vî dengî tu hesreti
Muheqqeq dibînî ji min lezzeti

1837 Ez im wahidi tekk û ferd û semed
Ne hunkûf ji bû min ne nidd û ‘eded

1838 Bi derhali ilham Xudayî celîl
Dida min ku da ez bikim wî delîl

1839 Mi gûtî tehiyyat û lillah hat
Digel selewat û digel teyyibat

1840 Digûtî ‘eleykessselam ey nebî
Çi rehmet berekat hemî ser te bî

1841 Mi gûtî li ser me hemî ecme‘în
Digel wan ‘ibadi te yî salihîn

1842 Li dû wî nida da cemî‘i melek
Çiqasî hene ser sutûhi felek

1843 Hemî şehdeyî em didin her mudam
Ji xeyrî Xuda kes tune wesselam

1844 Ew e wahid û bî şerîk e Xuda
Ji vî i‘tiqadi qe nabin cuda

1845 Xuda kir xitab wî xitabek mezin
Muhemmed resûli min û ‘ebdi min

1846 Kesî ku ji te hesbiket ey resûl
Muheqqeq li nik min gelek ew qebûl

1847 Kesi ku ji te ‘aciz e ew kezab
Di nari cehennem dibit wek kebab

1848 Xuda gûte min ey Muhemmed emîn
Bi çavi seri xû binîre yeqîn

1849 Eger min dibînî bibîje ‘eyan
Yeqîn ke ev e xelweta lamekan

1850 Bi serbest xeber de eya şahi dîn
Muheqqeq şefî‘î ji bû muznibîn

1851 Çukû hesdikim ez ji te ey resûl
Hemî gûtinî te li nik min qebûl

1852 Ji lew min te anî sera lamekan
Kerem ke bibîje ji bû min ‘eyan

1853 Çukû efzeli ser zemîn û sema
Tu yî ey Muhemmed mekîşe xema

1854 Mi gû ya Ilahî çi cinn û beşer
Digel cumle ‘alem hemî serteser

1855 Nikarin nezer kin li zati Kerîm
Mehal e ji xeyrî cemala ‘ezîm

1856 Çukû qet nebûrîne weqt û zeman
Li ser zati Ferd û Ehed hîn û an

1857 Şev û rûj muxeyyer te nakin ebed
Tu yî Wahid û Ferd û Heyy û Semed

1858 Ilahî we ya seyyidi cumle xelq
Tu yi xaliqi cumle ‘alem bi heqq

1859 Ilahiyye nûr û beha û celal
Xeşa beserî lew dikim qîl û qal

1860 Welîkin erake bi qelbî yeqîn
Mehal e bi çav dîtinî ey Metîn

1861 Çukû dîtina wî Xudayî Wedûd
Mehal e bi çeşm û beser bîwucûd

1862 Xuda gûte min ey Muhemmed resûl
Sifati mi ‘ed ke bi ‘izz û qebûl

1863 Eger tu dizanî bibîje sifat
Çukû tu nebiyyi we zî’l-mu‘cizat

1864 Mi gûtî kî Subhan ji zati Ehed
Wesifçî nikarin wesif kin ebed

1865 Çewa ez wesif kim sifati Celal
Ji bû min mehal e sifati Kemal

1866 Ne ‘arif ne ‘abid ne zenn û zunûn
Nikarin wesif kin hemî ew butûn

1867 Çukû Heyy û Qeyyûm e zati qedîm
Semî‘ û Besîr e Qedîr û ‘Elîm

1868 Xuda gûtî ya Ehmedi çavbelek
Ezî xû wesif kim ji wesfa hinek

1869 Bizane ku şe’nî ‘ezîm û mezin
Kesek qet nikare bibe nîzî min

1870 Bi sultaniyî pur ‘ezîz im heman
Ji bû min çu nîne ciha tu mekan

1871 Mehal e ji bû min şerîk û mesîl
Nikarin bi min ra bikin qal û qîl

1872 Melîki mulûka cemî‘i milel
Ji min tev ditirsin hemî bîxilel

1873 Ez im qaziyî cumle hacat temam
Ez im raziqi cumlei xas û ‘am

1874 Kesî gazî min ke bidim wî cewab
Ji min çi bixwaze bidim bî xitab

1875 Tewekkul li ser min bide ew yeqîn
Ezî wî muhafiz bikim an û hîn

1876 Kesî rabe ber dergehî rehmeti
Ezî wî xelas kim ji her zehmeti

1877 Ji afat û ‘ahatî dunya û dîn
Ezî wî xelas kim mebe dilhezîn

1878 Welî ya Muhemmed li ber xû binîr
Ku ev der çi cay e tu hatî bi xîr

1879 Di beyna min û te çu nîne resûl
Ne yek tercuman e xeber de fuzûl

1880 Resûli kerîm gû mi nîrî li jûr
Mi dîtî gelek nûr ji kesk û ji sûr

1881 Gelek tirs û heybet li min zîde bû
Çi ‘eql û xired bû hemî berze bû

1882 Mi nefsa xû wenda kirî an zeman
Nizanim li ku me di hîn û di an

1883 Mi anî niyaz kir ji Rebbi kerîm
Bi min de nîşan da bibim musteqîm

1884 Çukû mame heyrî li vir bîmefer
Nizanim bi kî der herim der bi der

1885 Xuda gûte min ey Muhemmed emîn
Tu ‘eqli xû berde bizane yeqîn

1886 Xudî te bisata ji unsi qedîm
Muheyya kirî der ezel ey kelîm

1887 Ji bû xatiri te ku biyyî li ser
Xitabi bi min ra bikî serteser

1888 Ev e ew bisat ey hebîbi mezin
Çi hate dilî te bixwaze ji min

1889 Bi derhal vegîram ku ne‘li qedem
Derînim ji payî xû ez lacerem

1890 Çukû min edeb kir bisata celîl
Ku ne‘li xû deynim li ser bî delîl

1891 Fenadanî rebbî eya Mustefa
Were ser bisati bi keyf û sefa

1892 Tevî ne‘li pak û nezîf û delal
Ku da ev bisat pî bibit ba cemal

1893 Çukû ev bisat min ji kenza ‘edem
Deranî ji bû ne‘li paki qedem

1894 Ku bîtî li ser pî muşerref bibit
Were ser bi ne‘li muşerref bikit

1895 Kerem ke here ser bisati yeqîn
Çukû tu yî efzeltirî ‘alemîn

1896 Eger ne tu bî min ne tîna wucûd
Ne ‘erş û ne ferş û ciha tu hudûd

1897 Were ey hebîbi mini pur delal
Bimeş ser bisata şehi layezal

1898 Ku her kes bizane di gav û demi
Muhemmed reîs e li ser ‘alemi

1899 Mi bismillah gû ez diçûm ser bisat
Bi izna Xudayî kerîmi’s-sifat

1900 Mi dî seyfi niqmet li alî yemîn
Dibare ji wî her demi av û xwîn

1901 Mu‘elleq bi ‘erşi Xuda her zeman
Dibare ji wî xûn di her hîn û an

1902 Mi gûtî Ilahî we ya seyyida
Ricai dikim ez ji zati Xuda

1903 Tu seyfi xû hildî ji ser ummeti
Ku da ew nekîşin ji ber zehmeti

1904 Çukû ez ditirsim ji dunya xedar
Ku ew pî bixapin bibin teng û tar

1905 Nexasim ku şeytan û nefs û hewa
Bi ‘udwanî bîn ummeta bînewa

1906 Nizanim ku ew Xaliqi neh felek
Bi ‘efwa xû derbaz biket lek bi lek

1907 Ku şeytan nebîjit yekî ummeti
Sebeb zenb û ‘isyan kete zehmeti

1908 Ilahî bide xatiri min temam
Rica min ev e her demi wesselam

1909 Xuda gû Muhemmed tu guh de li min
Ez im Hakim û Xaliqi pur mezin

1910 Çi hukm û qezai mini der ezel
Muxeyyer qe nabin heta bî ecel

1911 Heçî ekseri ummeta te yeqîn
Bi şûr dî fena bin hemî ecme‘în

1912 Di ger yek hedîsek heye bîhenek
Bi te‘n û bi ta‘ûni dimrin gelek

1913 Welîkin ‘efû me gelek hesdikim
Ji ‘efwi ji bû te ezî ‘efwi kim

1914 Mi gû ya Ilahî bi zati xû kî
Dixwazim sual kim ji te şey’ekî

1915 Xuda gû bi ‘izz û celala xû kim
Çi tişti buxwazî ezî wek te kim

1916 Çukû du hezar sal berî Ademi
Mi ‘ehdi kir çi tişti buxwazî hemî

1917 Ezî wî bidim te yeqîn ke temam
Wuha tu bizane ji min wesselam

1918 Mi gûtî te xelqi kirye Adem sefî
Te rûh danî tî da bi lutfa xefî

1919 Te da jî re secde bi qismek melek
Heta ew li dûr wî dibûn wek xelek

1920 Te çîkir Berahîm ji bû xû xelîl
Wekellemte Mûsa bi nutqa celîl

1921 Te Idrîsi danî li ‘alî mekan
Ji bû Dawûdî te Zebûr jî re şan

1922 Te anî Suleyman kirî padişah
Te mulki ‘ezîm da ji bû wî Ilah

1923 Te jî re musexxer kirî ins û cin
Digel teyr û wehş û hewai mezin

1924 Te xelqi kirye ‘Îsa bi kaf û bi nûn
Te çi hedye da min wekî wan butûn

1925 Xuda gûtî ya Ehmedi serwerî
Mi Adem xeliq kir ji av û herî

1926 Welîkin ji wechi xû min girti nûr
Tu hatî wucûdi ji wî bîqusûr

1927 Eger çi Berahîm mi çîkir xelîl
Welîkin tu bûyî hebîbi celîl

1928 Dizanî xelîl kîmtir e ez hebîb
Wuha vî bizane ji sun‘i xerîb

1929 Eger çi bi Mûsa mi teklîmi kir
Li pişt perdeya Tûrî Sîna dikir

1930 Welîkin li ser vî bisata qedîm
Xitabi bi min ra dikî musteqîm

1931 Ne perde di nava min û te yeqîn
Ne mani‘ ne hiss û hesîs în çunîn

1932 Ne Mûsa ne Yûsuf Berahîm Xelîl
Nikarin ku bîn ser bisata celîl

1933 Eger çi ku Idrîs li jûra mekan
Mi cî da ji bû wî li ser asiman

1934 Welîkin tu hatî mekanek celal
Ji xeyri te kes nagihî ey delal

1935 Eger çi Suleyman mi kir padişah
Mi Beytulheram kir li te qiblegah

1936 Eger çi ku Dawûd mi dayî Zebûr
Welîkin ji bû te xû lî kir tehûr

1937 Eger çi Zebûri dixûne ‘eyan
Welîkin mi daye te Seb‘u’l-Mesan

1938 Di ger min wehî kir kelami qedîm
Li ser te ku pî hûn bibin musteqîm

1839 Di wî da heye sûreî fatihe
Beqer Al-i ‘Imran hemî laihe

1840 Kesî ku bixûne evan sûreta
Ji vî ummeta te evan dewleta

1941 Ezî wî ‘efû kim ji bî emriya
Eger çi gunahi wî misli çiya

1942 Welew misli keffi bi har û rimal
Ezî wî ‘efû kim ji zenb û webal

1943 Eger çi mi xelq kirye ‘Îsa bi “kun”
Dema” kun” bibîjim hema ew dibin

1944 Çi ‘ebdi bibî La Ilahe Illallah
Gerek bî Muhemmed resûli Ilah

1945 Eger yek risalet qerari neket
Ne meqbûl e nik min xesaret diket

1946 Evî munkera rûzi heşr û ceza
Di nari cehennem didim wî eza

1947 Mi hazir kirî bû hebîbi celal
Di der cenneti kewsera pur delal

1948 Li dûr wî muzeyyen bi durri semîn
Di der cenneti wek wî nîne yeqîn

1949 Evî kewsera pur delal û temîz
Ji berfi sipîtir resûli ‘ezîz

1950 Ji hingiv şîrîntir bi te‘ma xû pur
Wuha tu bizane ji min keşf û sir

1951 Xu lî miska xalis nebat ze‘feran
Di heşt cenneta de wuha tî ‘eyan

1952 Mi da te evî hewzi mewrûd yeqîn
Ku da tu fexir kî li ser ecme‘în

1953 Şefa‘eta kubra derenca refî‘
Mi da te ji nîv ‘alemi ey bedî‘

1954 Mi da te siyama meha remezan
Kesî ku eda ket diçit der cinan

1955 Mi Quran wehî kir ji bû te yeqîn
Heye tî de ‘ilmi ewel axerîn

1956 Xenîmi kufara helal kir li te
Helal min nekir bû li kes pîşî te

1957 Mi gû ya Rebbî min qebûl kir ji dil
Welî ez ji ber ummeti dilbikul

1958 Teda min qebûl kir bi çeşm û beser
Eva ni‘meti ha hemî serteser

1959 Welî min rica ye ji zati Xuda
Min û ummeti tu nekî me cuda

1960 Çi hedye Xuda kir li vî ummeti
Bibîje ku da ez nekim hesreti

1961 Çukû ummeta min ze‘îf e ze‘îf
Ricai gelek ez dikim ya Letîf

1962 Bidî xatiri min evî ummeti
Bi serbest bi hev ra biçîn cenneti

1963 We ger na di rûzi qiyam şermisar
Dibim ez di nava hevali kubar

1964 Ku da kes nebîjit Muhemmed emîn
Ji ber ummeta xû bûye dilhezîn

1965 Xuda gûtî ya Ehmedi çavbelek
Mi hefti hezar ‘ef kirî yek bi yek

1966 Evî ku buwîn musteheqqi Cehîm
Mi da xatiri te mebe dilseqîm

1967 Mi gûtî Ilahî hinek zîde ke
Ji ‘efwa te ra ev qeder hindik e

1968 Digûtî eger muznibek zenbidar
Rucû‘ be ji zenbi xû yî bî qerar

1969 Bi salek berî mewti tewbe biket
Gunahi wî ber cenbi ‘efwi çiket

1970 Ezî wî ‘efû kim di wî lehzei
Bi ‘efwi xelas kim ji wî hewbei

1971 Mi gûtî Ilahî ku salek kesîr
Bi lutfi binîre li hali feqîr

1972 Digûtî berî mewti mahek temam
Rucû‘ be ji zenb û guna xas û ‘am

1973 Ezî wî ‘efû kim bi ‘efwa kubar
Ji bû xatiri te evî bî medar

1974 Mi gûtî Ilahî mehek zîde ye
Çukû ev feqîrek gelek hewce ye

1975 Hinek jî neqis ke bi lutfa ‘emîm
Ku da ev feqîr pî bibit musteqîm

1976 Digûtî eger cum‘eyek bittemam
Biket tewbei ew ji xas û ji ‘am

1977 Ezî wî duxûl kim di nîv rehmeti
Bi wî rehmeti dî biçit cenneti

1978 Mi gûtî Ilahî di vî cum‘ei
Nikarit xû bigrit ji vî hewbei

1979 Hinek kîm bike muddetî tewbedar
Ku da xû muheyya bike zenbidar

1980 Digûtî bi rûjek berî mewti xû
Ku tewbe biket ew ji zenbi di xû

1981 Ezî wî ‘efû kim di wî sa‘eti
Ji bû xatiri te biçit cenneti

1982 Mi gûtî Ilahî ku rûjek hemîn
Kesîr e ji bû zenbidara yeqîn

1983 Were tu neqis ke ji rûji hinek
Ku da tewbe kin ew hemî yek bi yek

1984 Digûtî berî mewti yek sa‘eti
Xû hazir bike ew ji bû tewbeti

1985 Ezî tewbeya wî qebûl kim yeqîn
Biçit cenneta nazik û nazenîn

1986 Mi gûtî pir e sa‘etek ey Xuda
Ji rehma xû ‘ebdi xû nakî cuda

1987 Eger tu nexî rehmeti zenbidar
Ki ye vî xelas ke bi zenbi kubar

1988 Digûtî dema ket li nik xerxeri
Ku tewbe biket ew di wî zemceri

1989 Ezî wî qebûl kim qebûlek hesen
Duxûl kim di nîv cenneti da ‘elen

1990 Mi gûtî Ilahî li nik xerxera
Ki ye ‘eql û daniş bibit eşkera

1991 Çukû ew nikare di wî wertei
Xû hazir biket ew bi vî tewbei

1992 Digûtî di her leyla cum‘a kubar
Ezî sed hezarî xelas kim ji nar

1993 Çukû rehmeta min di her cum‘ei
Difûre ji bû xatiri tewbei

1994 Mi ‘ehd e kesî tewbe ket an zeman
Ezî wî xelas kim ji derd û xeman

1995 Mi gûtî hinek zîde ke ya Kerîm
Çukû rehmeta te kesîr e ‘emîm

1996 Hemî î tene ey Xuda serteser
Eger ne tu bî ew dibin bîmefer

1997 Serî min ji ber wan ve berjîr meke
Ewan daxili cenbi ‘efwi bike

1998 Mi hîvî heyej Xaliqî neh felek
‘Efû ke evî ummeti lek bi lek

1999 Digû axiri leyleya Remezan
Ezî wanî azad bikim bîguman

2000 ‘Eded ewweli şehri ta axirî
Çukû tu ji bû wan dibî rehberî

2001 Ezî wan bidim xatiri te yeqîn
Ji ber wan tu cara mebe dilhezîn

2002 Mi gû ya Ilahî bi zati xwe kî
Ji ber ummeti min bi serjîr nekî

2003 Eger çi gunahi wa misli çiya
Li ber cenbî ‘efwi qe nabin xuya

2004 Hinek zîde ke ey şehi ‘erş û ban
Ku da tev bi hev ra biçîn der cinan

2005 Çukû ew biçûk in tu şahi mezin
Hemû ew ji bû rehmetî hewce yin

2006 Hema wî bi sî carî xuz gû yeqîn
Welî min nizanî çi me’na divîn

2007 Mi gû ya Ilahî çi me‘na ye xuz
Beyan ke ku da ez bibim musteliz

2008 Te sî carî gû xuz bi lefzi qedîm
Nizanim ku tefsîr bikim ey ‘Elîm

2009 Cewab da ku ‘efwî we hilmî bizan
Digel rehmetî ey şehi ins û can

2010 Mi gûtî li wechi ke hemd û şukur
Digel hinde ikram û ihsani pur

2011 Ezel ta ebed hemd û şukri Xuda
Di yek lehzei ez nebim jî cuda

2012 Nikarim ji bin ni‘metî bî‘eded
Bi derve herim ez bi muhr û sened

2013 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatiri şahi ‘alî cenab

## Mewzi‘u’d–du‘a-i we’t-tederru‘i we’l-ibtihal[85]

## (Ev beş 75 malik e)

2014 Çira hemd û şukrî Xuda bî ‘eded
Tu nakî eya Nûriyî bî meded

2015 Xuda te kirî ummeta şehsuwar
Ku Islam li te wî kirî yadigar

2016 Gelek hemd û şukri Xuda ke ji dil
Ku Islam ey Nûriyî dilbikul

2017 Xû bavîje dergahi şahi ‘Ereb
Ku belkî qebûl ke eya bîedeb

2018 Ew e rehberî cumle ‘alem yeqîn
Şefî‘e ji bû cumlei muznibîn

2019 Ku belkî te jî ew şefa‘et biket
Ji nîv ehli heşri te derbazi ket

2020 Eger ne Muhemmed resûli binûr
Ki ye te xelas ke ji deryai kûr

2021 Were tu rucû‘ be ji zenb û gunah
Ku belkî şefa‘et biket padişah

2022 Çukû rehmet e bû hemî ‘alemîn
Himayetgerî cumlei xaifîn

2023 Were tu rucû‘ be bike tewbei
Xû derxe ji vî deftera hewbei

2024 Ku furset heye tewbe ket el‘ecel
Ku da fuc‘eten nîte ser te ecel

2025 Dema bîte ser te ecel ey fulan
Nikarî tu tewbe bikî an zeman

2026 Ricai bike ez şehi ins û can
Dema çû bi teşrîf sera lamekan

2027 Bibîje ji bû Rebb û şahi qedîr
Bibûre ji vî Nûriyî pur feqîr

2028 Çukû pur neçar e ji zenb û gunah
Diket ‘ew‘ewî ber derî padişah

2029 Mi hîvî ji zati kerîmi’s-sifat
Di rûzî qiyame bikî wî necat

2030 Çukû pur feqîr e hezîn û zelîl
Bidî xatiri ismi paki celîl

2031 Di rûzî qiyame bidî ruxseti
Ji bû min ku ‘ed kim ji vî ummeti

[85] “Babeta hêvî, gazî û du‘ayan”

2032 Ku da kes nebîjit yekî zenbidar
Duxûl bû bi zenba di nari kubar

2033 Çukû tu ‘efuww û kerîmi yeqîn
Ji ‘efwi gelek hesdikî an û hîn

2034 E jî pur ricai dikim ey Xuda
Ji nîv ummeta min nekî wî cuda

2035 Were Necli Ewhed were rûsiya
Te defter tijî kir ji bî emriya

2036 Ne şerm û heya bû te ey zenbidar
Heta tu dikî van kelami feşar

2037 Guneh ser guneh dikî hîn û an
Hewale dikî ser şehi ins û can

2038 Eger van gunahi dikî bîne der
Hemî wî ji te dûrkevin serteser

2039 Çewan tu evan lafi vajî dikî
Di nîv ‘alemi de xû ruswa dikî

2040 Heta tu bi van laf û bîemriya
Bi zenb û gunahi xu yî wek çiya

2041 Xitabi dikî ba şehi ummeti
Ku belkî te ‘ed ke ji vî ummeti

2042 Welî nabirim ez ricai ebed
Bi van zenb û ‘isyaniyî bî‘eded

2043 Ji wî rehmeta cumlei kainat
Li ser wî hezaran selam û selat

2044 Ku belkî mi ‘ed ke ji vî ummeti
Bi sefa xû re min bibit cenneti

2045 Eger çi gunah im hene wek çiya
Bi zenb û bi ‘isyaniya bîheya

2046 Welîkin bi hemdi Xudayî semed
Ji vî ummeti me bi muhr û sened

2047 Ji xeyrî Xudayi kerîm kes çunîn
Muhemmed resûli Xuda ye yeqîn

2048 Melek tev ji nûrîne cismi letîf
Bi teyran diçin tîn ne cismi kesîf

2049 Sed û çar kitab in hemî bittemam
Rusûl sî sed û sîzdeh in wesselam

2050 Qeder heqq e zanim digel xeyr û şer
Bi teqdîri zati Xuda serteser

2051 Digel heşr û neşr û qiyamet heq in
Sewab û ‘iqabi Xuda mutleq in

2052 Cehennem di bendav û cennet li ser
Wuha pî xeber da hedîs û eser

2053 Cehennem cihî kafir û muşrikîn
We cennet cihî muslim û mu’minîn

2054 Wuha wî bimînin ebed her ebed
Wuha yî emir kir Xudayi semed

2055 Muhemmed şefî‘e ji bû mu’minîn
Nexasim ji bû cumlei muznibîn

2056 E jî yek ji wan muzniba me eman
Ricai dikim ez ji şahi cihan

2057 Mi derxî ji deryai bîemriya
Menîre li zenbi mini wek çiya

2058 Eger tu binîrî li zenbi di min
Dibim musteheqqi ‘ezabi mezin

2059 Welîkin umîdam eya şahi dîn
Heye tî şefî‘ bî ji bû min yeqîn

2060 Gunah im hene bîhed û bîjimar
Nikarim hisab kim di leyl û nehar

2061 Mi defter tijî kir ji zenb û gunah
Nikarim ku ‘ed kim eya padişah

2062 Ji lew ez dibîjim şefî‘i min î
Bi heqqi bisata li ser sakin î

2063 Xuda ruhsetek pur mezin daye te
Ne daye çû kes pîşi te xeyrî te

2064 Xuda te ji erzi birî asiman
Ji wî te birî xelweta lamekan

2065 Xelatek mezin wî li ser te hinar
Bi lutf û kerem te ji wî anî xwar

2066 Ji vî rutbeti qet çu rutbe ni ye
Eger tu nebî ey ‘eceb ew ki ye

2067 Mi hîvî rica ye ji şahi ‘Ereb
Şefa‘et bikî Nûriyî bîedeb

2068 Gelek ez xerab im welî bende yem
Li ber dergehi rewzei tûle yem

2069 Nehîlî bibînim çu derd û xema
Bidî xatiri Qasim û Fatima

2070 Çukû ez bi van zenb û ‘isyaniya
Digel hinde fi‘li ji bîemriya

2071 Nikarim ku bîm hezreta şahi dîn
Ku da ez ricai ji wî kim yeqîn

2072 Bi serjîr xeber da mi ev çend kelam
Mi anî hewale kirî der meqam

2073 Ku da eşrefi ser zemîn û sema
Nehîle bibînim ebed yek xema

2074 Çukû rûreş û bîmedar im eman
Mi hîvî nema xeyri şahi cihan

2075 Di rûzî qiyame tevî ummeti
Bi sefa xû ra min bibî cenneti

2076 Ku da ez bibim şadiman ey nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

2077 Ku her kes bizane yekî bîmecal
Di zenb û guna de bûye kerr û lal

2078 Resûli Xuda wî ji nîv ummeti
Hilanî heta wî birî cenneti

2079 Heçî ehli îman dibin şadiman
Welî î şevî bit dibit pûşiman

2080 Şevî dî bibîjit xûzî an zeman
E jî wî demî ez bibûm musliman

2081 Ku da ev resûli kerîmi's-sifat
Bi vî muznibî ra mi bikra necat

2082 Li dunya digûtin eva sahir e
Bi qewl û bi fi'li xû pur makir e

2083 Mi jî i'tiqad pî dikir wî demi
Ji lew bûme ruswa di nîv 'alemi

2084 Eger min jî îman biîna yeqîn
Nuha ez dibûm tabi'i muslimîn

2085 Diçûm cenneti ez bi keyf û tereb
Bi saya Muhemmed resûli 'Ereb

2086 'Eded kulli zerrati der kainat
Li ser Ehmedi şubhi gul es-selat

2087 Digel wan selami te yî mu'teber
Nebin munqeti' ev selam serteser

2088 Ilahî mi nespîrî nefsa xerab
Bidî xatiri şahi 'alî cenab

## Sewqu ma nehnu fîhi[86]

## (Ev beş 350 malik e)

2089 Niyet kir resûli Xuda bin nuzûl
Nida hatî qif ey Muhemmed resûl

2090 Ezî hedye kim ser te wû ummeti
Kesî wan wefa ket diçit cenneti

2091 Welî ger kesî wan neket bittemam
Meşîet ji bû wî heye wesselam

2092 Eger ‘efwi ket nîne mani‘ ebed
Te daxul biket ew bi muhr û sened

2093 Welî ger ceza ket ewî bîwefa
Çu mani‘ çunîne eya Mustefa

2094 Mi ferz kir li tew ummeti pencî ferz
Hetanî ku sax in dibit deyn û qerz

2095 Di kulli şev û rûjî lazim bikin
Eger ew nekin xû mucezza dikin

2096 Semî‘na ete‘na mi gû bû Xuda
Heta ez ji nik wî dibûme cuda

2097 Bi xû ew selat û selama diket
Li ser min bi lutf û kerem ew diket

2098 Heta çû gihîştim bi Mûsa kelîm
Xudanî ‘esa ez bi qelbi selîm

2099 Dema min didî radibû ser piya
Di wechi mubarek beşaşet xuya

2100 Gelek merheba wî ji bû min dikir
Bi ‘işq û mehebbet mi hembîzî kir

2101 Digûtî eya eşrefi kainat
Li ser te hezaran selam û selat

2102 ‘Eceb tu ji nik rebbi ‘erz û sema
Tu tîyî bibîje ji bû min hema

2103 “Ne‘em” gûtî sultani her neh felek
Beraber bi min ra sufûfi melek

2104 Xitab kirye Mûsa bi şahi cihan
Dema çûyî xelwa şehi lamekan

2105 Çi hedye Xuda date ey Mustefa
Ji bû min beyan ke bi sidq û sefa

2106 Kerem ke bibîje ji bûna Xuda
Ku da ez bizanim ku çi hedye da

2107 Cewab da resûli Xuda bû kelîm
Ji bû hedyei ra mebe dilseqîm

2108 Xuda da min û ez bi razî kirim
Ji bû ni‘meti wî gelek şakir im

[86] “Sewqa ku em tê de ne”

2109 Di ger gûtî Mûsa gelek şakir î
Ji bû ummeti wî çi hedye kirî

2110 Were bîje min ey şehi serfiraz
Bi lutf û kerem hem bi ‘izz û bi naz

2111 Cewab da hebîbî Xuda an zeman
Xuda daye ummet xelati giran

2112 Heta ew bi vî tuhfei razî bûn
Ji ewel heta axiri wan butûn

2113 Ji nav hindi vî tuhfeya faxire
Kî pencî limîj daye wan zahire

2114 Şev û rûjî pencî limîj daye wan
Gerek ew eda kin limîjî ‘eyan

2115 Cewab daye Mûsa ji bû şehriyar
Heçî ummeta te ze‘îf û neçar

2116 Nikarin hilînin giran e li wan
Nexasim ku tîtin di axirzeman

2117 Ze‘îf û neçar in bi ‘umrî qesîr
Heqîr û feqîr in bi zenbi kesîr

2118 Sual ke ji Barî bike xiffeti
Wegerna muheqqeq diçin mihneti

2119 Cewab da resûli kerîmi’s-sifat
“Eleyhi minellahi elfu selat”

2120 Ki ye bî hilîne ulûfan hicab
Ditirsim Xuda bîne ser min ‘itab

2121 Cewab daye Mûsa ‘eleyhisselam
Li vir jî suali bike ya imam

2122 Çukû ew qerîb û mucîb e yeqîn
Di nîv ‘alemi da te nake hezîn

2123 Muhibb e ji bû te eya şehriyar
Çi meqsed bixwazî dide ew bixar

2124 Bixwaze ji wî da biket xiffeti
Ku da ew nekîşin gelek zehmeti

2125 Ji nagah bihîstî nidaek mezin
Çi ye der dilî te bixwaze ji min

2126 Çi tişti buxwazî didim te yeqîn
Çukû tu şefî‘i ji bû muznibîn

2127 Bi serbest buxwaze ji min ey resûl
Çi tiştî buxwazî li nik min qebûl

2128 Mi gûtî Ilahî bikî xiffeti
Hilîne hinek jî li ser ummeti

2129 Ze‘îf in nikarin evî deyn û qerz
Hilînin di rûj û şevi pencî ferz

2130 Xuda pince ferz jî hilanî hema
Digûtî mekîşe tu derd û xema

2131 Mi gûtî Ilahî hinek dî hilî
Ji wan ferzi paki tu pî qailî

2132 Nihayet heta çill û penc ferz yeqîn
Ji pencî hilanî di der an û hîn

2133 Dema ser min û ummeti penc selat
Li ser Ehmedi çavbelek esselat

2134 Sual kirye Mûsa kelîmi Xuda
Hinek dî buxwaze eya Ehmeda

2135 Ze‘îf û neçar in eya şahi dîn
Nikarin hilînin selati Metîn

2136 Mi şerm û heya kir ji zati Metîn
Heta jî buxwazim hinek dî hilîn

2137 Nida hat ji bû min eya çavbelek
Mi şandî ji bû xizmeta te melek

2138 Hetanî tu hatî li ‘erşi ‘ezîm
Qedem da bi ne‘li bisata qedîm

2139 Li ser vî bisati mi hinde xitab
Dikir min ji bû te ne perdew hicab

2140 Ku da gûtinî te hemî kim qebûl
Di der ‘alemî de te nakim melûl

2141 Were tu kerem ke eya zelmeqam
We ya efzeli cumle ‘alem temam

2142 Çi maye bibîje beyan ke li min
Bi serbest xeber de hebîbi mezin

2143 Eger çi ku penc in di qewl û xebat
Welîkin di mîzani pencî selat

2144 Ku her yek limîjek bi misli deha
Wuha tu bizane eya padişa

2145 Mubeddel qe nabin li nik min kelam
Yeqîn ke li ba min ev e wesselam

2146 Kesî bîte ba min bi yek hesenat
Ezî bidmi misli wî deh qat bi qat

2147 Welî ger biket seyyiek bî medar
Li ser tî nivîsî wekî wî bi xar

2148 Kerem ke bimeş ey şahi canfida
Li ser te selam û selati Xuda

2149 Mu xatir dixwustî ji Mûsa kelîm
Digel Refrefi ser riya musteqîm

2150 Hetanî gihîştim exî Cibreîl
Li ser wî selam û selati celîl

2151 Mi ditî qiyam e wekî hali ber
Ne pîş û ne paş e exî mu‘teber

2152 Dema min didî wî mi hembîzî kir
Li nav her du burhi mi teqbîli kir

2153 Gelek merheba kir bi nutq û kelam
Li ser min duxwendî selat û selam

2154 Gelû te çi hedye ji nik girdigar
Dianî bi Refref dihatî suwar

2155 Bibîje ji bû min eya serfiraz
Beyan ke çi anî bi ‘izz û bi naz

2156 Heqîqet tu wî efzeli ‘alemîn
Şefî‘î ji bû cumlei muznibîn

2157 Mi gûtî Xuda da mi fezla ‘ezîm
Bi min kirye ihsan ‘etaa cesîm

2158 Gelek hedyei faxir e pur hezîl
Bi min da Xuda ey exî Cibreîl

2159 Heman gûtî Cibrîl liyaqet heye
Çi tiştî dibîjî hemî ew we ye

2160 Heqîqî tu yî eşrefi kainat
Li ser te hezaran selam û selat

2161 Xuda min ji yumna te mehrûm neke
Di rûjî qiyami fidai te ke

2162 Nihayet bi desti mi girtî heta
Diçûn em gihîştin bi heşt cenneta

2163 Mi dî yek melek pur mezin ba cemal
Bi husn û bi hey’et çu nîne misal

2164 Bi wechi munewwer libasi nezîf
Mulewwen muzeyyen herîrî xefîf

2165 Ji istebreq û sundus in ev libas
Ji durr û cewahir ji yaqût û mas

2166 Culûs e li ser kursiyek sade nûr
Libas û xişir tev hemî bîqusûr

2167 Mi gûtî exî Cibreîl ev ki ye
Wekî vî bi vî hey’eti kî diye

2168 Bibîje ji bû min binasim temam
Ku da ez herim nik li wî kim selam

2169 Digûtî eya şahi insan û can
Kî Ridvan e ew xazini heşt cinan

2170 Kerem ke here nik li wî ke selam
Bi ‘izz û bi lutf û kerem ihtiram

2171 Diçûme li nik wî selam lî dikir
Ji hindav de rabû mi himbîzî kir

2172 Selamam vegîra selamek temîz
Li min merheba gû hebîbî ‘ezîz

2173 Kerem ke were nasihi ummeti
Bi çavi serî xû bibîn cenneti

2174 Gelek ez ji tew ummeti hesdikim
Duxwazim herû xizmeta te bikim

2175 Heman Cibreîl gûtî Ridvan bixar
Were bigre desti hebîbi kubar

2176 Bide dîtini cenneta nazenîn
Ku da ew bibîne cihi mu’minîn

2177 Çukû ew duxwaze cihi mu’minan
Bi çavi serî xû bibîne ‘eyan

2178 Heta ew cihi wan nebîne temam
Dili wî rehet nabitin her mudam

2179 Çukû rehmet e bû hemî ‘alemîn
Şefî‘e ji bû cumlei muznibîn

2180 Bidesti mi girt xazini cenneti
Heta da nişandan cihi ummeti

2181 Gelek keyfxweşî pur muferreh dibûm
Dema min cihi wan didî xweş dibûm

2182 Mi dî erzi cennet beyazi neqî
Wekî zîvî xalis digel rewneqî

2183 Teemmul mi tî da kirî çendî car
Ne hate wesif cenneta nazidar

2184 Bi hembai lu’lu’û mercani pur
Ji bellûr û cewher ji mas û ji dur

2185 Xu lî miska ezfer nebat ze‘feran
Ji zîv û ji zîr in pelî der cinan

2186 Pelî darî cennet ji zîv û ji zer
Wuha bû riwayet hedîs û eser

2187 Pelek zîv e yek zîr e dari cinan
Wuha pî emir kir şehi ins û can

2188 Heçî fîkî dari heşt cenneta
Lezîz in bi te‘ma hemî lezzeta

2189 Bi misli nucûmi sema ne hemî
Li jûr ‘erşi Rehman e şubhi gemî

2190 Tijî rehmet e ew melek sakin in
Bi zikri Xuda ew hemî zakir in

2191 Ciwar in hemî ew bi zati Xuda
Ji wî rehmeti ew qe nabin cuda

2192 Nihayet kî Ridwan bi desti mi girt
Diçûm em di nîv dar û bexç û duruxt

2193 Mi bîhed didîtin tuxût û surûr
Li ser wan culûs in çi Wildan û Hûr

2194 Digel dewhei qesri ‘alî di nav
Heme miska xalis li wan tî xunav

2195 Çi Xilman û Wildan bi misli qemer
Ji bû wan çu nîne ne kerb û keder

2196 Gelek ni‘meti der meqami kerîm
Xulûd û su‘ûd û surûra ‘ezîm

2197 Hemî ev ciwar in bi zati Xuda
Me hîvî heye em nebin jî cuda

2198 Mi dî qubbekî lu’lu’ û sîm û zer
Mu‘elleq li cewwi sema serteser

2199 Mu‘elleq li jûri bila şey ‘eyan
Ne tiştek di bin da heye bîguman

2200 Ji wî ra hezar qapiyî sade zer
Hene her derîkî hezaran guher

2201 Li ser her guher kî hezaran wesif
Wuha kir muzeyyen Xebîrî Letîf

2202 Di nîv hindi qubbî hezaran qusûr
Di her qesrekî da xuref sade nûr

2203 Di her xurfekî da hezaran serîr
Li ser her serîrî bisati herîr

2204 Di beyna firaş û firaşi nehir
Ji avi diçin tîn bi naz û fexir

2205 Li her yek firaş Hûriyek bacemal
Kesî wî bibîne dibit kerr û lal

2206 Muheyyer dimînin heçî nazir în
Mudehheş dimînin heçî sami‘ în

2207 E jî mame heyrî dimame ‘ecîb
Ji vî qubbeya pur muzeyyen xerîb

2208 Nida hat li min gû eya şahi dîn
Nezer ke li jûra qubî ya emîn

2209 Muheqqeq tu hingî dikev hîreti
Ji tişti dibînî di der cenneti

2210 Mi bir jûrî nîzî bi medde’l-beser
‘Eceb min digirtî hemî serteser

2211 Teemmul mi tî da kirî an zeman
Mi qubbek ji zumrûdi kesk dî ‘eyan

2212 Di wî qubbei textekî ‘enber e
Sipî pur muresse‘ durr û cewher e

2213 Li ser calis e cariyek çavbikil
Hezarûkî şeşsed kezî dane mil

2214 Sipî sûr û çavreş bi husn û cemal
Kesî qet nedîtî wekî wî misal

2215 Bi husn û melahet bi qedda zirav
Wekî wî nebûne li ber si yû tav

2216 Xuda xelq kirî ez qedem ta rukeb
Ji kafûra ebyed eva pur ‘eceb

2217 Ji rukbet heta sedri miska siyah
Eva sûreta sun‘i zati Ilah

2218 Ji sedri heta wechi sade ji nûr
Xuda wî muzeyyen kirî bîqusûr

2219 Eger pîçiyek xû bidit ser zemîn
Meşariq mexarib dibin dûrebîn

2220 Eger tif ke behri heta saleki
Ji şîrîn nikarî buxî qulpeki

2221 Mi gûtî exî Cibreîlî kerîm
Eva ni‘meta gel ‘etai cesîm

2222 Ji bû kî Xuda kir muheyya temam
Bibîje ji bû min hemî wesselam

2223 Çukû ez ‘eceb mam ji vî ni‘meti
Xuda xelq kirî tev di der cenneti

2224 Beyan ke li min ey xelîli wefî
Ji bû min mehîle tu tiştek xefî

2225 Digûtî ji bû min kî ey şehsuwar
Duxwazî beyan kim li te yadigar

2226 Xuda xelq kirî ev ne‘îmi metîn
Muheyya kirî bû kesi mu’minîn

2227 Dema ew ji dunya biçit meqberi
Beraber be îman heta meşheri

2228 Ku ye‘nî li dunya Xuda yek bizan
Muhemmed resûl e bi bal ins û can

2229 Xuda wî bidî vî ne‘îmi yeqîn
Tu hemdi Xuda ke eya şahi dîn

2230 Mi dîtin gelek ni‘meti cenneti
Xuda kir muheyya ji bû ummeti

2231 Mi dî heft nehir der cinani diçin
Bi hay û bi hû zikrî Mewla dikin

2232 Yekî av e yek şîr e yek xemri pak
Digel hingiv û selsebîl derdinak

2233 Yekî jî rehîq e bi ah û fixan
Yekîdiyye tesnîm diçit her zeman

2234 Yekîdiyye kewser behiyy û delal
Ji bû min muheyya kirî zulcelal

2235 Li dûr wî hene şurb û eqdahi pur
Ji yaqût û mas û cewahîr û dur

2236 Bi misli nucûmi sema rengereng
Ji wan tî bi zikri Xuda sewt û deng

2237 Hinek jî selat û selami kubar
Didin ser Muhemmed dikin yadîgar

2238 Digel al û sehbi nebiyyi Huda
Ji vî zikrî nabin ebed ew cuda

2239 Resûli Xuda gû dihatim bixar
Sema ta sema ez dihatim li xwar

2240 Çi tişti mi dîtin di heft asiman
Hemî zikri Mewla dikin her zeman

2241 Dema em dihatin semai yekî
Mi dîtî ku îşev li yek halekî

2242 Ne pîş e ne paş e şeva rehmeti
Xuda kirye hedye ji bû ummeti

2243 Suwar bûm Buraqi heta Mekketi
Qeder zerreyek min nedî zehmeti

2244 Nuzûl bûm ji Buraqi rûyi zemîn
Ku xatir dixwestin ji min ecme‘în

2245 Buraqi digû ey şehi bawefa
Mi ‘ehd e ji bû te bi sidq û sefa

2246 Di rûzi qiyami suwar bî li min
Şefa‘et bikî mehfela pur mezin

2247 Te jî ‘ehdî kirye bi min ra resûl
Li nik xû mi ‘ehda te kirye qebûl

2248 Ricai dikim ez şehi ins û cin
Dema bî qiyamet bi heşr û wezin

2249 Li min tu suwar bî bikî diqqeti
Ku da tu şefa‘et bikî ummeti

2250 Li min ‘ehd e ger izni det ew Xuda
Ji nîv ummeta te qe nabim cuda

2251 Zebanî dema wan bibin cehnemi
Ezî bîm xeber dim bi te wî demi

2252 Eger yek ji wan ser sirati bikev
Ezî wî hilînim bi dest û bi dev

2253 Zemani bikîşin sewab û ‘iqab
Ezî bîm culûs bim di keffa sewab

2254 Welî ger bixûnin kitab û sicil
Li min ew xefî kin bi can û bi dil

2255 Heta ser sirati biçî cenneti
Li min ez nedim te ebed ezyeti

2256 Bi diqqet temîn ke li wan ey kubar
Bira terk nekin ew limîjî tu car

2257 Çukû pur muhimm e limîj û selat
Sebeb wî di heşri dibin ew necat

2258 Eger ne muhim ba limîja temîz
Xuda ferzi nedkir li te ey ‘ezîz

2259 Emanet emanet emanet limîj
Ew e î ku kes nabitin bî qirîj

2260 Eger yek duxwaze binîzî Xuda
Bira ew limîj ke nebit jî cuda

2261 Eger yek limîjî neket ey hebîb
Qebûl nabitin ew zekata ‘ecîb

2262 Sed û çar kitabi Xudayî metîn
Dibîn tariki vî limîjî le‘în

2263 Le‘în çiyye me‘na ku metrûd e ew
Ji ber dergehi rehmeti dûr e ew

2264 Emanet bi diqqet li wan ke temîn
Nebin musteheqqi ‘ezabi mehîn

2265 ‘Eded kulli zerrati der kainat
Minellah li ser te selam û selat

2266 Dibîra xû bîne tu ‘ehda qedîm
Li ser te bibarin selati kerîm

2267 Di ger gûtî Cibrîl Muhemmed emîn
Dema bû sibe bîje wan ecme‘în

2268 Çi mayî te dîtî ‘ecîbi zeman
Di ev nîvi şev da li ser asiman

2269 Beşaret bi wan de bi rehma Xuda
Ji Islami qet‘î nebin ew cuda

2270 Mi gûtî exî Cibreîlî delal
Ditirsim bibîjim eva pur mehal

2271 Nekin bawerî ew bi mi‘raci min
Bibîjin xeberdani fehşi mezin

2272 Çukû ‘aqili wan qesîr e heman
Nikarin hilînin kelami giran

2273 Di ger gûtî Cibrîl bibîje temam
Welew ew xeber din bi fehşi kelam

2274 Eger ew qebûl naketin te bi heq
Ebûbekrî bîjit sedeqte sedeq

2275 Kerem ke here ser te elfû selam
Heta bî qiyamet nebîtin temam

2276 Guhî xû mede wan û fehşi xeber
Tu caran li xû negre qet yek eser

2277 Bira ew bibîjin hetanî hebin
Li dû wî bikîşin ‘ezabi muhîn

2278 Kerem ke here bîje wan ey nebî
Bira rûh û can im fidai te bî

2279 Menîre li wan û xeberdani wan
Kerem ke here ey şehi ins û can

2280 Nihayet ku xatir dixwustin temam
Diçûn ûxira xû hemî wesselam

2281 Ji dû wan vegîram û hatîme mal
Niyet min heye ez bikim keşfi hal

2282 Heman Ummu Hani di gû Yabne ‘Em
Ji Israi mekşî ebed hemmû xem

2283 Mebîje ji bû wan eya şahi dîn
Hemî wî ‘inadî bikin ecme‘în

2284 Ku belkî heta eqrebai di te
Nekin bawerî cumlei wan bi te

2285 Were rûh û can im mebîje li wan
Heçî gûtinî te li wan tî giran

2286 Resûli Xuda gû ji bû Ummi Han
Di îşev de çûme sera lamekân

2287 Gelek ni‘meti zahir û batin e
Di îşev de bû min hemî dayine

2288 Emir da ku bîje li cumle mulel
Emanet nehîlî di nav de xilel

2289 Çewa ez nebîjim eya Binte ‘Em
Ji bû gûtina min nekîşe tu xem

2290 Xuda emrî kir gû “feheddis” yeqîn
Nikarim nebîjim mebe dilhezîn

2291 Resûli Xuda gû ji bû me temam
Li ser wî hezaran selat û selam

2292 Dema çûme ser wî firaşa temîz
Mi xew kir di wî da xewek pur lezîz

2293 Wuha mam heta bû sube radibûm
Limîja subî min dikir ez diçûm

2294 Heta hatime qapiyî mescidi
Ku da ez duxûl bim ji bûna Xudi

2295 Heman min didîtî Ebî Cehli pîs
Li wî der xuya bû xebîsi te‘îs

2296 Çukû ‘adeti vî xebîsi cihan
Dema min bidîta digûtî ‘eyan

2297 Te îşev çi derxist ji ‘eqli xû bîj
Hemî tu beyan ke ji kurt û dirîj

2298 Evî kelbi hat û ji min kir sual
Wekî î berî wî dikir keşfi hal

2299 Çukû ev xebîs pur neyar e li min
Xebîsi mirari le‘îni mezin

2300 Mi gûtî ji bû wî şevi barih e
Bi derketme derve ji bû nasih e

2301 Ji bû min re gûtî tu çûyi li kû
Kerem ke bibîje hemî mû bi mû

2302 Mi gûtî bi Beytilmuqeddes ve çûm
Di der mescidi dîn qenadîl û mûm

2303 Ji wî çûme sabi’ semai kerîm
Ji sabi’ sema çûme ‘erşi ‘ezîm

2304 Min û Heq bi hevra xitabet dikir
Didamin gelek wî mi kir pur şukur

2305 Mi dî cenneta wî Xudayi kerîm
Digel hinde ala ne‘îmi muqîm

2306 Xuda kir muheyya ji bû mu’minîn
Digel wan ‘ibadi xû yî salihîn

2307 Mi dîtî cehennem ‘ezabi elîm
Digel hinde alam zeqûm û hemîm

2308 Li min ew vegîra xebîsi mirar
Digûtî ketim ke tu tişti kubar

2309 Bi van gûtina qet xeber pî mede
Di tişti şevî da ebed guh mede

2310 Mi gûte Ebî Cehli pîsi bi kîn
Çewa ez ketim kim kelami metîn

2311 Gelek ni‘meti wî li ser min hene
Nikarim ketim kim ebed yek tene

2312 Çukû wî Xudayi Kerîm û ‘Elîm
Dişandî li ser min kelami qedîm

2313 “We emma bi ni‘meti rabbike” hat
Li pey wî “feheddis” dihat qat bi qat

2314 Li dû gû Ebû Cehli pîsi le‘în
‘Eceb pur dibînim ji te ey emîn

2315 Çewa tî bibîjî di qewmi xu da
Ki ye î ku heq tîxe desti te da

2316 Eger xû dizanî tu nabîjî qet
Di nîv meclisa de xû nakî xelet

2317 Ne‘em gûtî sultani her neh felek
Ezî bîme nîv meclisa yek bi yek

2318 Bibîjim ku îşev diçûm lamekan
Dihatim li xwarî cihi min ‘eyan

2319 Ji nagah nida kir xebîsi neyar
Di nav ehli Mekke wekî kelbi har

2320 Werin hûn hemî muctemi‘ bin li min
Ku da ez bibîjim çi tişti mezin

2321 Hemî ehli Mekke dihatin temam
Li ser wî le‘îni dikir wan selam

2322 Digûtin bibîje ji bû me ‘eyan
Ji bû çi te gazî me kir ev zeman

2323 Bibîje li nik te hemî hazir in
Di emr û di nehyî te da nazir in

2324 Le‘îni munafiq hemî serteser
Li wan kir beyan ev hedîs û xeber

2325 Qureyşî bi hevra bi buxz û bi kîn
Berî xû didane resûli emîn

2326 ‘Eceb ev çi tişt in dikî tu ‘eyan
Wekî te me nedye di dewra zeman

2327 Hela bîje me vî hedîsa betal
Ki ye yî qebûl ke ji te ev meqal

2328 Resûli Xuda rabû şubhi xetîb
Li wan kir beyan ev hedîsa ‘ecîb

2329 Digûtî guhi xû bidin min temam
Ku da ez beyan kim li we xas û ‘am

2330 Xuda min birî şehri Qudsi hema
Ji wî der mi bir ta bi sabi’ sema

2331 Mi dîtin gelek enbiyai kiram
Li ser wan hezaran selat û selam

2332 Ji wî çûme ser ‘erşi ‘alî ‘ezîm
Heta ez diçûm ser bisata qedîm

2333 Min û Heq bi hevra xitab kir yeqîn
Hemî hûn sima‘ kin ji min ecme‘în

2334 Mi dî cennet û cehnemi bî qusûr
Temami xelaiq dikin jî nufûr

2335 Resûli Xuda gûte me cumle şan
Çi wesfi dikim bû Qureyşa ‘eyan

2336 Ebûbekr dibîjit sedeqte sedeq
Çi mayî tu bîjî ew e î bi heq

2337 Ebû Cehli pîsi xebîsi le‘în
Berî xû vegîra li min wî bi kîn

2338 Digûtî ji bû me tu wesfa didî
Ji van gûtini xû tu nakî fedî

2339 Tu wesfi semaa dikî yek bi yek
Ki ye bî yû bawer biket bîhenek

2340 Welîkin duxwazin ji te ey fulan
Tu Beytilmuqeddes li me kî ‘eyan

2341 Wesif ke eger tu dizanî bibîj
Te wesfi sema kir wesifkî dirîj

2342 Wesif ke tu Beytulmuqeddes temam
Ku da em bizanin heqq e wesselam

2343 Dema wî bihîstî kelami le‘în
Seri xû li jîr kir li alî zemîn

2344 Çukû ew duxûl bû di Qudsi bi şev
Di ser da dihatî ‘ecel ew bi xef

2345 Nedî yek ‘elamet heta ew bibîj
Ji lew ev xeber dan li wî bû dirîj

2346 Eger yek işaret bidîta temam
Bi lez wî cewab da li wa wesselam

2347 Nihayet Xuda wehyî kir an zeman
Li Cibrîl here Qudsi zû hani han

2348 Tu hilke bi erz û çiya û tilal
Digel çarşi yû mescidi hem newal

2349 Keşif ke li nik Ehmedi çavbelek
Ji bû ew beyan ke li wan yek bi yek

2350 Heman hate xwarî emîn Cibreîl
'Ecel kir dihatî bi Qudsi'l-Xelîl

2351 Dida qarişî şahi her neh felek
Evî jî beyan kir li wan yek bi yek

2352 Heta ew hemî serbijîr bûn temam
Ji wan çînebû ew bidin yek kelam

2353 Ebûbekr dibîjit sedeqte resûl
Çi mayî tu bîjî hemî ew qebûl

2354 Resûli Xuda gû ez û Cibreîl
Dema em dihatin ji Qudsi'l-Xelîl

2355 Li cewwi hewai mi dî çend zilam
Digel qafilek dî bi hevra temam

2356 Belav bûn li jî ra Çiyai Erak
Diçin tîn ji bû yek cemel fehli pak

2357 Mi gazî kirî wan devi wey fehil
Nuha ew diçîre li Wadi'n- Nexil

2358 Li nik rûj ku derkev ewî bîne mal
Dema ew ku hatin ji wan kin sual

2359 Dema bû sube qafile dûrî bûn
Nikarin bihata li Mekke butûn

2360 Beraber bir û jî ra qefli Hicaz
Nikarin ku bîn Mekkei serfiraz

2361 Xuda rûj digirtî di weqt û zeman
Ku da wan bi hevra bibînin 'eyan

2362 Ku da tev bizanin ev e mu'cizat
Ji bûna Muhemmed şehi kainat

2363 Heman wî le'îni Ebû Cehli dûn
Dişand Bû Qubeysi du merdi zebûn

2364 Ku da kariwan û tulû' bibne yek
Hemî ew bizanin nekin reyb û şek

2365 Dema ew zebûnî diçûn ser çiya
Bi hevra didîn rûj û qefle xuya

2366 Zebûnî dihatin li nik muşrikîn
Ji wan ra digûtin çi tişti ku dîn

2367 Mi dî kariwan hat û rûjî veda
Wuha şehdeyî em didin bû Xuda

2368 Nikarin veşîrin çi tişti me dî
Di nîv 'alemi da bi şerm û fedî

2369 Dema kariwan hate Mekke butûn
Dipirsîn ji wan kafir û muşrikûn

2370 Ji bû çi dereng hûn dihatin temam
Ji bûme bibîje çi qesd û meram

2371 Çukû me ji bû we dikir qîl û qal
Hinek jî digûtin bi şev tîne mal

2372 Hinek jî bi fecri re gûtin yeqîn
Li vir hazir in cumlei kariwan

2373 Ji bûme bibîjin hemî bî henek
Ku da em yeqîn kin ji we yek bi yek

2374 Çukû mane heyrî li we bîguman
Sebeb çi li rî ev qeder hûn diman

2375 Werin hûn beyan kin li me yek bi yek
Ji qelbi me derxin hemî reyb û şek

2376 Cewab da ji bû muşrika kariwan
Çi tişti me dîtî dibîjin ‘eyan

2377 Dema em dihatin Çiyaî Erak
Me barî xû danîn li ser ruyî xak

2378 Ku da em bibînin hinek raheti
Ku belkî xelas bin ji vî ezyeti

2379 Deva kî me wunda dibû an zeman
Hemî em digeryan li wî bîguman

2380 Gelek te‘b û ezyet li pey wî me dî
Heta em vegîran deve me nedî

2381 Nida da li me şexsekî mu‘teber
Li cewwi hewa wî bi dengi beşer

2382 Werin hûn vegîrin li alî yemîn
Deva xû bibînin mebin dilhezîn

2383 Deva we diçîre li Wadi’n-Nexil
Ji bûna deva xû mebin dilbikul

2384 Hemî em vegîran li ali newal
Me dîtî deva me diçîre delal

2385 Deva xû me anî heta merheli
Fulan kes kete gazi yû welweli

2386 Me pirsî ji wî ev çi gazî fixan
Di ev nîvi şev da dikî ey fulan

2387 Beyan ke çi hate serî te bibîj
Te îşev hemî me kirî kerr û gîj

2388 Cewab da li me gû hemî hûn bizan
Mi şerbi xû danî bi avi ‘eyan

2389 Mi sîveke sûr û zerî ba cemal
Dida ser devi şerbiki pur delal

2390 Welîkin mi ali di sûr kir ‘eyan
Ku da ew ji bû min bibit yek nişan

2391 Dema em dihatin gelek tih dibûm
Mi ra hişte şerbi ku avî vexûm

2392 Mi dîtî ku nişan muxeyyer bû ye
Mi zanî ku ava di şerbi niye

2393 Mi da ser devi xû ji bû imtihan
Mi dîtî ku av tî niye bîguman

2394 Ji lew min li we gazî kir wî demi
Ki ye av ji şerbi mi bir ‘edemi

2395 Hevala ji wî ra qesem pur duxwar
Me ava di şerbi te qet‘î nexwar

2396 Çukû ku zû şerbi me cumle heval
Muheqqeq tijî ne ji ava zelal

2397 Welî î nida kir li cewwi sema
Digûtî bizanin ji min hûn hema

2398 Mi ava di şerbi yekî tev vexwar
Bira ew nebîje hevala we xwar

2399 Mi sîva devi şerbiki wî qelabt
Ku da ew di Mekkî bibit mu‘cizat

2400 Dema muşrika ev ji kerwan bihîst
Bela bû heta her kesî pî gihîşt

2401 Digûtin ketim kin evan bittemam
Ku da kes nebîje ji we wesselam

2402 Çukû wî berî we li me kir beyan
Evan gûtini we yekayek ‘eyan

2403 Bira ev xeberdan ji we çînebin
Ku da kes nebit tabi‘i wî ji bin

2404 Nihayet belabûn hemî çûne mal
Yekayek dipirsîn ji hev ev meqal

2405 Gelû wî çewa be li vî sahirî
Di nîv ‘alemî da me ruswa kirî

2406 Eger ev ji wî ra bimîne gelek
Ji bû me xerab e hemî yek bi yek

2407 Nihayet bi kîn û bi buxz û hesed
Diçin tîn li dûra resûli semed

2408 Fereh kefti nîv mu’min û muslimîn
Hesed kefti nîv kafir û muşrikîn

2409 Musulman bi keyf û sefa çûn temam
Bi ali Muhemmed ‘eleyhisselam

2410 Bi tehlîl û tekbîr diçûn ref bi ref
Li dûra Muhemmed kirin sef bi sef

2411 Resûli Xuda radibû ser piya
Şu‘ai ji nûri li wecha xuya

2412 Sehabî bi hevra selat û selam
Dixwûndin li ser şahi Beytilheram

2413 Bi sewt û seda wan diçû asiman
Ji wî çû hetanî sera lamekan

2414 Muhemmed di nav wan bi şubhi qemer
Wehum hewlehu ke’n-nucûmi’s-sixer

2415 Di ew rûj musulman buwîn çar hezar
Hemî derketin ew ji qewmi kufar

2416 Melaik duxwûndin li heft asiman
Selat û selaman li şahi cihan

2417 Bi tehlîl û tekbîrî şahi qedîr
Ji bû xatiri wî beşîrî nezîr

2418 Nihayet Ebû Cehli pîsi mirar
Neyar û ‘eduwwî şehi nazîdar

2419 Hesed pur digirtî ji şahi cihan
Xuda le‘netî lî bike her zeman

2420 Resûli Xuda sahibi mu‘cizat
Li ser wî hezaran selam û selat

2421 Digûtî ji bû wan sehabi kiram
Ji wa razî bit xaliqi layenam

2422 Ku îşev şeva bîst û hefti receb
Xuda min ji Mekkî birî bî te‘eb

2423 Buraq hatî îşev suwar bûm hema
Ji vir çûme Qudsi ji wî ta sema

2424 Ji wî çûme heft asimani kerîm
Ji wî çûme ser ‘erşi ‘alî ‘ezîm

2425 Heta ez diçûme sera lamekan
Cemala Xudî min didî bînişan

2426 Xuda ferz kirî ser min û we temam
Şev û rûjî penc ferz ev e wesselam

2427 ‘Ecaib didîtin mi bîhed gelek
Ji jîrî sema ta bi sethi felek

2428 Mi dî cenneta wî Xudayî metîn
Xuda kir muheyya ji bû mu’minîn

2429 Digel ni‘meti daimî der cinan
Xuda kir muheyya ji bû mu’minan

2430 Mi dîtî cehîm û ‘ezabi mehîn
Ji bû cumlei kafir û muşrikîn

2431 Nexasim le‘îni Ebî Cehli dûn
Digel tabi‘i wî di narî butûn

2432 Selat û selami Xudayî metîn
Li ser seyyidi me Muhemmed emîn

2433 Digel al û sehba hemî cumle şan
Hetanî hebin nar û êrş û cinan

2434 Rizaa Xuda bit ji her mu’minîn
Digel mu’minata me‘e’t-tabi‘în

2435 Digel nazim û qari‘ û salihe
Digel î li van hedye kit fatihe

2436 Xitam bû dî mi‘rac di sali hezar
Digel sî sed û heşti yû neh jimar

2437 Ji hicra Muhemmed şehinşahi dîn
Ji Mekkî ku çû bal Medîni yeqîn

2438 Ji şehra muherrem di çû çarî rûj
Meha me‘tema şeh Huseyn dildisûj

2439 Se‘et heft şeva penci şehrilheram
Bi hewla Xudî ev hedîs bû temam

## 2.2. KITABU NUZHETU'N-NUFÛS (MESNEWIYA HESEN CEWHERÎ)

1 Bi zat û sifati Xudayî ‘ezîm
Me pî ibtida kir bi qelbi selîm

2 Çi hemdi ku bîtin ji her hamida
Muheqqeq hemî hasil in bû Xuda

3 Digel pur selat û selami qebûl
Li ser seyyidi me Muhemmed resûl

4 Li dû wî li ser al û sehba temam
Nebit munqeti‘ ta bi rûzi qiyam

5 We be‘du ji min hûn bizanin yeqîn
Zemani ku bûrî li rûyî zemîn

6 Gelek hadise wî Xudayî Wedûd
Ji bû i‘tibari hemî kir wucûd

7 Li me lazim e i‘tibari bikin
Bi van hadisa em hemî guhbidin

8 Heçî qenc e bigre, zexel guh meke
Di qenc û zexel da tu şubhe meke

9 Çukû Xaliqi cumle insan û can
Ji bû imtihani me anî cihan

10 Heyat û mirin xelqi kir bî xelel
Hemî mubtela kir bi qenci ‘emel

11 Hinek jî ‘emel kir bi qenc û delal
Hinek jî xerabî dikir bîmecal

12 Xuda wî suali ji wan ke yeqîn
Di rûzi qiyamet hemî ecme‘în

13 Kesi ku bi qencî biket xizmeti
Bi fezla Xudî wan bixit cenneti

14 Welî ger xerabî biket ew seqîm
Dibit musteheqqi ‘ezabi elîm

15 Hemî tev bizanin ev e ev emir
Bi qelb û dili xû nebin munkedir

16 Emanet tu vî bendi bigre ji min
Ku belkî ‘efû ke Xudayî mezin

17 Nihayet sima‘ kin ji min hûn kelam
Bi dil guh bidin ez beyan kim temam

18 Zemani berî yek merivkî kubar
Hebû lazim e hûn bikin i‘tibar

19 Gelek mutteqî bû bi qewl û ‘emel
Kesî jî nedîtî ‘emelkî zexel

20 Bi ‘ilm û fesahet bi hilm û edeb
Di weqti wekî wî nebûn der ‘Ereb

21 Di Misri diseknî mirûvi tucar
Bi milk û ‘iqar û bi mali kubar

22 Ji bû ra digûtin Hesen Cewherî
Xuda wî ‘efû ke bi peyxemberî

23 Xuda hedye kir bû weledkî delal
Bi ‘ilm û fesahet bi ‘izz û kemal

24 Li wî navi danî ‘Elî wî demi
Bela bû ewî navi li der ‘alemi

25 Welîmek mezin çîkirî an zeman
Kesî wek welîmi nedî der cihan

26 Heçî ku bihîstî ji bû ra gelek
Du‘a wan dikir tev hemî yek bi yek

27 Çukû pur delal û wecîh e weled
Di weqti wekî wî nebûne ebed

28 Di Qur’an û ‘ilm û fesahet edeb
Wekî wî nehin qet bi keyf û tereb

29 Nihayet Hesen Cewherî bîmecal
Nexûş keti derhal xû avîti mal

30 Nişan û ‘elamati mewti ku dîn
Emir kir li ser meclisa hazirîn

31 Gû bînin ‘Elî vî demi hani han
Li wî ez wesî kim di weqt û zeman

32 Bi derhal yekî çû xeber da ‘Elî
Were zû xû bighîne mali welî

33 Ku bavi te bîhal e zû ke ‘ecel
Xû bighîne ba wî ku nehtî ecel

34 Dema wî ku seh kir jî wî an zeman
Xû avîte mali bi ah û fixan

35 Gelek wî girîn kir girînek ‘eceb
Kesî wî girîni nedî der ‘Ereb

36 Xû avîti ser wî leşi pur birîn
Bi ah û fixan û bi şîn û girîn

37 Hetanî kesi der huzûra Hesen
Girînek ‘eceb kirne gazî ‘elen

38 Dibû welwele wî demi serteser
Di nîv şehri Misri nema yek beşer

39 Ku illa dihatin ji bû me’temi
Hemî pî diîşan di gav û demi

40 Nihayet sukût kir kesî mehfeli
Ji ah û girîn û ji vî welweli

41 Ji ew paş Hesen gû ‘Elî ey weled
Xuda yek bizane ezel ta ebed

42 Bizane ku dunya hemî fanî ye
Yeqîn axiret serteser baqî ye

43 Ne nefs û ne mal û ne ehl û weled
Dimîne ji xeyri Xudayî semed

44 Tu vî her bizane nekev xefleti
Bi diqqet hilîne tu vî wesyeti

45 Tu vî wesyeti ger hilînî delal
Se‘îdî li nik Xaliqi zilcelal

46 We illa eger tu ‘emel pî nekî
Yeqîn ke gelek te‘bi hasil dikî

47 Gelek tî pêşîman bibî der ‘eqeb
Bi derd û bi îş û bi kerb û te‘eb

48 Emanet bike diqqeti ey ciger
Li nik xû bigîre gelek mu‘teber

49 Ji ew paş Xuda te selamet bike
Ji ekdari dunya te xaric bike

50 Bi derhal cewab da ‘Elî wî demi
Te dunya li min kir wekî cehnemi

51 Çewa guh nekim we‘z û bendi Hesen
Te cerg û dilî min kewandî ‘elen

52 Çukû ferz e ser min ita‘et bikim
Bi qelb û ciger ez qebûli bikim

53 Çi tişti emir kî qebûl e yeqîn
Emir ke ji bû min nebe dilhezîn

54 Gelû mumkin e guh nekim wesyeti
Dikîşî ji bû min tu vî ezyeti

55 Ji ew paş Hesen gû bizane heman
Mi hiştî ji bû te gelek xanûman

56 Ji milk û ji mali bila hedd û ‘ed
Ne jî ra hisab e ne jî ra ‘eded

57 Tu serf kî di yek rûjî pansed dinar
Neqis nakevit wan perî te tu car

58 Welîkîn emanet bibî mutteqî
Nebî tabi‘i wan mirovi şeqî

59 Eda ke ji ser xû firûzi Xuda
Bibit tabi‘i sunneti Ehmeda

60 Tu cehdi bike qenciyî her mudam
Ji bû te zexîre ew e ey xulam

61 Tu ehli selahi bike hemneşîn
Tu mali xû serf ke li wan ecme‘în

62 Nebî tabi‘i şuhh û buxli eman
Di gel wan mirûvi xebîsi zeman

63 Li nik ehli şubhi nekev suhbeti
Bi diqqet hilîne tu vî wesyeti

64 Emanet li nik te ‘eyal û xedem
Ebed ew nebînin ji te yek elem

65 Nexasim jina tey bi ‘izz û kemal
Bi husn û melahet bi qed i‘tidal

66 Çukû ev jina tey bi ‘izz û edeb
Xudan wer‘ û teqwa bi esl û neseb

67 Nuha ew ji te hamil e ey weled
Ji min vî bizane bi muhr û sened

68 Ku belkî Xuda zuryetek salihe
Bike hedye bû te bixûn Fatihe

69 Nihayet wuha wî wesî kir temam
Li ser Fexr-i ‘Alem hezaran selam

70 Ricai dikim ez ji Rebbi kerîm
Ku ew te hifiz ke ji fi‘li zemîm

71 Ku belkî bide ber te rahi sewab
Bi yumna şehînşahi  ‘alîcenab

72 ‘Elî da girîni girînek mezin
Digûtî tu xatir duxwazî ji min

73 Te suhtî dil û cergi min ey ebî
Bira mulk û dewlet fidai te bî

74 Digûtî ne‘em ey weled ‘arif im
Bi hal û bi nefsa xû ez waqif im

75 Nevî paşi gûşi xû vî wesyeti
Li vî wesyeti pur bike diqqeti

76 Li dû gû were nîzî min ey ciger
Çukû min nema ez bidim yek xeber

77 Ji hindav de rabû ‘Elî ser piya
Hetanî bi bavi xû çû ew giya

78 Bi ah û bi nalîn û şîn û girîn
Ku hîret kirin meclisa hazirîn

79 Dema çû ‘Elî rabû himbîzi kir
Ser û çav û dev li wî teqbîli kir

80 Ji ewwel de şehde dida an zeman
Di wî lehzei rûh bi derket ji can

81 Wefat bû bi bal rehmeta girdîgar
Hemî pî diîşan sexîr û kubar

82 Gelek welwele şîn û huzn û girîn
Di wî hînî ket meclisa hazirîn

83 Hemî ehli Misri cemi‘ bûn li wî
Bi derd û bi îş in temamen bi wî

84 Heta wî dişûştin digel sî kefen
Hemî jî ra huznî ne cumle ‘elen

85 Bi tekbîr hilanîn birîn mescidi
Di piştî limîji birîn merqedi

86 Dema wan defin kir bi ‘izz û kemal
Bi huzni hemî tev vegîrane mal

87 Gelek xwendin û Fatihe hem du‘a
Ji bû ra kirin hedye cumle eda

88 Li dû her kesek çû bi hali xû bû
Bi şîn û biîş in heta mahi nû

89 ‘Elî xetm û tehlîl li bavê xû dan
Bi huzn û girîn e di rûz û şevan

90 Ji mali bi der ve qe naçit yeqîn
Muqîm e di mali heta erbe‘în

91 Ku illa diçit cami‘i bû sela
Bi kerb û bi huzn e bi vî mubtela

92 Ji cum‘i heta cum‘a dî temam
Diçû bav ziyaret dikir wesselam

93 Ev e sen‘eti wî li gav û demi
Bi ah û girîn e di vî me’temi

94 Li dû hinde ewladi weqt û zeman
Dema çûne ba wî selam dan heman

95 Digûtin heta kingi huzn û girîn
Dikîşî gelek ‘eyb û ‘ar e yeqîn

96 Gelû em ne wek te bi bav û bi da
Buwîn me sebir kir hetanî nuha

97 Ji bav û ji ceddi me zîr û guher
Nemayî ticaret bikin serteser

98 Xuda sermiyanek mezin hedye kir
Ji bû me gerek em bikin pur şukur

99 Nexasim wekî te di Misri yeqîn
Ne wek te xenî ne ne wek te heyin

100 Were guh mede kerb û vî hesreti
Hetanî tu sax î bike lezzeti

101 Eger tu wuha dûm bikî ey heval
Dibînî zerarkî mezin bî zewal

102 Wuha tev ji wî ra digûtin hemîn
Digel wan beraber bû Iblîs le‘în

103 Le‘îni xebîs weswese çîkirî
Ku belkî bi hev ra bibin serserî

104 Nihayet evan le‘netiyî bikîn
‘Elî rakirin tev bi keyf û kenîn

105 Xulase ewan qatirek pur rewan
Dianîn huzûri di weqt û zeman

106 ‘Elî lê suwar bû bi keyf û sefa
Wekî qet nedîtî ebed yek cefa

107 Dema ew biderketne nîv xanûman
Berê xû didan bexçe û bûsitan

108 Dema çûne bûstan yekî ez heval
Vegerya bi paş de heta hate mal

109 Gelek xarin û et‘imi rengereng
Dianîn beraber ewî bî dereng

110 Dixwarin bi keyf û bi besta meqam
Heta bû xefî rû di mexrib temam

111 Hemî bûn suwar her kesek hate mal
Dema bû sube cumle hatin li bal

112 Digûtin ‘Elî rabe zû ke ela
Ku da em biçîn pîşî baxi gula

113 Digûtî gelek ehl û sed merheba
Di emri we da serserî bim teba

114 Dema bûn suwar wê dem û sa‘eti
Bi hev ra diçûn bexçei nezheti

115 Bi derhal yekî dî şeqiyyî xerab
Suwar bû li yek qatiri bîxitab

116 Muheyya dikir wî gelek xemr û mey
Bi ‘ûd û ribab û bi qanûn û ney

117 ‘Ecel kir heta hate Baxi Irem
Ji bû ra digûtin eya muhterem

118 Heqîqet wekî te di nîv me nehîn
Bi cûd û sexa û delal û metîn

119 Dema wan duxwarî te‘am û şerab
‘Elî gû çi ye hûn dixwûn ey şebab

120 Digûtin ji bû ra eya dilbirîn
Dewa e ji bû merdi jar û hezîn

121 Dema yek buxû jî diçit hemm û xem
Bi keyf û surûr e ev e la cerem

122 Nihayet ewan pur wesif kir xemir
Ku da ew di nîv wan nebit munkedir

123 Qedeh ba qedeh wî duxwar xemr û mey
Heta dest û pa lî dibûn tey bi tey

124 Wuha man di keyf û sirûri mudam
Heta rû diçû mexribi bittemam

125 Li dû tev rucû‘ bûn dihatne mal
Ji bû kes tu nîn e ne ‘eql û xiyal

126 Welîkin ‘Elî wî dem û sa’eti
Ji şurba mudami kete zehmeti

127 Çukû wî nexarî heta wî demi
Ji lew wî dikîşa bi derd û xemi

128 Şerabi eser kir di wî da gelek
Heta bû duxûl ew di qesra belek

129 Jina wî dema wî bi vî hali dî
Ji bû ra digûtî eya seyyidî

130 Çi hal e dibînim ji te wey li min
Te agir veda beyt û mali di min

131 Bibîje ji bû min evî kurbeti
Bi çî tu dikîşî evî zehmeti

132 Cewab da ji bû zewceya tahire
Dema em diçûn bexçei faxire

133 Yekî ez hevala te‘ami lezîz
Beraber dikir hinde ava temîz

134 Vexarî hevala digel min gelek
Heta dest û pa wî li min kir xelek

135 E jî qet nizanim çi bû ev huner
Dema min vexarî xuya bû eser

136 Jina wî cewab da te xemr û şerab
Vexarî ji lew cerg û dil bû kebab

137 Emanet eya Seyyidi mulk û mal
Gelû wesyeta walidî bû zewal

138 Evî walidi muhterem pur temîz
Bi diqqet wesî kir li te ey ‘ezîz

139 Mebe hemneşîni xerabi zeman
Hetanî tu sax î xû dûr ke ji wan

140 Te zayî‘ kirî wesyeta mu‘teber
Yekayek te ber da hemî der bi der

141 Welîkin ditirsim ji milk û defîn
Hemî serfi kî ser mirûvi le‘în

142 Ricai dikim ez ji te hîn û an
Nebî tabi‘i şab û xûrti zeman

143 Çukû xûrt û şabi zemani exîr
Butûn suhbeta wan heram e emîr

144 Were gû medîre li van bîheya
Mebe tabi‘i van hemî eşqiya

145 Ji wan dûredûr be selami meke
Bi vî pendi rehmi li bavi xû ke

146 Eger tu bi vî wesyeti kî ‘emel
Di nefs û di mali de nabit xelel

147 Cewab da ‘Elî bû jina xwe digût
Evan hemneşîna neî te digût

148 Hemî sahibi zîv û zîr û guher
Nedîtî kesî qet ji wan yek keder

149 Tu car in ji min zîde ne bî gûman
Bi keyf û fereh şa ne weqt û zeman

150 Nihayet ewî guh nekir zewcei
Bi wan re kete welwel û hewbei

151 Dewam kir ‘Elî gel hevali mirar
Ev e sen’eti wan di leyl û nehar

152 Di ekl û şerabi di le’bi heram
Wekî wan kesî qet nedî wesselam

153 Te‘am û şerab û bisati temîz
Butûn ser ‘Elî ne bizan ey ‘ezîz

154 Tebaxîn û ferraş û hem qehwecî
Li dû wan digîran hemî ca bi cî

155 Gelek weqti derbaz dikin mah temam
Di le‘b û di lehw û di fî‘li heram

156 ‘Elî serfi kir zîr û zîv wî demi
Nefikrî çi hal e di vî ‘alemi

157 Dema dî serf kir gelek zîv û zîr
Di fî‘li heram de ne fî‘li bixîr

158 Le‘îni munafiq dikir weswese
Bi serfî evî navî bû te bes e

159 Eger tu biserfî herû sed hezar
Di lehw û di le‘bi qe nabit xisar

160 Serif ke li wan zîr û zîv ey weled
Ji mali te ra nîne hedd û ‘eded

161 Ewî jî gelek serf dikir bî qeder
Heta sî sene bû temam bî keder

162 Jina wî nesîhet dikir hurmeti
Di bîra xû bîne tu vî wesyeti

163 Ewî guh nekir wesyeta bav û jin
Heta bû nema zîr û zîv bû hizin

164 Firûtin ewî beyt û mulk û ‘iqar
Digel bazin û xişri zewca kubar

165 Hetanî furût xaniyî radizan
Sebî da girînî ji bû keffe nan

166 Ji nagahi dî muşterî hate bal
Biderkev ji xanî digû ev meqal

167 ‘Ecel ke ji bû me gelek lazim e
Bizane ji min ev qeder xatim e

168 Li nik wî nema şey’ekî serteser
Bi desti xû bigre ne hişk û ne ter

169 Bi desti sebî girtî çû der yeqîn
Ku belkî ji bû xû sitarek bibîn

170 Gelek wî girîn kir girînek ‘eceb
Digel wî jina xû bi esl û neseb

171 Heta meskenek dîti xirb û xerab
Bi wan re beraber nebû nan û ab

172 Gelek ah û efxan dikir wî demi
Çewa bûme riswa di nîv ‘alemi

173 Mi ‘umrî xû derbazî kir ba delal
Digel xadim û ‘izz û mulk û menal

174 Nuha taqetim nîne bû kesre nan
Bi îş û girîn im bi ah û fixan

175 Gelû dî çewa kim ji dunya denî
Di nîv ‘alemî da dibûm pîkenî

176 Jina wî digû jî re wî sa‘eti
Çi hate serî me bela wesyeti

177 Şev û rû nesîhet li te min dikir
Te rûjek li ba xû nekir ev fikir

178 Mebe hemneşîni xerabi zeman
Beraber nebe ehli xusr û ziyan

179 Gelek we‘z û pendi ku bavî te kir
Hemî te hilanî bi cî te nekir

180 Ji deh yek eger te bikirna yeqîn
Ne riswa dibûn ne dibûn pîkenîn

181 Gelek hewqele gû jina pur delal
Çewa te telef kir hemî mulk û mal

182 Heçî tişti carî di kewn û mekân
Muqedder kirî Xaliqi ins û can

183 Wuha wî muqedder kirî ez ezel
Ji bû kulli eşya heye yek ecel

184 Tu derxe ji qelb û dili xû xemi
Rucû‘ be bi bal Xaliqi ‘alemi

185 Bike tewbe belkî Xudayî metîn
Me derxe ji vî tengiyî ecme‘în

186 ‘Elî rabû ser xû bi lez hem bi xar
Heta çû gihîşte hevali neyar

187 Li ser wan digerya yekayek heman
Kesî qet nedayî heta keffe nan

188 ‘Elî ger bikirna li wan yek selam
Ne redda selami ne redda kelam

189 Ji xeyrî kelami xebîsi mirar
Ji bû ra digûtin mirûvi neyar

190 Wuha wî kirin yek bi yek pîkenîn
Heta hate mali bi ah û girîn

191 Wuha wî hikayet kirî yek bi yek
Ji bû zewceya xû bila reyb û şekç

192 Çi hîna jina wî bihîst serteser
Ji hindav de rabû bi lez çûye der

193 Kû belkî hinek qût ji bû xû bibîn
Ji vî tengiyî derkevin ecme‘în

194 Li dûst û hevala gera wî demi
Bi ah û girîn û bi hemm û xemi

195 Heta hate ba hurmetek sadiqe
Bi cûd û sexai gelek faiqe

196 Girîn kir xû avîte daman û dest
Di hîna suali mirin wî duxest

197 Çukû pur heya kir ji vî mes’eli
Bi ah û girîn e digel welweli

198 Dema vî jina dî ku bûka Hesen
Xû avîti damani digrî ‘elen

199 Gelek pî diîşa ji vî haletî
Digûtî fîdai te bit xaletî

200 Çi hal e dibînim e binta helal
Gelû kî exiz kir ji we mulk û mal

201 Cewab da ji bû ra hikayet dikir
Çi hate seri me helali me kir

202 Di pişti ku bavî wî çû rehmeti
Emel wî bikirna bi vî wesyeti

203 Çi ra me bidîna li dunya keder
Di Misri bigeryan hemî der bi der

204 Welî Xaliqi cumle insan û can
Wuha pî muqedder kirî der cihan

205 Dema sehkirî wî ‘ecûza delal
Digûtî bera bit fîdai we mal

206 Welî lazim e hûn gelek sebir kin
Şukur kin ji bû Xaliqi ins û cin

207 Ku belkî Xuda we mu‘ezzeb neket
Ji derd û belai we xaric biket

208 Çi tişti muqedder kirî der cihan
Muheqqeq dibîtin di weqt û zeman

209 Nebe munkedir vî dem û sa‘eti
Nekîşe ji bû mulk û mal hesreti

210 Çukû mal û mulk û weled bittemam
Wedî‘a Xudî ne hemî wesselam

211 Ji ev paş çi tişti tu muhtac dibî
Ji min tev bizane fîdai te bî

212 Nebîjî bi deyn û bi minnet Didim
Ku belkî cemî‘en fida ez dikim

213 Gelek merheba vî ‘ecûzi ‘elen
Digûtî ji bû bûka tacir Hesen

214 Hetanî li nik min hebit qût û mal
Tu caran ji nasa meke yek sûal

215 Ji ew paş didayî gelek qût û rûn
Besî we heta mahekî hûn buxwûn

216 Çi gava xelas bû were hanihan
Bidim te te‘am û pere an zeman

217 Nihayet hilanî keça pur helal
Te‘am û peri xû heta hate mal

218 Dema zewcei wî didî ev te‘am
Sual kir çi ye wî digû bittemam

219 ‘Elî da girîni digû wey li min
Çi hate seri min hemî tev ji min

220 Di ger gû ‘Elî bû jina ba neseb
Emi der cihani bikîşin te‘eb

221 Welîkin bizane ji min ev qeder
Li pey min nekîşe ne te‘b û keder

222 Çukû dî biçim ser mi nîne herec
Ku belkî bişîne Xuda yek ferec

223 Nebîjî ‘Elî çû mi hiştî li vir
Ji bû me cemî‘en Xuda muqtedir

224 Li dû wî weda‘ kir ji zewc û weled
Bi derket ji Misri nedî kes ebed

225 Nizanî biçit kî deri ew hemî
Heta hate Bûlaqi dî yek gemî

226 Musafir dibit ali Dimyat ‘elen
Li wî dî tucarek muhubbi Hesen

227 Ku ye‘nî ji bavi ‘Elî hesdikir
Muferreh dibû hem wî himbîzî kir

228 Gelek merheba jî re gû wî demi
Muhibbim bi bavi te der ‘alemi

229 Emir ke te meqsed çi ye bîje min
Ku da em gelek pî teberruk bibin

230 ‘Elî da cewabi ji bûna tucar
Mukedder nebe ey tucari kubar

231 Di Dimyat sehab û hevali emîn
Hene ez ziyaret bikim ecme‘în

232 Li dû dî rucû‘ bim bi Misra qedîm
Wuha vî bizane tucari helîm

233 Bi desti ‘Elî girtî bir xanûman
Muhibbim bi bavi te ev qa zeman

234 Gelek minneti wî li ser min hene
Hetanî ez sax bim li min zîde ne

235 Nihayet ‘Elî çû bi wî ra temam
Heta bû duxûl ew di mala zilam

236 Gelek xarin û et‘imi faxire
Ji bû ra muheyya dikir daire

237 Hinek zîr didani ji bû xerci ra
Bi wî ra beraber dibû eşkera

238 Heta hate Dîmyati bi hemm û xem
Nizanî biçit kî deri lacerem

239 Ji nagahi dî yek mirûvi delal
Gelek merheba jî re gû ey heval

240 Kerem ke were em biçîn menzeli
Ji bû te xulam im di nîv mehfeli

241 Bi hev ra diçûn wî dem û sa‘eti
Bi hurmet ji bû wî dike xizmeti

242 Digûtî ku bavi te qencî dikir
Li min lazim e ez eda kim şukur

243 Çi tişti dibînî ku bavi te da
Gerek ez şukur kim bikim ez eda

244 Nihayet ‘Elî ma li wî der gelek
Heta xem li dûr wî dibûn wek xelek

245 Ji hindav de rabû ‘Elî ser piya
Digûtî ji bû min nema yek heya

246 Heta kengi ez dî bixwûm nan û zad
Gelek bûme riswa di beyni’l- ‘ibad

247 Li dû ew biderket ji mala tucar
Bi derhali dî yek sefînek kubar

248 Muheyya diçit ew bi bal Şehr-i Şam
Xû hazir dikir wî ji bû ra temam

249 Tucar dî ‘Elî hazir e an zeman
Muheyya dikir bû ‘Elî av û nan

250 Beraber bu wî ra heta sahilî
Li qeptan temîn kir ji bûna ‘Elî

251 ‘Elî bû duxûl çû heta şehr-i Şam
Ji wî çû Dimişqi ‘Elî bittemam

252 Di nîv çarşiyî dî merivkî delal
‘Elî wî dinasî bi ‘izz û kemal

253 Gelek merheba jî re gû wî demi
Tu derxe ji qelb û dili xû xemi

254 Kerem ke bi min ra biçîn pîşî mal
Ela ey ‘ezîzim ‘Eliyyi delal

255 ‘Elî çû bi wî ra bi sed ihtiram
Heta hefteki ew li wî bû temam

256 Li dû ew bi derket ku dî qafîlek
Ji wan wî sual kir hemî yek bi yek

257 Diçin kî deri hûn bidin min cewab
Ku belkî beraber bibim bîxitab

258 Yekî gû bi Bexdad diçit qafile
Kerem ke bi hev ra biçîn kamile

259 Eger meqsedek te heye ey fulan
Bibîje ji bû me di weqt û zeman

260 ‘Elî gû mi qest e bibim ez refîq
Digel we heta şehri Bexda heqîq

261 Welî sa‘etek hûn li min sebir kin
Heta ez buxazim ji bû xû izin

262 Çukû lazim e ez vegîrim bira
Ji bû xû buxazim izin eşkera

263 Cewab da ji bûna ‘Elî hanihan*0
‘Ecel ke ku da em biçîn ey cuwan

264 ‘Ecel ke were vî dem û sa‘eti
Ku da em bi hev ra bikin suhbeti

265 ‘Elî çû giha taciri ew li bal
Izin jî duxustî xû pî kir helal

266 Çukû wî gelek hurmet û ihtişam
Ji wî ra dikir ev qeder bittemam

267 Diger ew vegîra bi ali tucar
Bi wan ra beraber bû leyl û nehar

268 Yekî ez tucara ‘Elî hes dikir
Bi nan û bi avi digel xû dibi

269 Heta çûn gihan nîzî Bexda yeqîn
Ji nagahi dîn çil suwar devbuxwîn

270 Evî çil suwari xerabi zeman
Li dûr wan digirtin wekî ejdehan

271 Hemî rût û tazî kirîn serteser
Ji bû yek tucarî nema yek mefer

272 Gelek jî dikuştin bi ah û fîxan
Heçî ma revîn çûne deşt û çîyan

273 Dema dî ‘Elî ev tucari zebûn
Revîn çûne deşt û çiya ew butûn

274 Ewî qesti Bexda dikir wî demi
Ku belkî xelas be ji vî me’temi

275 ‘Ecel kir heta hate Bexda bi xar
Heman dît rû çû di mexrib veşar

276 Rica kir ji bewwabi sûra şehir
Ezî dî çewa kim teni ez li vir

277 Bihîlin biçim şehri Bexda heman
Ku da ez xelas bim ji xedra zeman

278 Dipirsîn ji wî ey şebabi delal
Bibîje ji bû me ne ‘eybe sûal

279 Ji kî der tu tîyî te sen’et çi ye
Bi sîma tucarî me ev zaniyeP

280 Cewab da ‘Elî ez tucar im hemîn
Ji Misri mi qesd e heta vir yeqîn

281 Bi min ra bi xal û hemîr û xulam
Hetanî nuha em bi hev ra temam

282 Li dû min ‘ecel kir bi lez hanihan
Ku da ez bibînim li vir xanûman

283 Dema hatime deşt û çûla çiya
Mi dîtî li pîş çil suwar bû xuya

284 Gelek wan li min xist û qatir birin
Çi tişti bi min ra hemî ker kirin

285 Mu bawer nekir ez xelas bim yeqîn
Ji vî çil suwari xebîs û le‘în

286 Gelek merheba jî re gûtin temam
Li ba me bisekne bi şîrîn-kelam

287 Hetanî sube tu bisekne li vir
Ji bû mali dunya mebe munkedir

288 Ku belkî me helkî ji bû te bibîn
Ku em pî xudanxîr bibin ecme‘în

289 Cewab da ne‘em gû ji bû dergevan
Çi emri dibîĵî ew e bîguman

290 Di ceyba xu teftîşi kir bittifaq
Heman dîti zîrek ji zîrî Bulaq

291 Dida yek ji bewwabi sahibxitab
Kerem ke here bîne nan û kebab

292 Bera ev mesarif ji ceyba mi bit
Çi tişti Xuda ke muqedder dibit

293 Hema wî ‘ecel kir mirûvi delal
Çi tişti ku gû wî kirî hate bal

294 Bi hev ra duxarin bi keyf û sefa
Heta bû sube wan nedî yek cefa

295 Li dû yek ji bewwabi qenc û kubar
Bi desti ‘Elî girti bir ba tucar

296 Hikayet dikir wî hemî yek bi yek
Ji bû wan tucara nema reyb û şek

297 Ku illa bi tesdîqi gû merheba
Kerem ke bi hev ra biçîn em teba

298 ‘Elî çû bi wan re heta şirketi
Ji bû ra digûtin mekev hesreti

299 Yekî ez tucari ezîmi’l-qedir
Heman deste cil wî muheyya dikir

300 Kerem ke here xû xesil ke humam
Ser û dest û cani bi ava hemam

301 ‘Elî çû digel taciri ba edeb
Bi zewq û sefa û bi keyf û tereb

302 Nihayet dema derketin çûne mal
Beraber bu wî ra bi ‘izz û kemal

303 Dema ew duxûl bûn emir kir tucar
Ku hazir bikin sufreya pur kubar

304 ‘Ebîd û xulaman ‘ecel kir heman
Hemî wan muheyya dikir an zeman

305 Duxarin bi hev ra hemî yek bi yek
Digûtin bira ne bila reyb û şek

306 Nihayet dema bûn xelas ez te‘am
Ku desti xû şûştin bi miska xitam

307 Heman wî emir kir li ‘ebd û xulam
Beraber bibin bû ‘Elî bittemam

308 Kû her du serayî di min şanidin
Ji kîĵani heskir kilîti bidin

309 Nihayet ‘Elî çû ku dîn ev qesir
Gelek çîdibû der dili wî fikir

310 Gelû dî çikim ez bi qesr û bi xan
Ne zîr û ne zîv e ne av û ne nan

311 Heman dîti qesrek li wî hember e
Ji wan her du qesra gelek çîtir e

312 Dipirsî digû ev sera nazenîn
Gelû ya kî ye hûn bibîn ecm‘eîn

313 Cewab dan bi hev ra di weqt û zeman
Ev e cay û me’wayî ‘efrît û can

314 Kesî kû duxûli biket vî derî
Muheqqeq subî derdixin wî mirî

315 Ji lew seyyidi me derî girtiye
Kesek pî nizanî ku hikmet çiye

316 Were guh medîre evi gûtini
Bi vî gûtini dil dixî sûtini

317 Mexaze evi qesreya bîwefa
Bi vi xustina xû didî me cefa

318 ‘Elî da cewabi ji bûna ‘ebîd
Dixazim ji we hûn bidin min kilîd

319 Ji bil vî serai e nakim qebûl
Zerer nabitin hûn nebin qet melûl

320 Çi tişti Xuda ket muqedder hemîn
Ewî dî bibit hûn bizanin yeqîn

321 Heta seyyidi me emir ke li me
Ku bidni kilîdi li me lazim e

322 Heman ez ‘ebîda yekî çû cewab
Dida seyyidi xû ewî ev xitab

323 Were xû bigîne Misir tacirî
Çibû ev musîbet ku hate serî

324 Nizanim gelû dîn e ya bî‘eqil
Duxaze ji min ew kilîd û qefil

325 Ku ye‘nî kilîda serai ‘ezîm
Duxaze ku em pî bibin dilseqîm

326 Me hindî ji wî ra digû an zeman
Ne cay û mekan e ji bû te eman

327 Evan gûtini me qe nakin eser
Di wî da kerem ke eya mu‘teber

328 Heman wî ‘ecel kir heta hate bal
Ji bû ra digû ey tucari delal

329 Mebe qatili xû eman sed eman
Muheqqeq ev e cayî ‘efrît û can

330 Cewab da ‘Elî bû tucari şefîq
Mebe munkedir tu ji bû min refîq

331 Eger tu didî min ji bû min bide
Ji bû van meqala ebed guh mede

332 Mi bispîre wî xaliqi nehfelek
Di fi‘li Xudî de meke reyb û şek

333 Çukû wî dema ez ‘ebîda xeber
Hilanî ji vî xaniyî mu‘teber

334 Kesi ku şevek tî de razî yeqîn
Subî radibin wî mirî derdixîn

335 Duxazî kû ew tî de bimre heman
Ku da ew xelas be ji kerbi zeman

336 Ji lew ew musirr e li van gûtina
Ku belkî qetil be bi zerbi cina

337 Çi hîna tucar jî bihîstî heman
Digûtî senedkî bide min eman

338 Çi weqta zererki bibînî ji vir
Kesek qet nebîje ji bû min te kir

339 Ne‘em gûtî an dem ‘Elî bû Xuda
Tu hakim werîne digel şahida

340 Bera ew senedkî bidin te temam
Çu de‘wa li ser te tune ta qiyam

341 Nihayet ewî hakim û şahideyn
Muheyya kirî wî wekî ferzû ‘eyn

342 Sened ku nivîsan kilîd dane dest
Mirin wî demi wî tucarî duxest

343 Dema wî duxûl kir bi qesra mexûf
Wekî mujdeyek bît ji Besra û Kûf

344 Tucar jî re şandî feraş û bisat
Li ser hev didani hemî qat bi qat

345 Heman dî ‘Elî bîrekî pur bi hewl
Di hewşi muheyya bi zencîr û dewl

346 Ewî dewle berda bini bîri pak
Deranî hinek av li ser rûyî xak

347 Ku destmîje girtî limîj kir dewam
Heta rû di mexrib veşarî temam

348 ‘Ebîda gelek et‘imi faxire
Digel ku zû ibrîq û hem saire

349 Dianîn ji bû wî heta bû dereng
Duxarî ji wan et‘imi rengereng

350 Dili wî digû jî re rabe fulan
Xû bighîne salûna jûrî heman

351 Ku belkî rehet bî li wî der gelek
Xuda xaliqi ins û cinn û melek

352 Metirse ecel her yek e bîguman
Mebîje ev e meskeni ins û can

353 Nihayet ewî ev firûş û bisat
Birîn taqeya jûr hemî qat bi qat

354 Li ser wan dirîj bû bi ‘izz û kemal
Dixûndî kelami şehi layezal

355 Ji hindav de dî şexsekî gazi kir
Kî gû ya ‘Eliyyî Hesen emri kir

356 Birîjim li ser te gelek sîm û zer
Digel durr û gewher bi misli meter

357 ‘Elî da cewabi di weqt û zeman
Li kî der birîjî li min gewheran

358 Bi derhal rijandî li ser wî guher
Heta bû tijî ûdeya zî huner

359 Ji sîm û ji zîr û ji yaqût û mas
Rijandî li ser wî heta bû xelas

360 Li dû wî rica kir ricayek ‘elen
Mi aza bikî ya ‘Eliyyî Hesen

361 Ku da ez xelas bim ji vî muhneti
Tu derxe ji qelb û dilîm hesreti

362 Mi hîvî heye ey ‘Eliyyi delal
Mi aza bikey da biçim pîşî mal

363 Çukû xizmeta min heta vir qeda
Eva çendî sal e dikir min eda

364 Mi derxe ji vî muhneti el eman
Ricai dikim ez ji te her zeman

365 ‘Elî da cewabi ji bû maridî
Were tu bibîje çewa bûm xudî

366 Hetanî nuha min nema mulk û mal
Gelû xewn e bîje weya ev xiyal

367 Cewab da ne xewn û xiyal e bizan
Evî xizne ya ha qedîmi zeman

368 Li ser te resid bû bizane ji min
Çi ni‘met ku da te Xudayî mezin

369 Berî te kesi kû duxûl bû li vir
Hema me ‘ecel kir ewî qetli kir

370 Çukû me ji wî ra digû ya ‘Elî
Bidin te gelek zîr û zîv û hulî

371 Dema wî bihîstî kelami di me
Hema ew ditirsa hewar kir ji me

372 Ji lew me dukuşt wî bi zerbi şedîd
Hetanî bi îrû derî bû kilîd

373 Dema tu bi teşrîfi hatî ‘elen
Me gazî kirî ya ‘Eliyyi Hesen

374 Eger tu duxazî ji sîm û ji zîr
Cewabi bide hem li me guh bidîr

375 Bi derhal te da me cewabek delal
Me zanî tu yî sahibi mulk û mal

376 Welî mujdeyek dî bidim te ‘elen
Ku xiznek ji bû te heye der Yemen

377 Eger tu biçî nik Yemen ey bira
Ku bigrî xezîni tu bînî vira

378 Gelek çîtir e ew ji bû te şebab
Bizane ji min ev nesîhet sewab

379 Welîkîn e jî pur ricai dikim
Tu destûr bidî min kû da ez biçim

380 Eger ruxseti tu bidî min delal
Dewami dikî tu bi milk û bi mal

381 ‘Elî gû ji bû maridi xiznei
Çewa te rihakim ji vî xanei

382 Ku illa biçî tu biladi Yemen
Tu bînî xezîni li nik min ‘elen

383 Dema ez xezîni bibînim temam
Muheqqeq te aza dikim ey xulam

384 Dema maridî dî cewaba tucar
Gelek ew bi vi mujdei bû kubar

385 Digûtî ji bûna ‘Elî hanihan
Were min emîn ke di weqt û zeman

386 Çi weqta ku bînim ewî xiznei
Tu aza bikî min bi vi mujdei

387 ‘Elî wî emîn kir bi husn û riza
Birîket evî marida wek feza

388 Bi derhal ‘Elî gûte marid heman
Çi îşek mezin çîbû weqt û zeman

389 ‘Ecel ke xû bighîne Misra qedîm
Werîne jina min digel wan yetîm

390 Bi ‘izz û bi hurmet gelek ihtişam
Werîne li vir wan hemî bittemam

391 Ne‘em gûtî marid izin jî duxest
Wekî wî bi setrinci bir çendi dest

392 Ku sî rû temam be li vir wan buxaz
Bi texterewani bi ‘izz û bi naz

393 ‘Elî rabû ser xû bi cehd û teleb
Ku cîkî bibîne veşîre zeheb

394 Heman dîti sexrek di jûra derî
Wekî buxriyek tî de sun‘i perî

395 ‘Elî dest dida buxriyî hanihan
Kevir hate xari di weqt û zeman

396 Di derhal vebû qapiyek pur mezin
Muheqqeq eva sun‘i ‘efrît û cin

397 ‘Elî dî ku ûdek muzeyyen nefîs
Ji jîri heta jûr tijî bû ji kîs

398 Hemî tev durûtî muheyya kirî
‘Elî yek bi yek wî ji cî rakirî

399 Yekayek tijî kir ji zîr û guher
Heta wî nema taqet û yek mefer

400 Nihayet ewî tev hilanîn hemîn
Ewî tev cemi‘ kir di ûdî yeqîn

401 Derî girt dema lewlebi badida
Kevir çû tevî lewlebi cî dida

402 Li dû radibû hate xar bî hicab
Diseknî li ser mesteba pişti bab

403 Dema wî qu‘ûd kir li ser mestebi
Yekî dî qu‘ûd e bi vî mertebi

404 Heman gû fetihke derî ey bira
Me îşev nekir xew ji hali te ra

405 Derî wî fetihkir bi zanî ki ye
Ku dî ew ‘ebîdi xûyî xani ye

406 Dema wî ‘Elî dî li ser mestebi
Bi hey’et qu‘ûd e bi vi mertebi

407 Heman ew rucû‘ bû bi ali tucar
Ku da ew bidî mujdeyek pur kubar

408 Bi lez çû ‘ecel kir giha tacirî
Mi dîtî qu‘ûd e ‘Elî ber derî

409 Bi keyf û sefa ye ne îş û elem
Were wî bibîne eya muhterem

410 Dema seyyidi wî bihîstî kelam
Ji hindav de rabû bi sed ihtiram

411 Heta hate ba xaniyî pur mexûf
Tefekkur di dilda dikir sed ulûf

412 Dema di qu‘ûd e ‘Eliyyi tucar
Selamek da li ser wî selamek kubar

413 Digûtî te îşev çi dîti ‘eyan
Were tu ji min ra bike vî beyan

414 Ji bû te me îşev ebed xew nekir
Dihate dili me hezaran fikir

415 ‘Elî da cevabi cevabek temîz
Min tiştek nedî ey tucari ‘ezîz

416 Ku illa diçûm ûdeya pur bilind
Mi danî li ber xû gelek mûm û find

417 Hetanî subî radizam bîhenek
Nehate dili min ne reyb û ne şek

418 Dema bû sube radibûm ser piya
Mi qet kes nedîtî nebû kes xuya

419 Mi destmîji girtî limîj pî dikir
Nehatî dili min ebed yek fikir

420 Dema bû temam ev limîja delal
Xû berjîri berda bila qîl û qal

421 Mi hatî qu‘ûd kir li ser mestebi
Tu hatî mi dîtî bi vî mertebi

422 Eve qet ji xeyri vî tiştek niye
Mebîje gelû ev çi bû ya çi ye

423 Çukû ev Xudayî qedîr û ‘ezîm
Dema min xeliq kir bi lutfa ‘emîm

424 Çi tişti heye Wî muqedder kirî
Muheqqeq dibînim li vî bifikrî

425 Ji tişti muqedder nikarim hemîn
Ku jî xû hifiz kim bizane yeqîn

426 Nihayet tucar jî re pur kir du‘a
Xuda te selamet bike ez bela

427 Li dû wî emir kir ‘ebîd û xedem
Ku bînin gelek xarini muhterem

428 Digel xali yû hem bisati kubar
Çi tişti ku tîtin ji mala tucar

429 Cewarî dihatin ser û bin temam
Dişûştin bi avî hemî bî kelam

430 Hemalîk û carî bi vî xizmeti
Diseknin ji bû wî bi vî hey’eti

431 Çi hîna tucara bihîstî xeber
Gelek hedye jî ra kirin mu‘teber

432 Ji me’kûl û meşrûb û melbûsi xas
Ku jî ra ne ‘edde ne jîra qiyas

433 Cemi‘ bûn li nik wî tucari şehir
Hemî jî re xizmet dikin bi fexir

434 Heta wî digel xû birin çarşiyî
Bi rê da ji wî tev dikin hîviyî

435 Çi kû me ne qedrek ji bû te didî
Ji lew em ji ber te dikin pur fedî

436 Ricai dikin em ji te bîqeder
Ji bû nexî der dili xû keder

437 ‘Elî da cevabi ji bû wan temam
Ricai dikim ez ji we xas û ‘am

438 Ji van gûtini we dibim ez melûl
Çi tişti we gû tev li nik min qebûl

439 Çukû we gelek qenciyû ihtiram
Bi min kir qe nabit xefî ta qiyam

440 Digel vî kelamî heçî em tucar
Bi hev ra bira ne di leyl û Nehar

441 Gerek em ji hev ra bikin xizmeti
Bi qelb û dili xû bikin hurmeti

442 Li dû wan sual kir bi keyf û tereb
Ku weqta tu hatî ji Şam û Heleb

443 Li kî der dima kariwani Misir
Ku da em bizanin meta tî şehir

444 Ku sî rû temam be ‘Elî da cewab
Hemî hûn bizanin ji min ev xitab

445 Dema bû temam her sî rûji giran
Heman dî ‘Elî yek ji ‘efrîti can

446 Dihatî li nik wî bi sed ihtiram
Ez im xadimi xezneya te temam

447 Digûtî kerem ke eya zî huner
Bila vî xezîni here bîkeder

448 Ku ye‘nî mi anî xezîna Yemen
Kerem ke here pîş xezîni ‘elen

449 Digel van herîmi te yî pur delal
Bi wan ra devew qatiri zî cemal

450 Hemî tev bizane ji cinni şedîd
Digel wan xudam û xulam û ‘ebîd

451 Çukû xadimi xezneya pur ‘ezîm
Berî xû dida şehri Misra qedîm

452 Heman dî jina wî ‘Eliyyî bi naz
Digel wan sebiyya hemî rût û taz

453 Bi lez wan hilanî di texterewan
Bi her yek libasek ji xezni heban

454 Heçî text û lebsi dianî ‘elen
Muressem muneqqeş ji xezna Yemen

455 ‘Ecel kir heta ba Misir tacirî
Digûtî keremke Xuda heskirî

456 Tu rabe bi leq zewceya xû heman
Nebîjî çira paşketî el eman

457 Bi lez kir ‘ecel kir heta vî demi
Ku riswa nebim ez di nîv ‘alemi

458 Keremke tu jî zû ‘ecelke bi xar
Xû bighîne wî mehfela pur kubar

459 Dema mujde sehkir ‘Elî der meqam
Ji hindav de rabû ‘Elî bî kelam

460 Heta çû giha wan tucari şehir
Xeber da bi wan ra beyan kir emir

461 Dema wî beyan kir li wan ev emir
Digûtî kerem kin bi der vi şehir

462 Ku da em bi leq metcera xû herin
Kerem kin bimin ra tevî min werin

463 Welîkin ricai dikim bî melal
Emir kin li ser muhrimi pur delal

464 Ku ew jî beraber bi hev ra biçîn
Ji bû iltiqaa herîmi hezîn

465 Ji bû ew nebîjin me hurmet niye
Çukû ew nizanin heqîqet çi ye

466 Hemî jî re gûtin gelek merheba
Herîmi me jî ew digel me teba

467 Heman wan herîmi xû hazir dikir
Hemî çûn bi hev ra bi keyf û şukur

468 Heta çûne nîv busitani şehir
Bi hev ra bi keyf û henek wan dikir

469 Ji hindav de dîn wan ji dûrve xubar
Ser û bin dibû ev xubar bîqerar

470 Xuya bû di bin da bixal û deve
Hemî wan bi hev ra digûtin ev e

471 Reîsi li ser qeflei hanihan
‘Ecel kir heta ba ‘Elî an zeman

472 Bi derhal peya bû bi keyf û sefa
Xû avîti dest û piya bî cefa

473 Digûtî eya seyyidî el eman
Were min ‘efûke di weqt û zeman

474 Eger çi me te’xîrî kir ev qeder
Me bîhed di vî xizmeti dî keder

475 Me xûstî ku îşev duxûl bin şehir
Ji qati‘ terîqa dikir me fikir

476 Ji lew em diman çari rû bittemam
Hetanî Xuda serfi kir ev zulam

477 Ji hindav de rabûn hemî ev tucar
Yekayek li hespi xû bûne suwar

478 Beraber bi qefle diçûne şehir
Bi keyf û sefa û bi ‘izz û fexir

479 Hemî mane heyrî ji vî mehmeli
Xeber dan tijî bû ji vî mehfeli

480 Çi ihsan Xuda kir li vî tacirî
Muheqqeq Xuda pur ji vî heskirî

481 Çukû me di ‘umri xu de bîmelal
Nedîtî wekî vî bi mulk û mal

482 Sexiyy û kerîm e bi wechi Hesen
Wekî wî me nedye di dunya ‘elen

483 We hem mane heyrî herîmi du wan
Ji lebsi ji nawî ‘Eliyyî cuwan

484 Me nedye wekî wî bi lebsi herîr
Muweşşeh muzeyyen bi text û serîr

485 Nihayet hemî keyfxûş în tev bu wî
Herîmi du wan gel herîmi di wî

486 Beraber bi hev ra diçûn menzeli
Hemî tev peya bûn bi wî mehfeli

487 Heçî bar û ‘ehmali van qatira
Hemî wan duxûl kir di hewş û sera

488 Hemî kirne xezne di nîv firçiya
Ji kes ra ne me‘lûm e nabit xuya

489 Nizanin di van hewseli mehmeli
Çi ye ta bibîjin di vî mehfeli

490 Nihayet herîmi tucari şehir
Bi hev ra diçûn jûri qati qesir

491 Ku dîtin muheyya bi furşi ‘ezîm
Muzeyyen muterrez çû baxi ne‘îm

492 Dema wan herîma li ser kir culûs
Gelek pî muferreh dibûn ew nufûs

493 Bi keyf û surûr in hemî bittemam
Bi hezz û nesîb in di jûri meqam

494 Li dû et‘im û xarini terz e terz
Muheyya dibû ew ji bû wan bi lez

495 Bi hev ra duxarin bi keyf û sefa
Ne te‘b û eziyyet ne vî ra cefa

496 Bi çayî bi qehwe di vî mehfeli
Bi misk û bixûr û bi ava guli

497 Heta meclisa wan temam bû delal
Bi xatir bi hev ra hemî çûne mal

498 Li gûra xû her yek hedayî kubar
Dişandin ji bûna ‘Eliyyî tucar

499 ‘Ebîd û cewarî dişandin gelek
Bi keyf û sefai hemî yek bi yek

500 Welî ev tucari xuyî qesr û ban
Muqîm e li nik wî ‘Eliyyî cuwan

501 Hetanî ku xalî dibû kes nema
Li dûr wî digûtî ji bû wî hema

502 Bera ev ‘ebîd qatir û van deva
Bibin xanûmani di me çend şeva

503 Heta ew rehet bin ji te‘ba sefer
Ku da ew bimînin hemî bî keder

504 ‘Elî gû gerek îşevi der ‘ecel
Ji şehri bi der bin ev e bî xelel

505 Icaze mu da we eve wesselam
Gerek derkevin hûn ji şehri temam

506 Dema wan ku sehkir hemî derketin
Heta jûri Bexda hemî lez ketin

507 Ku şev hate ser wan firîn ber hewa
Xelas bûn ji vî zehmeta bîdewa

508 ‘Elî ma digel sahibi beyti tek
Bi suhbet bi hev ra dikin yek bi yek

509 Heta şev ku bûrî tucari delal
Icaze dixustî ku ew bîte mal

510 ‘Elî jî re gû merheba ey tucar
Di desti te da ye izin ey kubar

511 Keremke tu ‘aciz bûyî bîqeder
Ji bû min tu hinde mekîşe keder

512 Çukû te gelek zehmet û pur cefa
Diye te ji bû min qe nabit xefa

513 Tu jî misli bavi min i bîhenek
Gerek tu di vir da nekî reyb û şek

514 Nihayet tucar çû heta hate mal
Ewî bû jina xû dikir keşfi hal

515 Wekî wî sexiyy û beşaşet yeqîn
Mi nedye wekî wî li ruyî zemîn

516 Li dû wî ‘Elî çû heta ba herîm
Dipirsî ji wî zewceya pur kerîm

517 Gelû we li pey min di vî muddetî
Çewa bûn xelas hûn ji vî haletî

518 Jini da cewabi ji bû wî digût
Ji pursa me cerg û dili xû disût

519 Gelek rût û tazî diman bî qeder
Bi te‘b û eziyyet bi kerb û keder

520 Heta Xaliqi ‘alemi rehmi kir
Gerek ji bû wî bikin pur şukur

521 Şevi barihe min didî şexsekî
Ji erzi me hilda wekî teyrekî

522 Heta ew bilind bû çû ‘ewri buhar
Ji bû xû me nedye ne cay û qerar

523 Welî bîzerer em wuha hilfirîn
Nizanin çi hate seri me yeqîn

524 Heta hate xari mi dî qafilek
Bixal û hemîr û deve yek bi yek

525 Mi pirsî ku kîne çi bar û deve
Çi cay û mekan e sualam ev e

526 Cevab dan ji bû min hemî wan ‘elen
Xulam in ji bûna ‘Eliyyî Hesen

527 Ewî em dişandin ji bû we hemîn
Ku da we bibin şehri Bexda yeqîn

528 Digûtî mesave ji vir ta şehir
Sebir ke ji mexrib heta ye fecir

529 Me anî suwar kir li texterewan
Me nedye çewa em dihatin heman

530 Heta em dihatin li nik we temam
Bi ‘izz û bi fexr û gelek ihtiram

531 Welî wî dema me suwar kir heman
Devî sendiqek wî vekir an zeman

532 Ji vî sindiqi cill û xişri ji zîr
Deranî digû hûn lebis kin bi xîr

533 Dema me lebis kir çewa wî digû
Devî sindiqi girt kilîd da mi gû

534 Emanet bikî vî kilîdi bixar
Heta tu bidî wî ‘Eliyyî tucar

535 Nuha ew bi min ra di cîba mi da
Kesek pî nizane ji xeyri Xuda

536 Heman wî ji ceybi deranî kilît
Dida dest ‘Eliyyî Hesen wî ku dît

537 Digûtî ji bû zewceya pur emîn
Eger sendiqi tu dinasî yeqîn

538 Were şani min de ku da em bizan
Çi tî da vucûd e di weqt û zeman

539 Ne‘em gûtî vî hurmeta mu‘teber
Ji bû ra digûtî hemî serteser

540 Hema radibû ew ‘Eliyyî tucar
Digel wî jina xû heta hate xar

541 Çi qasî senadîq li hewşi hebûn
Ewî pî nişandan senadîq butûn

542 Heman dîti ew sindiqa cil di nav
Digûtî bizane ji min bî xilaf

543 Eve ya ku cil derdixist maridî
Digûte ‘Elî dî kilîti bidî

544 Dema wî exiz kir kilît jî heman
Devi sendiqi wî vekir bîguman

545 Heman dî tijî bû ji xişri kubar
Temami kilîta di wî da veşar

546 Yekayek hemî vî vekir an zeman
Ku dîtî tijî ne ji tişti giran

547 Ji yaqût û mas û ji zîv û ji zer
Ji durr û cevahir e ya mu‘teber

548 Li dû wî qefil kir hilanîn kilît
Diçûn xezneya jûr ku ewwel didît

549 Heçî zîv û zîr û cewahir hebûn
Bi wî da nişani ‘Elî tev butûn

550 Jini jî sual kir eya mu‘teber
Ji kî der bi desti ket ev guher

551 Bibîje ji bû min sebeb vî çi ye
Ku da ez bizanim hemî cî ci ye

552 ‘Elî da cewabi bizane ji min
Hemî tev bi fezla Xudayî mezin

553 Çukû ez ji nik we dema ez derketim
Mi rî daye ber xû hema lez ketim

554 Nizanim biçim kî deri wey li min
Çi hate serî min hemî tev ji min

555 Diçûm di rî da bi te‘b û cefa
Ji bû xû nedî min di rî da sefa

556 Nihayet hemî wî hikayet dikir
Ji ewwel heta axirî kir zikir

557 Ne hewce dirîj kim dibit pur melal
Kesi ku zikir ket dibit kerr û lal

558 Me kin kir ku da pur melale nebit
Çukû pur dirîjî melalet dibit

559 Jini jî re gûtî bike pur şukir
Ji yumna du‘ai ku bavi te kir

560 Gelû te jibîr kir vesiyya Hesen
Di nîv meclisi da kirî wî ‘elen

561 Digûtî Ilahî bi zat û sifat
Çi şiddet bibîne li pey be necat

562 Tu jî pur hemid ke ji bû Zilcelal
Ku da te gelek gewher û mulk û mal

563 Nebe tabi‘i fasiqa el eman
Te dîtî çi anîn seri te heman

564 Hudûdi Xuda pur bike diqqeti
Ku belkî Xuda te nexet şiddeti

565 ‘Elî jî qebûl kir çi pend û we‘iz
Ji tişti xerabî bike min hifiz

566 Me dûr ke ji etba‘i sûi xerab
‘Efû ke bide xatiri da û bab

567 Ku tewfîq bide ew ji bû ta‘eti
Ku da ez bibim tabi‘i sunneti

568 Nihayet ‘Eliyy û jina ba neseb
Digel wan sebiyyî xû yî ba edeb

569 Bi hev ra diman ew bi keyf û sefa
Wekî wan nedîtî ebed yek cefa

570 Xulase fetih kir ‘Elî yek dukan
Di sewqa tucara di weqt û zeman

571 Gelek cewher û me‘deni pur semîn
Dixistî dukani ‘Elî ecme‘în

572 Li ser merteba xû culûs kir ‘Elî
Li nik wî ‘ebîd û xulami di wî

573 Bilind bû heta bû reîsi tucar
Di nîv şehri Bexdadi bû iştihar

574 Melîk pî hisa yek tucari kubar
Ji Misri dihatî bi sed iftixar

575 Heman qasidek wî dişandî li bal
Ku ye‘nî kerem ke tucari delal

576 Melîk te duxaze eya muhterem
Ji bû te bibîne ev e lacerem

577 Semi‘na ete‘na ‘Elî da cevab
Çukû ferzû ‘eyn e ne‘em bîxitab

578 Heman wî hilanî hediyyek temam
Ku da ew biket jî re pur ihtiram

579 Digel çar firaqi zîri kubar
Tijî kir ji mas û guher bîqerar

580 Evan gewher û me‘deni bîqeder
Li nik tu mulûka qe nabit eser

581 Nihayet ‘Elî çû heta ber derî
Ji hakim izin xûsti wî tacirî

582 Izin hat ji bûna ‘Elî an zeman
‘Elî bû duxûl ew di qesra giran

583 Selam da li ser wî bi ‘izz û ni‘em
Gelek merheba gû eya muhterem

584 Te sebra me anî tu hatî li vir
Bi te iftixari dikin ‘ebd û hur

585 Li dû gû ‘Elî ya melîki zeman
Ez im ‘ebd û kûle ji bû te heman

586 Ricai dikim ez nekî min melûl
Hediyyek mi anî bikî tu qebûl

587 Eger çi biçûk e hediyya di min
Gerek tu qebûl kî bi fezla mezin

588 Ne‘em gûtî sultan bi wechi telîq
Çi hedye te anî qebûl e heqîq

589 Heman wî li ber danî hedya kubar
Kesî ev hediyye nedîti tu car

590 Melîk maye heyrî ji van gewhera
Çukû kes nedîti li cay û dera

591 Digûtî hemû qebûl e hemî serteser
Li nik xû dibînim gelek mu‘teber

592 Eger hesbiket ew Xudayî ‘ezîm
Mukafe didim ey tucari kerîm

593 Nihayet bi xatir ‘Elî hate mal
Ji bû zewceya xû kirî keşfi hal

594 Melîk gazî kir dewleta xû heman
Ku da mes’ela xû li wan ke beyan

595 Dema ew dihatin li nik wî temam
Li wan erzi kir wî çû qesd û muram

596 Ku ye‘nî temami mulûki mezin
Dişandin hediye ji bû binta min

597 Kesî da hediyye bi misli tucar
Eger hûn dizanin bibîjin bixar

598 Hemî dan cewabi me nedye yeqîn
Wekî vî hediyyî li rûyî zemîn

599 Ne hakim ne tacir ji qismi beşer
Nikarin verîkin hemî serteser

600 Melîk gû duxazim ku qîza delal
Nikah kim li vî taciri zî cemal

601 Gelek mu‘teber ez dibînim heman
Bu we istişare dikim her zeman

602 Bibîjin eger ev liyaqet heye
Kerem kin ku da ez bizanim we ye

603 Wezîra cewab da ji bû hakimî
Liyaqet dibînin ji bû wî hemî

604 Çukû ev kerîmate husnu’l-vucûd
Gelek laiq e ey melîki wedûd

605 Ku inkah bikî tu li vî taciri
Ku ye‘nî ‘Eliyyî Hesen Cevherî

606 Dema wî ku sehkir ji wan ev meqal
Bi vî gûtina wan dibû ibtihal

607 Emir kir li ‘ebd û xulami kerîm
Bibin vî hediyyî li ali herîm

608 Li dû radibû padişa çû sera
Emir kir li hedyî ku bînin vira

609 Digûte jina xû were tu bibîn
Tu perdi ji ser van hediyya hilîn

610 Çi ni‘met Xuda kir li me ixtiyar
Ji mal û ji cah û ji qedri kubar

611 Dema hat û perde hilanî heman
Gelek maye heyrî ji van gewheran

612 Digûtî eya padîşahi kubar
Ji kîja mulûkî dihat yadigar

613 Mi nedye di ‘umri xu de ev guher
Hetanî nuha min nedî serteser

614 Muheqqeq yekî ez mulûki zemîn
Dişandî hediyye ji bû me yeqîn

615 Ku husnu’l-wucûdi bi ‘izz û kemal
Bidin wî mulûk tev bibin kerr û lal

616 Melîk da cewabi ji bû zewcet
Ji min tu bizane di vî sa‘eti

617 Yekî ez tucari Misri hate vir
Ewî ev cewahir hemî hedye kir

618 Çukû min bihîstî tucarek mezin
Ji Misri biderket heta şehri min

619 Mi şandî li pey wî ku hazir bibit
Wekî van tucara ‘inadi nekit

620 Ku da em hinek cewheri bîmisil
Bi heq em ji wî bistinin bîxecil

621 Ji bûna cihazi ku husnu’l-wucûd
Beraber bibit ew ‘erûsa wedûd

622 Ewî imtisala emir kir heman
Dihatî li nik min di weqt û zeman

623 Beraber kirî çar firaqi kubar
Hemî ev cewahîr kirî yadîgar

624 Dema hate ba min bi husn û edeb
Digel ‘eqli kamil bi şiklek ‘eceb

625 Wekî tuxmei van mulûki zemîn
Bi fezl û belaxet li nik min yeqîn

626 Dema min ku wî dî bi lutfa Xuda
Mehebbet difûrî di qelbi mi da

627 Mi heskir ku husnu’l-wucûda melîh
Bidim vî şebabi belîx û fesîh

628 Digel min hediyye hewale dikir
Li ser van wezîra bi qelb û fikir

629 We hem istişare dikir min bi wan
Di tezwîca binta me da an zeman

630 Hemî wan liyaqet didî ey herîm
Cewab de ji bû min bi qelbi selîm

631 Cewab da herîmi ji bû hakimî
Li ser vî nikahi ebed qaimî

632 Çi tişti Xuda hesbiket dî bibit
Di hukmi xu de ew teserruf dikit

633 Ji bûna herîmi melîk da cewab
Kî husnu’l-wucûdi bidin vî şebab

634 Nihayet wuha ma heta bû sube
Melîk hat û runişt li ser mertebe

635 Emir kir ku bînin ‘Eliyyî Misir
Digel kamili taciri ev şehir

636 Bera ew cemi‘ bin li vî der temam
Ku emrek heye ez bikim wesselam

637 Hemî ew cemi‘ bûn bi keyf û tereb
Li nik hakimi ew bi ‘izz û edeb

638 Emir kir ku qaziyyî Şer‘a Şerîf
Bera bî huzûri bi qelbi letîf

639 Dema hatî qazî li nik wî heman
Emir kir li ser wî di weqt û zeman

640 Tu husnu’l-wucûdi nikah ke bi xar
Li tacir ‘Elî taciri nazidar

641 Heman rabû ser xû ‘Elî hanihan
Digûtî ‘efû ke eman sed eman

642 Çukû na durust e wekî min xebî
Bibin zavi sultan bi Şer‘a Nebî

643 Bi derhali gûtî li min guh bidîr
Mi date digel rutbeya şubhi zîr

644 Mi rutba wezîrî li te kir xelat
Ji rutba xebiyyî tu bûyî necat

645 Were tu kerem ke ku husnu’l-wucûd
Bidim te qebûl ke bi qazî şuhûd

646 Di ger jî re gûtî ‘Eliyyî cuwan
Were min ‘efû ke melîki zeman

647 Te ni‘met li min pir kirîn bî ‘eded
Nikarim ji bin derkevim ez ebed

648 Welî ez ricai dikim bîqeder
Tu guhdîre da ez bibîm yek xeber

649 Melîk da cewabi digû ey bira
Çi ye der dili te bike eşkera

650 Metirse mebîje qebûl nabitin
Bibîje çi hate dili te li min

651 ‘Elî gû ku madam tu teşrîf dikî
Bi husnu’l-wucûdi ku inkah bikî

652 Bizane ji min ey melîki zeman
Ji bû min heye yek weledkî cuwan

653 Musemma bi navi Hesen ev delal
Bi ‘eql û kemal e bi qed i‘tidal

654 Melîk gû ‘ecel ke divî sa‘eti
Ku da ez li wî kim evî ni‘meti

655 Çukû min nizanî ji bû te weled
Heye ey wezîri bi muhr û sened

656 ‘Ecel ke bera bî huzûri ‘ecel
Ku da ez nikah kim di beyna mulel

657 Bi husnu’l-wucûdi bikim serfîraz
Bi qanûn û ‘ud û ribab û bi saz

658 Ku da dest bikîşin mulûki zeman
Ji husnu’l-wucûdi bi derd û xeman

659 Bi derhal ‘Elî şand Hesen bû huzûr
Hemî mane heyrî ji sun‘i Xefûr

660 Digûtin me nedye di dewra zeman
Wekî ev weled qet di cay û mekân

661 Bi husn û melahet bi vî hey’eti
Gelek ew liyaq e bi vî dewleti

662 Hesen hate pîşî melîki zeman
Selam da li ser wî selamek giran

663 Bi husn û edeb ew diseknî qîyam
Hemî jî re heyran dibûn wesselam

664 Melîk lî nezer kir bi çavi mezin
Digû çîtir e ew ji binta dimin

665 Bi husn û melahet bi ‘eql û edeb
Bi şikl û bi sîma bi keyf û tereb

666 Melîk jî sual kir bi keyf û henek
Ku namet çi ye bîje ey çavbelek

667 Cewab da ji bû padîşa wî ‘elen
Ez im î musemma bi ismi Hesen

668 Di vî hîni ‘emri mi bû çarde sal
Xuda te hifiz ke nebînî zewal

669 Heman der ‘eqeb padişah emir kir
Li ser qaziyî dewleti bifikir

670 Nîkah ke tu husnu’l-wucûdi ‘elen
Li ser vî şebabi ku nav lî Hesen

671 Bi derhali qazî nikah kir temam
Li ser meclisa hazirîn es-selam

672 Li dû çûne mali kesi mehfeli
Tucar û wezîr çûn bi vî welweli

673 Cemî‘i tucara du‘ai ‘elen
Dikir wan ji bûna ‘Eliyy û Hesen

674 Nihayet ‘Elî çû bi vî hey‘eti
Ji navî ku dî xel‘eta dewleti

675 Jini jî re gû ey ‘Elî ev çi ye
Ewî ev xelat da bibîje ki ye

676 Nihayet ‘Elî jî re gû serteser
Çi tişti bibîtin qeza û qeder

677 Jinik pur muferreh dibû an zeman
Ku mîr bû wezîri melîki cihan

678 Nexasim ku sultani Bexda ‘elen
Nikah kirye qîza xû daye Hesen

679 Nihayet ‘Elî wî şevi ma li mal
Di nîv şehri Bexda dibû qîl û qal

680 Hemî dilxûşîn ew bi vî mes‘eli
Bi keyf û sefa tev diçîn mehfeli

681 ‘Elî rabû ser xû dema bû sube
Heta xû gihand mensa ratibe

682 Bi leqva melîk çû bi ‘izz û kemal
Dema rûdinişt wî dikir jî sual

683 Me qesd e ji vir em dikin de‘weti
Ku tu serfiraz bî di vî dewleti

684 Ku herkes bizane mi husnu’l-wucûd
Didayî kurî te bi qazî şuhûd

685 Çi hîna sima‘ kin mulûki cihan
Mi qîza xû da te di weqt û zeman

686 Gerek ew biseknin nekin qîl û qal
Ji lew min teklîfi kir ev sual

687 ‘Elî gû ne‘em jî re da ev cewab
Çi tişti emirkî ku ‘eyni sewab

688 Bi keyf û bi şahî melîk emri kir
Hetanî mehek çû ewî serfi kir

689 Dema bû temam her sî rûzi ‘eceb
Hesen kirne zava bi ‘izz û edeb

690 Bi keyf û sefa ew diçûn xelweti
Gelek ferh û şahî kete dewleti

691 Dema bû sube padişah emri kir
Ku bînin bina kin li vir yek qesir

692 Bi neqş û muzeyyen bi sun‘i xerîb
Ku jî hîre bigrin rical lebîb

693 Mihendis dihatin cemi‘ bûn temam
Bi lez wan bina kir bi sed ihtiram

694 Di nîv şehri Bexda kesî ev qesir
Nedîtî wekî wî bi ‘izz û fexir

695 Hesen rabû ser xû bi ‘izz û kemal
Heta çû culûs kir di qesra delal

696 Nihayet wuha man heta çendi sal
Bi keyf û xuşî hem bi ‘izz û kemal

697 Bi hev ra dibûrîn bi ‘eyş û riza
Heta hate ser wan qeder hem qeza

698 Li dû ev melîki bi şerm û heya
Nexûş ket xû avîti nava ciya

699 Bi rûj û bi şev hem dem û sa‘eti
Dikîşe ji vî ‘illeti zehmeti

700 Dema di dirîj bû li wî ev seqem
Nikarî xû bigre li her du qedem

701 Emir kir bera bîn wezîr û wuzera
Ku da bîn cemi‘ bin bikim istişar

702 Cemî‘i wezîra yekayek temam
Dihatin li hakim dikir wan selam

703 Emir da ku rûnîn li ser kursiya
Nikarim ku rabim li her du piya

704 Çukû ez nexûş bûm bi îşek şedîd
Ji lew min dişandî li pey we ‘ebîd

705 Ku belkî mirin tî hebit vî demi
Nizanim çi bîjim di vî ‘alemi

706 Bu we istişare dikim bîhicab
Ricai dikim hûn bidin min cewab

707 Çukû ixtiyar im mi nîne weled
Li dû min bisekne bi muhr û sened

708 Ditirsim li pey xû ji e‘dai dîn
Ku bîn we zebit kin hemî ecme‘în

709 Mi qesd e ji we ittifaqi bikin
Li ser yek merivkî ku pî zebtikin

710 Duxazim e jî wî qebûl kim yeqîn
Ku da memleket pî hifiz bit hemîn

711 Cewab dan wezîra bi hev ra ‘elen
Ku em qani‘ in ya melîk Bil-Hesen

712 Çukû ew bi ‘eql û kemal û edeb
Wekî wî me nedye ji tuxmi ‘Ereb

713 Gelek ew dizane meqami kebîr
Bi rehm û bi şefqet li ser her feqîr

714 Ji xeyri Hesen em qebûl naketin
Eger na muheqqeq dibit pur fitin

715 Ku hîna sima‘ kir melîk ev kelam
Digû raziya we heye bittemam

716 Ji bûna Hesen zewci husnu’l-wucûd
Di piştî ku bimrim nekin hûn cuhûd

717 Nebîn me li nik padişah da xeber
Nuha em wî nakin melîk serteser

718 Bi serbest bibîjin ne şerm û fedî
Ku da ez bizanim ki ye bû Xudî

719 Ne ‘eyb û ne ‘ar e ji bû we yeqîn
Ji bû ez bizanim hemî ecme‘în

720 Temamen cewab dan bi zehr û beten
Qebûl naketin em ji xeyrî Hesen

721 Hemî em qenû ‘in bi wî serteser
Muxalif ji me kes tune yek nefer

722 Dema padişah dî hemî sadiq in
Bi zahir bi batin ku muttefiq in

723 Digûtî bera bîn huzûri kubar
Qumandan û qazî hemî tev bixar

724 Çewa ku Xuda heskirî dî bibit
Sube ez duxwazim li vir tev bibit

725 Hemî wan semi‘na ete‘na digût
Ji îş û birîni wî dil wan disût

726 Dema ew ji nik padişah tev diçûn
Emir dan xelqi hemî wan butûn

727 Sube hun cemi‘ bin li nik hakimî
Çi tişti emir ke qebûl kin hemî

728 Nihayet cemi‘ bûn hemî der meqam
Yekayek li hakim dikir wan selam

729 Bi hev ra digûtin kî sultani dîn
Hemî hazir in em li nik te yeqîn

730 Çi tişti emirkî qebûl e heman
Emir ke bibîje melîki zeman

731 Serî xû hilanî melîk der ‘eqeb
Selam da li ser wan bi ‘izz û edeb

732 Xitab kir bu wan ra melîk wî demi
Ji ferzan e hakim li ser ‘alemi

733 Welîkîn melîkek xeyûr û sebûr
Ji zulm û ji te‘da bibit dûredûr

734 Bikî hûn qenû‘ in bikin hûn beyan
Berî mewti ez wî qebûl kim heman

735 Hemî wan digûtî bi hev ra ‘elen
Rizaa me nîne ji xeyrî Hesen

736 Kuri wî ‘Eliyyî wezîri delal
Xeyûr û sebûr e bi husn û cemal

737 Hemî pî qenû‘ in bi qelb û bi dev
Bi zahir bi batin ‘elen hem bi xef

738 Melîk gû ku madam wuha ye emir
Kerem kin herin wî huzûr kin li vir

739 Welîkîn bi tertîb û bi ‘eql û edeb
Ji min lî selam kin selamek ‘eceb

740 Li dû hûn bibîjin were ey Hesen
Melîk te duxwaze li nik xû ‘elen

741 Ji hindav de rabûn hemî serteser
Heta çûne nik qapiyî mu‘teber

742 Yekî ez wezîra diçû ba edeb
Izin jî dixustî bi keyf û tereb

743 Hesen da cewabi ki ye ber derî
Ji bû min bibîje meçe qehqerî

744 Bi serbest were rûni ey muhteşem
Li nik min bizane tu yî muhterem

745 Cewab da wezîra hemî ecme‘în
Melîki zeman te duxwaze yeqîn

746 Kerem ke were em bi hev ra biçin
Li nik wî melîki li rûyî zemîn

747 Ku elbette emrek heye ey cuwan
Çi hîna biçî dî keşif ket ‘eyan

748 Ji hindav de rabû piya bî dereng
Li xû werkirin elbisi rengereng

749 ‘Ecel kir heta ba melîki kubar
Bi teqbîli erza melîk kir du car

750 Hesen gû eya sahibi mulk û mal
Emirke ji bû min bike keşfi hal

751 Ji bû te bi derd in bi îş in yeqîn
Xuda te şifa ke li rûyî zemîn

752 Melîk gû were nîzî min ey weled
Nebînî ne îş û ne derda ebed

753 Tu rûni li nik min were nîzî min
Cemî‘i wezîra biçûk û mezin

754 Duxwazin melîk bî li ser wan heman
Hemî ew duxwazin bi rûh û bi can

755 E jî pur duxwazim bi can û ciger
Berî mewti bey‘et bidim bîkeder

756 Heqîqet liyaqet dibînim qewî
Çi tişti mi gûtî qebûl ke tu wî

757 Ji hindav de rabû Hesen ser piya
Ji bav û melîk wî dikir pur heya

758 Digûtî di nîv van wezîra hene
Ji min ew mezintir gelek zîde ne

759 Ricai dikim ez ji te el eman
Ji ser min hilîne vî bari giran

760 Heman wan wezîra bi hev ra temam
Digû em duxwazin tu bî wesselam

761 Hesen gû ku madam ev e ittifaq
Ku bavîm di vî meslekî da liyaq

762 Hema bav digûtî ji bû wî weled
Hemî te duxwazin bi muhr û sened

763 Ji ber emri hakim digel van bira
Muxalif nebe tu li wan eşkera

764 Dema ku Hesen dî bi vi hey’eti
Gelek wî heya kir ji vî hezreti

765 Serî xû dibir nîzî erzi heman
Ji şerma wezîr û melîki zeman

766 Li dû gû melîk hûn bu wî qani‘ in
Li ser we melîk be bi ‘ehda mezin

767 Buxûnin gelek fatihe bî ‘eded
Hesen bû melîk ew bi muhr û sened

768 Duxûndin ewan fatihe wî demi
Belabû ewî navi der ‘alemi

769 Dema bû temam fatiha hezreti
Melîk gûte qazî nivîs hucceti

770 Li ser van wezîra melîk bû Hesen
Li nik herkesî ev sened bit ‘elen

771 Heman qazî huccet nivîsa temam
Dida dest melîk wî bi sed ihtiram

772 Melîk ev sened jî digirt hanihan
Bi imza dida dest wezîra heman

773 Ewan jî ku imza dikir serteser
Bi keyf û bi şahî sened mu‘teber

774 Melîk gû li ser texti rûni Hesen
Ku bey‘et bidin te hemî ew ‘elen

775 Hesen çû li ser texti rûnişt temam
Wezîra li wî kir yekayek selam

776 Bi teqbîla desti wî bûn muhterem
Hemî dest li ser hev li pay û qedem

777 Emir kir ku rûnîn di vî ta‘eti
Ku da ez ji bû we bikim xizmeti

778 Dema rudiniştin li ser kursiya
Yekayek du‘a wan dikir ser piya

779 Nihayet heta rû diçû mexribi
Li ser wan hukum kir bi vî mertebi

780 Xelat û hediyyî nefîs û kubar
Li ser van wezîra kirî yadigar

781 Heta şev dihate li ser wan temam
Hemî çûne mali bi sed ihtiram

782 Li dû wan çû Hesen bi qelbi selîm
Heta xû gihandî melîki qedîm

783 Ewî her du dest lî ziyaret dikir
Ji sun‘i melîk radikir pur şukur

784 Melîk lî wesî kir bi teqwa Xuda
Emanet ji teqwa nebî tu cuda

685 Çukû wî Xudayî metîn û ‘ezîm
Wehî şand li ser wî resûli kerîm

786 Muheqqeq bi teqwa dibin rû sipî
Li nik hezreta min mirûvi xebî

787 Bi teqwa Xuda tev dibin serfîraz
Bi serbest diçin ser terîqa diraz

788 Xuda razi ye ser hemî mutteqîn
Qebûl ke tu emri Xuda bil-yeqîn

789 Hesen da cewabi digû ey peder
Ji bû min mekîşe tu hinde keder

790 Eger hesbiket ew Xudayî wedûd
Ji xeyri ‘edalet qe nabit wucûd

791 Du‘ai duxwazim ji te bî‘eded
Ku belkî Xuda şîne bû min meded

792 Nihayet Hesen çû sera nazenîn
Bi leq wî ve hatin hemî ecme‘în

793 Jina wî xesû tev bi leq ve heman
Ji wî ra digûtin melîki zeman

794 Mubarek be ev menseba tey ‘ezîz
Digel van libasi li te pur temîz

795 Li dû çû ziyaret biket bav û da
Ku da ew ji bû wî bikin pur du‘a

796 Dema çû bi leq ve hemî radibûn
Bi keyf û xûşî tev ji wî ra butûn

797 Ser û çav û dev lî ziyaret kirin
Xuda te hifîz ket ji fitni mezin

798 ‘Elî gû bi teqwa Xuda ke ‘emel
Ji ‘umri xû nabînî qet yek xelel

799 Emanet bi şefqet be ser re‘yeti
Bi ‘edl û bi ihsan bike diqqeti

800 Xû tîxe du‘ai yetîm û feqîr
Ew in î ji bû te bibin destegîr

801 Nihayet li wî ma heta bû sube
Niyet kir ku rabe biçit ratibe

802 Li dû wî limîj kir heta bû temam
Hema çû heta ew gihîşte meqam

803 Wezîr û wuzare hemî cem‘i bûn
Yekayek selam dan li ser wî butûn

804 Hukum kir li ser wan bi nehy û emir
Wezîra ji bû wî dikir pur şukur

805 Hinek rutbe da wan hinek bûn ‘ezil
‘Edalet dikir wî bi qelb û bi dil

806 Wuha ma heta mexribi ev delal
Cemî‘i wezîra hemî çûne mal

807 Li dû rabû sultani pak û ‘efîf
Heman dî melîki qedîm pur ze‘îf

808 Selam da li ser wî ziyaret dikir
Melîk pî hisa wî li xû çav vekir

809 Heman wî xeber da digû ey lebîb
Bi xû ez dizanim ecel bû qerîb

810 Çukû emr û fermana rebbi qedîr
Dema bit hewale li merdi feqîr

811 Nikarî nefeskî bi dûr ve biçit
Ku da hukmi xû tîda carî bikit

812 Nuha pî dizanim hukum bû li min
Bi emr û irada Xudayî mezin

813 Rizaa mi jîra heye ey weled
Gelek hemd û şukri dikim bî‘eded

814 Welîkîn wesiyyet dikim bî cuhûd
Emanet li nik te bi husni’l-wucûd

815 Digel walida wî feqîr û hezîn
Li nik te emanet hemî ecme‘în

816 Xû dûr ke ji fi‘li xerab û şera
Mutî‘ be ji bav û ji dayî xu ra

817 Bitirse ji wî heybeta girdigar
Mulûki cihan jî dibin teng û tar

818 Xuda emri kir ser hemî ins û can
Bi ‘edl û bi ihsan emir kir li wan

819 Cewab da ji bû gûtî sultan Hesen
Bi qelb û bi dil min qebûl kir ‘elen

820 Semi‘na ete‘na e ya bav û ced
Nikarim xeberdim li nik te ebed

821 Çi tişti emirkî muheqqeq dibit
Eger ew Xudayî mezin hesbikit

822 Li dû ev melîki qedîmi hezîn
Heta çari rû ma li rûyî zemîn

823 Wefat bû bi bal rehmeta girdigar
Hemî pê diîşan buçûk û kubar

824 Hilanîn bi xesl û kefen wî demi
Bela bû wefata wî der ‘alemi

825 Bi Qur’an û dewr û d‘a man li ser
Heta bû temam erbe’în serteser

826 Vegîran hemî tev bi kerb û hezîn
Di nîv şehri Bexda bela bû girîn

827 Wuha ma hetanî mehek te‘ziye
Kesi ku dihat Fatihe xûndiye

828 Nihayet hilat te‘ziya pur weqûr
Ji emri Xuda radibûn pur sebûr

829 Ev e ‘adeti Rebbi erd û sema
Wuha vî bizanin di gav û dema

830 Hesen musteqil bû bi mulk û mal
Bi ‘edl û bi ihsan û qenc û delal

831 Gelek hesdikin jî hemî ‘alemi
Ji bûra du‘ai dikin her demi

832 Zemani Hesen bi keyf û surûr
Di çû tev bi hukmi Xudayî Xefûr

833 Heçî bav wezîri mezin der yemîn
Wezîrê çepê yek zilamek emîn

834 Hesen ma li Bexda melîkek mezin
Bi ‘edl û bi ihsan û hem heskirin

835 Ji qîza melîk qîz û kur zîde bûn
Li dû wî hemî bûn melîk ew butûn

836 Bi keyf û şahî wuha man temam
Heta hate ser wan mirin wesselam

837 Beqabûn ji bûna Xuda ye yeqîn
Bi xeyr wî fena ne hemî ecme‘în

838 Hemî em wuha ne ev e nasihe
Ji bû me bixûnin hemî Fatihe

## 4.3. MERSIYENAME

## DER HEQQI ŞEHADETA IMAM HUSEYN DA YE ( XWEDÊ JÊ RAZÎ BE)

## BISMILLAHIRREHMANIRREHÎM

**Benda rabi‘ ‘eşere der mersiyei Imam Huseyn şehîdi Kerbela hefîdi’n-nebiyyi (s.‘e.w.)**

1 Werin hey werin hey werin guhbidin
Ku bîjim ji bû we çi derdek mezin

2 Çi hate serî ehli beyta nebî
Ji bû wan fida bin ummî we ebî

3 Nexasim Huseyni imam bû şehîd
Di kerb û belai Imami wehîd

4 Werin me'temi tev bi hevra temam
Ji bû mersiya şeh bikin ihtiram

5 Bibîjin Huseyna şehi dilbirîn
Ji bû te şeb û rûz em in dilhezîn

6 Ji Mekke ku derket şehi bawefa
Ewî qurreti ‘eyni bû Mustefa

7 Di nîv rûzî sîşem we hem terwiye
Ji hindek ruwatan me ev zaniye

8 Ji zîlhicce bûrî temam heşti rûj
Di tarîxi şîstî ewî dil disûj

9 Beraber dikir wî şehi namidar
Digel xû hinek Şî‘ û Beyta kubar

10 Dema ew bi rîket ki heştî nufûs
We hem du merûv wî birin baxusûs

11 Gelek cehdi kir wî Huseyni delal
Heta çû sefahi bi ‘izz û kemal

12 Firizdeq bi leq wî ve çû wî demî
Selam da li ser wî di gav û demî

13 Firizdeq digûti ji bûna imam
Xuda meqseda te bide te temam

14 Nebînî di vî meqseda xwe kurûb
Ne nesb û eziyet ne te‘b û luxûb

15 Sual kir imam ez Firizdeq heman
Digûti bibîje di weqt û zeman

16 Ji min qet xefî tu meke Bu Feras
Ji ‘erdi ‘lraqi ji ehwali nas

17 Çikû şa‘irî Ehli Beyta resûl
Tu wî ey Firizdeq bi ‘izz û qebûl

18 Beyan ke ji Kûfe bi lez hem bi xar
Eger tu dizanî meke qet sitar

19 Cewab da ji bû şahi deşta ‘lraq
Cewabek fesîh wî bi terz û liyaq

20 Ki ey seyyidî Ehli Beyta resûl
Çewan ez bibîjim kelami fuzûl

21 Nexasim di vî mehzera pur weqûr
Ji laf û guzaf defteri kim sutûr

22 Muheqqeq ji nîv şehri Kûfe yeqîn
Bi lez hem bi xar tîm eya dûrebîn

23 Dizanim ji ehwali wan cumleyan
Dixwazî ji min ke sualî ‘eyan

24 Ebed yek xeberdan xefî nabitin
Ji bû te hefîdi resûli mezin

25 Were ey Firizdeq sual kir Imam
Tu ehwali Kûfe bibîje temam

26 Gelû ew bi keyf in weya ew hezîn
Mufessel bide min beyanek şîrîn

27 Çikû wan dişandin resûl subh û şam
Ji bû wan xelas kim ji zilm û zulam

28 Ji te‘da Yezîd û Ibni Ziyad
Xelas kim ji bûna Xudayi ‘ibad

29 Cewab da ki şahim rucu‘ be ji dil
Di vî mes'elî de dibim pur xecil

30 Çikû qelbi wan nik te ye ey reîs
Suyufî ewan nik Yezîdi xebîs

31 Welîkin qeza û qeder ez sema
Nuzûlî dikin ser zemîni hema

32 Dikit "ma yeşaû" Xudayi mezin
"We fî kullî yewmin huwe fî şein"

33 Cewab da Imam bû Firizdeq cewab
Gelek haziqî tu bi nutqa sewab

34 Bibûre li meqsed eya Bu'l-Feras
Mufessel te kir bû me ehwali nas

35 Eger ew bixwazin bikin pur xedir
Ji bû min ji bû wan Xuda muqtedir

36 Firizdeq li rî çû Huseyn hate pîş
Ji vî meqseda wî dibim dilbiîş

37 Heta hate ser mai Haciz Imam
Peyabû li ser mai pak bittemam

38 Ku nagahi dî ‘Ebdullah bin Mutî‘
Li ser mai Haciz nuzûlî bedî‘

39 Bi leq hev de çûn hem selami kubar
Li hev wan dikir bî hedd û bî şumar

40 Ji bû wî re gû ‘Ebdullah ey exî
Tu meqsed bibîje ji bû min wefî

41 Gelek ez te‘eccub dimînim yeqîn
Ji wî meqseda te dibim dilhezîn

42 Tu meqsed bibîje ji bû min ji dil
Tu derxe ji qelb û dilim xişş û xill

43 Cewab da ji bû wî ki ya Bne'l-Mutî‘
Diçim Kûfei ez bi qelbek wecî‘

44 Çikû wan dişandî şeb û rûz û an
Ku bîm Kûfei ez di weqt û zeman

45 Ji bûna Yezîd û Ibni Ziyad
Te‘edde nekin ew li ehli bilad

46 Li min lazim e ez biçim alî wan
Nehîlim bibînin çu xusr û ziyan

47 Ji bû wî re gû ‘Ebdullah wî demî
Bi cuz te kesek nîne der ‘alemî

48 Heta tu biçî alî Kûfe Imam
Ne ‘ehd û wefa ye ji bû wan temam

49 Digel ev xeber min dişandî ‘eyan
Meçe sûyî Kûfe eman sed eman

50 Ricai dikim ez ji te bî qeder
Rucû‘ be ji vî meqseda zî huner

51 Ji bûna Xuda hem ji bûna resûl
Veger tu ditirsim bibî tu melûl

52 Mehetkîne tu hurmeta muslimîn
Bi cahi Muhemmed resûli emîn

53 Fewellahi ey seyyidî zî cemal
Çi weqta teleb kî ji wan mulk û mal

54 Ku ye‘nî teleb kî ji destî Yezîd
Ku derxî ditirsim bikin te şehîd

55 Eger te qetil kin bizan şehriyar
Ebed “la yehabûne merden” tu car

56 Mebe mustemi‘ bû kelami ewan
Ne sal û zeman û ne hîn û ne an

57 Çikû bû mesel ey sefiyyi wefî
Heçî ehli Kûfe ebed la yefî

58 Bizane ji min her kesî der ‘lraq
Bi laf û guzaf in ebed la yutaq

59 Were hey were tu rucû‘ be ji wir
Ricai dikim min nekî munkedir

60 Meçe Kûfei nîv Benî Ummeye
Ji ber sewqi min ev qeder zaniye

61 Nekir gûşi xwe pendî wî an zeman
Meşî sûyi Kûfe bi se‘y û rewan

62 Heta hate texlîbiyet bî xilaf
Ku nagahi dî qafilek der mesaf

63 Sual kir ji wan yek bi yek wî demî
Tu derxe ji qelb û dilî min xemî

64 Ji Muslim xeber de bi sidq û yeqîn
Eger tu dizanî bibî ey emîn

65 Cewab da ji bû wî ki ya Bne'r-Resûl
Rûh û can fida bit bi ‘izz û qebûl

66 Xuda te selamet bikî ez Yezîd
Ditirsim ji te ew bikin te şehîd

67 Tu xweş bî ji ber Muslimi pur betil
Di nîv ehli Kûfe kirin wî qetil

68 Gelek xaîn in ehli Kûfe temam
Veger tu ji meqsed meçe ey Imam

69 Fefilhal yekî ez sehabî kubar
Digûtî veger tu ji meqsed bi xar

70 Çikû nasirek bû te nîne ebed
Di der Kûfei qet bi muhr û sened

71 Gelek em ditirsin bi qelb û bi dil
Di der Kûfei ew bikin te qetil

72 Heman ew 'Uqeyliyyi pur ihtişam
Bi lez wan digûtî ji bûna imam

73 Tu car em rucû‘i qe nakin ebed
Ji meqsed Imam bi muhr û sened

74 Çewan em rucû‘ bikin ey bira
Bihîlin birader di seng û jera

75 Heta em neçin Kûfei bittemam
Ebed em rucû‘i qe nakin Imam

76 Ku belki rehet kin dilî xwe li wan
Weyaxûd serî ew qetil kin heman

77 Çewan em bihîlin birayi celîl
Di ‘erdi ‘lraqi bikin wî qetîl

78 Cewab da ji bû wan Huseyni imam
Dixwazim ji we ev qeder wesselam

79 Ki "La xeyrelî be‘dekum fî’l-heyat"
Ji bû wan digût "'eccilu fî’l-memat"

80 Ji wî barkirin tazu yale yeqîn
Bi leq wan ve hatî zilamek emîn

81 Ji bû şeh Huseyn wî digûtî heman
Veger tu ji vir ey şehi rûh û can

82 Meçe Kûfei nîv wî qewmi rezîl
Gelek ez ditirsim bikin te qetîl

83 Çikû ‘Ebdullah wan qetil kir yeqîn
Birayi Reza‘i ji bû te emîn

84 Tu xûş bî ji ber ve meçe el eman
Ditirsim qetil kin te jî rûh û can

85 Te irsal kirî wî bi bal Muslimî
Cewabeş verîke ji bû te hemî

86 Çi hîna gihîşt Qadisiyye Cewad
Li dûr wî digirt ‘eskerî Bin Ziyad

87 Ku teftîş kirin ‘Ebdullah der meqam
Bi wî ra beraber kitaba Imam

88 Çi ewwel çi axir hemî daxil e
Bi ‘ezla Yezîdi hemî şamil e

89 Bi derhal qetil wî kirin şahizad
Di der Kûfei bû te nîne wi dad

90 Rica'i dikim ez ji zati kerîm
Ji vir tu rucû‘ be nekî dil seqîm

91 Vegerya Huseyn ser sehaban temam
Ji bû wan beyan kir kelami zilam

92 Di ger gû ki wellahi xedrek mezin
Li me çîkirin ey sehabî di min

93 Li dû gû Imam bû sehabî delal
Kesî hesdike ew biçit sûyi mal

94 Bira ew biçit alî mali bi xar
Ne zemm û ne lewme dikim bû tu car

95 Belabûne E‘rab yemîn û şimal
Bi lez ew vegeryan û tev çûne mal

96 Heta ma Imam û sehabî qedîm
Bi wî ra diçûn ew bi qelbi selîm

97 Çikû ev Imam bi xeşy û edeb
Çi gava dihat ser mi yahi ‘Ereb

98 Beraber dibû gel wî hindek ji wan
Heta hat ji bale bi se‘y û rewan

99 Bihîst ‘Ebdullah wan qetil kir yeqîn
Ji yek merdî paki selîmi emîn

100 Ji ber wî li E‘raban teklîfi kir
Ku ye‘nî rucû‘ bin nebin munkedir

101 Çukû wî dizanî ji wan ev qeder
Ku wî bîne Kûfe bi se‘y û huner

102 Ne herb û qitali dikin ew ebed
Ne te‘b û eziyyet didin bû cesed

103 Li nik xû dibîjin ki Kûfe temam
Muheqqeq mutî‘ in ji bûna Imam

104 Çi hîna vegeryane E‘rab ji rî
Imam û sehab tev diçûn li ûxurî

105 Gelek cehdi kir wan bi se‘y û bi baz
Li ser vî riya pur ‘erîz û di raz

106 Heta betni ‘uqbe dihatin temam
Li wî der nuzûl bûn bi qesd û meram

107 Bi lez ez şuyûxi ‘Ereb yek recul
Dihat nik Imam ew recul dilbikul

108 Digûti veger ey şehi namidar
Meçe sûyi Kûfe bi se‘y û bi xar

109 Fewellahi wellahi wellah qesem
Çi weqta biçî Kûfei lacerem

110 Ji bû te muheyya rimahi tiwal
Digel wan suyûfi hidad û siqal

111 Gelek ez ricai dikim ey hefîd
Meçî Kûfei nîv xuyûli Yezîd

112 Li wî iltifat qet nekir şahizad
Nekir guşi xû behsa Ibni Ziyad

113 Ku belki dibû sabir û muhtesib
Ji ehwali 'alem dibû munqelib

114 Digûtî bi cuz wî Xudayi semed
Zererkî nikarî bide min ebed

115 Çikû min ne şer‘ û ne sunnet tu car
Muxeyyer nekir ne bi fi'li kubar

116 Hetta ew berî xû bidin min bi kîn
Bibin tabi‘i firqeya muznibîn

117 Ji wî irtihal kir şehi bawefa
Ewî qurreti ‘eyni bû Mustefa

118 Meşî ew bi se‘y û bi cehd û rewan
Heta ma dû merhel ji cada giran

119 Bi leq wî ve hat yek recul pur şedîd
Ji bû ra dibîjin ki Hurr bin Yezîd

120 Hezar ten ji eshabi Ibni Ziyad
Bi wî ra beraber suwarî şidad

121 Temamen muselleh bizirdi nezîd
Ji bû şeh Huseyn ev ‘uyûni Yezîd

122 Heman Hurr digû bû Huseyni imam
Ji vir tu veger gel sehaban temam

123 Çikû em ‘uyûn in li ser te hefîd
Ji alî ‘Ubeyd û ji alî Yezîd

124 Ji bû min re gû Bin Ziyad ev qeder
Herre tu temami turuq serteser

125 Li ser wî bigir ey ribahî bi xar
Beraber bike bû xû elfe suwar

126 Mehîle bipaş xe qedemkî ebed
Heta ez bişînim ji bû te meded

127 Fewellahi ez karih im ey Imam
Nikarim rucû‘ bim ji vir bittemam

128 Ditirsim ji ceddi te yî zîlcemal
Şefa‘et nebînim bibim kerr û lal

129 Xelase mudaxil me nîne yeqîn
Di vî mes'elî da eya şahi dîn

130 Bi xeyr min exîz kirye bey‘et ji qewm
Ne zemm û ‘itabî li min kî ne lewm

131 Berî xû bide xeyri cardin veger
Tu derxe ji qelb û dilî min keder

132 Bi lez tu veger ey şehi namidar
Bi alî Hicazî bi se‘y û bi xar

133 Bi şev hem bi roj tu bi se'y û bi baz
Herre ey Imam tu bi alî Hicaz

134 Bihîle min û Bin Ziyad ey Imam
Ji ser te refi‘ kim ewî bittemam

135 Newîsende kim ez ji bû Bin Ziyad
Veger tu ji vî mewzi‘i şahizad

136 Xelase vegerya Huseyn qehqerî
Bi alî Hicazî ewî enwerî

137 Gelek cehdî kir wî şevî ta sebah
Li wî dîti Hurr bin Yezîdi ribah

138 Ji bû ra digû wî Huseyni delal
Gelek ez dibînim xerab e meal

139 Ji bû çi vegeryayi yabne Yezîd
Li ser min diseknî bi şubhi ‘etîd

140 Te‘eccub dimînim ji te vî demî
Tu derxe ji qelb û dilî min xemî

141 Cewab da ji bû wî eya zî huner
Yekî ez cewasîs birî ev xeber

142 Heman Bin Ziyad yek resûlek bi lez
Dişand alî min wî bi se‘y û bi bez

143 Digûtî çewan tu Huseyni ‘Elî
Di rî da dibînî çû şemsa celî

144 Li dû tu dibîjî herre şehriyar
Bi alî Hicazî bi se‘y û bi xar

145 Nihayet ji te ez dixwazim Huseyn
Li ser te emir her wekî ferzi ‘eyn

146 E jî qet nikarim ji te bim cuda
Wuha bû muqedder bi emrî Xuda

147 Peya bû li wî erdi sibti hebîb
Sual kir çi erz e bi qelbek kebîb

148 Ji bû wî re gûtin ev e Kerbela
Ela ey Imami bi heyy û hela

149 Nuzûl bû Imam rûzi çarşem yeqîn
Di heşti muherrem meha pur şîrîn

150 Ji hicra mubarek bizan şîst û yek
Sene çû ebed tu nekî reyb û şek

151 Digûtî ev e Kerbelai şehîr
Di qalû belai ji bû min setîr

152 Cihî Kerbelai cihek pur şedîd
Muheqqeq li vî der dibim ez şehîd

153 Li vî der me naxi rikabi di me
Li vî der me hetti rihali di me

154 Li vir meqtela van sehabî di min
Wuha kir muqedder Xudayi mezin

155 Li vir wî bihetkin çi ehl û weled
Ebed bû me nîne tu caran meded

156 Kitabet dikir Hurr bi bal Bin Ziyad
Ku ye'nî Huseyni Imami ciyad

157 Nuzûle li erdek di bîn Kerbela
Ji bû te xeber ez didim essela

158 Newîsende kir Bin Ziyad bû Imam
Bizane ji min ev qeder wesselam

159 Resûlî Yezîd emrî min kir heman
Herre tu bi alî Huseyn hani han

160 Ku belki rucû‘ be dibin hukmi min
Weya wî qetil ke bizane ji min

161 Çi hîna wurûd bû kitab ser imam
Vekir xwend û avît ji dest xû heman

162 Digû bû resûl nîne nik min cewab
Bi wî ra ebed ez qe nakim xitab

163 Heman ev resûli bi kerb û bi kîn
Vegerya bi bal firqeya muznibîn

164 Temam ‘erzi kir gûtinî şahizad
Xezeb girt ji qewli Imam, Bin Ziyad

165 Emir kir li ‘esker bibin muctemi‘
Temamen di emrî mi da mustemi‘

166 Herrin ser Huseyni ‘Elî hani han
Cemî‘ bin li ser wî bi herba giran

167 Qumandan li ser ‘eskerî pur giran
‘Umer ibni Se‘d waliyî Rey bizan

168 Digûtî ‘ecel kin herrin hûn bi lez
Di qetla Huseyn da bikin se‘y û bez

169 Birrîket evî ‘eskerî bî qeder
Ji ewwel ve hat çû gihîşte Şemer

170 Heta elfe elf ‘eskerî Ibni Se‘d
Cemî' bûn di qetla Huseyn kirne cehd

171 Temamen bi zird û suyûf û rimah
Bi se‘y û rewan çûn heta bû sebah

172 Nuzûl bûn bişati‘ Firati temîz
Derî avî girtin ji şahi ‘ezîz

173 Gelek tengî çîbû li ser şahi dîn
Ji qet‘a Firati dibû pur hezîn

174 We hem ser sehabî ewî cumle şan
Giran bû emir her wekî bû nîşan

175 Gelek tih dibûn bî hedd û bî qeder
Teheyyur diman hem dibûn bî mefer

176 Nizanin çewa kin Huseyn û sehab
Ji tihna dil û cergi wan bû kebab

177 Heman ez sehabî Imami delal
Xudan zuhd û wer‘ û we hem bakemal

178 Zilamek nezîf û temîz û mekîn
Ji bû ra dibîjin Yezîd bin Hesîn

179 Bi lez wî digûtî ki ya Bne'r-Resûl
Tu destûr bide min bi ‘izz û qebûl

180 Heta ez biçim nik ‘Umer bî xilaf
Xeber dim bi wî ra bi qurb û bi laf

181 Ku belki bide hindî mai Firat
Ez û ehl û ewlad bibin bî necat

182 Yezîd bin Hesîn zû diçû se‘y û cehd
Heta hate ba ‘Umer ibni Se‘d

183 Xeber da bi wî ra digû ey ‘Umer
Çi ra men‘i avî dikî serteser

184 Ne mulki te ye hem ne mulki Yezîd
Dixûn jî dewab û kilabi şedîd

185 Tu men‘a Firati dikî bî edeb
Ji ehl û ji ewladi şahi ‘Ereb

186 Dihîlî temam ‘itreta tahir e
Ji tihna helak bin hemî zahir e

187 Tu hîja dibîjî ku ez mu'min im
Bi we‘da Xuda hem resûl mûqin im

188 Eger mu'minek sadiqi ey ‘Umer
Mede Ehli Beyti tu hinde keder

189 Were ey birader mebe bî wefa
Muheqqeq şefî‘i me ye Mustefa

190 Ji bû hinde ava Firati mecal
Tu buxli meke bû wî şahi kemal

191 Mebe musteheqqi ‘ezabi şedîd
Ji bû xatiri wî Yezîdi pelîd

192 Xelase serî xû dixist nav peya
Cewab da ji bûna Yezîd bî heya

193 Nikarim ku ez mulki Reyyi tu car
Bidim xeyri xû ey birader bi xar

194 Tehemmul qe nefsa mi nake ebed
Heta mulki Reyyi bidim her ehed

195 Çiku her ewî ‘Ebdullah bin Ziyad
Ji nav qewmi xû min hilanî şidad

196 Digûtî ji te ez dixwazim Huseyn
Muheqqeq li ser te dikim şubhi deyn

197 We hem wî dida min ebed mulki Rey
Bizan mulki Rey qurreti ‘eyn e ey

198 Eger ez bidim we Firati belaş
Bizane ji destî me çû mulki baş

199 Dizanim di qetla Huseyn da ‘ezab
Dibînim di yewmil qiyam bî xitab

200 Welîkin e jî mame heyrî yeqîn
Nizanim çi bîjim ji bû te emîn

201 Xelase evî mulki Reyyi tu car
Qe nakim ji dest xû vî mulki kubar

202 Rucû‘ bû Yezîd bin Huseyn bal Imam
Yekayek beyan kir ji bû wî temam

203 Digûtî nedî min tu kafir ebed
Wekî Ibni Se‘d qet bi muhr û sened

204 Çi weqta bihîstî Imam ev meqal
Dizanî dibin de heye pur qital

205 Yeqîn kir evî qewmi pîsi rezîl
Dixwazin di vir da bikin min qetîl

206 Emir kir li eshabi nûrîn cemal
Hefir kin çû xendeq bi 'izz û kemal

207 Heman ew sehabi şehi Kerbela
Bi lez wan hefir kir çû xendeq ela

208 Welîkin yekî furce hîştin ji bû
Qital bikin ew bi ha yû bi hû

209 Xelas hî nebûn ew ji xendeq temam
Hucûm wan dikir ser sehab û Imam

210 Li dûr wan digirtin ewan çar nekar
Yekayek dikuştin bi seyfi kubar

211 We hem wan dikuştin bi nebl û nibal
Ewan jî bi wan ra dikir pur qital

212 Welîkin mefer wan nebû bî xilaf
Ne quwwet ne taqet ji bû hinde av

213 Heta ez sehabi Imami celîl
Muheqqeq heta pincî merd bûn qetîl

214 Li nik kuştina van sehabi delal
Fesahel Huseyn û bi sewtek zelal

215 Digûtî gelû der cihani ebed
Kesek nîne bibîtin ji bû min meded

216 We hem ew herîmi Resûli Kerîm
Muhafiz bikîtin bi qelbek selîm

217 Heman dîti Hurr bin Yezîdi ewwil
Dihat ba Imam ew bi qelb û bi dil

218 Digûtî ez im yabne Şahi Cihan
Di ber te bikim herbekî pur giran

219 Ez im hizb û ensarî te vî demî
Nikarim xû bigrim di der ‘alemî

220 Eger çi ji ewwel ve ez bû me ‘eyn
Welîkin di axir da hatim Huseyn

221 Dixwazim di ber te şehîd bim Imam
Ez û tu heşir bin bi hev ra temam

222 Ku belki şehi beyt û rukn û hetîm
Şefa‘et bikit vî feqîrî seqîm

223 Nihayet ewî herbekî bî mesîl
Dikir axirî da kirin wî qetîl

224 Du sed betl û sendîdi Ibni Ziyad
Dikuştin ji wan her wekî qewmi ‘Ad

225 Li wî cem‘i bûn her wekî sa bi xar
Ji ser puşta hespî ewî dane xwar

226 Li dû Ibni Hurr hate alî Imam
Digûtî dixwazim ez Hurr temam

227 Digel te heşir bin şehi Kerbela
Ji ‘işqa te xayet ez im mubtela

228 Heyata li puşt te dizanim yeqîn
Ne tiştek dibînim eya şahi dîn

229 Ricai dikim ez di yewmi'1-qiyam
Min û Hurr ji bîr tu nekî ey Imam

230 Tu destûr ji bû min bide şahizad
Heta ez biçim ‘eskerî Bin Ziyad

231 Li hev dim serûbin bikim bî qeder
Nehîlim bibînin ji bû xwe mefer

232 Nihayet diçû wan bi se‘y û bi bez
Dikuştin ji wan not û neh wî bi lez

233 Heta bû şehîd Ibni Hurr ey hewar
Ne imdad û gazî ji bû wan tu car

234 Eger çendi ji eshabi ceddi'l-Hesen
Bikirna li meydan fixanek ‘elen

235 Çi hed bû ji wan kafirî dînbetal
Bi wan ra bikirna çi herb û qital

236 Welîkin wuha bû muqedder yeqîn
Ji bû ehl û ewladi şahi emîn

237 Gerek ew bibînin gelek zehmetî
Ku daye tesellî ji bû ummetî

238 Li me lazim e em tesellî bikin
Bi ehl û bi ewladi şahi mezin

239 Nihayet sehabi Imami delal
Kesek qet nemabû bikirna qital

240 Tenî ma şehînşahi deşta ‘lraq
Nikarim bibîjim ji destî firaq

241 Heman wî hucûm kir li ser ‘eskerî
Ji ber wî temam çûn hemî qehqerî

242 Bi wan ra dikir herbekî bî qeder
Welîkin ji tihna nemabû mefer

243 Gelek betl û sendîd dikuştin Imam
Selamet vegerya heta nik Xiyam

244 Di ger wî hucûm kir hucûmek şedîd
Li ser ‘eskerî Bin Ziyad û Yezîd

245 Dikuştin ji wan bîhedd û bîşumar
Wekî bû riwayet ku pinsed hezar

246 Le‘ini Şemer hate alî herîm
Digel hinde ebtali pîsi zemîm

247 Hinek dî bi lez çûne wî şahizad
Serî wan dihavîtî şubhi hesad

248 Li wan pur dida ne‘re û sewt û deng
Serûbin dikir qewmi pîsi bizeng

249 Digûtî eya qewmi ‘Ad û Semûd
Meçin Ehli Beyti bi şubhi Yehûd

250 Werin min eger hûn cesûr in temam
Bibînin çi zerban ji destî Imam

251 Ez im necli wî Heyderî namidar
‘Eliyyi Weliyyi şehîdi kubar

252 Ez im sibti şahi cihani yeqîn
Ki ceddi min e seyyidi'l-murselîn

253 Nizanin ez im qatili we temam
Xelasî ji bû we tune subh û şam

254 Ezî we hesadî bikim wek durûn
Ji we ez birîjim hezar meşki xûn

255 Werin hey werin hûn wekî sa bi xar
Li we Kerbelai bikim teng û tar

256 Ez im bid‘ekî tahire bîxilaf
Eya qewmi pîsi bi laf û guzaf

257 Ezî Kerbelai bikim surxi dem
Muheqqeq ezî we bixim der ‘edem

258 Eya qewmi ‘Ad û Semûd û Yehûd
We waqi‘ bikim ez di nari xulûd

259 Temamerı vegerya bi ser şahizad
Li dûr wî digirtin wekî qewmi ‘Ad

260 Di wan de dida ne‘reyek Haşemî
Serûbin dibûn ew ji ber wî hemî

261 Digûtî werin ey kilabi ‘eqûr
Çira hûn dibin pur ji min dûredûr

262 Di gûr jî li ser wan çû ebrî bihar
Çi hed bû li ber wî bikirna qerar

263 Dikuştin ji wan bî hedd û bî qeder
Nehîştî ji bû wan ebed yek mefer

264 Nikarin bi nezdîkî şahi sebûr
Bibin ew temamen dikin jî nufûr

265 Heman ew le‘îni Şemer nagihan
Emir kir li ser ‘eskerî pur giran

266 Ku bavîne wî hûn nişab û nebil
Ku belki di vir da bikin wî qetil

267 Eger nîte kuştin bi nebli kesîr
Muheqqeq di vir da dikit me esîr

268 Evî ‘eskerî bî hedd û bî hisab
Muheyya dikir wan nibal û nişab

269 Şemer emrî wan kir bi lez hem bi xar
Li ser puşta hespî ewî bidne xwar

270 Temamen bi hev ra wekî yek nebil
Bila şek bi nebla dibit ew qetil

271 Çi hîna evî qewmi Ibni Ziyad
Berî van nibala didan şahizad

272 Bi hev ra dikirne ‘ewawek kilab
Dihatin Imam ev nibal bîhisab

273 Heta “esxenûhu cerahen” hewar
Ji ser puşta hespî ewî dane xwar

274 Hewar e were ey şehi ins û can
Şehîd bû Huseyni imam nagihan

275 Şehîd bû şehi Kerbelai wehîd
Were hey were ey Resûli Mecîd

276 Bişîne tû imdad ‘Eliyyi Cewad
Qetil ke heçî ‘eskerî Bin Ziyad

277 Weyaxud hinek ez sehabi celîl
Bişîne di imdada şahi cemîl

278 Serûbin bikin qewmi pîsi mirar
Temamen qetil kin biçûk û kubar

279 Bişîne tu imdad eya Mustefa
Mehû ke evî qewmi pîs bîwefa

280 Qetil ke ewan ey Resûli Xuda
Mehîle yekayek bibin ew cuda

281 Li nik vî Firati dilal û temîz
Şehîd bû Imami wehîdi ‘ezîz

282 Ne imdad û gazî ji bû wî tu car
Heta bû şehîd ev hefîdi kubar

## Mel'ene[87]

283 Hezar ah û efxan dikim her seher
Ricai dikim ez ji Fexru'1-Beşer

284 Dibîjim tu negrî li min şehriyar
Ku le‘net li ser wan bikim bî qerar

285 Bi ‘edda hemî qetre mai sema
Bi ‘edda hemî hemm û derd û xema

286 Bi siqli cibal û bi ewzani ab
Bi ‘edda cemî‘i hurûfi kitab

287 Bi ‘edda hemî şey'i der kainat
Çi retb û çi yabis we hem xedrewat

288 Dibîjim Ilahî bi ‘edda melek
Çiqasi hebîtin melek der felek

289 Bi ‘edda hemî ehli her heşt cinan
Bi ‘edda ne‘îmi ewan cumle şan

290 Bi ‘edda hemî ehli dûzex kerîm
Çiqa dî dibînin ‘ezabi elîm

291 Bidî le‘netî ser Şemer hem Sinan
Çewan wan şehîdkir Imami cuwan

292 Çû şeytan, bidî ser ewan le‘netî
Di dûzex bibînin ebed zehmetî

293 Tu daxil bike Bin Ziyad û ‘Umer
Di vî le‘netî da di narî seqer

294 Nikarim ebed le‘netî ser Yezîd
Bikim ez ditirsim ji xulli hedîd

295 Ku tîkevne dest û we payi di min
Nikarim hilînim‘ezabi mezîn

296 Çira çunki kes nîne şahid ebed
Li ser vî xebîsi bi muhr û sened

297 Ku gûtî ji bû kes ebed biddelîl
Here tu qetil ke Huseyni celîl

298 We hem wî bi destî xû qet‘en tu car
Ne kuştî evî sibti paki kubar

299 Ji lew ez nikarim bidim ser Yezîd
Evî le‘netî ser xebîsi pelîd

300 Welîkin dibîjim Ilahî eman
Bidî ser Yezîdi ‘ezabi giran

301 Hezaran zeman û hezar hîn û gav
Di nari cehennem bibî kanî av

302 Muda'ef bibit ev 'ezabi elîm
Di nari cehennmem bibit dilseqîm

303 Xelase peya bûn hemî bî hewes
Dihat pîş Huseyni Sinan bin Enes

304 Qeti‘ kir seri wî Imami kubar
Heman wî hilanî bi lez bû suwar

87 “Le‘netkirin”

305 Beraber dikir wan bi re'si şerîf
Ru'usi sehabi delali 'efîf

306 Ru'usi ewan ser rimahi tiwal
Dixistin heman ew dibûn kerr û lal

307 Li ser wan dibû tarî sî rûj temam
Nikarî bi pîş de biçit yek zilam

308 Heta bû temam her sî rûji kubar
Di ber wan serî wî şehi namidar

309 Le‘îni Sinan bir serî şahizad
Heta ba ‘Ebdullah ibni Ziyad

310 Çi hîna wedi‘ kir wî re'si şerîf
Digûtî rikabam tejî kî ji zîv

311 Çikû seyyidek min ji ehli Hicaz
Dikûştî bide min tu zîvi beyaz

312 Rikabam tijî kî ji zîr ey emîr
Ji yaqût û elmas bide min kesîr

313 “Qeteltû Huseynen” bizane ji min
Ki bid‘ek ji wî şahi insan û cin

314 Ew e seyyidi ehli perdî yeqîn
Wuha bû riwayet ji şahi emîn

315 Di ser wî de kes nîne qet ba neseb
Ne Rûm û ne Turk û ne Kurd û ‘Ereb

316 Gerek tu bidî min gelek bî qeder
Ji zîv û ji elmas û yaqût û zer

317 Bi derhal xezeb girtî wî hani han
Ji tefrîta qewli le‘îni Sinan

318 Digûtî ki wallahi wallah ehed
Ne zîr û ne zîvek qe nadim ebed

319 Eger tu dizanî wuha bû Huseyn
Çira kuştina wî te kir şubhi deyn

320 E jî te qetil kim çû kelbi mirar
Ji bû van kelami te yî bî şumar

321 Xelase ewî zend hilanî ji dil
Bi derhal Sinani Enes kir qetil

322 Li ser yek munadî emir kir bi xar
Bira cemi‘ bin çi biçûk û kubar

323 Hemî cem‘i bûn nik ‘Ubeydi şeqî
Bi wan da nîşan re'si şahi neqî

324 Bidest xû digirit yek qedîb an zeman
Dida ser dirani Huseyn el eman

325 Diniqrand ewî çendî car bî edeb
Ne tirsa ji wî şahi Fexri ‘Ereb

326 Heman Zeydi Erqem digûtî helî
Ji ser van dirani Huseyni ‘Elî

327 Qedîbi xuya kafiri dînbetal
Nizanî ev e ew Huseyni delal

328 Bi çavî serî xû mi dî çendî car
Ji şahi ‘Ereb dîtina pur kubar

329 Ewî her du lîvî munewwer ji nûr
Dida ser diranî Huseyni sebûr

330 Ne Fir‘ewn û Şeddad û Bû Cehli pîs
Ebed wan nekir wek te fi‘li xebîs

331 Helîne qedîbi xû tu hani han
Bitirse ji wî şah û fexri cihan

332 Li dû wî girîn kir girînek ‘eceb
Digûtî eya qewm û tuxmi ‘Ereb

333 Di puşt kuştina vî şehi ba ‘Ereb
Ne cah û ne rutbe dimîne ebed

334 Ji bû we eya ehli Kûfe yeqîn
Huseyn bû di bid‘ek ji şahi emîn

335 Li nik we diniqrîne kelbi ‘eqûr
Li ser van dirani Huseyni bi nûr

336 Çewan hûn qebûli dikin bittemam
Ji Ibni Ziyad ev qeder intiqam

337 Eger mu'minin hûn bi şahi kerîm
Werin wî qetil kin çû kelbi zemîm

338 Bi ceddi Huseyn wî qeti' kin ji dil
Nehîlin hilîne ebed yek ricil

339 Xelase kesî guh nekir ev meqal
Dibîjî temamen dibûn kerr û lal

340 Cewabeş kesî qet neda der huzûr
Ku belki temamen ji wî kir nufûr

341 Bi derhal li wî iltifat kir ‘Ubeyd
Bi çavi xedeb hem bi kîn û bi keyd

342 Digûtî ki wallahi ya ixtiyar
Seqet te xeber da bi lefzi kubar

343 Eger ixtiyarî nebûna yeqîn
Minî ser hilîna ji cani şîrîn

344 “Xerefte” eya Zeydi Erqem ‘elen
Dixwazî ji min kin evan su û zen

345 Mebe berdili xû evan cumle şan
Bibînî ji min tu çi xaxi giran

346 Tu derkev ji vî mehfela pur kubar
Ku hîja serî te neçûyî bi xar

347 We ger ne qeti‘ kim serî te bi lez
Di vî mehfelî da ki ye bîje ez

348 Herre yabne Erqem herre bîhenek
Ji min vî meqali neke reyb û şek

349 Te fezle xeber da ji xû zîdetir
Bi cuz te ki ye min bike munkedir

350 Herre tu şukur ke bi şukrî cezîl
We ger ne muheqqeq dikim te qetîl

351 Bi lez rabû çû der kurî Erqemî
Ji bû wan digûtî bizanin hemî

352 Di puştî nuha hûn ‘ebîdin temam
Gelek hûn bibînin ji wan intiqam

353 We anî mezin kir ‘Ubeyd û Yezîd
Li ser şeh Huseyni heta bû şehîd

354 Xelase gelî ummeta pur şeqî
Di puştî şehi Kerbelai teqî

355 Ne bîjin ku em mu'minin ba yeqîn
Şefî‘i me ye seyyidil-murselîn

356 Ku belki Yezîd û ‘Ubeydi şenî‘
Di yewmi1-qiyame ji bû we şefî‘

357 Nihayet serî şeh Huseyni imam
Digel van ruûsi xudan ihtiram

358 Birin wan heta şehrî Şami bi lez
Bi rî da dikir wan gelek se‘y û bez

359 Muhafiz li ser wan dibîjin zecir
Yekî pîsi murdari sahib xedir

360 Beraber bi wan ra heta şehrî Şam
Ebed bû kesi qet nekir ihtiram

361 Xelase di Şami duxûl bû zecir
Heta bû duxûl wî dikir pur xedir

362 Heta hate ba wî Yezîdi mirar
Digel Şi‘e û Ehli Beyta kubar

363 Heman gûti bû wî Yezîd ma werak
Bi lez tu ji bû min bibî merdi şak

364 Bide min cewabek ji alî Huseyn
Serî‘en dixwazim ji te şubhi deyn

365 Were hey were ey zecir hani han
Fesîhen bibîje çi ye der cihan

366 Ji min tu xefî qet meke ey resûl
Bi sidq û sefa tu bibî bî fuzûl

367 Çi ye tu bibîje ji bû min bi lez
Dibînim digel te bûye cergebez

368 Mufessel bibîje bike eşkera
Li min tu xefî qet meke der sera

369 Cewab da ki mizgîn li te ey emîr
Di der vî cihani nebî dilkesîr

370 Wurûd bû li ser me Huseyni ‘Elî
Bi hey'et bi zînet çû şemsa celî

371 Beraber kirî hujde merdî kubar
Welî Şî‘ei wî bizan şîst û çar

372 “Fesirna ileyhim” bi emrî emîr
Me gûtî ji bû wî eya dilxetîr

373 Were tu nuzûl be di hukmi me da
Dixwazin ji te tu bikî vî eda

374 Weyaxûd eger tû bixwazî qital
Li ser vî Firatî wesî‘e mecal

375 Qital wî hilanî bi kîn û bi kerb
Dixwest wî bikuşta bi te‘n û bi zerb

376 Me anî qetil kir Huseyn û sehab
Di erdi ‘lraqi dibûn wek kebab

377 Serî wan me anî li wur man cesed
Ji bû wan di dunya nebû qet meded

378 Beraber bi min ra nisa û benîn
Bizane ji min tev esîr in yeqîn

379 Beraber ‘Eliyyi Huseyn e ji dil
Di dest û piyî wî bizan qeyd û xill

380 Bi cuz yek Tufeyli kî nameş
‘Umer Hefîdi hezebri Xuda pur huner

381 Xulase esîr in li nik te temam
Nikarin xeber din ebed der meqam

382 Li dû van meqali zecir bîxilaf
Ji çeşmi Yezîdi dihat qetri av

383 Digûtî ki wellah bi zati celal
Eger min bidîta di weqta qital

384 Mi nedhişt we bikra bi wî ra xedir
Herre der ji vî meclisi ey zecir

385 Rizaa min nîne bi qetla Huseyn
Heta kuştina wî we kir şubhi deyn

386 Herre ey zecir tu ji vî der bi xar
Te dunya li min kir gelek teng û tar

387 Li ser Bin Ziyad le‘neta Zulcelal
Çewan wî şehîd kir Huseyni delal

388 Heman Ibni Qeys çûye der sifri yed
Ji destî Yezîdi nedî qet meded

389 Ku illa ewî le‘netek pur ‘ezîm
Dibir wî ji bû xwe bi qelbek seqîm

390 Bi lez çû heta hate Kûfe yeqîn
Yekayek digû bû ‘Ubeydi le‘în

391 Hemî gûtinî wî Yezîdi mirar
Cemî‘en ‘erizkir li wî kelbi har

392 Nihayet serî şahi deşta ‘lraq
Bi lez wan duxûl kir bi terz û liyaq

393 Heta wan birî ber Yezîdi xebîs
Evî re'si ha pur ‘efîf û nefîs

394 Bi destî Yezîdi hebû yek qedîb
Dida ser dirani Huseyni lebîb

395 Gelek beyt û eş‘ar digûtin rezîl
Ebed ew ne tirsa ji şahi celîl

396 Ebû Burdeti Eslemî der ‘eqeb
Digûtî helî tu qedîb bî edeb

397 Ji ser van diranî ‘ezîzî binûr
Bitirse ji Rebbi Kerîmi Xefûr

398 Nizanî ev e seyyidi heşt cinan
Wuha bû riwayet ji Fexri Cihan

399 Bi lez rabû çû der evî Eslemî
Ji bû wan digûtî bizanin hemî

400 Nebîjin ku em mu'minin bittemam
Şefa‘et bibînin ji ceddi Imam

401 Xelase gelî ummeta eşqiya
Xesîmi we ye seyyidi esfiya

402 Nexasim eger Fatime merziyye
Di yewmu'l-qiyame bikit gaziye

403 Ku ye‘nî bira bîn huzûra Xuda
Ku da em yekayek ji hev bin cuda

404 Cewaba we andem çi ye der huzûr
Eger Ehli Beyti bikin pur nufûr

405 Nizanin di dunya û hem der qiyam
Eger ne Muhemmed ‘eleyhisselam

406 Bibit rehberî me temamen ji dil
Di ewwel di axir dibin em xecil

## Mewzi‘u’t-tederru‘i we'l-ibtihal[88]

407 Ilahî bikî rehberî min emîn
Mi dûr kî ji vî firqeya muznibîn

408 Eger çi şefa‘et me pur kir bedîd
Ricai dikim min ‘efû kî Mecîd

409 Çikû ez muhibbim bi beyta Resûl
Eger çi dibîjim kelami fuzûl

410 Bi qelb û bi dil ez muhibb im eman
Ji bû Ehli Beyta şehi ins û can

411 Çewana muhibb im bi qelbi şewat
Şefî‘i me ye şahi 'alî sifat

412 Li ser me ji ferza ne ey girdigar
Ku em hesbikin Ehli Beyta kubar

413 Çikû te ji mehza ‘edem ba yeqîn
Me çîkir ji bû şahi beyta zemîn

414 Li me lazim e hubbi Fexri 'Ereb
Di ber wî ebed em nekin bîedeb

415 Nexasim di ber Ehli Beyta Hebîb
Gerek em nehîlin bibin dilkebîb

416 Gelû wî çewa kin ‘Ubeyd û Yezîd
Ji desti şehi Kerbelai wehîd

417 Nizanim eger efxerî neh felek
Bibûre ji wan ew bi rehma gelek

418 Çikû rehmetek pur mezin bû heye
Dirîje li ser wî kesî hewce ye

419 Ji wan hewcetir min nedî der cihan
Ji bû rehmeta wî şehi ins û can

420 E jî hewce me ey şehi bawefa
Birîje li ser min eya Mustefa

421 Tu rehma xû ye pur bi cûda ‘emîm
Mi nespîre nefsa minî pur zemîm

422 Eger çi gunehkar û pur zillet im
Welîkin gunehkari ev ummet im

423 Mi pur kirne ‘isyan hezaran sunûf
Ji enwa‘i qubhi bizan sed ulûf

424 Şefa‘et bike Nûriyî bîmedar
Mehîle di werta gunah de tu car

425 Bi yumna Hesen ba Huseyni şehîd
Bibûre ji Necli cunûni belîd

426 Eger tu nebûrî ji wî ey nebî
Ki ye tî bibûre ji Necli xebî

---

[88] “Babeta hêvî û gaziyan”

427 Eya Fexri ‘Alem bi zat û sifat
Qesem ez dixûm ta bi rûja memat

428 Muhibb im bi te her dem û sa‘etî
Gerek tu mi ‘edd kî ji vî ummetî

429 Gelek ez feqîr im bi cah û ruteb
Dexîl im li ber babi Fexrî ‘Ereb

430 Bibûre ji vî Nûriyî dilbikul
Bide ber wî tûrahî ehde's-subul

431 Eger çi bi nepaki yû bedfi‘al
Dibînî şefa‘et bikî der meal

432 We ger na hezînim di sal û zeman
Ditirsim nebînim şehi ruhi can

433 Çikû ez dizanim bi ev rûsiya
Nikarim ku bîm hezreta Kibriya

434 Ne şerm û heya bû te ey zenbidar
Şeb û rûz dikî van zunûbî kubar

435 Nizanî demek hewcei şahi dîn
Dibî Necli Ewhed eya dilbirîn

436 Xû bavîje dergahi wî subh û şam
Ku belki şefa‘et bikit der qiyam

437 Bike zarezar tu dem û sa‘etî
Rica xû bike ez şehi ummetî

438 Bibîje eya sedri ‘alî himem
Evî Necli Ewhed bi îş û elem

439 Mehîle di behra gunahi xebîs
Eya şahi dîni mubîni nefîs

440 Şefa‘et bike qismetî min hebîb
Bibûre ki vî mucrimi dilkebîb

441 Nihayet şefa‘et dixwazim yeqîn
Mi derxî ji nîv firqeya muznibîn

442 Bi cuz babi te ez nikarim ebed
Biçim ber derî hîç kes bîmeded

## Sewqi Pîşî

443 Were Necli Ewhed tu bes iztirab
Bike te dil û sîne kir wek kebab

444 Tu meqsed bikîşe “lima nehnu fî”
Beyan ke li me tu meke qet xefî

445 Birîje heraret ji qelb û ciger
Eya Nûriyî şafi‘î bîmefer

446 Mufessel bike sewqi pîşî rewan
Di behsa serî wî Huseyni zeman

447 Çewan bû di weqta birin mehfelî
Bi diqqet beyan ke tu vî welwelî

448 Ne‘em gûtî Nûrî ji bû sailî
Were istima‘ ke bi qelb û dilî

449 Çi weqta birin ba Yezîdi pelîd
Serî wî şehi Kerbelai wehîd

450 Setir wî dikir ev serî namidar
Ji ehl û ji ewladî şahi kubar

451 Sekîne digel Fatime zîcemal
Bi derhal didîtin şehi bakemal

452 Gelek wan girîn kir girînek 'eceb
Nedîtî çu kes ev girîn der ‘Ereb

453 Heta hate der cumle ehli Yezîd
Ji bû kerb û vî hesreta pur şedîd

454 Gelek welwele wan dikir der meqam
Çu kes qet nemabû di nîv şehri Şam

455 Ku illa ewan me'temek pur mezin
Dikir bû hefîdi şehi ins û cin

456 “Fe bilhemdi” gûtin gelû der cihan
Tu kafir hene wek Yezîd bîeman

457 Benati Resûli Xuda kir esîr
Çewan wî xelas be di rûja ‘esîr

458 Emir kir bibin wan bi alî herîm
Nehîlin ebed ew bibin dilseqîm

459 Li dû wî emir kir ku bînin ‘Elîyy
Hefîdi ‘Eliyyi Weliyyi Celîyy

460 Bi derhal duxûl bû ‘Elî an zeman
Di dest û piyî wî quyûdi giran

461 Heta hate ba wî bi derd û bi îş
Nikarî biçit ez quyûdan bi pîş

462 Digûtî ki wellahi ey dilxedar
Eger min bidîta Resûli kubar

463 Di vî haletî da bi qeyd û bi xil
Gelek ew ji bû min dibû dilbikul

464 Welîkin gelek zen dikim ey Yezîd
Te qelb û dilî xû kirî wek hedîd

465 Li ser Ehli Beyti ji buxz û ji kîn
Heta te hilanîn hemî ecme‘in

466 Te nezrek mezin kir şeb û rûj û an
Heta fursetî tu bibînî heman

467 Ji bû Ehli Beytî qetil kî hemî
Eya ehli narî seqer pur xemî

468 Tedarek bike xû ji bû narî kûr
Tu dûrî ji rehma Xuda bî qusûr

469 Çewan min dihîlî di xilli giran
Nizanî ez im ehli şahi cihan

470 Ne‘em gûtî bû wî we tesdîqi kir
Vekin qeyd û xilli ‘Elî emrî kir

471 We hem wî bi alî xû bir wî demî
Nehîştî bibîne ebed yek xemî

472 Ji bû ra gelek merheba gû ji dil
Tu derxe ji qelb û dilet xişş û xil

473 Qesem pur dixûm ez bi zati celal
Me agah nebû qet bi herb û qital

474 Heta wî ‘Ubeydi le‘îni cehûl
Dişandî zecir wî xebîsi resûl

475 Ebed min nizanî Huseyn bû şehîd
Bi cuz wî şeqiyyi le‘ini şedîd

476 Le‘ini ‘Ubeyd pur cihan teng û tar
Li min kir bi qetla Huseyni kubar

477 Welîkin gelek min dixwestî ji wî
Di hukmi mi da pur bimeşya qewî

478 Çira çunkî wî qet ebed ihtiram
Nekir wî ji bû min bi qesd û meram

479 Te‘erruz dikir wî di hukmi mi da
Dixwestî temamen ji min bin cuda

480 Ne qedr û ne me‘rifetek wî ebed
Nekir wî ji bû min bi muhr û sened

481 Eger wî bikirna ji bû min qedir
Çira wî bihata serî ev xedir

482 Çi hate serî wî bizane yeqîn
Ji dest û zebanî wî hat ecme‘în

483 Cewab da ‘Elî bû Yezîd der ‘eqeb
Te fezle xeber da eya bî edeb

484 Nizanî çi bîtin di nefs û zemîn
Kitabet Xuda kir di lewhi mubîn

485 Berî xilqeta ‘alemî bittemam
Xuda kir wehî bû ‘Eleyhisselam

486 Çikû ev yesîre li nik girdigar
Mebîje evan gûtinî bîşumar

487 Ku da hûn teessuf nekin yek nefes
Di hukmi Xuda da nebin hûn xeses

488 Di exz û ‘etaî Xudayi Kerîm
Mebin cangiran hûn bi qelbi selîm

489 Xulase qeti‘ kir ‘Elî ev kelam
Ji ber giryei mehfela der meqam

490 Nikarî xeber de ji derdî mezin
Ku çîbû li ehli şehi ins û cin

491 Li dû wî emir kir ku yek menzelek
Muheyya bikin bû şehi çavbelek

492 Digel wan herîmi şehi Kerbela
Mehîlin eziyet bibînin ela

493 “Di ecra lehum kullema yunfiqûn”
Li ser ev musîbet dibûn sabirûn

494 Welî ev Yezîdi bi kerb û bi kîn
Muheqqeq bi cuz zîneta ‘abîdîn

495 Nexwarî tu xwarin şeb û rûz û an
Ji bû kes nekit nefreti der cihan

496 Bizan rûjekî gazî kir bû xeda
Dixûstî wezîfe bikîtin eda

497 Di gel xû birî wî birayi ‘Umer
Sexîrî delalî bi fezl û huner

498 Ji bûna Yezîdi hebû yek weled
Musemma bi Xalid evî bî meded

499 Bi ‘umr û qiyafet wekî hev bizan
Ne kîm û ne zîde ebed yek ji wan

500 Heman der ‘eqeb ku Yezîd bû ‘Umer
Were tu rewan be bi fezl û huner

501 Eger tu dikarî bikî tu qital
Bi Xalid ra ey ‘Umeri çavxezal

502 Werin hûn di vir da bikin ceng û herb
Li hev din gelek hûn bi te‘n û bi zerb

503 Cewab da ‘Umer bû Yezîdi pelîd
Bide min sikkînek welî pur şedîd

504 Bide Xalidi xû sikkînek kubar
Çewan meclisi lî bikim teng û tar

505 Ku da tû nebîjî ebed der cihan
Nemaye çû kes bû şehi ins û can

506 Nizanî eger yek tufeylek sexîr
Bimîne ji ehli Beşîrî Nezîr

507 Bi sedqat ji we zîdetir ey Yezîd
Fetih tu meke vî derî bî kelîd

508 Yezîd wî bi singa xû ve zemmi kir
Li nav her du burhî wî teqbîli kir

509 Li dû wî digûtî sedeqte ‘Umer
Ji wan gûtinî te hemî serteser

510 Dizanim hewwiye ji heyyi kubar
Dibit şinşine ez ezel hate xwar

511 We be‘d û li Nu‘man emir kir Yezîd
Xu bijdîne yabne’l-Beşîr pur şedîd

512 Bişîne bi alî Medînî bi lez
Bi ehli Nebî ra bi se‘y û bi bez

513 Zilamek emîn tu bişîn el ‘ecel
Emanet bike da nebit pur xelel

514 Li dû wî weda‘ kir ‘Elî bin Huseyn
Gelek wî rica jî dikir şubhi deyn

515 We hem wî rica jî dikir bî hisab
Dexîl im li ber babî ‘alî cenab

516 Ki wellahi ageh mi nîne ebed
Di qetla Imami bi muhr û sened

517 Welîkin çi hîna diçî nîv herem
Tu deyne li erda muqeddes qedem

518 Ki katibnî ey bid‘ei tahire
Ji bû te bişînim gelek faxire

519 Çi nuqsan bibit ez hewaic eman
Newîsendeke tu di weqt û zeman

520 Nihayet çiqas le‘netî girdigar
Li ser Bin Ziyad bin di leyl û nehar

521 Mudaxil me nîne di ehli nebî
Bi xeyr wî ‘Ubeydi şeqiyyi xebî

522 Tecasur kirî wî bi fi‘lî kubar
Bi qetla Huseyni cihan kir di tar

523 Bi ‘erş û bi ferşi Xudayi kerîm
Bi cah û bi qedri Resûli ‘ezîm

524 Ne ‘ilm û ne ageh ebed min nebû
Di qetla Huseyn da cihan berze bû

525 Çi zahir çi batin çi leyl û nehar
Dinûşim şeraba firaqa kubar

526 Welîkin çi bîjim te bawer niye
Ji eqsam û sûndî me pur xwariye

527 Eger çi xerab im meke tu ‘elen
Ji min ev qeder ya ‘Elî suûzen

528 Nihayet Xuda kir muqedder welî
Ji weqta ezel ser Huseyni ‘Elî

529 Gerek tu sebir kî bi sebra cemîl
Li ser ev musîbet bibî tu delîl

530 We be‘d û weda‘ kir ‘Elî der ‘eqeb
Diçû ew bi se‘y û bi lez rûz û şeb

531 Heta bû duxûl der Medîne bi lez
Ebed wî bi rî da nekir cergebez

532 Bi lez Fatime ez Sekîne sual
Dikir wî bi fezl û huner bakemal

533 Digûtî eya uxti min ev recûl
Nehîştî bi rî da bibin dilbikul

534 Ku ye‘nî hefîzi me ez şehri Şam
Gelek wî heta vir dikir ihtiram

535 Gelû wî çibe ger tu tiştek mezin
Bidî wî ji bû şahi ins û cin

536 Çikû ev recûl hurmetek bîqeder
Ji bû me bi rî da dikir bîkeder

537 Were tû bidî ger dixwazî ji dil
Bi dil xweş verîke meke wî xecil

538 Cewab da Sekîne cewabek kubar
Dixwazim bidim Dimlec û hem siwar

539 Bexîlî qe nakim bitiştek ebed
Ji bû wî hefîzi bi muhr û sened

540 Xulase Sekîne ji destî şerîf
Deraniyye cûtek siwarî letîf

541 Emir kir li ser Fatime zîcemal
Were tû bişîne siwarî bixal

542 Bi alî hefîzi mei baedeb
Evan hedye û hem siwarî Heleb

543 Ne‘em gûtî bû wî Fatime hezîn
Dişandî ji bûna hefîzi emîn

544 Welîkin digel Dimleci pur kubar
Dişandî ji bûna hefîz yadîgar

545 Nihayet heta çû gihîşte hefîz
Zilami emîni ne fezz û xelîz

546 Vegîrandî cumle hediyan temam
Digûti bi cahi resûli enam

547 Qebûli qe nakim evan cumleyan
Eger xizmetî kim hezaran zeman

548 Çikû min ji bûna Xuda hem resûl
Kirî ev senî‘e çewan kim qebûl

549 Eger rexbetek min di dunyai dûn
Hebûna min î pur bixwesta dufûn

550 Welîkin me rexbet heye der qiyam
Ki ceddi we derbaz bikit me temam

551 Medara hemî ‘alemî ba yeqîn
Li ser ceddi we seyyidi'l-murselîn

552 Ricai dikim ez ji we bîguman
Jibîr hûn nekin min di weqt û zeman

553 We be‘d û weda‘ kir ji wan ecme‘în
Heta hate ba wî Yezîdi kemîn

554 ‘Eriz kir hemî fi‘l û ef‘ali qenc
Ne kerb û eziyyet ne te‘b û ne renc

555 Nihayet ku bû gûtinî wî temam
Li nik wî Yezîdi şeqî wesselam

556 Ditirsa gelek ev Yezîdi mirar
Ji ber Ehli Beyti dibû teng û tar

557 Çikû ew bi fikra xû ya qasire
Dizane bi vî ‘itreta tahire

558 Çi hîna sema‘ kin hedîsa şewat
Ku çîbû li ser şett û nehri Firat

559 Ebed lehzeyek bû şehi Kerbela
Xû te‘xîri nakin bi heyy û hela

560 Bi şeb ta seher wî ebed xew nekir
Ji ber Ehli Beyti dibû munkedir

561 Ne xûrdûne xwarin şeb û rûz û an
Ji tirsa şehinşahi axir zeman

562 Xulase evî xaini bîwefa
Gelek rûsiyah e ji ber Mustefa

563 Xitam bû di durru'l-yetîm serteser
Bi cahi Muhemmed resûli beşer

564 Di sali hezari we sî sed yeqîn
Ku bûrî ji tarîxi şahi emîn

565 Digel pence sali ‘edîdî di raz
Me zanî ji hicra reîsi Hicaz

566 We hem pînc sene çû bila reyb û şek
Mufessel me gû ev qeder bîhenek

567 We hem der cemazî duwan bû temam
Li ser rûhi Ehmed selat û selam

568 Bizan çarde rûzî mubarek heman
Dibûrî ji mahi cemazî duwan

569 Di sa‘ati çari ji rûjî selas
Xitam bû di durru'l-yetîm bîmeras

## Mewzi‘u't-tederru‘i we'l-ibtihal[89]

570 Xudaya bi yumna şehi Kerbela
Bi cahi Hesen sibti şahi ‘ula

571 Bi qedri ‘Elî zîneta ‘Abidîn
Mi nîxî di nîv firqeya muznibîn

572 Eger mucrimek pur xedar im
Xuda bidî xatirî şahi rahi Huda

573 Çikû ez dinalim şeb û rûz û an
Ji kerba ku dîtî Huseyni zeman

574 Li ser vî Firati mubarek temîz
Şehîd bû Imami wehîdi ‘ezîz

575 Çewan te‘ni kir kafiri rûsiya
Bi qesd bi kîn evserî eşqiya

576 Li sibti hebîb efxerî neh felek
Şebabi cinani şehi çavbelek

577 Dema tîte fikr û xiyala Nuceyl
Dibare ji çeşm û beser xûn çû seyl

578 Welîkin çi bîjim Xuda ez ezel
Wuhayî emir kir “kema fî’l-ecel”

579 Ji lew ez nikarim xeberdim yeqîn
Di vî mes'elî da eya dûrebîn

580 We ger na li ser vî Nuceyli xebî
Gelek lazim e bû hefîdi nebî

581 Çû xurd û xuwarin heram ke ebed
Binale ji cerg û kebed bî‘eded

582 Bibîje Huseyna Huseyni zeman
Tu wî qurreti ‘eyni şahi cihan

583 Şefa‘et bike Nûriyî bîmedar
Mehîle di werta guna de tu car

584 Huseyna bi re's û bi çeşmi belek
Bi ceddi te yi efxerî neh felek

585 Evan çendî elfazî şîrîn zerîn
Me anîne nezmi bi qelbi hezîn

586 Ji ber hubbi te bid‘ei tahire
Me tenzîmi kir ev qeder zahire

587 Çikû ummeta seyyidi ins û cin
Gelek jî nizanin bi qetla mezin

588 Me anî beyan kir ku ev Kerbela
Cihî meqtela şeh Huseyn e ela

589 Ji bû ew bizanin şehîd bû Huseyn
Ku da me’temi ew bikin şubhi deyn

590 Muherrem dema deh bibûrin temam
Bikin me’temi cumlei xas û ‘am

591 Bibîjin hewar e hewar e hewar
Werin me’temî bû şehi namidar

[89] “Babeta hêvî û gaziyan"

592 Şehîd bû di ev qurreti ‘eyni pak
Di erdi ‘Iraqi li ser rûyi xak

593 Ne bab û ne da hem ne qewm û bira
Şehîd bû di reyhanei heşt sera

594 Ilahî bi reyhanei cenneti
Tu Nûrî nehîlî di nîv zehmetî

595 Eger çi xerab e bibûre ji wî
Bide xatirî Mustefayî xû yî

596 Ji cada Hebîbi xû yi nazidar
Megire berî wî Xudaya tu car

597 Hifiz ke ji ehwali yewmi'l-qiyam
Bi cahi Muhemmed ‘eleyhissselam

598 Çikû ser xuşû bîdurûne reqîb
Ji ehwal û extari rûja ‘ecîb

599 Dizanim di yewmi’l-qiyam da û bab
Nikarin xelas kin evî bî sewab

600 Ku illa şehinşahi beyt û hetîm
Şefa‘et bikit vî Nuceyli seqîm

601 Ne ‘ilm û ‘emel min ne ‘ehdek wesîq
Ricai dikim ez ji şahi heqîq

602 Bibit rehberî min di yewmi’n-nuşûr
Eger çi gunehkar im û zûqusûr

603 Bide xatirî şahi deşta ‘Iraq
Nuceyli xebî mudnifi dilmezaq

604 Me çend beyti anî wezin bîfutûr
Di behsa şehi Kerbelai weqûr

605 Xûş e bî newîsende ser bergi gul
Evan çendî beyti rezîni bikul

606 Bixûnit li ser ‘endelîbi hezîn
Bi ‘işq û heraret bi ah û enîn

607 Welî hûr û wildani vî dewhei
Binalin bikalin bi vî nexmei

608 Temamen bi hev ra bibîn ey qedîr
Bi xefrî gunahi Nuceyli feqîr

609 Çikû ew bi beyt û bi şi‘rî xefî
Dinale di wesfi şehidi wefî

610 Ilahî evî mudnifi dilxedar
Bibexşi şehi Kerbelai kubar

611 Mesûze dilî wî bi narî elîm
Xudaya bi cahi Resûli ‘ezîm

612 Nikarit li ser narî dûzex heman
Bikîşit eziyyet eman sed eman

613 Eger çi xerab e ji nîv ummetî
Nedî ber wî ya Reb ebed zehmetî

614. Bibûre ji wî tu bi rehma giran
Birîje li ser tu ‘etai rewan

615 Evî Necli Ewhed feqîrî feqîr
Bibexşî Muhemmed beşîrî nezîr

616 Evan çendî rûjî ‘edîdî ‘edîd
Gelek surxi dem wî dibarî şedîd

617 Heraret ji qelb û ciger tîte der
Bi ah û bi nalîn disûze beşer

618 Bide xatirî beyt û şi‘rî temîz
Ku telfiqi kir çendî rûjî ‘ezîz

619 Evî mudnifi bî sukûn û medar
Nuceyli xebiyyi hesîfi mirar

620 Eger ne ji hubba şehi dilbirîn
Me tenzîmi nedkir çû beyti metîn

621 Gelek min vexwarî bi dil surxi dem
Bi te‘b û eziyyet bi îş û elem

622 Dizanim ku yek mutribî der cihan
Biçit ber derî hakimi ev zeman

623 Bisûze dil û sîn û cerg û hinav
Wekî vî Nuceyli xebî hîn û gav

624 Bixwaze ji wî dirhemek bîhenek
Ne zîde ne kem mutribî nayi tek

625 Didî ser serî ev emîrî celîl
Musemme xû nake bi navi bexîl

626 Te haşa ji zati cemili’s-sifat
Ku derbaz nekit min di yewmi’l-memat

627 Bikeyf û surûr û bizewq û sefa
Ebed ev l inik mim qe nabit xefa

628 Dizanim ku rehma Xudayî qedîr
Kesîr e kesîr e kesîr e kesîr

629 Nexasim li ser mucrimi bînewa
Wekî min di le‘b û di lehw û hewa

630 Eger ev Xudayî ‘ezîm û metîn
Ku rehmî birîje li ser muznibîn

631 Ihate dikit cumleiwan temam
Ebed yek ji ber fewti nabit heman

632 Heta ev ‘ezazîli mel‘uni har
Ricai dikit bû wî nuqtek kubar

633 Çewan bîumîd ez bibim ey Ehed
Ji vî rehmeta bîhisab û ‘eded

634 Ku madame şeytani pîsi muzirr
Dixwazit yekî nuqte ez rehmi purr

635 Digel ev xeber pîstirî kainat
Dixwazit bi rehma Xuda bit necat

636 Çi qasî xerab im welî bende yem
Li ber dergehi rehmetî tûle yem

637 Ne laiq dibînim eya girdigar
Ku derbaz nekî min ji narî kubar

638 Eger rûsiyah im bi zenbi giran
Bidî xatirî şahi axirzeman

639 Çikû ez dibînim gelek mu‘teber
Nebiyyi ‘elemdarî cumle beşer

640 Li nik te eya xaliqi ins û cin
Bi xefrî ji min van gunahi mezin

641 Eger tu nexefrî Nuceyli seqîm
Dizanî şehi rukn û beyt û hetîm

642 Ebed razî nabit bi te‘zîbi min
Ku illa bixefrî gunahi di min

643 Çikû te wehî kir li ser şahi dîn
Ku razî bikim te mebe dilhezîn

644 Çewan ew dibe şadiman ey Xuda
Ji zumra Muhammed bibim ez cuda

645 Were Necli Ewhed were rûsiya
Ji heddi xû zîde meçe bîheya

646 Te derbazî kir çendî carî ‘edîd
Di zenb û guna de di emrî şedîd

647 Ne quwwet ne taqet ji bû te ebed
Di vî mes’elî da bi muhr û sened

648 Çira tû te‘erruz dikî bîedeb
Xû bavîje dergahi şahi ‘Ereb

649 Ku belki şefa‘et bikit te ji dil
Nehîle di yewmil-qiyam bîxecil

650 Çikû rehberi cumle ‘alem bizan
Muhemmed şehinşahi axirzeman

651 Bi Adem bi Idrîs û Nûhi nebi
Bixefrî Xudaya Nuceyli xebî

652 Bi Hûd û bi Salih Ibrahim Xelîl
Isma‘îl û Lûti nebiyyi celil

653 Bi Ishaq û Ye‘qûbi sahib xeter
Bi Yûnus bi Eyyûbi sahib zerer

654 Şu‘eyb û bi Mûsa bi Harûni xûb
Mehû kî ji min van bi harî zunûb

655 Bi Dawûd Suleyman û Zilkifli pak
Mi riswa nekî Rebbi ser rûyi xak

656 Bi Ilyas û Welyes‘i paki delal
Bi Yûsuf xudawendî sahib cemal

657 Zekerya bi Yehya bi ‘Îsa Mesîh
Bi Circîs Muhemmed resûli fesih

658 Bibûre ji min tu bi van efzelan
Hilîne ji ser min zunûbî giran

659 Cesaret mekir der cihani xerab
Mebûrî bi lez ‘umrekî bîsewab

660 Bi xeflet hemî çûne fikr û xiyal
Ebed min nekir bû şehi layezal

661 Eger min bikirna xiyal û fikir
Çira der cihanî dibûm munkedir

662 Welîkin şehi Kerbela bîhenek
Şefî‘i min e ew bila reyb û şek

663 Çira çûnki min çendî rûjî ‘edîd
Di ber wî dixwar surxi demmi şedîd

664 Ne mexfî li nik min şehidi ‘Iraq
Ku derbaz nekit min bi terz û liyaq

665 Çikû bid‘ekî tahir e bîxilaf
Rûh û can fida bin şeb û rûz û gav

666 Were tu qeti‘ ke Nuceyli xebî
Nizanî ev e ew hefıdî nebî

667 Eger ew te derbaz nekit zînihar
Bi van beyt û eş‘arî şîrîn kubar

668 Ki ye iltifati bikit ey sexîf
Digel te Nuceyli feqîrî ze‘îf

669 Were bes dirîj ke tu benda du‘a
Bike hemd û şukr û senai Xuda

670 Bibîje Ilahî ez im bîedeb
Bibûre ji min tu bi fexrî ‘Ereb

671 Yedî xû dirîj ke bi bal girdigar
Bi diqqet du‘a ke di leyl û Nehar

672 Bibîje Xudaya Xudayi Xeffar
Bixefrînî min mucrimi dilxedar

673 Digel da û bab û we her çar bira
Di der vî cihani ji bû min çira

674 Digel qewm û etba‘ û exwali hem
Xudaya nedî wan ebed hemm û xem

675 Bixefrîn kesî ku bixûne ji dil
Di vî meclisî da bila xişş û xil

676 Bike hedye ew fatihek bittemam
Ji bû min feqîrî hezîn wesselam

677 Digel yek selat û selami qedir
Bide ser resûli ‘ezîmu’l-fexir

678 Xuda der qiyam wî bike şadiman
Bi cahi Muhemmed şehi ins û can

679 Ilahî ‘efû ke min û da û bab
Di heşrî hilîne li ser min hisab

## 4.4. MESNEWIYA ŞEMSEDÎNÊ TACIR

1 Da hemd û senai girdigarî
Bînin ji xu ra çû wur di carî

2 Hemdi te bikîn ji bû xu ‘adet
Bilcumle bikîn ji bû te ta‘et

3 Barî ji te ra mutî‘idar în
Bilcumle ji te umîdiwar în

4 Hildî ku nebîn çu huzn û xewfi
Serbesti biçîn hemî bi keyfi

5 Azadi bikey hemî bi şefqet
Da cumle hemî biçîne cennet

6 Barî tu dizani şahi cana
Hîna bi şeref çû asimana

7 “Lewlake” te kirye yadigarî
Lutf û kerema te bûye car

8 Qewli ku tu bîjî dî eda kim
Kerbi ji dili te dî cuda kim

9 Kanî çi ye derdi li te bîje
Meqsed te çi ye hemî birîje

10 ‘Ehda mi heye ezi te şa kim
Meqsed te çiye ezî eda kim

11 Hîna ku resûli ins û cana
Dî şefqe ji şahi ‘erş û bana

12 Gûtî ku rica min î bi diqqet
Ez Bariyî pur bişefq û rehmet

13 ‘Efwa xû bidî gunahikara
Da şermi nebin li ber neyara

14 Ey sahibi ‘erş û bani ‘ulya
Wey fatiri hef sema û dunya

15 Navi te ezel Rehîm û Rehman
Hukmi te heye di weqt û ezman

16 Hîvî me heye feqîr û jara
Derbazî bikey gunahikara

17 ‘Efwa te pur e hemî feqîr in
Der zenb û xeta hemî esîr in

18 Lutfa ku te da resûli e‘zem
Mujda ku te da hebîbi Ekrem

19 ‘Efwa mi pir e xeta xefî ne
Mujde ji te ra bu wan bigîne

20 Şirki ji mi ra nekin beyan e
‘Efwa me hemî ji bû xeta ne

21 Wer na dî bibin te’ami narî
Teblîx biket kelamî Barî

22 Em hîvî dikin ji zati Ekrem
Sed carî ji zati Ismi E‘zem

23 Kufri zerî ber me em geda ne
Bîşubhe ku cumle can fida ne

24 Laiq te nehîn şerîk û emsal
Dûr in ji te cumle qîl û hem qal

25 Subhan ji te ra qedîmî lareyb
Laiq niye bû te neqs û hem ‘eyb

26 Dûr ke ji me tu xeta û ‘emda
Derbazî bike tu me gewenda

27 Ehmed ji me ra bikîte rehber
Ref ref bu wî ra bibîn beraber

28 Wer na dî bibin rezîli axir
Ser ta bi qedem ‘ezabi agir

29 Barî tu Nuceyli bed ‘efû key
Der baxi ne‘îmi rû be rû key

**Temme'l-wesfu we telîhi't-tesliyetu[90]**

30 Lazim ku hinek selati Barî
Ber Ehmedi kin bi yadigarî

31 Fexr û şerefa xû em bu wî kin
Sed hîvî rica hemî ji wî kin

32 Bî şubhe şefî'e rûzi axir
Derbaz me diket ji nîvi agir

33 Ger ew nebû sema heta 'erş
Ev hef tebeqi serayî ta ferş

34 Bîşubhe mehal e bî wucûdi
Rewneq keşifi ji ber şuhûdi

35 Lewlake dema dibûyî zahir
Erwah û felek dibûne hazir

36 Lew lazim ser me Ibn-i Adem
Em hedye bikin li Fexr-i 'Alem

37 Hindî ku hebin selati Barî
Em jîre bikîne yadigarî

38 Çunkî wî Xudayî layezalî
Rehman û Rehîm û Zulcelalî

39 Wî gel meleka selati ekber
Dayîne li ser nebiyyî enwer

40 Emrî me kirî li ser selati
Da em pî bibin xuyî Necati

41 Teslîm û selami emri Barî
Em cumle bikîne yadigarî

42 Ya Reb tu bidî selati e'zem
Ser wî nebiyyî xu yî mu'ezzem

43 'Edda nefesi hemî nufûsa
Wek mûyî hebin li ser ruûsa

44 Wek axûri mali berr û behra
Wek dar û beri hemî li sehra

45 Ya reb çi buhûr û nehri carî
Ya Reb bi çi tiştî 'ilmewarî

46 Sed carî muza'efet ne carek
Ev 'edd û 'eded hemî bi carek

47 Tekrari bibit selati carî
Bîhedd û hisab û bîşumarî

48 Der her nefesi hemî bi tekrar
Xalî nebitin hemî biejmar

49 Bilcumle li ser resûli ekrem
Xalî nebitin li ser wî her dem

[90] "Wesifkirin qediya dora selatxwendinê""

50. Ya Reb me xîra van selata

Mehrûmi nekî di nîv cıvata

51 Amîne bibîn kesi diyar e

Azadi bibin hemî ji nar e

52 Ev **Necl**a feqîr û pur hezîn e

Der xatimei meded bişîne

53 Barî tu **Nuceyli** bed ‘efû key

Der baxi ne‘îmi rû be rû key

## Temmeti’t-tesliyetu we telîhe’l-hikayetu ‘Elauddînî ebî’ş-Şammatî[91]

54 Guhbidin bi me ra gelî hevala
Guhdari bibin li qîl û qala

55 Em ketne zemani qerni axir
Hindî ku hebin feqîr û tacir

56 Kerba me hemî bi mulk û mal e
Sûnd û derew û bi qîl û qal e

57 Herkes bi fesadiyî ‘emeldar
Xurd û ‘emeli dikin sutûxwar

58 Banqai hukûmeti pîş in
Herkes ji xu ra pera dikîşin

59 Hay nîne selef riba ‘ezab in
Axir nefesi ku malxerab in

60 Kerb û kederi hemî bi mal e
Nabîjin heram e yan helal e

61 Ya Reb nedî ber me vî heramî
“Amîn” hûn bibîn hemî temamî

62 Lakin guhbidin ku ez beyan kim
Hali selefi beri ‘eyan kim

63 Herkes bi feqîri yû tucarî
Bî hîl û derew bi dil neyarî

64 Kesba xû dikin wekî birayî
‘Ilm û ‘emeli di bîriyayî

65 Lew bûne xudani mulk û mala
Misli me nebûn di qîl û qala

66 Tev bûne tucari berr û behra
Serfa xû dikin di gund û şerha

67 Serfa xû dikin di gewheri pur
Hin mas û hinek cewahir û dur

68 Hin cariyû hin ‘ebîd û kûle
Hin qezz û herîr û heyte hûle

69 Dîbac û lefaif û qedîfe
Her weqt û zeman ev e wezîfe

70 Kari ku dikin hemî helalî
Bî fitn û fesada mulk û malî

71 Bîsûnd û derew meqali fasid
Kesba xû dikin bila mu‘anid

72 Rûjiyy û limîj û hecc û i‘sar
Qet nafewutin li qismi tuccar

73 Lew bûne xudani mulk û malî
Serbesti diçîn huzûra ‘alî

74 Guhdari bibin gelî cema‘et
Ez bîjim ji bû we yek hikayet

75 Qenctir ji me ra ji kîn û xeybi
Em bavîne muslima çi ‘eybi

[91] “Selatxwendin qediya dora çîroka ‘Elauddîn ebi’ş-Şammatî ye”

76 Xeybet ku heram e kî buxwazit
Der nari cehîmi dî bibazit

77 Laiq niye meclisa ku hazir
Can û cesedi xû tîxe agir

78 Ey yar û birayî meclisa min
Guhdarî bikin hikayeta min

79 Kanî bi çi terzî tîte gûtin
Can û cigeri we bîte sûtin

80 Gava ku Xuda me da cihani
Mutleq wî ji bû yî imtihani

81 Da keşfi bibit xerabû qencî
Zahir bibitin beyaz û zencî

82 Hindek rûsiya ne hin beyaz in
Hindek jî feqîr û rût û taz in

83 Hindek jî bimal û mulk û dewlet
Hindek jî biîş û kerb û hesret

84 Guhdari bibin ku ez bibîjim
Her çî ku heye ezî birîjim

85 Yek merde hebû tucari Misri
Ba ‘izz û menal û naz û fexri

86 Misli wî nebûn bi mal û dewlet
Hem ‘eql û feraset û belaxet

87 Esdeqtirî cumla can û kala
Eksertiri wan bi mulk û mala

88 Heşm û xedem û ‘ebîd û carî
Ba cûd û sexawet û medarî

89 Mehbûb e li nik qerîb û yara
Serdar e li ser hemî tucara

90 Bû wî hebû yek jinek zerafet
Pur husn û cemal û pur melahet

91 Mehbûb e li nik wî her dem û gav
Esl û tese ye bi da û hem bav

92 Lakin ji teref Xuda tebarek
Ewladî nebûn bitûn bi carek

93 Çil sali ‘umur kirî helali
Ewladî nebûn ji bû delali

94 Navi wî tucari Şemsedîn bû
Pur ‘eql û fesahet û mekîn bû

95 Rûjek wî li şirket û dikani
Dîtî ku tucar hemî gihani

96 Bilcumle selam kirîn temamî
Pur heşm û heşem di wî meqamî

97 Redda wan dikir hemî bi hurmet
Pur keyf û sefa ewî bi diqqet

98 Rûniştin li nik wî tev seraser
Her yek weledi wî pî beraber

99 Her kes bi tebayî çûn dikana
Rûniştin li merteb û sukana

100 Ahîn û keser kirî bi imdad
Bilcumle hemî ji bû yî ewlad

101 Fikrî bi dil xû nine derman
Çeşm û beseri wî şubhi baran

102 Pur fikr û tesewwur û xeyalat
Meqsûd û metalibi xefiyyat

103 Wî ‘eqli nema hemî temamî
Rabûyî piya ji wî meqamî

104 Rabûyî piya bi îş û derda
Derhali dikan kilît bi ser da

105 Dî biçme hemami herme ‘adet
Xusla cum‘i bikim ‘ibadet

106 Ez dî ji xudani ‘erş û banî
Pur hîvî rica bikim ji canî

107 Belkî ew Xudayî layezalî
Ewlada bidet ‘ele’t-tewalî

108 Çunkî ew xudani ‘izz û dewlet
Şefqet wî pur e gelek bi rehmet

109 Belkî ji mi ra bidet weledkî
Pî keyf û xuşî bikim mudetkî

110 Fîlhali giha hemami tuccar
Xusla cum‘ei dikir bi settar

111 Wî pur bi du‘a û pur bi nazî
Ye‘nî ji Xuda weled duxwazî

112 Gûtî ku Ilahî pur xebîrî
Pur zanî bi hali vî feqîrî

113 Rûreş dibezim li ber derî te
Ahîn û fixan li pîşberî te

114 Ihsan tu bikî Ilahî imdad
Minnet tu bikî li min bi ewlad

115 Ihsan te pur e neî hisabi
Sed hîvî dikim nekî ‘itabi

116 Hîna ku dibînim van hevala
Îvari diçîne mulk û mala

117 Herkes weledi wî gel beraber
Pur keyf û sefa dikin seraser

118 Gava ku diçim ji vir bi der de
Kes nîne digel mi bî xeber de

119 Ez jar û ze‘îf û bîneçar im
Her dem li deri te şermisar im

120 Hedye tu bikî weledkî sadiq
Her çî tu bikî ji bû te laiq

121 Ya Rebbi qebûl kî vî du‘ai
Pur hîvî dikim digel ricai

122 Gava ku du‘a dikir bi amîn
Wek jî ra du‘a dibû çi muzgîn

123 Derhali dema ku çû hemami
Xusla xû dikir bi wî meqami

124 Pur zari yû pur du‘ai ‘alî
Wî ‘erzi kirîn li Zîlcelali

125 Hîna ji hemami ev xezenfer
Derket dî li qarişi xû berber

126 Hinga de hilanî ‘eyn û mir‘at
Wechi xû ku dîtî cumle berbat

127 Dî wech û liha hemî sipî ne
Ah û kesera ji dil kişine

128 Eşhed wî dida di gav û weqti
Zanî ku nezîr e bûyî mewti

129 Ahîn û keser gelek hilanî
Hîna ku Xudî bu xû dizanî

130 Fîlhali vegerya hatî mali
Da keşfi biket ji bû ‘eyali

131 Zewca wî dizane ‘adeta wî
Guhdar e ebed li xizmeta wî

132 Rabû sekinî heta ku bîtin
Gulyax û lewente hinde rîtin

133 Hem şîv û te‘ami xas û nadir
Bilcumle ji bû wî kirye hazir

134 Weqta ku tucarî bîte mali
Derhali ji navî tîte yali

135 Ew rûje tucar hinek bi paş ket
Hindî ku xiyal û xem biserket

136 Gavek wî li pîş e yek li paş e
Kerb û kedera wî kirye şaş e

137 Hasil ev tucari bî mecal e
Îvari dereng dihati mal e

138 Fîlhali jina wi ya ‘efîf e
Çû dîtî tucarî na bikeyf e

139 Gûtî ku bi xeyr û pur selamet
Hatî tu kerem ke bî şikayet

140 Cani min fida ji bû te her dem
Bîje min çira bi huzni hem xem

141 Tuccarî cewabi da ‘eyali
Min xeyr û xuşî nedî ji mali

142 I‘razi kirî ji van te‘ama
Hetta ku nekir digel kelama

143 Wechi xû guhestî ez ‘eyali
Sa‘etkî dikîşe vî xiyali

144 Hîna ku ‘eyali dî bi i‘raz
Berda giriyî bi deng û awaz

145 Gûtî ku sebeb çi ye bîme‘dî
I‘razi dikey wuha biderdî

146 Ez mam heyyirî nizam ku çîbû
Zû bîje ku dijmini te kî bû

147 Te can û ciger li min helandî
Ser ta bi qedem te min kewandî

148 Wî gûte ‘eyali ma nizanî
Pursa tu dikî ji min ‘eyanî

149 Ev huzn û keabeta dibînim
Bilcumle sebeb tu yî hezîn im

150 Îrû ku dema diçûme sewqi
Min çû vekirî dikan bi zewqi

151 Bilcumle tucari ehli Misri
Hatin vekirin dikan bi fexri

152 Her kes bu xu ra weled beraber
Lew bûme li vir hemî mukedder

153 Bu her weledek dikan û şirket
Lew bûme li vir bi ah û hesret

154 Derhali mi gû bi dil hezînî
Î bavi te bir ‘eceb dimînî

155 Ev menal û mulk û dewlet
Ev gewher û cewheri biqîmet

156 Ev qesr û qusûr û baxi ‘alî
Weqta ku mir im dibîte xalî

157 Bî sahib û bî xudî dimîne
Kes nîne li ser bibit hezîne

158 Ger min hebû weledkî qani‘
Kes nedbû li ser bibîte mani‘

159 Çil sal e li ba mini bi imdad
Qet zîde nebûn ji te tu ewlad

160 Xîr nîne di dara hişk û bîber
Axir nefesi dibit xulîser

161 Bîra te neî şeva zefafi
Misli haciyî biçit tewafi

162 Sûndek te li ber mi dani ew dem
Ez na zewucum li ser te bîxem

163 Ta vî se‘eti wuha dimînî
Hesret ji mi ra weledkî bînî

164 Derhal jinikî digûte tuccar
Sûndî duxwerim bi ismi Xeffar

165 Ev ‘aqet û bî weled bi carek
Ser vî sebebî tu yî mubarek

166 Zanim bu xû ez ne ‘aqir im yeqîn im
Bilcumle sebeb ji te dibînim

167 Çil sal buhirî nuha dibîjî
Nav û cigeri mi pî dipîjî

168 Hesret bi mi ra hene beraber
Hettanî nuha mi yek neda der

169 Îşev te li min hemî hebandin
Kerb û kederîm hemî civandin

170 Ez ‘ailekî feqîr û jar im
Ber zenb û xeta ku şermisar im

171 Ez hîvî dikim Xudayî Barî
Ewladek bidet bi yadigarî

172 Mumkin dibitin nexwazim ewlad
Ber dergehi rehmeti nekim dad

173 Van rûz û şevi li min dibûrin
Her dem ew li min bi şubhi gûr in

174 Lî ez çi bikim qerer wuha ye
Ew hukm û qezai Kibriya ye

175 Lakin ji te ye hemî bizane
Ev jî qeder e li nik Xuda ne

176 Gazindi meke ne ez temamî
Qudret me niye di vî meqamî

177 Lî tiştek heye sebeb ku nîne
Subhi radibî here bibîne

178 Tuccarî dema xeber hilanî
Pur keyf û sefa dikir ‘elanî

179 Gûtî ku ‘eceb li ku bibînim
Mali xû bidim ji bû xû bînim

180 Bîje ji mi ra eya wefadar
Bînim ji xu ra welew bi qintar

181 Hettanî nuha çira negûtî
Can û cigerîm te hinde sûtî

182 Gûtî tu here li nik ‘etara
Xef ke tu nebîjî bû tucara

183 Navi wî ‘ilaci me‘kerama
Ev xasse ji bû keç û xulama

184 Diqqet bike vî ‘ilaci bîne
Bî şubhe ew e ku xem revîne

185 Pur keyf û sefa dihate tuccar
Kengî ez biçim dikana ‘ettar

186 Hasil bû sube diçû bi der da
Jin hat û digel tucar xeber da

187 Ez hîvî dikim ji te hemû an
Bîne bu xu ra ‘ilac û derman

188 Diqqet bike kes nebîne carek
Belkî ji me ra bibit mubarek

189 Wî gûte jini eya helali
Ma bî vî dewai tîme mali

190 Ev mulk û menal û qesr û eywan
Ez dî bidim wan hemî bi derman

191 Xemgîn tu nebe bi kerb û hesret
Ez dî bigerim li wî bi diqqet

192 Hetta vî ‘ilacî ez nebînim
Gav û se‘eti bi dilhezîn im

193 Tacir Şemsedîn dema diçû der
Wek teyra diçû bi çeng û hem per

194 Hetta ku giha ‘etari tacir
Pursî ev ‘ilac li nik te hazir

195 Pur lazim ev ‘ilac emanet
Peyda bibitin neke xiyanet

196 Hindî tu buxwazî bîje bî ‘eyb
Derhali bidim te ez bila reyb

197 Serbestî xeber de ey birader
Bîşubhe bidim te zîr û gewher

198 Navi wî dewai me‘kerama
Ev xasse ji bû keç û xulama

199 Min hîvî eger heye bide min
Pur lazim e paş nexe ji bû min

200 Gûtî ku qesem bi zati ekber
Hettanî nuha hebû birader

201 Yek merde dihatî pur rica kir
Min dayî nuha ji bû xû wî bir

202 Pursî biketin ‘etarî carî
Belkî bidet ew bi yadigarî

203 Ger ew hebitin bexîli naket
Bîşubhe xema dili te raket

204 Zûke here nik ji wî buxwazî
Derhali didet bi serfirazî

205 Çû pursî ji wî digûtî ey can
Eya heye nik te ‘ekri derman

206 Ger ew hebitin bide ji bû min
Qîmet wî çi ye bibî ji bû min

207 ‘Ettari qesem dikir tebarek
Dermani dibîjî nîne carek

208 Lî pursi bike dewa bibîne
Bîşubhe dewakî xemrevîn e

209 Hasil geriya bi dil newaî
Kes jî ra negû evî dewaî

210 Hettanî dihate şirketa xû
Rûniştî demek bi hesreta xû

211 Derhali dihat neqîbi dellal
Pursa wî dikir bi keyf û ehwal

212 Gûtî ku çira wuha bîme‘dî
Vî subhi sebeb çi ye biderdî

213 Bîje ji mi ra birayî tuccar
Eya çi sebeb wuhayî xemxwar

214 Cara mi nedî wuha bihesret
Her dem te dibînim pur bihurmet

215 Bîje ku ki ye herim bibînim
Da vî se‘eti serî şikînim

216 Derhali tucari gûte dellal
Kes nîne li min ke qîl û hem qal

217 Lakin qisseta mi pur dirîj e
Can û cigera mi tev dipîje

218 Hasil mesela xuwû ‘eyali
Wî gûte delal çibû di mali

219 Lew mame li vir bi huzn û derd e
Kes nîne ji derdi min xeber de

220 Çil sal e mi ev jina xû anî
Hettanî bi îrû zar û tanî

221 Her kes ji mi ra dibî bi yarî
Madam tu xeniyy û pur tucarî

222 Keşif tu bike dewa û derman
Belkî bibitin sebeb bila wan

223 Ma tişt heye bîsebeb dibîtin
Illa ku sebebkî tîte dîtin

224 Min pursî gelek ji van tucara
Yek yek geriyam li nik ‘etara

225 Hemyan wan digû li nik me nîne
Pursi tu bike ji bû xû bîne

226 Ez dî ji kî pursi kim temamî
Ez mame teni li vî meqamî

227 Dellali digûte Şemsedînî
Derman û ‘ilac ji min dibînî

228 Dermanek bidim eger ku çîbit
Derhali jina te wî hemil bit

229 Çil salî menîre ey birader
Î sale weled dibit beraber

230 Tuccari digûtî ey wefadar
Ger bînî didim te mal û dînar

231 Hetta te bikim wekî tucarek
Sed sûndî dixum ne yek bi carek

232 Gûtî ku bide tu zîrekî tek
Derhalî hilînim reyb û hem şek

233 Tuccarî dida du zîri ‘eyyar
Dellali ji mestebi Xuda xar

234 Fîlhali dema delal biderket
Çû ta ku gihîşt yekî bişefqet

235 Dellali digû ji bû dewacî
Bîne ji mi ra fulan ‘ilacî

236 Mumkin bibitin li nik te ey can
Serbesti bide ji bû mi derman

237 Qîmet wî çi ye ku da bizanim
Bîşubhe didim bi rûh û can im

238 ‘Ettari digû dewa buha ye
Dermani duxwazî kîmiya ye

239 Pur xali ye ev dewa biqîmet
Nik padişeha gelek bihurmet

240 Sed zîrî didî bidim te derman
Ger na tî bibî gelek peşîman

241 Misli vî dewai nîne carek
Serdari hemî dewa mubarek

242 Dellali dema xeber hilanî
Muhlet jî duxustî wî ‘elanî

243 Hetta ku herim xuyî bibînim
Derhal qîmetî ji bû te bînim

244 Gûtî ku ‘ecel ke zû ke ey can
Sed zîrî bidî bidim te derman

245 Dellali diçû gihîşte tuccar
Yek yek wî digû kelami ‘ettar

246 Sed zîrî bidî ji bû te bînim
Wellahi li ser te pur hezîn im

247 Dermani duxwazî na buha ye
Esli wî dewaî kîmiya ye

248 Ez hîvî dikim digel ricai
Dermani wuha bi des te nai

249 Derhali tucarî daye sed zîr
Gûtî ku ‘ecel ke bîne bilxîr

250 Ger zîde buxwaze merdi ‘ettar
Ez dî bidim eya wefadar

251 Dellali diçû bi keyf û şayî
Satil bu xu ra kirî tebayî

252 Çûnkî ev dewa wekî ‘icîn e
Bîsatili ew nikarî bîne

253 Esli vî dewaî ger bizanî
Ez dî ji te ra bikim ‘eyanî

254 Hindek ji şeker hinek ji filfil
Hindek ji kebab û hin qerenfil

255 Vani ku me gû hemî qutînin
Der zeyti tevî hemî kelînin

256 Yek huqqe hesalebani zeker
Reşreşka qedeh kî ket beraber

257 Wan cumle di zeyti pur werînin
Me‘cûni bikin bihingivînin

258 Hasil vî delali pak û kamil
Eşyai me gû dixisti satil

259 Rabû ev delal ji nik ‘etarî
Hetta ku dihate nik tucarî

260 Satil ku didayî gû dewa ye
Me‘dî xû meke ne bîbuha ye

261 Şîva te bera kevûki mali
Pur ke tu ji ava pûrteqali

262 Bîşubhe ev e dewa û derman
Carî bûye ev ji desti Luqman

263 Hasil vî tucarî tev dişandin
Seknî ta jini hemî kelandin

264 Ava wan hilanî vî ‘eyali
Hettanî tucari bîte mali

265 Şîva wî te‘ami hate gûtî
Danî bû tucari dil disûtî

266 Îvari bi lez dihatî tacir
Dî cumle te‘am li ber wî hazir

267 Şîva xû dixwar bi keyf û şayî
Pursî ka sitle dewa tebayî

268 Derhal jinikî dewa hilanî
Tevlî qedehi li ber wî danî

269 Gûtî ku kerem ke ey wefadar
Derman û ‘ilac bixû bi Settar

270 Rahişt qedehi bi ismi Barî
Ava qedehi hemî vexwarî

271 Ew bû sebebi weledkî kamil
Ew şev ‘aile dibûyî hamil

272 Hîna ku temam bû hatî qelqi
Rûnişt ‘aile ji bûyî telqi

273 Hasil ew Xuda bi hukmi carî
Da yek weledek bi yadigarî

274 Azani didan li ser munara
Şahî dikete hemî diyara

275 Pîçan dadiya didan diya wî
Himbîzî dikir di pîçeka wî

276 Şîrî xû duxwar hetanî raza
Bû keyf û sefa bi ‘ud û saza

277 Helwa çîkirîn di rûji hefta
Mal mali geran hemî bi desta

278 Tacir Şemsedîn ji bû ziyaret
Hatî wî digûte wan selamet

279 Wî gûtî ku kanî ew wedî‘e
Hukmi vî Xudayî pur bedî‘e

280 Fîlhali jina wî daye mewlûd
Pur şukri dikir ji bûyî Me‘bûd

281 Dîtî ku kurek di rûji hefta
Wek salek dibit bi pay û desta

282 Subhan ji te ra Xudayî Barî
Ev kur ji me ra te kirye yadigarî

283 Ni‘met te pur in ku pur xeta me
Ez raciyî ‘efwa Kibriya me

284 Tacir ku dema di wechi wî dî
Wek bedr e diîse me xefî dî

285 Şamati li ser bedri hemî şemal in
Bilcumle ji nûra Zîcelal in

286 Wî gûte jini çi navi danî
Bîje ji mi ra ku pî dizanî

287 Lazim ev kura bi ism û nav be
Ev nave bi desti da û bav be

288 Ez hîvî dikim digel ricaî
Her dem tu bikî ji bû du‘aî

289 Jin gûte tucar eger ku qîz e
Min navi bida li ser ‘Ezîze

290 Lakin ev weled weledkî faiq
Lazim ku tu deyni ismi laiq

291 Ehli wî zemani tev bi hikmet
Navi xû bi fali kirne ‘adet

292 Hindek sekinîn ku beynebeyn in
Navi bi fali cumle deynin

293 Dîtin ku yekî digû ‘Eladîn
Ez hîvî dikim nebî tu xemgîn

294 Wer da ku beraber em biçîn mal
Îşî me tune bi qîl û hem qal

295 Gûtin ku ‘Elaudîn ‘ezîz e
Ev navek mubarek pur temîz e

296 Vî navi bikin li wî ‘eyan e
Da her kes bizane xanedan e

297 Navi wî bera ‘Elaudîn be
Serdari kura çû dûrebîn be

298 Wan fatihe xûnd bi keyf û şahî
Ser vî weledî bi ‘izz û cahî

299 Hasil wî dida te şîri dara
Mehbûb e gelek bi dûst û yara

300 Hetta ku du sal dibû temamî
Wî şîr vekirîn di wî meqamî

301 Hev sali dibû dema ‘Eladîn
Tirsane ji wî ji çavi xayîn

302 Anîn veşirîn ku kes nebîne
Da çav û nezer li wî nexîne

303 Xizmet wî dikin hemî dil û can
Der rûz û şeva ji bû wî pawan

304 Sunnet wî kirîn bi nan û mewlûd
Qanûn û ribab û nay û hem ‘ud

305 Wî hîn û demi ji bû ‘Eladîn
‘Alimkî mezin ji bû wî anîn

306 Dersa wî digû bi cehd û taqet
Quran û xet û nutq û belaxet

307 Rûjek ew ‘ebîdi xizmeçî hat
Danî li berî te‘ami qat qat

308 Der ma vekirî ‘ebîd bi derket
‘Eqli wî nema derî kilît ket

309 Hîna ku derî didî ‘Eladîn
Kes nîne li ber derî bi te‘yîn

310 Fîlhali biderketî ji der de
Kes nîne bi wî re bî xeber de

311 Pur keyf û sefa bi sed beşair
Dî mehzerek tev jini kebair

312 Bilcumle li nik diya wî şa ne
Pur keyf û surûr û pur sefa ne

313 Hatî mehzeri digel cemali
Bilcumle diketne qîl û qali

314 Hîna ku jina didî çi dilber
Ahîn dikirîn keser beraber

315 Wechi xû didane bin niqabi
Hemya bi tehewwur û ‘itabi

316 Wan gûte diya wî ey fulanet
Cara me nedî ji te xiyanet

317 Tirsa te nehîn eya helali
Daxil dikî ser me vî cemali

318 Ev şerm û heya hinek ji îman
Tînî li vira ‘ebîd û xilman

319 Laiq niye em wuha dibînin
Nav û neseba xû em hilînin

320 Xanim der ‘eqeb dida cewabi
Hûn cumle li min dikin ‘itabi

321 Haşa ev weled xulam û ‘ebd e
‘Alem tev bu wî bi îş û derd e

322 ‘Ilm û ‘emel û neseb hebîne
Ev rûh û rewani Şemsedîn e

323 Gûtin çi ‘eceb hemî bi imdad
Ma sehnekirî ji bû te ewlad

324 Kengî ev weled Xudayî Barî
Ihsan kirî wî bi yadigarî

325 Gûtî ku Xuda ji ‘alema xeyb
Ev hedye kirî ji bû me bîreyb

326 Bavi wî veşarî kes nebîne
Da çav û sihir li wî nexîne

327 Belkî xadimî derî neda ber
Hetta ev weled li pey dihat der

328 Meqsed me nebû weled biderkev
Na sal û meha ne rûz û na şev

329 Bilcumle du‘a bikin bi carek
Belkî ev du‘a bibin mubarek

330 Wan desti hilan ji bû du‘ai
Em hîvî dikin digel ricai

331 ‘Umri wî dirîj û pur bixîr be
Der mehfeli ‘alem bi kîr be

332 Derhali biderketî ‘Eladîn
Hîna ku du‘a dikir te amîn

333 Çû ta ku gihîşti hewşi mali
Dîtî ku ‘ebîd bi qîl û qali

334 Pursî ku çi ye ku hûn dibîjin
Can û cigeri xû hûn dipîjin

335 Ev qatira pur bi xişr û zînet
Bû çi bu we ra wuha dimînet

336 Gûtin ku herû wuha ye carî
Bavi te ku lî bibit suwarî

337 Bavi te ku îrû çû dukani
Em jî bi tebayî pî gihani

338 Hîna ku ji qantiri peya bû
Derhali li mertebi bi ca bû

339 Wî gûte me qatiri bibin mal
Em hatin me kirye keşfi ehwal

340 Karî me wuha ye her dem û hîn
Hetta tu hebî nebî tu xemgîn

341 Wî gûte ‘ebîdi xem revîne
Bavi min çi xizmeti dibîne

342 Bîjin ji mi ra ku da bizanim
Sen‘et wî çi ye ku şadiman im

343 Wan gûtî ji bû eya ‘Eladîn
Dilşadi bibe herû bi mizgîn

344 Bavi te ye bîndera tucara
Serdar e bi mal û hem ‘iqara

345 Keyfa xû biket bi mal û dewlet
Der mehfeli ‘alemi biqîmet

346 Rabû ji wî çû sera û eywan
Da pursî biket ji sen‘eti wan

347 Çû ta ku gihîşt diya temîze
Sen‘et we çi ye eya ‘ezîze

348 Ev xanima pur delal û şîrîn
Wî gûte kuri xu yî ‘Eladîn

349 Bavi te ye bîndera tucara
Serbest e di cumle dûst û yara

350 Cariy û ‘ebîd û zîr û zîver
Ev mulk û menal û mas û cewher

351 Her sinfek ji wan kirî defîne
Qet ‘edd û hisabi jî re nîne

352 Mali wî pur e ku bî hisab e
Katib nikarin bikin kitab e

353 Hîna ku bihîsti ev ‘Eladîn
Pur hemd û şukur dikir bi tehsîn

354 Wî gûte diya xu ya ‘ezîze
Fi‘li hûn dikin ne pur temîz e

355 Madam ku wuha ye ey wefadar
Min hebsi dikin di qulleya tar

356 Min curm û cinayetek çunîne
Hetta ku ceza li min yemîn e

357 Dayî ku dugûti ey ‘Eladîn
Can im ji te ra bibîte muzgîn

358 Hebsa ku dibîy ne hebs e ey can
Cani xû dikim ji bû te qurban

359 Hîna ku Xuda te da me hedye
Çil sal buhurî weled me neyde

360 Anî me te xiste xaniyî xar
Da kes te nebîne dûst û neyar

361 Tirsa me hebû ji sihr û çava
Haya me hebû du weqt û gava

362 Ev çav û sihir hemî bela ne
‘Alem hemî pî ku mubtela ne

363 Gava ku bihîsti wî ‘Eladîn
Gû dayî mebin li ser mi xemgîn

364 Bû min çi heye ezî bibînim
Ser vî qederi ne dilhezîn im

365 Weqti ku qeder bibit mehal e
Redda qederi bi qîl û qal e

366 Î kali mi bir qe bav dihîle
Bî mumkine ew ku bav bihîle

367 Îrû ku ecel bibit kemîne
Nabit ku heta subî bimîne

368 Bavîm ku biçit meger bimînim
Derd û elema gelek kişînim

369 Ez dî ku bibîm ez im ‘Eladîn
Can û cigera xû ez bikim xîn

370 Bavi min e Şemsedîni xemxar
Inkari bikin cemî‘i tuccar

371 Tesdîqi mi nakin kes bi carek
Ez dî li vira bibim ‘ebarek

372 Hem şeyx û şuyûx li min bikin dad
Qet nîne ji Şemsedîn re ewlad

373 Qaziyy û şuhûdi beyti mali
Hîna ku xuya ye keşfi hali

374 Dî bîtin li vir hemî tedarek
Mali min bibin hemî bi carek

375 Rehma Xudî bit li î ku gûtî
Can û ciger û dili mi sûtî

376 Yek dimre ku mal diçînin
Pîsi ji zilama jin dibînin

377 Ya dayî bi bav re tu xeber de
Her çî ku mu gû li wî eser de

378 Da min bu xu ra bibîte sewqi
Dikanek veke bi zewq û şewqi

379 Rûnibim ez li wî wekî tucara
Her kes min bibîn ji dûst û yara

380 Da her kes bizan ‘Elaudîn im
Bî şubhe kurî ku Şemsedîn im

381 Dayî ku digû eya ‘Eladîn
Te nav û ciger li min kirî xîn

382 Bavi te dema ku bibite mali
Ez dî bidimi vî ‘erzihali

383 Xemgîn tu nebe eya ruhî min
Kerb û kedera nexî dili min

384 Qurbani te me xema mekîşe
Can û ciğeri mi pî diîşe

385 Bavi te ku bî ezî bibîjim
Çeşm û beserî xû dî birîjim

386 Derdek te mezin li min ku çîkir
Nav û cigeri mi tev te xî kir

387 Îvari tucarî bû hewale
Hatî ku ‘Elaudîn li mal e

388 Rûniştî li ba diya ‘ezîze
Hurra ku li her derî temîz e

389 Tuccarî digûtî ey ‘eyalî
Bu çi ku ‘Elaudîn li malî

390 Hurme te ji bû çi wî deranî
Weqta wî nebû te zû wî anî

391 Gûtî ku qesem bi ismi Barî
Min jî wî duxestî pur veşarî

392 Lakin xedema derî neda ber
Hetta ku dibû bi min beraber

393 Ûda min tijî jini kubar in
Bilcumle revîn xû jî veşarin

394 Hindî ku hebûn li min ‘itab kir
Nav û neseba me ca bi ca kir

395 Axir mesele mi da beyani
Her kes radibû bi şadimani

396 Her çî xeberî ‘Elaudîni
Bilcumle digûte Şemsedîni

397 Her çî vî kurî kirî beyane
Sûndî ez duxum hemî wuha ne

398 Bavi wî digû Xuda ku hes ke
Ez dî te bibim gelek hewes ke

399 Lakin ey weled dikan û çarşî
Hewcî edebî ne tev bibaşî

400 Axir wî şevi dima ‘Eladîn
Bavi wî dema didaye mizgîn

401 Keyfa wî gelek dihatî ew şev
Dî subhi biçîn dikani em tev

402 Hasil bû sube birîn hemami
Wan şûştî temîz di wî meqami

403 Wan destek cili bi qîmeti pir
Anîn her du wan bi hev re lî kir

404 Fittar û şurûbi tev de xarin
Her du bi tebayî karebar in

405 Qatirkî tucar û yek ‘Eladîn
Lî bûne suwar bi keyf û şahîn

406 Gû dayî ji bû mi ra du‘a ke
Belkî bi du‘a Xuda mi şa ke

407 Dayî digirî bi her du çava
Agir ketî hundur û hinava

408 Gûtî ku emanetî Xuda bî
Hetta tu hebî gelek tu şa bî

409 Hifza te Xuda bike ji çava
‘Umri te dirîj bi da û bava

410 Her çî ku hebûn digûtî amîn
Hîna ku diçûn li pey kirîn şîn

411 Hasil ku diçûne nîv suqaqi
‘Alem lî civa bi vî tifaqi

412 Her kes ji xu ra kelami veşşar
Bilcumle xeber didan ji tuccar

413 Wan gûtî binî li vî xulamî
Anî bu xu ra li vî meqamî

414 Zenna me dikir li wî bi xîri
Wek rahibi pîr biçîte dîri

415 Wek sîra sipî bi gewlaz
Qelbi wî reş e bi şubhi canbaz

416 Dellali beri ‘ilac ku anî
Wî gûte tucara ba nihanî

417 Em razî nehîn bi vî xebîsi
Hetta ku bikîn li xû reîsî

418 ‘Adetkî hebû di wî zemanî
Hîna ku reîs bibit ‘eyanî

419 Dellal û tucar hemî bi carek
Tev tîn subhi dikin mubarek

420 Her kes fatihe li wî dixûnî
Bilcumle diçîn hemî butûnî

421 Hîna ev reîsi Şemsedîn hat
Rûniştî dikani misli ‘adat

422 Tuccara butûn dikirne nefret
Bilcumle dikirne terki ‘adet

423 Gazî kire wî neqîbi dellal
Bîje ji mi ra beyanke ehwal

424 Bû çi ev tucar ji min nufûr in
Wechi xû hemî j imin digûrin

425 Dellali digû cemî‘i tuccar
Sûndî duxwerin bi ismi Xeffar

426 Naîne li nik te ey birader
‘Ezla te dikin hemî seraser

427 Ev sûc û qebaheti te ye can
Paşi tî li wan bibî peşîman

428 Tuccari digûti ey cigerxûn
Qewl û ‘emeli te şubhi mecnûn

429 Sûci min çi ye bike ‘eyanî
Zû bîje eger tu pî dizanî

430 Derhali delal digûte tuccar
Sûci te heye eya wefadar

431 Ev çi weled e li nik te hazir
Fi‘li tu dikî hemî kebair

432 ‘Ebdi te ye ya merivkî dûr e
Lew cumle dikin ji te nufûr e

433 Zenna me hemî bi te xerab e
Fi‘li tu dikî ne pur sewab e

434 Pûri te sipî bi sal û ‘ama
Meyla xû didî li ser xulama

435 Hîna ku bihîsti ev meqale
Qîrîn dikirî li ser delale

436 Tuccari digûtî jî re ey pîs
Zat û sifeti te şubhi Iblîs

437 Zenna te xerab e wek hevala
Meyla min didin bi zî cemala

438 Ma qe tu nizanî ev kurî min
Can û ciger e ji bû ruhî min

439 Çend sal e li vir tu bûyî dellal
Aya te bihîsti qîl û hem qal

440 Dellali digûte vî tucarî
Mar im di kewara tî veşarî

441 Hettanî nuha weled çunîne
Vî perdi ji ber me tu hilîne

442 Tuccarî digûte wî neqîbi
Mehbûbi li min ne pur xerîbi

443 Hîna te ‘ilac ji bû min anî
Min xarî jina mi ev dianî

444 Min jî wî xefî dikir ji çava
Hettanî nuha di hîn û gava

445 Meqsed me nebû ku em derînin
Ta lehy û rehi vî em bibînin

446 Razî nedibû diya wî ev dem
Ahîn û keser dikîşe her dem

447 Bû çi tu dikan ji bû ‘Eladîn
Nadî ku bibe wekî te zengîn

448 Eşyai dukani jî re deyn e
Lazim li te ew bi şubhi deyn e

449 Da bey‘ û şirai tev bizane
Her kes ku ne bîje bî xudan e

450 Min îrû dianî wî dukani
Cezl û fereh û bi şadimani

451 Tuhmet te kirî digel tucara
Rûreş me kirî dinîv neyara

452 Laiq me nebû çewa we gûtî
Nav û cigeri me hinde sûtî

453 Çibikim ku qeder wuha ye carî
Taqet me niye bikîn veşarî

454 Hasil ku neqîb diçû bi der da
Ev cumle li wan hemî xeber da

455 Tehqîqi ku bû hemî betal e
Bilcumle hemî dihatî bal e

456 ‘Uzrî xû kirîn bu wî şikayet
Em dexli te ne bikî ‘inayet

457 Seffi xû kirîn bi derdemend in
Tev hatin û fatihe duxendin

458 Nehsî dikirîn bu wî xulami
Hindek sekinîn li wî meqami

459 Desti xû hilan ji bû du‘ai
Pur hemd û şukur digel senai

460 Paşi wan digûte Şemsedîni
Ger hesdikî tu ‘Elaudîni

461 Helwa û ‘esîd e ke temamî
Wan ke sedeqe ji bû xulamî

462 ‘Adet me heye Xudayi Barî
Hîna weledek bidet tucarî

463 Şîrani ye pur bi qedr û qîmet
Hazir biketin hemî bi hurmet

464 Hindî ku me‘arif û eqarib
Dî bîne huzûri cumle ratib

465 ‘Alimkî mezin duxûne mewlûd
Nani xû duxun hemî bi meqsûd

466 Hîna ku temam be wî du‘a kin
Pur hemd û şukur hemî sena kin

467 Gava ku xelas bibin ji mewlûd
Her kes diçitin bi ali meqsûd

468 Ev ‘adetekî qedîm û carî
Hetta ku bigîte xundekarî

469 Lazim tu jî de‘wetek bi te‘yîn
Pîşkîşi bikey ji bû ‘Eladîn

470 Tuccarî ne‘em digû ji bû wan
Cani xû dikim fida û qurban

471 Bûstanek heye ne wek besatîn
Baxi Iremi dibûyî mizgîn

472 Qesrek wî di baxi pu musella
Bilcumle bi zîr kirî mutella

473 Ferraşi dişandî qesri ‘alî
Tezyîni bike bisat û xalî

474 Tenbîhi bike mirûvi aşçî
Tev bîne li vir digel kebabçî

475 Qehwa û şurûb û çay û leymûn
Xizmet pur bikin li vir hemî hûn

476 Da kes nebîjit bi dil neyarî
Nanek wî neda kesî nexarî

477 Hummet hûn bikin ji bû ‘Eladîn
Dilxûni bibin mirûvi xayîn

478 Mali ku nebit fida ji bû can
Bîşubhe dibit ‘ezabi nîran

479 Hasil van feraş û van ‘ebîdan
Diqqet dikirîn hemî bi cî dan

480 Nanek wî dida di wî zemanî
Naît qelemi bi şadimanî

481 Tuccar û ‘ewam hemî vexwendin
Mewlûdek mezin li ser dixwendin

482 Nani xû kirîn du cî bi şadan
Yek qesreyekî liqa‘ û eywan

483 Tuccarî digûtî ey ‘Eladîn
Xizmet li min û te ye bi te‘yîn

484 Hîna rî sipî ku bîn diyarî
Xizmet li min e bi xizmekarî

485 Lazim ku bikim hemî bi xizmet
Da kes nekitin ji min çû nefret

486 Lazim ji te ra bi ‘eql û dana
Xizmet tu bikî li şa bû cana

487 Çûnkî ji te ra ku hemneşîni
Her dem ji te ra ku xemrevîni

488 Elbette xizmeti dibin şad
Gav û se‘eti ji bû te imdad

489 Ev şa bû cuwani vî zemanî
Der mehfela şeyx û kali fanî

490 Pur şerm û fedî dikin ji bû wan
Lew nayîn huzûra pîr û kalan

491 Hindî hebitin şuyûx û hem pîr
Xizmet li min bi cehd û tedbîr

492 Lî şa bû cuwan û hindî emred
Hetta ku dikarî lî bike cehd

## 5.ENCAM

Mela Muhemmed Nûrî di sala 1894an de li gundekî navçeya Bismilê yê bi navê Sinanê hatiye dinyayê û di sala 1977an de li gundekî Diyarbekirê yê bi navê Hecî Îsê çûye ber dilovaniya Xwedê. Seydayî temenê xwe bi melatî û dersdariyê borandiye. Mela Muhemmed Nûrî çend heb berhemên Kurdî û du berhemên ‘Erebî li paş xwe hiştine. Heta niha li qada akademîk de li ser jiyan û kesayetiya wî ya edebî û berhemên wî xebatên gelemperî û berfireh nehatibûn kirin. Dema ku em bi hebûna Seydayî û berhemên wî hesiyan, me xwest ku em vî seyda û helbestvanê hosta bi qada akademîk û bi civakê bidin danasîn. Berhemên wî yên bi tîpên ‘Erebî û bi zimanê Kurdî hatine nivîsin wergerînin tîpên Kurdî ya Latînî. Bi vê xebatê armanca me ev bu ku em helbestvan û zanayekî din ê edebiyata Kurdî ya klasîk derbixînin holê û her wisa ev nirxê hanê yê biqîmet bi sedema vê xebatê di nav pelên dîrokê de winda nebe.

Me di vê xebata xwe de jiyana Mela Muhemmed Nûrî, kesayetiya wî ya edebî, dahûrîn û nirxandina berhemên wî yên Kurdî çêkiriye. Me dû re jî çar berhemên wî danîn ber destê xwe û tîpguhêziya wan çêkir. Dema me lêgerîn û lêkolîn dikir û berhemên Seydayî dinirxand em gihîştin wê baweriyê ku seydayê Mela Muhemmed Nûrî kesayetekî biqîmet e û haya wî ji edebiyata klasîk hebûye. Di dawiya van lêgerîn û dahûrînan de em gihîştin van encaman**:**

**1)**Mela Muhemmed Nûrî xelqeyekî edebiyata Kurdî ya klasîk e. Seydayî di her çar berhemên xwe yên ku me li ser xebat kirî de teşeya mesnewiyê û kêşa/pîvana ‘erûzê bi kar aniye.

**2)** Berhemên wî ji hejmara malikan ve wiha ne: Mi‘raciye 2439 malik e, Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs 838 malik e, Mersiyename 679 malik e û Mesnewiya Şemsedînê Tacir 492 malik e. Eger ku kesayetek ev qas malikan bi hostahî pêkbîne wisa xuya dibe ku e kesayet bi rastî jî di helbestvaniyê de serkeftî ye û şayanî lêkolînê ye.

**3)** Mela Muhemmed Nûrî di destxetên berhemên xwe de li pêşiya rûpela ewil navê berhema xwe (mesnewiya xwe) nivîsandiye û bi besmeleyê berhema wî destpê kiriye. Ji çar berhemên wî yên di vê xebata me de, sê heb bi vî awayî ne. Bi tenê berhemeke wî bê sernav e û di rûpela ewil de besmele tune ye. Lê dîsa jî diyar e ku

ew rupel, rupela ewil e. Çimkî di van malikan de hemd û pesna Xwedê hatiye kirin di beşa dû re de jî selat û selam daye ser pêxemberî. Taybetiyeke din a vê berhemê ev e ku berhem nîvco maye. Dawiya berhemê tune ye. Dibe ku ji aliyê muellifî ve nehatibe xelaskirin. Navê berhemê nehatiye nîvîsîn. Ji ber vê yekê me li gor naveroka berhemê û serlehengê berhemê ev berhema seydayî wek "Mesnewiya Şemsedînê Tacir" binavkiriye. Ev navê hanê li wê mesnewiyê ji hêla me ve hatiye danîn.

**4)** Seydayî di du heb berhemên xwe de babetên olî kiriye mijara xwe. Mijara berhema ewil mi'raca Hz Muhemmed e (Mi'raciye), ya din jî bobelata Kerbelayê anku qetilkirina Hz.Huseyn û ehlibeyta wî û hevalbendên wî ye (Mersiyename). Ji bilî van berheman di her du mesnewiyên dî de bi saya mijara berheman pend û şîret li xwendekaran tê kirin. Bi vê naverokê her du berhemên wî yên din (Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs, Mesnewiya Şemsedînê Tacir) wek nesîhetnameyan e.

**5)** Mela Muhemmed Nûrî di van berheman de gelek taybetiyên edebiyata klasîk bi kar aniye. Teşeya mesnewiyê, 'erûz, malik, serwa, paşserwa, hunerên edebî, mexles, mezmûn, terkîb hinek mînakên bikaranîna taybetmendiyên edebiyata klasîk in.

**6)** Seydayî kevneşopa medreseyan jî di berhemên **(**helbestên) xwe de bi kar aniye. Ligel navê pêxemberî vegotina peyva 'eleyhisselam, ligel navên mezinên ehli beytê vegotina peyva rediyellahu 'enhû mînakên bandora kevneşopa medreseyan e. Bandora vê kevneşopê li ser Seydayî zêde çêbûye. Bikaranîna taybetmendiya serkêşe, rid'e û hwd. mînakên vê bandorê ne.

**7)** Seydayî di helbestên xwe de peyvên 'Erebî û Farisî jî gelek bi kar aniye.

**8)**Di berheman de peyv û devoka herêma Botan û Behdînan jî hatiye bikaranîn.

**9)** Me di berhemên Seydayî de bandora navdarên edebiyata Kurdî ya klasîk tespît nekir. Bi vê boneyê bi taybetî bandora hostayekî navdarên Kurd li ser terza wî nehatiye pêşberî me. Seydayî terzekî li gorî xwe û xweser pêkaniye.

**10)** Ev berhemên ku bûne mijara xebata me ji aliyê Mela Muhemmed Nurî bi xwe ve wek destxet li defterekê hatiye nivîsandin û ev defter (destxet) li nik kurê

Seydayî birêz Ehmed Tanyerî ye. Di dema amadehiya vê xebatê de malbata Seydayî li Diyarbekirê niştecih bûn û me kopiya van berheman û gelek agahiyên di derbarê jiyana Mela Muhemmed Nûrî de ji malbata wî wergirtiye.

**6.ÇAVKANÎ**


**1) ADAK**, Abdurrahman (2014), Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, (çapa duyem), Stembol: Weş. Nûbihar.

**2) CÎHANÎ**, Perwîz (2013), Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Stembol: Weş. Nûbihar.

**3) DİLÇİN,** Cem (2016), Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, (Çapa Yazdehem), Stembol: weş. TDK.

**4) EBDULLA**, Helîma Xurşîd (2011), Berawirdeyeka Kêşnasî di Navbera ‘Erûza Kurdî û Farisî, Duhok: Spîrez.

**5) İPEKTEN**, Haluk (2015), Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, Stembol: Weş. Dergâh.

**6) OCEK,** Nezîr, Edebiyata Kurdî, Wan:Weş. Sîtav.

**7) PALA**, İskender (2016), Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, Stembol: Weş. Kapı.

**8) SAĞNİÇ**, Feqî Huseyn (2002), Dîroka Wêjeya Kurdî, Stembol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

**9) YILDIRIM**, Kadrî (2013), Ehmedê Xanî Mem û Zîn, Stembol: Weş. Avesta.

**10) ZINAR**, Zeynelabidin (1991), Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Stokholm.

**11) ZIVINGÎ**, Mela Mihemed (2013),Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Stembol: Weş. Avesta.

# 7. PÊVEK- 1

## WÊNEYÊN SEYDAYÎ Û GORA WÎ



**Wêne 1.1:** Mela Muhemmed Nûrî (1894-1977)



**Wêne 1.2:** Mela Muhemmed Nûrî (1894-1977)





**Wêne 1.3:** GoristanaMela Muhemmed Nûrî û Malbata Wî




**Wêne 1.4:** Gora Mela Muhemmed Nûrî

**PÊVEK-2**

**ÇEND NIMUNEYEK JI NUSXEYÊN MELA MUHEMMED NÛRÎ**




بحمده تعالى

كتاب الاسراء والمعراج

بسم الله الرحمن الرحيم

**Wêne 2.1: Kitabu'l-Isra we'l-Mi'rac (Mi'raciye), kopiya rupela 'ewil.**


١٩٢

ژ هجرا محمد شهینێ شاه دینێ — ژ مکێ کوچو باڵ مدینێ یقین

ژ شهرا محرم دچو چارێ روژ — قهاما تماشه حسینێ دڵ دسوژ

سعت هفت شفا ئنج شهرا لحرام — بچو لاخدێ ئەڤ حدیث بو تمام

ناظم الاسراء والمعراج محمد نوری بن ملا عبد الله رحمهما الله تعالی

رحمة عامة

آمین

ذی الحجة ٢٣ بالعربية یوم الاثنین فی سنة ١٣٨٩ هـ وفی سنة ١٩٧٠ م

مارت ٢ بالاتینیة — شباط ١٧ بالرومية

بایع أز مشتری بها خواهد — کاتب وناظم أز قاری وفاظما دعا خواهم

صه درگاه گیلانی دخوازت قرب یزدانی

ژ شیرا چیترن بالله صه درگاه گیلانی

لا اله الا الله سیدنا محمد رسول الله

صلی الله علیه وسلم وشرف وکرم وعظم

**Wêne 2.2: Kitabu’l-Isra We’l-Mi‘rac ( Mi ‘raciye), kopiya rûpela dawî**



بمنه تعالى

١٩٥ ١

لناظم الاسراء والمعراج ايضاً

هذا كتاب نزهة النفوس

وهو محمد نوري بن ملا عبد الله رحمهما الله تعالى آمين

بسم الله الرحمن الرحيم

بذات و صفاتِ خدائي عظيم — مه بي ابتدا عز بقلب سليم

چه حمد كو بيتن ژ هر حامدا — محقق همي حاصلن بو خدا

دگل بر صلات و سلام قبول — لسر سيد مه محمد رسول

لدو وي لسر آل و صحبا تمام — نبت منقطع تا بروژ قيام

و بعد ژ من هون بزانن يقين — زمان كو بوري لروي زمين

كلك حادثه وي خدائي ودود — ژ بو اعتبار همي عز وجود

لمه لازمه اعتبار بكن — بقان حادثا ام همي كه بدن

همي قنجه بكره ژ غفله مكه — دقنجو ژ غفلدا نوشبه مكه

چكو خالق جمله انسان و جان — ژ بو امتحان مه آخ جهان

**Wêne 2.3: Kitabu Nuzhetu'n Nufûs ( Mesnewiya Hesen Cewherî), kopiya rûpela 'ewil**




٢٦٠ ٦٧

حسن مستقی بو بیلکو عال | بعد لو باحسانو قنجو دلال
کلک حسن دکن ژی همی عالم | ژ بو را دعا دکن هر دم
زمان حسن تو بکیفو سرور | دیچو تو بحکم خدای غفور
همی باق وزیر مرن دژمین | وزیر حب یک ظلامک امین
حسن ما لبغدا ملیک مرن | بعد لو باحسانو هم حسن کرن
ژ تیز ملیک قیزو کر زینه بون | لدو وی همی بون ملیک اوبتون
بکیفو بشاهی و ها مان تمام | هتا هاته سروان مرن والسلام
بقا بون ژ بونا خدایه یقین | بغیر وی فنانه همی اجمعین
همی ام و هانه اقه ناصحه | ژ بو مه بخوینن همی فاتحه

تمت كتابة كتاب نزهة النفوس بقدرة ربي القدوس اللهم ارزق مالكه
وكاتبه وقارئه في الجنة ألف حور وسبعين ألف عروس
وما لكه وكاتبه محمد نوري بن ملا عبد الله الكتبي بنجل الأوحدي غفر الله لهما وجعل
الجنة مأواها ومثواها آمين وذلك في أواخر شهر الله الحرام محرم الحرام
من السنة الهجرية ١٣٩٠ ومن الرومية ١٣٨٦ ومن الميلادية ١٩٧٠ يوم الأحد ٢٨
قبل الظهر بساعة ونصف ساعة
والله أعلم بالصواب

**Wêne 2.4: Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs (Mesnewiya Hesen Cewherî) kopiya rûpela dawî.**



باخصوص . گلك جهد كروى حسين – ٢ – دلال . هتا چو صفاح بعزو كمال

بسم الله الرحمن الرحيم

وژن هى وژن هى وژن گوهبين | گوبيژم ژبو وه چه دژدك مژن
چه هاته سرى اهل بيتا نبى | ژبو وان فداين أمّى و أبى
نه خاص حسين امام بو شهيد | دكر بو بلاء امام وحيد
وژن ما أتم تق بهفرا تمام | ژبو مرثيا شه بكن احترام
بيژن حسينا شه دل برين | ژبو ته شبو روژ أمن دل حزين
ژ مكه كو دژكت شه باوفا | اوى قرة عين بو مصطفى
د نيڤ روژ ڤى شم وهم ترويه | ژ هندك دواتان مراڤ زانيه
ژ ذى الحجة بو تمام هشت روژ | د تاريخ شيعتى أڤى دل دسوژ
برابر دكروى شه نامدار | دكل خو هنك شيعو بيتا كبار
دما او بريكت كه هشت نفوس | وهم دو مروڤ ڤ برن باخصوص
گلك جهد كروى حسين دلال | هتا چو صفاح بعزو كمال


9

**Wêne 2.5: Mersiyename (Me’temname) kopiya rupela ‘ewil.**



-٥٠-

وره تو قطعكه نجيل غبي | نزانى أقه او حفيدى نبي
اگر او ته دربازنكت ذى نهار | بقان بيتو أشعار شيرين كبار
كيه التفات بكت اى سخيف | دكل ته نجيل فقيرى ضعيف
وره بس دريژكه تو بندا دعا | بكه حمد و شكر و ثناء خدا
بيژه الهى أزم بى أدب | ببوره زمن تو بفخر عرب
يدى خوه دريژكه بال كردگار | بدقت دعاكه دليل و نهار
بيژه خدايا خداى غفار | بغفرينى من مجرم دل غدار
دكل داؤ باب و هرچار برا | ددر فى جهان زبو من چرا
دكل قوم و اتباع و اخوال هم | خدايا ندى وان ابد هم و غم
بغفرين كسى كو بخونه ژ دل | دفى مجلسيدا بلا غش و غل
بكه هديه او فاتحك بالتمام | زبو من فقيرى حزين والسلام
دكل بك صلاة و سلام فدر | بده سر رسول عظيم الفخر
خدا در قيام وى بكه شادمان | بجاه محمد شه انس و جان
الهى عفوكه من و داؤ باب | دحشرى هلينه لسر من حساب

**Wênе 2.6: Mersiyename (Me’temname), kopiya rûpela dawî.**



**Wêne 2.7: Mesnewiya Şemsedînê Tacir, kopiya rûpela ‘ewil.**



**Wêne 2.8: Mesnewiya Şemsedînê Tacir, kopiya rupela dawî.**